

Ji weşanên yekîtiya nivîserên kurd-Duhok

(280)

www.duhokwriters.com

**Zanista rexneyî
di navbera tiorî û parktîkê de**

Rexne

Tengezarê Marînî

2014



Ji weşanên yekîtiya nivîserên kurd-Duhok
www-duhokwriters.com

- Navê pirtûkê: **Zanista rexneyî, di navbera tiyorî û parktîkê de**
- Nivîser : **Tengezarê Marînî**
- Derhênana hunerî : **Mesûd Xelef**
- Hijmara Sipardinê: **(2014) sala 2014 li pirtûkxana**
Bedirxaniyan / Duhok
- Weşana hijmar: **280**
- Çapxana : **Çapxana Parêzgeha Duhokê**
- Çapa yekê: **2014**
- Tîraj: **500 dane**

Tengezar Marîn 04.09.1959, Li Tirbespiyê

xwendin: Ragehandina nû " Comunication, Relation & international Management"

Pirtûkên çapkirî:

Helbest : bi kurdî

1. *Kilît 1992 weşanên kovara Zanîn*
2. *Çirûskên xewneke bazdayî 1993 weşanên kovara ASo*
3. *Evîna Leylan û Mijê 1998 weşanên Navenda çanda navnetewî IIK*
4. *şevnema şînê 2001 IIK Hannover*
5. *Nesrîna Qedexe ji bêciriya te 2005 Weşanxana Belkî Amed*
6. *Amed, ev qêrîna şêxê min e (Helbesta Kalo) 2008 Prîvat*

werger:

1. *Helbestên rengîn Erich Fried weşanxaneyê êkîtiya nivîserên kurd Duhok 2006*
2. *Pentelonê şeytan Ítalo Kalvîno weşanxana kovara Sivore ya zarokan*
3. *6 Belavok û pirtûkên li ser sîstema Tendurstiyê, li Elmaniya ji bo navenda nojdariyê ya regezan 2010, 2011, 2012 .*

Bi elmanî:

1. *Der Baum der Freiheit Dokumentation= dara azadiyê IIK 1998*
2. *Funken des Nebels Helbest = çirûskên mijê IIK 2001*
3. *Was hast du gesagt? Helbest= te çi got? privat 2012*

Yek ji damezirênerê kovara Pirs, endamê rêdaktora kovara Stêrû Pêl.

Nivîskarê goşeyên wêjeyî di rojnameyên Azadiya Welat, Evro û War.

Berhemên rexneya wêjeyî û dansîna pirtûkan, danasîna wêjeya bêgane di gelek gelek kovar, rojnameyên kurdî de hatine belavkirin.

Helbest û nivîs, bo zimanên, ingilîzî, erebî, Farisî, Turkî û îtalî hatine wergerandin

Naverok

Beşê tiyorî

Berahîk.....	7
Rexne (Metod û tiyorî)	9
Xwendina digîtal	27
(Wergirtin) xwendin û kartêkirina ciwaniyê.	33
Ziman û hizir	37
Wergerandin û kartêkirin.....	55
Tore (Wêje) û zayendên wê?	69
Helbest û şirovekirina wê?	75
Xwendin û ravekirina Helbestê:	77
Lyrîk	83
Zimanê helbestê û spehêtayiya xwendinê	91
Ciwaniya xwendinê	97
Drama	101
Kurteçîrok.....	107
Bingeha tiyoriya romanê	113
Beşê cihbicihkirinê	141
Leyla û Fîgaro ber bi kû ve...?	142

Gulistan û Şev, romana Hesên Silêvanî	157
Kelevajî, pirtûka Kamîran Haco.....	179
kelehên ava. P.S. Dêreşî	203
Dr. Fadîl û Nijyargerî.	215
Helbest û Dr. Kamîran Bedîrxan.....	229
Jihevxiştineke nîşaneyî, Mihsîn Qoçan.....	239
Payîza çiya û Arîf Hîto.....	251
Fatma Savcî û Gula Qasîd.....	267
Ey êş û êş û Abdulkadîr Musa.....	275
Gulnar Elî, û Xezala Metîn û.....	287
Maçêke gunehkar, Tirîfa Doskî.....	297
Selîm Biçûk, di XEWNÊN REVOK de.....	305
Baran û hebûneke berze. Perwîn Mihsîn.....	317
Şevêk ji şevên helbestê, bi Yildiz Çakar re.....	325

Berahîk

Dîroka zanista rexneya toreyê, prosesa ciwaniya wergirtin û dahênanê ye, ya ku deqên toreyê, di rêya xwêner re, xwe nû dike û bizavê dike, ku rexnegir bike vedenga berhemdariyê.

Pirsgirêka zanista toreyê ew e, ku cenga di nav rêbazên Markisîst û formalîstan de vekirî hişt û dest bo dîroka edebiyatê nehate dirêjkirin.

Giring e tore û epystomolojiya dîrokî û ciwaniyê bêne têperandin, daku dîmenên rexneyê xelekên nû damezirênin.

Xwêner, fakterê sereke ye, bo dengvedana toreyê, lê rola wî di tiyoriyên wê de berteng e.

Ronîkirina serpêhatiya toreyê ya xwêner, wî ji gefên derûnê rizgar dike, dema wergirtin û kartêkirina berhemekî, di hundurê sîstemekê de, hêviyan derbibire.

Her berhemek, wek zayndekî toreyî, bi form û naveroka xwe, ji dijberiya di nav encamên poetîzmê û zimanê binecihî de, tête têgehiştin.

Min pêkol kir, di vê pirtûka xwe de, çend xalan destnîşan bikim:

Tore û zimanê wê: Çi cîwazî di navbera zimanê tore û derbirînên zimanî de heye?

Nîşan û referens: Çawa deqên toreyê dikarin ji rastiye nêzîk bin û dîmenên xwe yên ciwanî û derbirînê winda nekin?

Hunera axaftinê (Rethoric) wek regezekî zimanî.

Vegêran: çawa çîrok çê dibin?

Afirandin û danûstendina zimanewanî: çawa nivîsîn dikare bibe êrîşek berbi rastiyan ve?

Hevdeqî û hev mediyayî (Intertextuality & intermediality): çawa deqekî edebî xwe disperse deqekî din, an jî mediyumekî din?

Li vir bo me diyar dibe, ku sîstema toreyê di rêya erkên danûstendinê û têkiliyên wan regezan di gel hev saz dibe. Di rêya, berhem, navbeynî, wergirtin û karê li ser ragihandina toryê, sîstema toreyê tete damezirandin.

Ez ê li dawî nimûneyeke berçav û rojane bo xwênerên xweştivî binivîsim û pê vê berahîkê bi dawî bînim:

Nivîser, dahêner û berhemdarê ragehandina toreyê ye, weşanger, rola xwe ya navbir dilîze, xwendevan, peyamwergirê ragehanderê berhem e(Nivîser) û ew e, yê biryarê dide, rexne dike, pêşniyar dike bo xwendina berhem an jî temêniyê li nivîser dike, ku li berhem vegere û li ser kar bike.

Rexne (Metod û tiyorî)

Destpêk:

Mijara Rexneyê, mijareke pirr fereh e. Rexne di toreyê de, an jî rexneya toreyî di gel têgeha nirxên edebî (toreyî) hevçerx e.

Di dema ku berhemek toreyî bête afirandin (nivîser), ji hêla xwêner ve tête guhdarkirin, an jî xwendin û ew jî nirxekî, an jî nêrîna xwe li ser dide.

Dibe ku nivîskar bi xwe jî buyer û fenomenên toreyî, civakî, îdolojî di berhema xwe de binirxîne û hukum bike.

Di toreya me kurdan de jî, tiştê ez pê agahdar im, li ba Cizîrî dest pê dike, dema Cizîrî rexneyên tûj li melayê Finikê digire, ji ber helbestên wî ezber dikirin û diçû li Finikê dikirin ên xwe:

“ Ey mela namê te ye xemse, eşer

Bi wan şî, irên netegotî xwe dikî qend û şeker

Ev çî teqlîd û şetat in, çî petat in tu dikî

Tu xwe vêre dihejînê bi dused ah û keser”. **Cizîrî¹**

Seydayê Xanî jî yek ji wan helbestvanên me yên kilasîk e, ku rexne li civata xwe ya wê demê girtiye, ji ber ku guh nadin toreyê:

¹ Zivingî, Ehmed, 2. Aleqidulcewherî Dîwan Melayê Cizîrî R.

*“ Ger dê hebûya me jî xudanek alî keremek letîfe danek
İlm û huner û kemal îz,an şî,ir û xezel û kîtab û dîwan
Ev cins biba li ba wî ma,imûl ev neqid biba li nik wî meqbûl
Min dê elema kelamê mewzûn alî bikira li banê gerdûn ”¹
Mem û Zîn/E.xanî*

Di vî mijarê rexneyê de, sê têgehên sereke hene, beriya hertişî pêdiviyê pênasînek ji wan re bête dan, daku êdî metoda nivîsê diyar bibe.

Têgeh û pênasîn:

Di vekolîna babetekî wisa de, pêdiviyê nivîser dest bi pênasîna sernavê gotarê bike, çinku, kilîla vekirina deqî, di biyav û asoyên wan têgehên de, yê sernav ji wan hatiye pêkanîn. Em di vî mijarê de, pêrgî sê têgehên dibin:

1. Rexne
2. Tore
3. Rexneya toreyî a jî zanista rexneyî

Rexne:“ Kritik“

Peyva Kritik, peyvek e girîkî ye. “KritikéTechné“, te

¹ Ehmedê Xanî, Mem û Zîn

wateya hunera nixandinê

Kritikos= hunera jihev cudakirin û nixandinê

Di Latînî de, wateya wê, hunera nixandina helbestê ye.

Pirseke di navbera helbestê û cemawer (xwêner) de heye, ew jî diyarkirina xalên bi hêz û ên bêhêz di berhemana de ye, hunera gumanlêkirinê ye û şirovekirina sedemên kartêkirina berhem (text=peyam) li xwêner e (peyamwergir).

Çaxê em li pênasînên rexneya toreyî cuda û di demên cuda de, dê bigihin encamên berferêh.

Pênasîna rexneyê, di **Real lexikon** ya dîroka lîteratûra elmanî de, weha hatiye:

“vebijana (reflex) rasterast li ser berhemekî hatî xwendin e, ku sirincrakêş be, çêj jê bête wergirtin (xweş, an jî nexweş). Ev jî bi hestên xwêner ve girêdayî ye, li beramberî berhem û meyla wî ber bi nixandin û hukumkirinê ve dibe, daku kartêkirinê li derdoran jî bike”¹

Prof.Dr.Wolfgang Kayser, ku rexnegirekî elmanî mezin e,ferhengeke têgehên toreyî nivîsiya û weha pênasîna rexneyê radixe: ”Rexneya toreyî ew navdest ê (navbir), di nêva berhema edebî û xwêner de ye. Xwedî maf e li ser nêrxên hunerî û mirovatiyê. Wate du erkên rexneyê hene:

1. **Hunerî**. Xizmeta hunerê dike, dema wê dide nasîn û

¹ Reallexikon der deutschen Literaturgeschichte, 2 Bd, W. Kohlschmidt û W.Mohr, Berlin 1959, r. 63

zemînê peyda dike, daku deq kartêkirina xwe bike, wate, zindîbûna deq ava dike û cihê wê zindîbûnê destnîşan dike.

2. **Civakî.** Xizmeta mirovahiyê dike, dema xwêner ber bi kehnê û çaviyan ve dibe, daku ji serpêhatiyan sûdmend be”¹

Rexne li nik **Jean Yves Tadié** “çirûska ku berhemên kevin ronî dike, an jî dahênanê di wan de dike, an jî desthilatdariyê li ser wan dike, bêy ku xwe mîna wan biafirîne,,²

Ji van pênasînan tête diyarkirin ku têgeha rexneyê bi pir şêweyan hatiye danasîn. Ne tenê wilo jî belkî her rêbazêke rexneyî ji xwe re pênasînek daye vî têgehî.

Rexne ne pêveyeke toreyê ye, belkî hevalbend e, ya rast, bi xwe jî tore ye û tore bê rexne pêşnakeve, çunku deq nikare hemî rastiye derbixe. Rexne deq têne panava eşkerekirinê, ji ber wilo jî **Spinoza** rexne weha dibîne “ rexne li ser pêpeloka avahiyê ye, ne ya naverokê, ji ber pirsgirêk ne danîna rastiyeke şûna ya din ye, belê guhertina cihê rastiye di bizava ravekirinê de ye. Pirs nema ew e: Nivîs rastî dibêje an na? Lê nivîs çi dibêje?”³

Albier Teboudiè di gotara xwe de ya bi navê **Phiziolojiya**

¹ Kleines literarisches Lexikon, 1. Bd. W. Kayser. Çap. 3 Bern.München r. 136

² Rexneya toreyî di sedsala 20an de, Jean Yves Tadié . Erebi, werger a Dr. Qasim Meqdad R.19 şam 1993 belavokên wezaretê Rewşenbîrî

³ jêdera berê R. 20

rexneyê, sê cureyên rexneyê ji hev cuda dike:

- 1 Rexneya bilêvkirî¹ yadgarî û namebihevguhertin, rojname (rojnamevan)
- 2 Rexneya pisporî. Rexneya ku mamosteyên zanîngehan bi kar tînin.

Ev rexne bi van erkan radibe:

- a. parastina dema buhurî
 - b. pesindana toreyê û şirovekirina wê, ku ne tenê zanîna zanistên mirovane bike zanîna deqên dema xwe
- 3 Rexneya hunermendane: ew rexne ye, ya ku hunermend bi kar tînin”.¹

Li dûv wan pênasînên zaniyarên toreyê yên cîhanî ku danîne, gelo têgeha kurdî “Rexne” hevwatera di gel Kirik? Li wir çend pirs xwe bi xwe arasteyî me dikin, ew jî ev in:

1. Têgeha rexne rast e an na?!
2. Têgeha rast çi ye?
3. Eger nerast be bo çi ta niha bi kar têt?

Rexne ji du kîtan pêk tê, rex û ne, ji xwe rex tê watera kêlek, û ne, nîşana neyênîyê ye, ger em wan kîtan bidin kêleka hev

¹ Rexneya toreyî di sedsala 20an de, Jean Yves Tadié . Erebi, werger a Dr. Qasim Meqdad R.17. şam 1993 belavokên wezaretê Rewşenbîrî

dê bibe rex û ne, an jî nerex. Li vir herdû wateya kiritik nadin. Lê eger em temaşe bikin, dibînin ku pîtên rexne û nerx yek in, lê cihê wan hatiye veguhestin û eger em li wateya wê jî binerin, gişt hemî jêderan behsê nirxan kiriye û ereban jî kiriye Neqîd wate nirx, an jî dirav û dibêjin ew ê rastiye ji nerastiye derbixe, lewra behwer dikim ku peyva nirxandin rastir ji rexne ye. Ji bilî wê destê min negiha wê makdera ku yekemîn car ev peyv bi kar hatiye û ne jî dizanim kengî û li kû deverê.

Di gel kû bizava nirxandinê, bi şeweyê zanistî û metodîk, di kurmanciya jor de ne hewqas bi hêz e jî, lê peyvên rexne, rexnegerî, rexnelêgirin, rexnelixwegiritin û xwerexnekirin wek têgeh jî cihê xwe girtine, lew ra mîna peyveke ferensiyan heye dibêje, peyveke şaş, lê di nav civatê (xwêner û nivîskar) de cihgirtî, rastir e ji peyveke rast, ku tenê di çarçewa ferhengan de mayî. Li vir jî dê peyva rexne û rexneriyê bi kar bînin.

Di encamê de: Rexne pirs e, beriya ku bersiv be. Şirovekirin e beriya ku fermananek (hukmek) be. Nirxandineke beriya ku êrîşek be. Rexne rexne ye, zayendekî toreyî wekî helbest, roman, çîrokê ye û.. pirtir ji wilo jî bê rexneyê, tore di nav mij û temê de dimîne. Şeweyên rexneyê jî ev in:

1 Rexneya erênî: pesindan û çepiklêxistin

- 2 Rexneya neyênî: geryana li xalên reş di peyamê de
- 3 R. Konstruktîv „Sazker= avaker“: nirxandin di gel belgeyan bi mebesta sûdwergirtinê.
- 4 R.destruktîv „Hilweşandin“: ew rexneya ku li her xalekê bi guman seyr bike û têbîniyên bêsiûde li ser peyamê an jî peyamhinêr binivîse „kesayetî“¹

Literatur= Tore:

“Literatur :

Latînî : nivîsîna pîtan e, daneheva nîşanan e, çîrokên ku di pêpeloka diwem de bi kar tên. Literatur zimanê ku bi hizran mişt e. Toreya nirxgiran, ew ziman e, yê bê sinor bi hişmendiyê dagirtî ye² (Ezra Pound)

„Literatur“ Kevin:

Nivîsîna nivîskarekî/ê li gor zagonên ciwaniyê ên taybet. „ Durv, Naverok, mezinbûn, armanc, hevgerîna deq, zayendek (Helbest) be û ramana berhem jî hebe

¹ www.wikipedia.org. Wahrig elmanî

² Literarischer Fachbegriffe, s. 294, Definitionen u. Beispiele Otto.F.Best.Dez 1991, Fischer verlag.

Literatur nû:

Her nivîsa ku bête nivîsîn ew tore ye. Lê pêdiviyê ciwaniya nivîsê wek faktorekî sereke be, nimûne helbest an jî berhemên hunera peyvê, ew berhemên ku ziman roleke bingehîn di wan de dilîzin. Ziman ne tenê bi erkê ragihandin û gihandina nûçey û nîşanan radibe. Ziman di lîteratûra nû de, avahiya(nijyar= Struktûr) berhem ya taybet e. Lewra ziman xwedî nirxekî taybet e. Ji vê yekê tê gotin, ku ev ziman helbestî ye.»¹

Di pênasîna toreyê de, gişt hemî jêder di yek baweriyê de ne. Bo nimûne J.P.Sarter dibêje: “ tore diyarkirina xalên nepenî di mirov û cîhanê de ye”

Tore li def Z. Theodorv ew e” tore ne tenê geryana li rastiyê ye, belê ew rastî bi xwe ye”²

Milan Kondera di pirtûka xwe, ya bi navê “Hunera Romanê” de dibêje: “ Tore, pêkoleke ji bo ronîkirina hêleke tarî ji hebûna mirovayetiye”³

Bi peyvên din, tore deqek e, ji komek, serpehatî, fantezî, buyer, dîtîn, nêrîn, aso û biyavên jiyane, ji hiş û sewdanê nivîskar derdikeve û bi hunerî û ciwaniyek berz û bilind êrîşe berdide cografiya fîzîkî û metafîzîkî ya xwêner.

¹ www.wikipedia.org

² Rexneya rexneyê Zivîtan Theodorv, erebî. W. Samî Swêdan(Merkez Alimai, i liqewmî Beyrût 1986 R. 9

³ Hunera Romanê komek gotar û hevpeyvîn, bi elmanî ji Ferensî Brigitte Weidmann. W.xana Fischer. 1989 Frankfurter am Main r 31.

Rexneya toreyî:

„Ew nivîsîn in, ên dihingivin berhemekî, bi hûrbînî tête xwendin û li ser tête nivîsîn û gengeşekirin“¹

Rexneya toreyî, têkiliyê pisporî ye di nêvbera xwêner û toreyê de, gera li dûv nîrxê berhem e. Rexnegir bi xwe, hunermend e, mirovekî taybetmend e, têgehiştî ye, dişê rê û resim û nîrxê berhem biparêze, pêşkêş bike, bi berpirsiyarî li gor pîvanên hunerî û êstatîkî (Ciwani) û normên zanistî binerxîne. Ev jî bi hizir, têgehiştin û rastiyên kesayetî „Subjektîv“ girêdayîne“²

Rexneya toreyî berhemeke dikeve xizmeta xwêner û berhem de. Li gor kartêkirin û nîşanên hundir û derve berhem dinirxîne. Ev Rexneya toreyî dikare çape be „Pirtûk, kovar, rojname“ û dikare media be“ TV û êzge“³

Ji vê bêhtir dikare îro Digital jî be „internêt“.

Heta ku berhemek bête rexnekirin, pêdiviyê du stûnên sereke hebin, tiyorî û rêbaz. Ev herdu stûn, yê zanistê ne, wate eger herdu hebin, em, dikarin bibêjin zanista rexneyê, an jî rexnelojî.

„Theorie“ Bîrdozî“: Texmînek e, di çarçewa siruşt û durvê

¹ www.wissen.de. Wahrig.

² Literarischer Fachbegriffe, s. 294, Definitionen u. Beispiele Otto.F.Best.Dez 1991 Fischer verlag.

³ www.wikipedia.org/wiki Literaturkritik.

mijarekê de dilive, ku em dikevin nav de û pêwendiyên wê ên hundur vedikin. Wate, têramandina di mijarekê de û bi şûn ve li ser mijûlbûn û guftûgokirin.

Methodê“ Rêbaz“: raxistina alavên teknîkî û danîna yasayên hûr bo wan. Mijûlbûn li ser mebestên ku rexne bo wan di liv û tevgerê de ye“¹

Ekol , rêbaz, tiyorî û xwendegehên rexneyî:

Li vir dixwazim çend nimûneyan ji rexnegirên cîhanî bi nav û deng bînim, an jî ên li ser dîroka rexnegirî nivîsîne, da em bibînin, ka, ew çawa dibistanan parve dikin.

Jean Yves Tadiè, di pirtûka xwe de, ya bi navê **Rexneya toreyê di sedsala 20an de** rexneyê weha rêz dike.

1 Formalîstên Rûs.

- Xeleka Moskowayê 1915-1930.Schoklovisky-Thomashevsky, Tiniyanov, R.J.
- Xeleka Prag 1926. Prof. W.Matheuisus, Mukarowisky, Vaşk û R.Jacobson

2 Rexneya Elmanî.

3 Rexneya hizrî

¹ Jean Starobinsky/ La Relation Critique, bi erebî wergera Bedreddîn Al-Qasim weşanên Wezareta Rewşenbîrî şam 1976 R. 7

- Dibistan Gênf, M.Rîmon, G.Poliè, J. Russè,
J.Starobinsky

- 4 **Rexneya şirovekirina derûnî, an jî Freud î**
- 5 **Rexneya sîberî, Xeyal (imaginaire)**
- 6 **Rexneya civakî a toreyê**
- 7 **R. zimanzanî û Tore (Linguistique)**
- 8 **R. watedariya toreyê (Sèmiotique)**
- 9 **R.helbestiyane ya toreyê Poetik)**
- 10 **Rexneya avaker (genetische Kritik)*¹**

Lê em dibînin dema **Roland Barth** ê Simiotîk behsê rexneyê dike çend têgehên bi kar tîne, mîna Rastiya rexnegir, çêj, zelalî, Simbol, û aloziya şirovekirinê.

Di pirtûka xwe de ya bi navê “**Tore an jî dîrok**”, pirs dike: Rexne çi ye? Û bersivê dide: „ Her rexneyek, rexneya berhem û rexneya xwe bi xwe ye“²

Z. Theodorv di pirtûka xwe de, ya bi navê **Rexneya li ser rexneyê**, dibêje: „ Hemî tişt ravekirin e“ û weha rexneyê û şêweyên wê parve dike û dibêje ev rêbazên rexneyî ne, ne ekol in:

- 1 **Rexneya nû Hermeneutique (Ravekirin)**
- 2 **Rexneya Derve (Kesayetî, dem û devera nivîskar î)**

¹ www.literaturkritik.de / Prof.Dr. Fee-Alexandera Haase : Kritik.

² bi erebî ji W. Dar Tobîqal, wergera Ebdul Ezîz bin Erefe, Tore an jî Dîrok, sal 1987, r. 94

- 3 **Rexneya nijyargeriyê û postnijayrgerî**
(Structuralizm & Poststructuralizm)
- 4 **Rexneya şirovekirina derûnî an jî Freud î**
- 5 **Rexneya Sosiyolojîk, civakî**
- 6 **Rexneya dîrokî.** ¹

J.Starobinsky (xwendegeha Gef) di pirtûka xwe de “La Relation Critique” rexne weha rêz dike bêy, ku tu navî li wan bike, aya ekol in, rêbaz in, an jî bîrdoz in? Lê ew bêhtir bi ser teoriya toreyî ve diçe, ji ber wilo jî dibêje: „ çendî rexnegir xwe bi rewşenbîriyê dewlemend bike, dê bizanibe çawa guhertin di teoriyan de çêdibe û kartêkirinê li têgehiştina berhemên toreyî bike“ ²

Lewra jî weha rexneyê û şêweyên wê rêz dike:

- 1 **Rexneya Sosiyologie civakî**
- 2 **Rexneya şirovekirina derûnî**
- 3 **Rexneya Strukturalîzim û post
strukturalîzmê**
- 4 **Rexneya diyardeyî „ Phinominology“**
- 5 **Rexeneya zimanevanî.** ³

Michael Bachtin yek ji wan ên, ku bi hişekî vekirî li toreyê

¹ erebî. W. Samî Swêdan(Merkez Rexneya rexneyê Zivitian Theodorv Alimai, i liqewmî Beyrût 1986 R. 128-140

² Jean Starobinsky/ La Relation Critique, bi erebî wergera Bedreddîn Al-Qasim weşanên Wezareta Rewşenbîrî şam 1976 r. 8

³ Wek berê

temaşê dikir. Bachtin xwe li ser ekolekê jî nedihesiband. Behweriya Bachtin ew e ye, ku şeweyên rexneyê ev in:

1. **Phenomenology**
2. **Sosiyology**
3. **Linguistik**
4. **Dîrokî**
5. **Poetik.**

Stûnên karê rexneyê li ba Bachtin weha bûn.

- Daneheva hemî hebûnên şênber(metriyal) û dubarelêkdana wan di vegotîneke dîrokî de.
- Bikaranîna ravekirinê bi alîkariya zagonên civakî, derûnî û biolojîyê “Baflov”.
- Şirovekirin rêka diyalogê ye ku azadiya mirovane bizîvire.¹

Li vir Bachtin û Sartre digihin hev ku „ Wate azadî ye, ravekirin bikaranîna wê ye.

Rexnegir **Umberto Eco** li nîşanan diger û di rêya nîşanan re, deq ji hev dixe û dîsan lêkdide. Bêguman bizava rexneyî ya cîhanî her berdewam e.

Rexneya toreyî jî bûye zayendekî wêjeyî toreyî, ku ew jî

¹ Rexneya rexneyê Zivitian Theodorv, erebî. W. Samî Swêdan(Merkez Alimai,i liqewmî Beyrût 1986 R. 11

mîna berhemê edebî dikare deqekî vekirî be. Wate dadê tund û absolût li ser deq teqez neke. Her tekstek dikare pir xwendin lê bibin û hermeneutîka deq bi asteya rewşenbîrî ya Xwêner=Rexnegir ve girêdayî ye.

Rexnegirên mîna **J.Christiva** (ReceptionsTheorié, Textolojié= Bîrdoziya wergirtinê) **Wolfgang Iser** (Der Akt des Lesens= Kartêkirina xwendinê), metodên xwe yên rexneyî li ser astê xwêner avakirine. Di qûnaxa ku (nivîskar=xwêner= rexnegir), êdî bihêzbûna rexneyê li ser astê Epostymologiya(Merîfet) xwênerê berhembar(ew yê tenê ji bo çêjekê ji nivîsê bibîne=consumé) û xwênerê berhemdar (xwênerê têkelî prosesa dahênanê dibe) diyar dibe.

Rexnegirekî baş çi dike?

Rexnegirê baş berê xwêner berbi pirtûk û gotara xwe ve dibe. Xwêner vedixwêne xwendinê. Çirûskên pêşîn ji pirtûkê destnîşan dike. Ev çirûsk dikarin çirûskên dîrokî, zimanî an jî her heyokeke ku taybetmendiya nivîser balkêş dike bin. Pêdivî ye rexnegir bi xwe rêbaza xwe ya nivîsînê be, di nivîsîn de û zimanekî di asteya lêkolîn û rexneyê bi dest xwe ve bîne.

Di civatên paşketî de, peyva rexne tim bi hêla neyênî ve bestiyayî ye, tevî em dizanin ku rexne ne weha ye, belê nirxandin û nirxpêdana berhem an jî deq e. Rast e erkê

rexnegir girêdana têkiliyan di navbera xwêner û berhem de ye û ronîkirina quncikên tarî di deq de ye, lê nayê wê wateyê ku pêdiviyê ta bi derziyê ve bike, çimkî êdî em li vir dê pêrgî xwênerekî bêkêr bibin.

Rexnegir li ba **R.Barth** „ xwêner bi xwe nivîskar û xwêner û rexnegir e“¹

Pêdiviyê rexnegir binivîse bo çî berhemê li ber, daye ber nirx û lêkolînê û ziman û navroka berhemê daye ber lêkolînê, ravebike.

Ji bilî wisa jî divêt ji xwe bipirse aya wî ev berhem di demeke bo wî baş de xwendiyê? Kartêkirina derdorê lê hebû? Bi wateyêke din pêdiviyê rexnegir li xwe mukur bê, ka dema wî rahêjete vî berhemî, di çi rewşê de bû, an jî ew agahiyên têra rahiştina berhem, bi dest xwe ve anîne?

Rexne, ne ev berhem baş e an jî nebaş e, belê şirovekirin û xwendina element û regezên ku di nav xêzan de hene ne, di xêzên nivîsî de. Wate regezên nebeşdar amede bike. Di dawî de dixwazim lîsteya daxwazên **Adorno (Xwendegeha Frankfurt)** li jêr binivîsim, çukî behwer im ev daxwaz bo her rexnegirekî û her demê dibin:

„ Pêdiviyê rexnegir van xalan pêk bîne:

1. Serbixwe be

¹ Barth, Rolan, Nivîsîn di pileya 0 de, erebi, werger, Dr. Munzur Al eyaşî, Dar al-inma,i alhedarî

²4 Adorno Noten zur Literatur Suhrkamp, 6. Aufl., Frankfurt/Main 1994, Or.-Pp., S708 S.87

2. Bi hûrbînî û çavsorî li berhem seyr bike, bê ku bigihe sînorê kesayetiyê.
3. Tenê di çareçwa tore û berhem de bimîne.
4. Ji zeviyê ku rexne lê digêrê agahdar be û ta radeyekê rehber be, di hunera berhem î de têgehiştî be.
5. Bandora hukmên hineke din lê nebe.“ 24“

Toreya rexnegir:

1. Aste û qalîteya wî bilind û berz be
2. Bi civakê re rast û hevdem be
3. Girêdayî pîşê toreyê be

Karê wî kartêker be:

1. Hêdî hêdî baweriya xwe biaffrîne, ango piştî xwendina berhemî.
2. Rexne mîna toreyê li gor pêşveçûna civakê bête dîtin û tegehiştin“¹.
3. „pêdiviye rexnegir amade be, bîr û rayên curecur ji hev derbixe û nekeve bin kartêkirina çu kesî de, ta bigihe wê radeyê xwe ji desthilatdariya xwe bi xwe jî rizgar bike.“².

¹ Theodor W. Adorno - Studien zum autoritären Charakter. Suhrkamp, 6. Aufl., Frankfurt/Main 1994, Or.-Pp., 708 S S.125

Rexne bi hêztir dibe eger, rexnevan agahiyan li ser têbîr, raman û berhemên nûser bizanibe, çimkî barê wî sivik dibe û çirîskan bo xwêner ronîtir dike.

Jibilî wilo çend têbîniyên teknîkî hene gereke rexnegir jibîr neke.

Navê jêderan, weşanxane, sala weşanê, cihê weşanê, hijmar û pîvanên pirtûka ku li ber nixandinê ye hijmara rûpelan, navê nivîskar.

Tiştêkî din pir giring heye, pêwîste rexnegir xwe dûrî taybetmendiyên kesayetî ên nivîskêr bike û rêzê li nivîsîn, nûser bigire û ew bi xwe jî xwedî bingeheke rewşenbîrî û stîlekî taybet be, pal bide ser bingeheke û stûnên Zanista toreyî.

Jêder:

- Dîwana Melayê Cizîrî . Al Eqdil Cewherî
- Ehmedê Xanî: Mem û Zîn
- Reallexikon der deutschen Literaturgeschichte, 2 Bd, W. Kohlschmidt û W.Mohr, Berlin 1959 Kleines literarisches Lexikon, 1. Bd. W. Kayser. Çap. 3 Bern.München
- Rexneya toreyî di sedsala 20an de, Jean Yves Tadié . Erebi, werger ya Dr. Qasim Meqdad şam 1993 belavokên wezareta Rewşenbîrî
- www.wikipedia.org. Wahrig elmanî
- Literarischer Fachbegriffe, Definitionen u. Beispiele Otto.F.Best.Dez 1991, Fischer verlag.
- Rexneya rexneyê Zivitan Theodorv, erebî. W. Samî Swêdan(Merkez Alimai,i liqewmî Beyrût 1986
- Hunera Romanê komek gotar û hevpeyvîn, bi elmanî ji Ferensî Brigitte Weidmann. W.Xana Fischer. 1989 Frankfurter am Main
- www.wissen.de. Wahrig
- Literarischer Fachbegriffe, Definitionen u. Beispiele Otto.F.Best.Dez 1991, Fischer verlag
- [www.wikipedia.org/ wiki Literaturkritik](http://www.wikipedia.org/wiki/Literaturkritik)
- Jean Starobinsky/ La Relation Critique, bi erebî wergera Bedreddîn Al-Qasim weşanên Wezareta Rewşenbîrî şam 1976
- www.literaturkritik.de / Prof.Dr. Fee-Alexandera Haase : Kritik
- bi erebî ji W. Dar Tobîqal, wergera Ebdul Ezîz bin Erefe, Tore an jî Dîrok, sal 1987
- Jean Starobinsky/ La Relation Critique, bi erebî wergera Bedreddîn Al-Qasim weşanên Wezareta Rewşenbîrî şam
- Barth, Rolan, Nivîsîn di pileya 0 de, erebi, werger, Dr. Munzur Al eyaşî, Dar al-inma,i alhedarî
- Theodor W. Adorno- Noten zur Literatur Suhrkamp, 6. Aufl., Frankfurt/Main 1994, Or.-Pp.
- Theodor W. Adorno - Studien zum autoritären Charakter. Suhrkamp, 6. Aufl., Frankfurt/Main 1994, Or.-Pp.

Xwendina digîtal

Di navbera

Ciwaniya teknîkî û hermeneûtîka de

Taybetmendiyan her dem û deverê hene. Di hundurê van taybetmendiyan de jî, pirsên cuda û cîwaz diafirin, wate her demek, pirsên xwe bi xwe re diafirîne û tîne.

Eger bi van hizran em berê xwe bidin pirsên heyî, dê bikaribin xwe di hundurê dîrokê de bilivînin û dê bikaribin, roleke kartêker bilîzin, ji dêvla ku li perawêza jiyanê bimînin. Bêguman, dema gulobalîzimê, bi têkilî û teknîka xwe ve, deqekî cuda ji jiyanê afirand. Em jî wek xwêner/bîner/kartêker/ berhem(dar/bar), mecbûr in di vê çarçewê de, pirsên xwe bi renekî din, cuda ji yên berê damezirînin û xwendineke nû li jiyanê/deq bikin.

Di serdemên sermiyandarî û di pey wê re, ta dema gulobalîzim/ Massmedia yê de, felesefê dikarîbû pirsên xwe di derbarê jiyanê de, bi çarçew bike. Lê di dema teknolîjiya hûr û bilind de/ Data, pêşberî asteng û aloziyên zor, di warê hermeneûtîka deq de (têgehîştin û şirovekirin) dibe.

Ev neşiyana biçarçewkirina jiyanê ji hêla felesefê ve, xwêner ber bi qûnaxek nû ve bir û ta radeyeke bi hêz, pirsên xwe li ser wî ferz kirin û dikin.

Êdî li hember vê rewşa nû, xwêner pêdivî bi xwendineke nûtir, li ser gelek asteyan heye.

Ji ber ku babeta me jî xwendina dîgîtal û ciwaniya wê ye, dê berê xwe bidin wan amurên nû û têkiliyên amurên digîtal di gel xwêner û katêkirina wan berdiwan li hev. Eger dema berê xwendin û xwêner di bin asîmanê çapemeniya kaxez û ximavê de, hest bi ciwaniyê dikirin, lê niha monîterê komputer û tora internêtê, wî vexwendî pirsên cuda û bi lez dike, rê li ber gilî û gazindan navekê û rê nade xwêner wek xwe li ciwaniya nû binere.

Li vir, tu xwêner î û bi teknolojiya ve digihî, an jî nexwêner î. Eger em nebêjin tu ne anAlfeBt î ?.

Toreya çalak û kartêker/Hyperfîktion, cihekî xwe, me bivênevê, di qada deq û ciwaniyê de girtiye. Şêweyekî nû, li cihekî nû bo çav û hizirên xwêner. Lewra xwêner pêdivî bi têkiliyeke nû heye, bo astê ciwanî û çêja xwendina xwe ji deq re bilindtir û nûtir bike.

Li vir xwêner pêngav bi pêngav ji layê amur/nivîskêr ve tête vexwendin/mecbûrkirin, ku xwe têkildarî prosesa dahênanê/berhemdariyê bibe.(kê-m-zêde, mecbûr dibe beşdarî prosesa ciwaniyê bibe û reftareke çalakane bilîze).

Dibe ku ji nêrîna yekem ve, em seyr nemînin û bibêjin, belê ev şêwebeşdarî, xala sereke bû, di berhemanînên **Bertold Brecht**, di şanoyê de. Beşdariya cemawer/xwêner bi

lîstikvanan/nivîskar/messaj, re, 1 bi 1, çêj û ciwaniya peyamhinêr û peyamgir nêzîkî hev dike û terazûya ciwaniyê, di hundurê wê têkiliyê de bilind dike û hinga em dikarin bibêjin prosesê biyava xwe ya sêqolî wergirt.

“ Ev pirs di hizra xwêner de digere, lewma pişkdariya xwêner, hêzekê dide deq, dibe sedema ku buyer bi xwe lîstika xwendinê bike ”¹

Xwêner di gera xwendinê de, bişkuj, xêz û xezokên mejî dixê bizavêkê. Di wê bizavê de, mejî velerizîneke taybet dike. Di wî hişî de, nûçe wek wêne têne veguhestin û tên guherîn. Epystomolojiya xwêner, xwe lê digihîne hev û dest bi prosesa berhevhevkirina zaniyariyên kevin, serpêhatîyên kevin û zaniyariyên deqê li ber dike. Di vê lerz û bizavê de, xwêner pêrgî çêjeke nû û ciwaniyek nû dibe. Di Hyperfiction de, xwêner, rola xwe ya dahênane pêktîne. Bi tikîna linkekî (lêdana pişkoka komputerî) prosesa pêgehandinê pêk têt. Ev bi serê xwe, rola pêgehandinê ji xala netiştêkî berbi zeryayeke ji nîşan û nûçe û zaniyariyan ve dibe, çunku ew tikandina wan şîfreyan, dibe kilît ji bo derbasbûna nav deqî û peydakirina asteyeke nû ji hermeneutîka de, bo deq û şikandina wê bendewariya çêj û bedeweyên kevin.

Eger, em bi hûrbînî li vê prosesê binêrin, dê bibînin ku hiş di Hyperfiction de, ji derve tête û ne mîna xwendina pirtûkê ye.

¹ Warning.R.Rezeptionsästhetik. „ Theorie u. Praxis. S.64 L. 8. ISBN 3-77705-4 UTB- Lw. Fink

“ liberçavanîna di hiş de, regezê derveyî ye. Şûnwarekî xwe yê ciwaniyê taybet ava dike. Di vî şûnwarî de, xwêner xwe li gor Hyperfiction bi sînor dike. Dan û stendinê dike, birayra xwe bi xwe dide û bi xwe jî werdigire. Radeyeke pîrr ji esseyî li ba xwênerî dest pê dike û dibe êtûna nivîsadin/xwendina hundurî(Zihnî)ê”¹

Bi vî şêweyê xwendinê, xwêner dibe desthilatdarê li ser deq. Eger em romanê wek nimûne deynin ber çav, dê bibîn ku xwendin û ravekirin, alîgir û cimikên hev in.

Ev şêwexwendin, weha dike, ku bi nêrîneke din li deq bête temaşekirin. Bi vî xwendinê erkên xwêner bêhtir dibin.

Bo nimûne, pêdiviyê xwêner, deq bi reng, ronî û avakirina deq re, di têkiliyê nû de be.

Boşahî, xiyal û cih, dikarin xwêner têxin deryayeke ji pêlên reng û dangan.

Lîstina tiliyan û awirên çavan di bedewiyê lertzane de melevaniyê dikin. Xwendina linkekî”Hyperfiction”, xeyal li hember realîte ye.

Ev pergale dibe çalakiyek di hundurê amûrê komputerî de û ew wêneyên li ser monitor di boşahiyeke ji reng û dangan de dilivin.

¹ www. Dichtund-digital.de (Forum Ästhetik Digitaler Literatur)

“Xala herî balkêş di hyperfiction de, ew e, ku asoyên berferh û konkrêt di hizra xwêner/bîner de tête afirandin û zemînekî ciwaniyê taybet pêktîne”¹

Şiyana teknîkî cihekî berçav ji hêla huner, zanîn, sazî û ciwaniyê ve digire, rêka serwextbûna me destnîşan dike.

Ev cihê hunerî ku li berçav wek realîte, biyav û zeviyên sêgoşeyî dadimezirîne, xwêner/ bîner jî dibe keptanê deq, bûsela wî jî hermeneutîka wî ji deq re ye.

Li vir pêdivî prosesê bi ciwanî û zaniyariyên bi şeweyekî cuda ne.

Li vir prosesa jihevixistin û levxistina symbol, nîşan û şîfreyên deqî dest pêdike.

Çendî jihevistineka şîfre û simbolan bi wirdekarî li ser xwe be, wisa jî levxistina wan bi hermeneutîkeke ciwan û keşxe tête ristin.

Ji ber wilo jî xwênerê hyperfiction pêdiviyê karê xwe bi zivîrî bike.

Xwêner/bîner, di cîhaneke din de xwe dibîne, ku têkiliyên nû, li ser bingeh û asteyên nû û cuda peyda dibin.

Civak jî, bivênevê derbasî qûnaxeke nû dibe, pêrgî şeweyekî nû ji xwendinê dibe, pêrgî dialogkirina jiyanê dibe, dikeve dava deqî.

¹ Ya berê

Wate, deq û xwêner di gelek caran de dibin yek, lê di hin caran de, xwêner dibe temaşevan.

Lê di rekeha teknîkî de, mirov nikare nepişikdar bimîne, çimkî, reng, ronî, dîkor alavên pîrvekêş in.

Xwêner/bîner li ber dergehên nû radiwestênin û ew jî nikare xwe bi virde û wir de bibe. Ew mecbûr dibe têkilî prosesa hevpejirandin, hevgehîştinê bibe.

Encax bi vî şeweyî, xwêner bikaribe di jiyana dîgîtal de, qûnaxên tarî derbas bike û bi ciwaniyeke nû regezên nediyar ji taristana amûran derbixe û bêne jiyane.

Jêder:

- Warning.R.Rezeptionsästhetik. „ Theorie u. Praxis. S.64 L. 8. ISBN 3-77705-4 UTB- Lw. Fink
- www.Dichtund-digital.de (Forum Ästhetik Digitaler Literatur)

(Wergirtin) xwendin û kartêkirina ciwaniyê.

Di dan û stendinên toreyê de û bi taybetî raxistina dîrokî ya toreyê û şirovekirina wê ya akademîk de, berhemhinêr xwêner piştguh dike. Lewra pêdiviyê, têkiliya di navbera deq û xwêner de, li ser bingeheke taze û durust bête avakirin. Di demên postmodernizmê de û ta niha, xwêner roleke sereke û bingehîn, di têgihiştin, têgehandin û ragihandina deqî de dilîze.

Di vê serdemê de, ji hêla zanista toreyê ve, berhem ne tenê rûdana buyerên civakî (Neynik) bi cih dike (Ciwaniya berhemênanê- Toreya sosiyolojîk), ne jî dixwaze yekîniyek ji nijyarên (structure) deqî be (ciwaniya bikaranînê).

Serpêhatiya xwendinê dest pê dike, dema xwêner li wateya deqî dipirse, lê dikole û hêdî hêdî stratîjiya xwendinê ava dike. Ev lêpîrsîna xwênerî, li wateya deq, wî derbasî asteya sementîk ya deqî dike.

Di dema xwendinê de, kelandineke taybet di navbera deq û xwêner de, peyda dibe. Xwêner dixwaze di rêka deq re, bigihe kakilê epystomolojiya nivîskarî. Ji xwe jî vir serpêhatiya xwendinê û wateya wergirtinê dest pê dike.

Di avakirina stratîjiya xwendinê de, xwêner rêkan dipelîne, bo avakirina watedarî û sîstema avakirina deq. Dan û stendina xwêner bi deqê re, dibe wekû mirovekî, ku tiştêkî xwe winda kiribe û li dûv şopa wî biçe. Lê ev şop, di deq de, lêkdan in (syntax).

Ev lêkdanên deq regezê bêliv in, lê diyardeya razberiya deq, regezê gerok e û hebûna wê bi beşdariya xwênerî tête damezirandin.

Eger em bîn û baş li wateya deqê binihêrin, dê bibînin, ku ev wate, dijreaksiyona hizra mirovî li hember deq e. Wate her kartêkirineke ku deq li xwêner dike û dibe parçeyek ji sementîka deq.

Li vir xwendevanê derveyî deq dibîne, ku wateya deq, ne di deq de ye, belê di têkiliya di navbera deq û xwêner de ye. Wate, sementîka deq ew şopa deqê, ku di hizra xwêner de tête çandin û dimîne.

Li vir, çi pêdiviye, ku xwêner bike, ta ku prosesa xwendinê, stratîjiya xwe ya demane ava bike? Xwênerê ku nivîskar bi xwe hizra wî kiriye, li yekîneyên zimanevanî (Hevok, Lêkdan, Peyv, nîşan.) digere, wan ji hev derdixe, vedike, vediwejêre û li hev dixê, di rêya wan yekîneyan re, rêbaza xwe ya xwendinê ava dike.

Lewra ev xwêner, berê xwe dide nijyara zimanevanî ya deqê.

Mebesta min, neku li wateya ferhengî digere, belê wan parçeyên deq li ber hev datîne û diner, ka çi kartêkirina deqê

li wî dibe û çî têkilî di navbera wan yekîneyan de heye. Wateya deq, encama prosesa xwendinê ye, avakirina rêbazekê ye, ka serpêhatiya xwendinê çawa ye.

Li vir rola hişê xwêner diyar dibe, ku ew bi xwe kontrola xwe dike û pê hest dike, ka biyava kartêkirina deqî çi çiqas lê dibe. Bi wateyeke din, ka xwêner çî qasî di lêpîrsîna li asteya merîfî dûr çûye?! Di her xwendinekê de, ku xwêner şêweyê guncîna xwe di gel deqî de nas dike, hindê karên hizrî dibin, bo avakirina wêneyekî ji wateya deqî. Ev têgehiştin bi pîrbûna xwendinê re mezin dibe, aso li ber vedibin.

Lewra ev wateyên ku deq wek şopeke zaniyarî li ser hişê xwêner dihêle, di gelek asteyan de de rû dide, mîna asteya derûnî, simbolîk, mîtolojîk, felesefî û... . Xwêner/ Rexnegir, êdî rêbaza xwe hildibijêre û estetîka wî, serdestiyê lê dike, daku rêbaza xwe hibijêre û ezmûneya xwe beramber nasîna deqî bixe bin neyikê de.

Dema em behsê xwendinê dikin, bêguman, nîrxên ciwaniyê jî di nav de ne, çunkî xwendin xwedî kartêkirineke mezin e, li ser xwêner. Wate têkiliya xwêner bi deqî re, nîrxekî ciwanî ye jî. Ev çêj, hilketin û guncîn, an jî nîfrîn, encamên hizirkirina regezên nebeşdar in. Em dizanin, ku nijyara ciwaniya deqê toreyî, şêweyê avakirina têkiliyan e, di hundurê deq de.

Ta ku wergirtin bigihe asteya bilind ji nîrxên ciwaniyê, di hundurê deqê toreyî de, pêdiviyê diyarokên dîrokî û nîrxên civakî ji xwe re, bo şirovekirina deqî bi kar bîne.

Pirsek li vir tête arayê, gelo hunerî û ciwaniya deqî, cuda di pêvajoya deqî de têne avakirinê, an jî parçeyek ji prosesa wergirtinê ne?

Li ser vê pirsê pir guft û go hene. Eger em bi çavekî pasîv (bêkêrî) berê xwe bidin xwêner, wate xwêner ew e, yê li pey nivîskar diçe û li ser deq î, ne xwedî roleke karîger e. Wate xwênerê berhembar(konservativ), bêguman dê bibêjin: nexêr, nixên ciwanî û hunerî wek xwe dimînin, li gor ku nivîskarî bo me dana ye.

Lê eger em bibêjin, ku têkiliya di nava xwêner û deqê toreyî de, têkiliyeke erênî û berhemdar e, wate xwêner nakeve bin kartêkirina nivîskarî de, lê xwe parçeyek ji prosesa xwendinê bi giştî dibîne, hinga dê bibêjin wegirtin(xwendin), encama têkiliya asteya merîfî ya xwêner û asteya marîfî ya deqî ye.

Hinga em dikarin bibêjin, rast e ciwanî û hunerî li derveyî deq tête pêkanîn, lê wek Wolfgang Iser dibêje: „Ciwanî û huneriya deq, parçeyekî hevbeş e, di nav deq û xwêner de“¹

Jêder:

¹ Der Impilizite Leser. Wolfgang Iser, 284. UTB, Stuttgart; çapa: 3. (1994)

¹ Der Impilizite Leser. 284. UTB, Stuttgart; çapa: 3. (1994)

Ziman û hizir du regezên pêkve girêdayî

Ziman û hizir, çawa ev herdû têgeh bi hev re? Bersiva wê Eflaton bi hêsanî daye:

{“ *Hizir axaftin e, axaftina giyan bi xwe re ye* (Sophistes 263e)“ di çekî din de dibêje: „ *Ji min re weha diyar dibe, dema ko giyan hizir dike, mina ko diaxive, ew pirsan ji xwe dike û bi xwe bersivê dide, erê an na jî dike*” Platon: Theaiteth 190a}¹

{ *Hizir, axaftineke di bêdengiyê bi xwe re ye, bi wî zimanê ko her yek dişê çavdêr be. Mînak li ser vê jî, dema mirov nameyekê dinivîse, bê ko nivîser bi xwe jî peyvekê bîne ser lêvên xwe, bi tinê dest û pênivîsa wî karê xwe li ser kaxezê dikin. Em dikarin- eger em bixwazin- ya peyva nivîsandî ji ya hatî bilêvkirin û ya hatî bilêvkirin ji ya tête hizirkirin cuda bikin, lê ne peyva nivîskî, ya bilêvkirî û ne jî ya hizirkirî dikare bi tena serê xwe bijî }*.²

¹ Dörner, D. (im Druck). Sprache und Denken. In J. Funke (Ed.), Denken und Problemlösen (=Enzyklopädie der Psychologie, Themenbereich C: Theorie und Forschung, Serie II: Kognition, Band 8). Göttingen: Hogrefe.

² Friedrich Max Müller(1823-1900), Philosophie als Sprachkritik im 19. J.hundert. Hrsg. Sigfried J. Schmidt, Stuttgart-Bad Cannstatt 1971.

Babetek û mijarekî weha, me berbi pirsekê de dibe, ew jî ev e: Çima em pirsan dikin?

Pirs ji bo çi ye? Çi guman li dûv pirsê heye? Gumana me ji çi heye? Ev ne şêweyekî rexnelêgirtinê li hizir û bîrên me, li zimanê me ye? Ev gumanek bingehîn e, ko rêka serbestbûna me ji xelesa desthilatdariya zimanê me yê perwerdê, toreyê, ragehandinê derdixe û nîşanî me dike, me berbi pêrgîbûnekê de dibe, dako em rastiye bizanin û pêk bînin, ew rastiya ko pêşbehwerî, pêşduruvkirin, pêşhevînasînên me nayête diyarkirin.

Guman, rêya xebatê, berbi nasîna rastiye ve, ye û di mercên îroyîn de jî, guman hene, berferehbûna vehesîna hebûna hişmendiya me, berbi paşeroja mirovahiyê ve, ya di tevaya hizira me de, dibe û eger ev guman berdewam bibe, dê pîşesazîkirin û zîrekiya hişmendiya me bi paşerojê ve girê bide û xwe wek guman di hiş, bîr û hizira me de rûbide.

Li vir ev berdewamî û pîşkirina hişmendiya me ya mirovane, cîhan û gerdûna me dike karxaneyek û bi rê ve dibe.

Ev têkiliyên di nav sedema rûdana gumanê û gumanê bi xwe de, di hundurê hizirê de wateyê dide mirovahiya me ya rasteqîne, ta bigihê sinorê metirsiyana lixweziyankirinê ko êdî dibe tehluke.

Ne bi me ye, ko êdî pirs xwe li hev rêz dikin û zeviyê jiyane mişt dikin wek: Erê boçûna me, li hember cîhana me di cihê xwe de ye?!

Me çend hukmên nerast, ji dema ziman û serpêhatiyên di gel zimên, wergirtine?

Em çendî bi zordarî nêzîkî hev bûne?

Çi bi darê zorê li ser me ferz bûye û me çend tişt li ser hin din ferz kirine, ta ko zimanê me ta roja îro di serpêhatiyên xwe yê dema pêşîn de dijîn?!

Em bi xwe ne aloziyek in, di hişmendiye de, bêy ko em pê bizanin?

Li berahîkê û li dawiyê, Pirs, bi xwe ne teqezkirineke, ji kêmsûdwergirtinê, an jî, rexnelêgirtinê li hişê me?

Ne diyalogêke giyanî ye, di gel xwe li ser wan kêmasiyên li nik me????

Pirs û pirs....

Eger weha em berdewam bikin, dê di xwe bînin der, ko em serpêhatî û qunaxên xwe dubare dikin û dawiyê li jiyana xwe tînin. Dema Kevin û nû dê têkel bibin, dê bibin mîna ko stêrkên komika sêwîyan li hev bikevin û birijin.

Ji van pirsan hemîyan diyar dibe, ka çendî ziman giring e û çend pêdivî ye têkeve nav dan û stendinê, têkeve nav bizavê, bo xwe li derveyî qewar û çarçova xwe bibîne.

Ziman weha giring e, ko bûye regezê sereke ji regezên pêkahtên neteweyekî, weha giring e û kartêkirina zimên li hizir û bîra mirovî heye.

“ *Em bi peyvan hizir dikin*”¹

Eflaton di pênasîna bîr û hizrê de weha dibêje:

„*Wateya Hizrê, hizra tişteki bikin, wate tişteki ji xwe re bibêje. Pênasîna Eflaton, dide xuyakirin, ko diyalogeke hundurîn ya giyan “Ruh” bi xwe re ye*“²

Hizir xwederbaskirin e, li xwe û behwerî û zaniyariyên xwe bi guman e. Serederiya di gel hizran, diyalogeke bêdawî vedike û bi xweşî guhertinên nû dipejirîne û serwext dike.

Tiştê mirovê normal ji yê xeyalî cuda dike, ew xeyala wî ya bêdawî ye, ji bo vê yekê, tiştê heyî, ew ya rast e û bi çavmiç-belkirinekê, peyda bûye.

Jiyan serpehatiyeke zimanî ye, mezinbûn û perwerdebûna mirovî, di hundurê axaftinê de ye, di hundurê ziman bi xwe de ye. Ev diyalog di demên bi xwe de û beriya niha jî, ji hêla hin din, dikete nav guftûgoya hundurîn.

Wate em bi xwe re guftûgoyên din, serpehatiyên mirovên din, dikin û parve dikin û di pey re wan rêk dixin.

Aristotalis bi ciwanî diyar dike,

“*ku wêneyekî geşdar ji diyalog û serboriyan berbi têgeh û gelemperiyê ve diçin,*”³

Di her pesindanê de, Aristotalis derbiriye, ko ji gelek liberçavdanîn û jidilhesibandinê de, serboriyek peyda dibe,

¹ Friedrich Max Müller(1823-1900), Philosophie als Sprachkritik im 19. J.hundert. Hrsg. Sigfried J. Schmidt, Stuttgart-Bad Cannstatt 1971.

² An Post. B 19 100 a 3ff.s.200

³ An Post. B 19 100 a 3ff.s.200

serpêhatî gencînekê ji zanînê re peyda dike, xwebewheriyê peyda dike û berdewamiyê dide jiyanê.

Lewra jî Aristotalis pirsê dike: Em çawa van zaniyariyan bi dest xwe ve tînin?!

Serpêhatî û tecrubeyên mirovan, roj bi roj pir dibin, gelek ji wan diyarokan dubare ne, encama wan wek hev e û wek hev dimînin, ji ber wilo jî pirsek xwe di serê me de dibe û tîne:

Ev çi rewş e? Pêdivî ye bi nav bibe? Kengî kesayetiya pirralî rola xwe dilîze? Kengî ziman û heyanî çi wateyê dikare hizirê binivîse?

Çendî ziman û hizir ji êk birevin, nêzîkî êk dibin. Mînakek ko em bikaribin nêzîkî wê bikin ev e: - Dema desthilatdarek bireve, li şûn xwe temaşe bike, hew dibîne ku nêzîkî dijminê xwe bibe. Weha jî mirov fêrî axaftinê dibe.

Di felsefeya Aristotalis de, peyva yekem nîne. Mirov bi ziman û di gel zimên mezin dibe.

Erê eger em werin û pisyarekê ji xwe bikin, em paşeroja xwe parçeparçe nakin?!

Di fêrbûna axaftinê de û guft û goyê de, em mezin û perwerde nabin?

Prosesa ziman û hizirê, di hundurê civakê de, di gel civakê dijî û di gel peyda dibe.

Serpêhatî, eger bi peymaneke nepenî di hundurê civakê de peyda bibe û bi rêk û pêk bibe dê baş be?

Prosesa hizir û ziman dibe „îdolojî“ weha jî fêrbûna axaftinê di berdewamiya fêrbûnê de ye. Guherîna têgeh, fêrbûna argumentan, afirandina behweriyan û teqezkirinên me jî, di prosesa ziman û hizir de dilivin, buyer û serpêhatiyên berê jî di van prosesan de diçin û tên. Pirs jî ev e: Çi rastiya wê yekê heye, ko jiyana bi serboriyên çûyî qewarekirî û bi cehkirî bin. Pirs li ser reh û makderên têgehyan an jî têkiliyên rasteqîne di navbera taybetî û giştî de yên têgehyan de, pirseke kevnar e. Çawa mirov diçe axaftina xwe têxe çarçovekê, ko axaftin û mebest hev bigirin?

Ev pirs hemî derdikevin, lê bersiv tim nisbî, rêlatîv in. Jiyan bi xwe jî mîna zimanî ye.

Li vir jî pêdivî ye mirov pisyarê ji xwe bike, erê jiyan jî hizir e?

Jiyan hizir e, ziman wî dinivîsê, lewra jî pêdivî ye, her careke em derbirînê ji hizrên xwe bikin, ji xwe pisyar bikin, tiştên me derbirî, mebesta me bû?

Mebesta me di rêka axaftinê re gehîşt?

Ta çî pêpelûkê encama têgehîştin û prosesa derbirînê êk girt? Derbirîn û têgehîştin di gel êk digunce?

Ev diyalog ya di navbera têgehîştin(HIZIR) û axaftin“ derbirîn“ (ZIMAN), bêdawî ye û dibe sedema pêşdeçûna me.

Di vir de, mebest ne ew e, ko nivîsîn, axaftin û têgehîştin 100% mîna hev bin.

Bi taybetî têgehîştin bi yê din(peyamwergir) ve û pileya wî ya zaniyarî û zanînê ve pabend e

Hizir û ziman duayeke berdewam û bêdawî ye, bi xwe re û li ser asteya yê din, vê civakê û civaka din. Ev xal bi xwe taybetmendiya herî giring e, ko mirovayetiye mecbûrî guft û goyê, dan û stendin, hevpejirandinê û rêzlihehev girtinê dike. Hizir û ziman hilgirê kultûra mirovayetiye ne.

Nivîskarê Elman GÜNTER GRASS di hevpeyvîneke xwe de gotiye:

“ pêdivî ye kultûr bibe cenga li dijî, hevnepejirandinê. Kultûr dawiya hev naînin, hev temam û dewlemend dikin.,”¹

*{Ziman destpê dike û dan û stendina hundurîn ya ruhî- bê ko çu sinoran li pêş xwe deyine- berdewam dike. Hêza ko li dijî ziman radiweste û gumanan ji hêza wî dike, îdolojîkirina ziman bi xwe ye}*²

Em dikarin her tiştî derbasî zimên bikin, lê em neşên, di her tiştî de wekû êk têbigihin, çimkî şiyan û heyîna me bi dawî dibe, lê axaftin li ser jiyana û şiyane ezê ye.

H.G.Gadamar, berhingariye di ber xwesteka universala axaftinê û têgehîştinê dike.

Li vir em dişên pirseke beramber bikin:

Gelo tişteki li dijî universaliyoma serpehatiyên zimên heye?! Ev mijar relatîv e, ji ber wêneyên zimanî wêneyên cîhanî ne.

¹ Hans Georg Gadamar, Sprache und Denken 1970, s.201.

² Hans Georg Gadamar, Sprache und Denken 1970, s.201.

*{Em bèn li vé teza giring temaşe bikin, dê bibînin ko zaniyarê Amerîkî Naom Tchomesky, wêne û tezên xwe yên li ser zimên ji Humbold yê Elmanî wergirtine, li ser kar kiriye û aktîv kirine}*¹

Strukturalîstên emerkî û bi taybetî Naom Tchomesky, ezmûneyên li ser zimanî, ji wêne, nerîn û dîtînen cîhanî, wek babeteke sereke û giring dibînin.

Nietsche, di aforîzmên (PEND) xwe de, li ser daxwaz û desthilatê çend têbînî li ber destên feylesofan danîne:

„Fakter û kirdeyên afirandinê ji hêla xwedê ve hatine danî. Xwedê rêziman çêkiriye. Wate, wî berê me da ye şeweyê zorbirin. Serketina li dijî kêşeyan, nîşanî me dide, dako em ji karwanê pêşveçûnê gîro nemînin. “ Weha dîsan bi pirsekê berdewam dike „ Ev girêdana me bi hizirê ve, ji şiyana zimên e, an jî mercek e, bi zordarî xwe li ser zimanî ferz dike? ”²

Nietsche li wê pirsra xwe ya dirêj û pirralî, bi tundî rexne li hişmendiya rojava digire, ji bilî wê jî, Nietsche dixwaze ko bizane:

„ Erê çi wateya wê heye, gava em li dora xwe û li cîhanê temaşe dikin? ”³

Şiyana me di guherîne de çend e, çaxê nixrên rojavayî yê gilobal(Cîhangîrî) û ne mîna yên dema buhurî bin,

¹ Hans Georg Gadamar, Sprache und Denken 1970, s.202. 810

² Hans Georg Gadamar, Sprache und Denken 1970, s.202.

³ Nietsche, Willen und Macht. S. 43

wekheviya kultûran bête forimkirin, an jî dest bi formekirina çandeyan bibe?!

Li gor Nietzsche, zimanê felsefeya rojavayî, dubarekirina zimanê felsefa girîkî ye.

„Ev zimanê mêtafîzîk û beşên wê (Kategorî), ew in yên em ji rêzimanî dizanin, mîna pirêdikatan „Xeber“ kirde, nav, lêker, lêkerê bigehîn û lêkerê bi bizav“¹

Di jiyana rojavayî de, ziman kartêkirineke mezin û diyar li hizirê mirovî dike, giha ye wê astê, ko dema peyvek tête bilêvkirin, di ceh de, mirov(peyamwergir) dikare wê peyvê têxe qewareyê taybet bi wê peyvê, li gor hizir û mijarê „Sêmantîk“, ya ko di felsefeyê nepeî de, an jî peymanê nepeî de, di navbera ziman û hizirê de, cihekî taybet daye wê peyvê.

Lewra demê pisyarek dibe, automatîk derbasî kategoriya di hişê mirovî de dibe û dûv re bizavê dike, ko di gel wê peyvê di wê kategoriyê de têkeve gengaşiyek e taybet û rûhî de. Bîr û mantiq(logîk), li gor wê fenomênê “diyardey“, dikevin nava diyalogê berdeyam û hemdemî de.

Em, rûbirû pirsekê dibin: „Ev tore û kultûra bi hezarên salan, ko ji nifşekî bo yê din hatiye veguhestin û gehîştîye me, -di

¹ Friedrich Max Müller (1823-1900), Philosophie als Sprachkritik im 19. Jahrhundert.

Hrsg. Sigfried J. Schmidt, Stuttgart-Bad Cannstatt 1971.

rêya zimên û avahiya wî de, kartêkirinek, an jî guhertinek di hiş, bîr, mentiqê me de nekiriye?

Gelo karekî durust e, ko em bêyn, van hizir û bîr û mentiqan, yên di rêka ziman, zarave û devokan ve, ji hezarên salan gehîştîye vê qûnaxê, têkbibin û derbasî şêweyekî din ji hizir û bîran bikin, dibe ko di cihê nehişmendiya me de jî cihê wî şêweyê hizirê nebe?

Di sîstema felesefî ya HUME û KANT, (*diyalekt, absolut nasname ye, ji ziman û hizirê tête afirandin, çendî mirov pêkolê bike, ko xwe jê pak bike nikare, ji ber nasname derveyê sîstemê peyda nabe*)¹

Pirseke giring li vêrê tête arayê, erê qedexekirin û nebikaranîna, zimanekî, zaraveyekî, devokekê, ne kuştin an jî jinavbirina nasnameya xelkên bi wan ziman, zarave an jî devokan dipeyivin?

Dîsan em dê vegerin xêzên xwe yê destpêkê û pirsaxwe careke din dubare bikin.

Bo çi em pirsaxwe dikin?

Çi ye, ya xwe li pişt pirsaxwe vedişêre?, Çima pirsaxwe li def me peyda dibin?

Hebûn an jî çêbûna pirsaxwê, guman e ji hêza hizirê me?

Rengê ji rengê jixwenebehweriyê ye, an jî lêpirsîna li „Kirîşna“ rastiyê ye?

¹ H.G.Gadamar, Dialektik und Hermeneutik . s. 203

Di qûnaxa teknolojiyayê de, kultûra me ya zimanî di çi radeyê de ye? Zimanê me dikarê li gel vê şaristaniya teknoloji û nîşanên wê, xwe ragire?

Hemî diyarok, li dijî ziman in û guman jî ji zimên bi xwe hene, lewra pêdiviyê mirov herdem pirsan ji xwe bike, çendî şiyana me heye, ko em jiyana xwe bi rê ve bibin, an jî planan jêre deynin?

Dîrok, kartêkirinê li zimanê me dike û di rêka zimên re jî li hizira me dike û bi kar tîne.

Erê eger em li ber dîrokê ji desthilanîn bikevin, dê jiyana û cîhana me bi destên me neyê roxandin? Pirrbûna gumanan, dergeh li hişmendiya me nagire?

Giring e, çu sinor li ber axaftina li ser babetan nebe, her weha pêdiviyê, ko peyv û axaftin û zelal be, ne di tem û mijê de be. Pêdiviyê, ziman û hizir nêzîkî hev bibin û axaftin di çarçewa lihevghandinê de bimîne, eger ne weha be, dê bibe diyaloga feylesofan, „hêk ji mirîşkê ye, an jî mirîşk ji hêkê ye?“

Martîn Heidiger, wê behweriya ko dibêje: - Zanebûn bermayê mirovayetiye ye, parve dikir.

Herweha „*destpêka teknolojiyayê ji felesefeya yewnanî têt, dema diyalektîk di gel hermeneutîkê de* (=diyalog û têgehîştin û şirovekirin li ser asteya zanîna her beşdarekî peyda bû)¹

¹ J.Habermas. Der Universalitätsanspruch der Hermeneutik, 2 Band S. 73. Tübingen. 1970

Jürgen Habermas, li dijî bîrozî û boçûnên Hans Georg Gadamer, yê di hêlên zimên, hizir û hişmendiye de rawestiya û weha di pirtûkeke xwe de nivîsiye: „*tiştêk li derveyî şeweyên serboriyên zimên, ko hatibe texmînkirin, nîne! Ziman xwe bi rêka serpêhatiyên cîhanê bi gelemperî li dar dixê!? Wate, pirraliya xwe di zimên de bi cih dike, ne dijberiyek û berovajiyek e.*“¹

Habermas li dijî şeweyê relatîv yê Gadamer diparast, derdikeve û dibîne, ko ew şewe me berbi xelekeke girtî ve dibe, êdî nema dikarin jê derkevin. Mirov in hene, netenê bi zimanê xwe hizir dikin, belê bi zimanekî din, ji ber bîr encamê serpêhatiyên zimên e.

Li vir, em, dikarin wek nimûne nivîskarên kurd yên bi sistematîk bi zimanekî din perwerde bûne û bi zimanekî din dinivîsin bînin.

Em dikarin pirseke din bikin: Erê, ezmûneyên din, yên rasteqîne, ji bilî şeweyê ziman î nînin? Ev serpêhatiyên desthilatdarî û serboriyên kar bi giştî, ne bersiva pirsê me ye?

J. Habermas bi xwe jî şirovekirin û têgehîştina gelemper û hermeneutikî yên kar û desthilatê, mîna dîmenên nû ji serpêhatiyên li qelem dide, ko dişên derveyî zimên kartêkirinê li hizir û bîrê bikin.

¹ H.G.Gadamar, Sprache schreibt das Denken vor, 1970, s.203.

Ev kultûra ko ji nifşekî bo yê din, di qûnaxên dirêj de, tête veguhestin, ne pitir ji formên desthilatê û hunera wê ne, sercoya wê jî azadiya rastî, armanc û rêbazên bi sîstem û pîlan in. Rûbirûbûna me bi desthilatê û neazadiyê re, serpêhatî û hizirên me yên siyasî pirrtir û bi hêztir dike, diyar jî dike, ko kar şiyane pirrtir dike, êdî em mirovahiya xwe û nasnameya xwe di wê rêkê de dibînin.

Hebûna me wek mirov, di hundurê desthilat û kar de, serboriyên me, yên konkirêt in, em xwe têde dibînin, xwe dînerixînin û dipîvin. Em bi rêka desthilat û kar, diyaloga ruh ya hundurîn, bi xwe re dikin û mirovahiya xwe pêktînin.

Rastiyeke heye divê em bibêjin, ko em di cîhaneke zimanî de dilivin, ezmûneyên xwe bi form dikin û digel zimên mezin dibin.

Şeweyê perwerdehiya bi zimên re, dergehê rexneyan vedike, imkanên nû vedike, zaniyariyên me pirrtir dike, jiyana me bi serpêhatiyên dewlemendtir dike. Di diyaloga ko peyda dibe di navbera „EZ, TU, EW, EM, HUN“ de, merc û sinorên avahiyên civakê li dar dikevin, bê ko di bin perdan de, berjewendiyên aborî yên desthilatê bêne jibîrkirin.

Ev gengaşiya dibe, diyalogeke zimanî ye, funksiyona mirovî bi hêz dike, hêza dadperwerane û nirixandinê zêdetir dike û ziman, hizir berbi xwe ve tîne, pêkve dikevin nav liv û tevgerê. Ev hostetîya siruştî, ya ziman himbêz dike de heye,

hişmendî û hizir daniye ser rêka bizavê û herdû pêkve bi hêz dibin.

PIAGET dibêje: „*şêweyên din ji zimên, mîna îma,iê, liv û nîşanên, ko me berbi xwe ve dikêşin û kartêkirinê di hizira peyamwergir û beramber de diket*“¹

H. Plessner dibêje: „*Girî û ken jî ziman in*“²

Plessner, balê dikişîne, li ser herdû şêwezimanan û behwer dike ko ev di rêkeke zanistî de hatine avakirin, ji ber ken û girî pêdivî bi atmosferêke taybet in û pêdivî li hizirpêkirinê ne.

Gengeşiya li ser van babetan, tiyoriyan diafirîne, şiyane û asoyên din dide wan simbol û nîşanên zimanî, yên ko êdî dibin barê xwêner bo şirovekirinê.

Dan û stendina van têgehîştin û şirovekirinên cuda, diyaloga giyanî bi xwe re bi hêz dike.

Ziman bi xwe bi civakê re, di peymaneke nepenî de ye, wate di hundurê civakê de mezin dibe. Ziman bi peyvan ve girêdayî ye(bîr), lê di eynî çaxê de jî, ziman wek ziman li qelem dikeve, ji ber ko regezekî çalak û serbixwe ye, ji hemî buyer û diyarokên ragehandinê cuda ye.

H.G.Gadamar nav li vê xwecudabûnê dike:“ *Nivîsîn û danivîsandin*“³

¹ J. Habermas, Die Universalität des hermeneutischen Problêms, s.219ff

² H.G.Gadamar, Sprache schreibt das Denken vor, 1970, s.204

³ Ya berê s.204

Gadamar digote şagirtên xwe, dema hun peyvekê bibînin ser zarê xwe, guhê xwe tûj bikin, ne tenê peyva li guhê we xweş be, ko hun wan bavêjin koşeyekê, ya baş bi rastiyê bigirin, ko berê we bide hizirê.

Gadamar şirovekirina peyvekê (Hizir), wek Wergerandinê bi nav dike û dibêje: „*Xwendin wergerandin e, wergerandin jî wergerandin e, ... erê eger em bi rastî bipirsin: çi wateya wê ye, ko em werdigerênin?.. wate em tiştêkî mirî werdigerênin, bo bête xwendin û têgehîştin, an jî têgehîştineke nû ye di zimanê de*“¹

Di axaftinê de, peyvek ya din dikişîne, û di rêya wê de, hizir mezin û fereh dibe.

Gelek caran tête fehemkirin, ko ziman parçeyek ji peyvan û hevokan e, ji têgeh, nêrîn û dîtina ye.

Ya rast ziman peyveke, şiyânên me berbi bidawînehatina berdewamiya axaftinê û bihevreaaxftinê û azadiya xwegotinê û yêdingotinê dibe û vedike.

Ziman, organê sereke yê canê EVRA” Heqîqetê” hişê me ye.

¹ Jerry Fodor. *language of thought, ji H.G.Gadamar, Sprache schreibt das Denken vor, 1970, s.204*

Encam:

Ziman: şêweyekî ragehandinê ye, ko mirov bikaribin dan û stendinê di gel hev bikin û di ji hev têbigihin. Her zimanek dengên taybet bi xwe hene, ew deng peyvên guncayî diafirînin û xelesa ferquenza her devokekê, ji devoka din di hundurê zimanekî de jî cuda ye. Li gor lêkolînên li ser deng û lerza wan hatiye kirin, ferquenzên zimên di navbera 300 Hz-4 kHz de. Dirêjahiya phonên zimên bi giştî di navber 10 ms û 50 ms de ne. Karakterê her zimanekî di dirêjîya fonan û sivikahiya lertzê de ye û ev in yên zimanekî ji yê din cuda dikin.

Ragehandin erkek ji erkên zimên e, di rêka nivîsîna simbolan û bikaranîna dengên de, wateyên xwe diafirîne, herweha di rêka simbol û dengên de watedar dibe. Ziman, bi armanca ragehandinê sîstema nîşanan e. Ji bilî ko zimanên siruştî hene, niha zimanên hunerî jî mîna, programê zimanan di EDV û alîkariya zimanan, herweha zimanê teba û cinaweran jî wek ziman tene hesibandin.

Hizir, zimanê hişweriyê ye.

Em bi peyvên xwe hizir dikin, wek em bi çavên xwe dibînin. Ne niha û ne jî di paşerojê de, ev rastî nayête windakirin, ko hizir û ziman ji hev cuda nabin û yek di hundurê yê din de xwe bigewde dike.

Hizir prosesekî berhmdar e.

Hizir ne axaftin e û axaftin jî ne hizir e. Hizir modeleke hişweriyê ye, wêneyan diafirîne an jî wan di gel hev têkildar dike.

„Hizir ramana zimanekî cindîtiyane ye, axaftina bêdeng û lal e, axaftina hundurîn ya her mirovekî ye“¹

Di felsefa Girîkan û ya dema navîn de, hizir zimanê axaftina siruştî bêdeng ya zimanê pîtan bû. Di dawiyê de dibêjim: ziman û hizir peyv e, lewra jî ziman hizirê dinivîse. Ziman regezê wêneyane, yê Hizran e, neynika rastiya civakê ye.

¹ Giani Vattino, ji H.G.Gadamer, “Wahrheit und Methode” di gotara G.V, bo bîranîna derbasbûna sedsal li ser zêbûna Gadamer “Di cîhanê bigihin” ji “Sein, das verstanden werden kann, ist Sprache”r. 52

Jêder:

1. Dörner, D. (im Druck). Sprache und Denken. In J. Funke (Ed.), Denken und Problemlösen (=Enzyklopädie der Psychologie, Themenbereich C: Theorie und Forschung, Serie II: Kognition, Band 8). Göttingen: Hogrefe
2. Friedrich Max Müller(1823-1900), Philosophie als Sprachkritik im 19. J.hundert. Hrsg. Sigfried J. Schmidt, Stuttgart-Bad Cannstatt 1971
3. An Post. B 19 100 a 3ff.
- 4.Hans Georg Gadamar, Sprache und Denken 1970
5. Nietzsche, Willen und Macht
6. H.G.Gadamar, Dialektik und Hermenuetik . s. 203
713. J.Habermas. Der Universalitätsanspruch der Hermeneutik, 2 Band Tübingen. 1970
8. J. Habermas, Die Universalität des hermeneutischen Problêms,
9. Jerry Fodor. *language of thought*
10. Giani Vattino, ji H.G.Gadamer, “ Wahrheit und Methode” di gotara G.V, bo bîranîna derbasbûna sedsal li ser zêbûna Gadamer “Di cîhanê bigihin” ji “Sein, das verstanden werden kann, ist Sprache” Homage an Hans-Georg Gadamer, edition suhrkamp 2183, erste Auflage 2001

Wergerandin û kartêkirina wê di pêşketina civatê de

Destpêk

Di vê cîhana me de, 3000 ziman hene. Mirov bi şêweyekî sirûştî bûnewerekî têkilîhez û civakî ye. Ev mirov di çûn û hatinê, dan û standinê, bazirganiyê, kar û barên diplomatîk, geşt û seyran, film, TV, programên kompiyûterê, amorên elektrîkê, kar, pirtûk û kovaran, û di gelek tiştên din de, pêdivî bi wergerê heye. Vêca ev kesên ku di zimanan de şehrezayîya wan heye, vê xizmeta han dikin, karê wergerê dikin, ku bi xwe karekî pir zor e û bi nirx e. Di rêya wergerê re, ziman, hiş û raman, sinorên xwe derbas dikin û dibin pirek di nav çandên welat û neteweyan de.

Di dema cîhangiriyê de (Globalization), pirsra li ser wergerê pêdivîtir û berferferhtir dibe, çunkî cîhan bûye gundekî biçûk. Werger ji demên kevin de jî heye û di rêka wê re millet û neteweyan hev naskirin, ji hev zanîn û zaniyarî girtin e.

Di demên Girîkan de, ku di rêya Iskenderê mezin de, hatine Rojhilata Navîn û naverast, gelek zanîn ji şaristaniyên kevin, mîna Summeriyan, Kildan, Babîlon , aşûrî û Mêdiyan

wergirtine, herweha dema dewleta Ebasiyan, felesefa Girîkan(Yonani) hatiye wergerandin bo erebî û di wê demê de, qewmên misilman sûd jê wergirtine. Di qûnaxa Renosansê (raperîna) di Europa de, wan jî Ibn Ruşd, Razî, Ibin Sîna û gelekên din wergerandine zimanê xwe, sûde û havil di çarçewa, Kîmiya, Matmatîk û nojdarî de, jê wergirtin.

Pênasîn:

Rast e, bizava wergerê kevn e û ji dema welat avabûne rola wergerê pêdivî bûye, lê werger ta demeke nêzîk nebûye pîş û zanist.

Werger mîna têgeh, ji alavê ragehandina zimanekî bo yekî din an jî ragihandina zimanan dihate gotin ” *Dibistana Leipzig ji wergerê re digot, navînerê kultûrê.*

Werger, proseseke cergebazî ye, bizaveke pirsgirêkane ye, carnan tête binçavkirin û carnan na, mak ne berhem e:

„Werger bikaranîna nêzîkbûnê di navbera deqekî bi zimanê jêder û deqê zimanê armanc de, di rêka lêkdanan, rêbazan, ferhengan, û normên şêwazane de ye

Ev nêzîkbûn bi çelengî û zîrekiya wergêr ve girêdayî ye.

Werger ji jêhatîbûna wergêr û kartêkirina darijtina prosesa wergerê ji hêla derûnî bikaranîna hevgunçînekê ye”¹1.

Giring e tiştêk ji bîra me neç, ka ji bo çî wergera X deqî dibe? Û Ji kê re?.

¹ Psychologie, *mîkanîzma avakirina zimên û serpehatiyên wergêr* “ *Konig: R* 9. 1979

Diyar e wergerandin, alavê herî giring e di têgehîştina netewe, civat û miletan de digel hev, prosesa veguhestina samanê hişê mirov li deverekê bo devereke din, di rêça zimên re. Ziman jî ne tenê alavê hevtêgehîştinê ye, belê sîstemek ji şîfre û kodan e, hilgirê jiyana cihekî, demekê û mirovên wê digel hemî sedem û encam, hêvî têkçûn, xewn û şevpest, xweşî û reşiyên vê jiyânê ye. Dema mirov fêrî zimanekî dibe, ne fêrî axaftinê tenê dibe, belê fêrî şêweyê avakirina hişê xelkê wî zimanî jî dibe. Werger çî ya devkî û çî ya nivîskî be, ji hingavtina zimanan û têkildariya wan bi hev re saz dibe. “Bizava wergerê ne bo zimanê ku ji wî tete veguhestin, bi xwe ye, lê belê ji bo deq e, ew ê bo zimanê armanc be”¹.

Werger wek zanist timî *“karekî çandeyî ye, bi wateyeke teng, karekî zimanevanî ye û wek teknîka kultûra zimanevanî, karekî di kultûrekê re bi kultûreke din re.”*²

Ev avakirina pirên ragehandinê û hevtêgehîştinê bi rêka wergerê sazûye.

Wergerandin dûrahî û biyava di navbera çandan de kêma û biçûk dike, herweha bi metodên komunikatîv rêgezên kehnî-deqê (deqê orîgînal) digihîne hewîndeq(deqê wergerandî) û hemî bêganetiya deqê mak derbasî deqê wergerandî de, êdî li vir hevgîhandin di navbera çandan de saz dibe.

¹ (vgl. Neubert 1996: R. 913).

² ” (vgl. Koller 2001: R.59Bend.f).


Werger”logy” wek zanist:

Rast e bizava wergerê kevin e, lê bi şêweyekî xurt rola xwe ta piştî şerê cîhana diwem nelîst. Ta demeke nêzîk sê nêrîn li ser wergerê hebûn.

1. Werger wek pîşeyekî ye, huner e, lewra pêdivî bi bîrdoziyê nîne.
2. Werger bi zanista zimên ve girêdayî ye, ji ber wê jî pêdivî bi bîrdoziyê nîne û tu nirxên wê ên zanistî nîne.
3. Werger zanist e=“science“ lewra pêdivî bi bîrdoziyê heye, bê ku kartêkirina di bikaranînê de jibîr bibe.

Werger eger zanist jî be, lê wê zinisteke bi ezmûn û serpêhatiyê ve girêdayî be, çimkî ew lîstikeke di navbera bîrozî û bikaranînê de ye, ji ber ziman bingih e ji vê lîsikê re, di gel ku girêdaneke mukumiya wergerê bi çandeyê ve girêdayî ye.

Em dişên Wergerlogiyê û li ser sê şêweyan belav bikin:



Terzên wergerê jî ev in:

1. Wergera raste-rast: ev tarz li ber deq radiweste û peyv bi peyv werdigerîne, struktûrên deqê mak li ber çav tê girtin, lê deqê armanc tenê di gel yê makder têtê têgehîştin.
2. Wergera peyvan: pêdiviye werger di gel deqê makder bigunce û li hev bike. Deqê ku hatî wegerandin mîna ziman têtê têgehîştin, lê mîna wate û naverok pêdivî bi deqê makder heye.
3. Wergera fîlologî: ev werger, hêza xwe berdide li ser naveroka deqê hewl dide, sementîk, lêkdan û pragmatîka deqê jêder himbêz bike. Bi taybetî ev şêwe

Wergerê ji babetên hişmendî, filosofi û dîrokê dike û bêhtir zimanê jêder li ber çav dideyne.

4. Wergera komunîkatîv: ev şêwe xwe nêzîkî asteya çandeya çivakî ya zimanê armanc dike.
5. Wergera praktîk, ku bi zanebûn, guhertinan di wergerê de dike, daku naveroka deq bigihîne xwêner û hewcedariyên wan pêktîne. Ev bi taybetî ji bo nûgihayî û zarokan dibe, lê divê deqê jêder ne deqekî hazir û durustkirî be.

Bîrdoziyên Wergerê jî çendek hene:

- A. Bîrdoziya wergerê ya Linguistik(Zimanevanî), ku awira xwe dide herdû deqan, yê jê tê wergêran û yê wergerandî „ hevguncîna wan, wekxwemayîna deq, cihê deq û texlîtê wî „ helbest, çîrok, roman, dîrok..hbd“. daneberhevekê û têkiliyekê di navbera herdû deqan de peyda dike.
- B. Bîrdoziya ku awira xwe li ser wergervan bi xwe radiselitîne, radeya têgehîştina wî, hişmendiya wî stratîjiyên wî yên kar pêpeloka behremediya wî.
- C. Awir li ser encama wergerê disekine. Ew têkiliya ku bi alîkariya wê pir kar û bar têne ezmûnkirin, gelek pergaleên derûnî, civakî û fêrbûn û fêrkirinê destnîşdibin.

Kurd û pêdiviya bizava wergerê:

Rola wergerê di pêşketina civatên lipaşmayî de, roleke sereke ye, çunkî dergehê têgehîştinê ên din vedibe û asoyên hiş fereh dibin.

Li vir dixwazim wek nimûne civaka Japanî bînim, digel ku berawerdekirina wê bi civaka kurdî re nabê, lê mirov dişê sûdeyê ji serpêhatiya wan werbigire.

Bêguman wateya civakî ya wergerê ji ya li cem kurdan cuda ye.

Di dema Meyî (Zamorayî) de, di sedsala 19an de, ku Japaniyan ji bilî şer tiştêkî din nas nedikir. Berî niha bi 150 salî, Japan, elektrîk, sîstemên dibistanan, tirên û yasa nas nedikir, lê desthilatdariya Meiji, peymanek bi bazirganê emrîkî Matthew C. Perry re girêda, ku mafê wî hebe, keştiyên xwe li qeraxên Japanê rawestîne.

Di vê demê de, gelek jinên Japaniyan xwe dikuştin ji tirsaxerîban, lê hin bi hin japanî fêr bûn û hewldanên wan ji bo pêşketina civaka xwe, ku fêrî jiyana moderin bibin bi hêztir kirin. Ew bû sedema ku welatê Japanê dagîr nebû.

Ji sala 1868an de, wergera ji zimanên Ewropî û bi taybetî ji inglîzî, Ferensî û Elmanî roleke mezin di nûkirina Japanê de lîst.

Wergerê ji dema Meyî de, ne tenê di pêşvebirina okonomî û teknolojiya civata japanî de kartêkirineke mezin hebû, belê di warê siyaset,perwerde, huner û wêjeyê de jî, bê tevgera

wergerê Japanê nikarîbû, xwe bighîne vê radeya ku îro ji welatên herî pêşketî li ser rûyê vê zemînê. Di rêka wergerê re, Japanê têkiliyên xwe girêdan û ji isolasiyona xwe derket.. S.Kato weha li ser Japanê dinivîsê: “ *digel hemî zor û astengiyan, sîstema Meiji ne tenê pir pirtûk wergerand, belê di asteya wergerê de jî pirtûkên bi nirx wergêran. Ji sala 1868-1890 de, li gor amojgeha Ogata, 1972 pirtûk hatine werger, ji wan, 360 pirtûkên felesefê, 749 pirtûk yên sosiyologî, 609 yê siruştologî û 254 di warên cuda de*“¹

Li vir diyar dibe, ku rewşenbîrên Japanî, berê xwe dane cihê zanist û teknolojiyê, ji Asiya berbi Ewropa û Amerîka ve çûn. Ev tendens û meyl ta îro jî berdewam e.

Belkî îro rola wergerê li Japan ne wek berê ye, lê hîn amojgeh û akademyên wergerê li Japanê hene. Lê xala din ya balkêş ew e, ku îro ji Japanî bo zimanên din tê wergerandin û bi taybetî bo çînî û zimanên din yên başûrê rojhilatê Asiyayê.

Eger em werin li rewşa zimanê kurdî seyr bikin, li rewşa civaka kurdî temaşe bikin, em ê bibînin, ku werger bo zimanê kurdî pir giring û pêdiviyê ji ber van sedeman:

1. Çu derfet bo zimanê kurdî ta niha peyda nebûye, ku bi şêweyekî xwezayî birêve biçe, ji ber sedemên

¹ Einführung in die Übersetzungswissenschaft. Von Werner Koller Von UTB, Stuttgart, August 2002. S. 204

çewisandin, qedexekirin û hewldana jinavbirina vî zimanî.

2. Ziman bi wergerê têkildariyê di gel sîstemên têramandinên nû dibe.

3. Ji ber nebûna dibistan û zankoyan, zimanê kurdî jar û belengaz, û lisernekarikirin ma ye.

4. Di rêka ziman re, hişekî kurdewarî tete damezirandin.

Lê eger em vegerin û ji weşanxaneyên xwe pirsiyar bikin, ta çi pêpelûkê bi erkê xwe rabûne, bo pêşvebirina zimanê kurdî û di rêga wê re modernîzekirina civaka kurd ..?!

Ew rewşenbîrên me, yên bi zimanê biyanî dizanin û ji karê wergerê tene der, bi berpirsiyariya xwe rabûne? Aya roj nehatiye, ku bi kêmasî nivîsgehên wergerê li Kurdistanê bêtin damezirandin?

Ez di vê babetê de, tenê li ser rewşa wergerê, di kurmanciya jor de dibêjim, bê ji bîr bikim, ku gelek rewşenbîrên kurd yê hêja xwe westandine û pirtûkên cor bi cor wergerandine. Lê divê em vê jî jibîr nekin, ku gelek ji wan birêzan, pirtûkên li ser dîrok û wêjeya kurdî, ji zimanên biyanî, bo zimanê serdestên me bo me wergerandine û nimûne jî pir in. Di behweriya min de, ev sûdeyê li zimanê me û civaka me nake. Xwenasîn, bi zimanê me, nasnameya me diçesipîne.

Ji hêla din ve jî, pir nivîskarên kurd hene, bi zimanê serdestan dinivîsin û berhemên wan ji hêla zimên ve, çu sûde nadin zimanê me. Jibilî wilo jî, ji ber bi bi zimanên dagîkeran perwerde bûne, avahiya hişê me jî bûye parçeyek ji struktura

wan, yê li ser bingehên yeklayane, nepejiradina behweriyên cuda û ên din û nedemokratîk ava û perwerde bûye. Nimûne: fêrbûna z.elmanî ji bo ereban“ hevokên leşkerî“

Çend nav:

Di kurmanjiya jor de, çend wergerên bi nirx jî ji hêla çend nivîskarên ve hatine kirin, ku hinek ji wan werger wek erkekî niştimanî dîtî û ji bo xizmeta zimanê kurdî, di gel ku ne pîşeyên wan bû dikirin. Di vî warî de, divê dîsan rola Bedirxaniyan jibîr nebe. Dr. Kamîran Bedirxan û Mîr Celadet Bedirxan, di serdemên Hawar, Ronahî û Stêr de, wergerên hêja pêşkêşî pirtûkxaniya kurdî kirine. Ji xwe di Hawarê de, werger roleke xwe sereke hebû û nivîskarên mîna serkêşê helbesta kurdî ya hevçerx helbestvanê xwedê jêrazî Qedrî Can, bi wergerên xwe jî, Hawar bi xemil û rewş dikir. Di demên dawiyê de, nexasim dema pêla penaberiyê, ji ber çî sedemî be dest pê kir, rewşên bîrên kurd, li dinayê belavbûn. Hindek ji rewşên bîrên di wargehên xwe ên nû de, pîşeyê wergerê kirin û bi wergerên xwe yê ji bo zimanê kurdî çend sernav derbasî pirtûxaneyên kurdî kirine û hindekan ji zimanê kurdî, ji wêjeya kurdî bo zimanên din wergerandine û wêjeya kurdî bi mîletên din dane nasîn.

Bêguman jiber rewşa kurdan û lawaziya ragehandinê di nêvbera sazî, weşanxane û dezgehên ragehandin û çapemeniyê de, mirovê neşê hemî navan bîne ziman û navê hemî pirtûkên wergerandî û hijmarên wan û ji çî celebê ne

bizanê, lê çend nav hene, ku mirov dikarê bibêje, ku hewldaneke cidî dane, ji bo dewlemenkirina pirtûkxaneya kurdî. Mustefa Aydogan yek ji wan wergêrên ku bi rastî serpêhatiya wî digel wergerê cihê rawestanê ye, ne tenê jiber pir pirtûk wergerandine, lê di warê wergerê de jî, melevan û bi serketî bûye. Mustefa Aydogan, di wergerên xwe de, wergerê di sê qûnaxan re derbas dike:

1. qûnaxa yekem xwendineke hûrbînî ji deqê ku bête wergerandin û lêpirsînê li ser her nîşanek, sembolek û pêzanînekê dike ku di deq de derbas dibe.
2. qûnaxa wergera pêşîn.
3. qûnaxa danberheva wergerê bi zimanê orîgînal re û bi wergerên ji bo zimanên din eger mumkin be.

Divê em xalekê ji bîr nekin ku ragehandina kurdî ya nû pala xwe dide wergerê. mînak kenale ezmanî yê TV yên kurdî û ajansên nûçeyan û malperên kurdî.

Karê nûçeyan para pirî zêde ji ajansên cîhanî tête wergerandin bo zimanê kurdî.

Bêguman, gelek rêzdar û nav hene ku yan take deq û bêhtir wergerandine, lê serhijmareke rast û durust ta niha nîne, ku mirov berê xwe bidiyê û agahiyan li ser werbigire.

Encam û pêşneyar:

Di vê cîhanê de, her miletek berpirsiyarê dana para xwe ye, di afirandin û belavkirina zanîn û me,irîfetê de. Werger jî gava berbi hevgihandin û hevguncîn û hevnasîn û

hevahengiya ve ye. Ev welatên ku kurdistan dagîrkirine, civatên bikaranîna zanînê û cûtina wê ne, ne afiranderên zanînê ne. Eger em di warê wergerê de, awirekê bidin serhijmara pirtûkên wergerandî, dê bibînin, ka çendî belengaz in û civatên paldar in.

Hijmara ereban 300.000.000 lê pirtûkên ku di salê de werdigerênin digihe 330 pirtûk, Tûrkiya ew jî xwe dighîne wê hijmarê. Israêl 1500 pirtûkê, Ispaniya 100.000. Sûriya salê 30 pirtûkî werdigerîne, ew jî bêhtir pirtûkên kevin. Elmaniy, ku salê hijmara pirtûkên têne weşandin, li derdora 836.740.000 sernavê dide, hijmara wergerê digihe 22-25% „

Frankfurter Mese

Di wergerê de, tiştêk diyar dibe, ku welatên pêwendî di gel hev hene, zimanê hev werdigerênin, ji bilî zimanê ingilîzî ku bi awayekî berferh belav bûye. Wek nimûne, dema Soviyet li ser xwe bû, welatên ku di feleka wê de digeriyan ji zimanê rûsî pir werger dikirin. Wergera baş û serketî pêdivî ne tenê bi zanîna 2 zimanan (ya bêhtir) heye, lê pêdivî bi zanebûneke mukum di wî warê ku jê werdigerîne de. Pir caran, peyvin hene, ku di zimanekî de hene û di yê din de nînin, ya jî gotinên pêşiyar û pend, ji zimanekî bo yê din wek ferheng cuda ye, lê wek wate yeke, lewra pêdiviya wergêr bi têgehîştina van babetan heye. Pêdivîye wergêr backgrounda kultûrî ya zimanê jêder baş bizane, jibo wateya hevoka symbolîk bizane. Ta ku em bêjin ev wergêrekî baş e, pêwîste karekî bêwestan bike, çunkî werger baş bi serpehatî, ezmûn û xwêdanê ve palbend e.

Çend kar hene, pêdiviye heryekî bixwaze wergervanekî baş be bike:

1. Divê wergêr wan zimanên ku jê wergerîne û bo wergerînê baş fêr bibe. Ziman baş fêrbibe, wate, dîroka kultûra wî zimanî bizane, daku defetan bo xwe peyda bike, ku wateyên veşartî ronî bike, pendên wan zimanan bizane, zaraveyên wan, wêjeya kilasîk ya zimanên jê têne wergerandin.
2. pêdiviye wergervan bi 2 zimanan bixwîne, û eger deqê bixwazê wergerîne, gelek caran bixwîne û eger hatibe wergerandin bo zimanê wî yan zimanên din ku ew dizanê, pêdiviye bixwîne. Abonetiya kovaran yan jî her çi be bi wan zimanên ku jê werdigerîne bike û li malperên Internêta yên bi gelek zimanan dinivîsin.
3. Hewldana girêdan têkiliyan bi kesên wî zimanê ku jê tê wergerandin û eger derfet û taqet hebe wî welatî bi xwe bibîne.
4. Pêdiviye wergervan bizane wê çi wergerînê“ Roman, helbest, teknîk“, da cemawerê xwe binasê û dan û stendinê bi wan re bike, li pêşniyar û rexneyên wan guhdar bike.
5. Ji ber ku ziman bûnewerekî guherander e, gerek e, wergervan bi berdewamî ji guhertinan di rêka xwendin û têkiliyê ve agahdar be.

6. Kar, kar û kar di warê ku jê werdigerîne. Eger derfet hebin, kurs û xulên wergerê çêbike, da teknîkên nû hîn bibe û yên li def wî hene bi pêş bixe.

Werger dikarê roleke baş di pêşkeftin û pêşbirina civata kurdî de bilîze eger sazî û dezgehên wê ên taybet di zankoyan, di nav dezgehên rewşenbîrî û perwerdeyê de bêne damezrandin û xwedîlêderketin ji hêla desthilatdariya kurd ve li vî karê pêdivî û giring bête kirin. Kesên pispor di rêka dibistanên taybet û pisporiyane de bo wergerê peyda bibin. Werger xwe bi xwe bibe pîşe.

Jêder:

- *Psychologie, mîkanîzma avakirina zimên û serpêhatiyên wergêr “ Konig: R 9. 1979”.*
- *(vgl. Neubert 1996: R. 913).*
- *” (vgl.Koller 2001: R.59Bend.f).*
- *Koller, Werner, Einführung in die Übersetzungswissenschaft UTB, August 2002*
- *Navên min sor e, Rûpel 578 weşanxaneyê Doz2002çîroka sê qûnaxênpêvajoya wergerekê. I.S.Aydogan.*

Tore (Wêje) û zayendên wê?

Di derbarê vê têgehê de, ji dema kevin ta bigihe ya niha û dê derbasî dema paşeroja nêzîk û dûr jî bibe, guftûgo û danûstendin bûye, dibe û dê bibe. Ev danûstendin jî li ser asteya civaka rewşenbîrî ya dem û cihê xwe bûye. Li vir jî, dê pêkolê bikim ku bihingivim vê têgeha hêsan û zor.

Eger em li vê navûnîşanê binêrin, dê bibînin ku eve dê bersiva du pirsan bide

1. Armanca danûstendina bi toreyê re
2. Tore bi xwe çi ye?

Di pêvajoya xwendinê de -ji ber ku xwendin xwarina giyan e-, danûstendina toreyî jî mîna çalakiyeke luksu tête dîtin. Ev pirs pirr giring e û eve demeke pirr dirêj e, ku ev pirs nivîskar û rexngiran bi xwe ve mijûl dike. Lê dema ev pirs tête meydanê, pirs diwan digel xwe tîne û xwe pê re davêje qada hizrê: Tore ci ye? Çi sudeya toreyê heye?

Ev pirsane, bi gelek şêweyan, li her demê û li her deverê, têne bersivdan.

Di demên bindestî û zordarî û neazadiyê de, tore bûye oksegîna berhemdaran û bûye êtûna pêşî ya serîhildan, raperîn, tekoşîn û şoreşan.

Li welatên, ku xwedî sîstemên totalîter in, (bi taybetî li def desthilatdaran) tore bûye, alavê propegenda sîstemê û razandina milletî. Lê di wan welatan de, yê civaka sivîl, destekî wan î bala di rêvebirina desthilatê de heye, an jî kontrola karê hukümetan dike, system piştgiriya behremend û berhemdaran dike.

Li vir bo me diyar dibe, ku wateya toreyê di civakê de, roleke giring û nirxdar e.

Tore mirov û wêneyê mirovatiyê dike heyok (element). Tore ji xwêner û her mirovekî re di vê danûstendina bi xwe re bi hebûna xwe re, wateya xwe diyar dike.

Tore vejandina berhemdana derfetên hebûnê ye

Eger em bi giştî li nivîs û tekstan binêrin, dê bigihin wê encamê, ku pêdiviya daxistina realîteyê bikar tîne, wek ku heye (objektîv), an jî mîna hizra nivîskarî ye, ku ew wisa dinase (subjektîv). Lê gelek deqên edebî û toreyî hene, realîteyê radixin, ku pêdiviyê hebûn wisa be (Vision”nerîn”). Mebesta toreyê ne kopîkirina hebûnê û realîteyê ye, belê wê realîteyê û hebûnê ji nû ve vejîne, wê reprodukte bikin.

Tore pêşniyazeke takekesane bo jiyane bi nêrîneke takekesane ye (dîtina nivîskar), nêrîneke berhemdar e (wek ku dikare wisa be), nêrînek hêviyane ye (pêdiviyê wisa be). Tore, delîveyên hebûna mirovahiyê diyar dike.

Realîte û rastiya toreyê gelemper û giştî ne.

Tore netenê dihingive hizir û hişmendiya me, belê dilînê û nehişmendiya me jî. Realîteya toreyê giştî ye, bi giştî tete têgehiştin, veguhestin û pejirandin.

Hilgirê xelata Nobêlê yê sala 1970, Alexander Solschenizyn, di axaftina xwe, ya bo xelatwergirtinê de weha gotibû: (Nivîs, serpêhat û daxwaziyên mirov bo mirovî ne, wan kurt bi cih tîn.

Huner (Helbest), ew keştî ya biyan e, ku serpêhatên demên dirêj, bi hemî bar û rengên xwe ve, tîne û katêkirinê dike, ku xwêner nivîsê wek ya xwe werbigire” Indentifikation” Karakterên kesayetiyên”Figure” pirsgirêk û kompleks in. Lehengên hunerî ji lehengên normal cuda ne, mîna figurên Romanên zarokan, an jî yên reş-spî ku hene mîna (Lucky Luck, ku her dem ji sîbera xwe siviktir in).

Realîteya toreyê, realîtiyeke bixweyî ye.

Ev diyar dike, ku figurên helbestê, dikarin li beramberî helbestvan, bibin parçeyek jê. Em li lehengê Thomas Mann „ Tonio Krüger“ binêrin, weha dibêje: „

Ez li gerdûnekî jidayiknebûyî û watedar dinerim, ku dixwazin xwe destnîşan û bi rêk bixin, ez gelek bûnewerên

ku di xeyalên mirovan de têne avakirin, dibînim ku destên xwe ji min re dihejînin, ji bo ez bibhujim.“ Berhemên Thomas Mann[Stockholmer Gesamtausgabe], bendê çîrokan, rûpel 388, 1966“

Ew armanca danûstendinê bi toreyê re bû, lê TORE bi xwe çî ye? Nivîskar, pirr caran vê pirsê ji xwe dikin: Gelo ev tişta ez dinivîsim Tore ye? Tore çî ye? Çawa ez dikarim toreyê destnîşan bikim? Çu pîvan ji çawatiya toreyê re hene?

Ev pir û çend xalên din, dê li jor bo xwêneran rabixin, belkî bibe dergehkek bo danûstendinê û nêrînên hemereng, ku dikarin berê nivîsên bi kurdî berbi asoyekî din bi qualîte ve bibin. „ **Eve hêviyeke min e**“

Têgeha toreyê li def min û li nik pirr mijûlvane nivîsîna bi kurdî beramber ya Literaturê ye, lewra dê pêkolê bikim, ku li têgeha Literaturê bikolim.

Ev peyv ji latînî hatiye wergirtin „ Litteratura“: Nivîsîn, hunera axaftinê, zanista axaftinê, waneyên ziman, ev giş dikevin bin peyva Litteratura da. Li gor vê pênasînê, Helbestên Melayê Cizîrî, her wisa rehbera TV, nameyên evîne, peregrafên yasayê jî, literatur in.

Li ser vê peyvê, pirr gengeşî çêbûne û negihane çu encamê. Bo nimûne, **Arîstotalis** helbest mîna literatûrê didît, lê vê demê û di nêrîna îroyîn da, ew pênasîn qet nayête pejirandin. Her nivîsek girêdayî dîrok û bîrdoziya xwe ye û li gor wan jî tête veguhestin. Gengeşiya ta berya 40-50 salî jî weha bû, ku Literaturê wisa didin nasîn: „ Literatûr, nivîsîneke, ku nivîskar, li gor mercên estetîkî ciwanî,

spehîtayî, bedewî) dinivîse, ku mirov di helbestê [waneyên hunera helbestê] de dibîne. Guman têde nîne, ku ev têgeh ta demek dirêj, di qada guftûgoyê de bimîne û bibe cihê bîrûbehweriyên cuda û balkêş.

Ji ber danîne sinorekî, an jî bi çesipandina vî termî kuştina berhemendî û nivîsê ye. Aristotalis yekemîn mirov bû, ku pêkol kiriye, bo pênasînekê ji têgeha Literatûrê re deyne, ew jî di rêka Poetîka (Helbestvanî) xwe da û bi rêka rêgezên kartêker re. Arsîtotalîs, cudabûnê dixwe navbera helbestvanekî û dîroknivîsekî de, ne ji ber ku yê helbestvan „Beyt û ristan“ dinivîse û yê dîroknivîs pexşanê dinivîse, lê ji ber ku yê dîroknivîs di nivîsa xwe da agahiya rastiya çêbûna buyeran diyar dike, lê yê helbestvan buyera dikare biqewme dinivîse. Di dema Yewnan de pir gengeşî çêbû. **Platon(Eflaton)**, helbestvan ji komara xwe avêtin, li gor wî, ku hemî helbestvan “derewîn in”. Ev diyar dike, ku helbestvan xwe bi jiyana real ve girênadin, belê jiyaneke real di hizir û nivîsên xwe da, li gor xwe ava dikin. Ev xal bi xwe jî nîşaneke ji yê ku **COLERIDGE** taybetmendiyek, an jî xisleteke literature dibîne “ Suspension of Disbelief”.

Ev nîşan e, ku peymanekê di navbera nivîskar û xwêner de ava dike. Ev taybetmendî bi xwe ye jî, ku rê li ber xwendinê” wergirtin” vekir, ku bibe karekî hunerî.

Li vir wateyeke din bo xwendinê û xwêner hate dan. Wate, êdî xwêner nema mecbûr e, bibêje ev nivîs fantaziya ye, an jî buyereke çêbûye. Di pênasîna vê terminolojiyê da, gelek

nêrînên cuda hene, ev nivîs nikare wan hemiyana raxe ser kaxezê, tenê dê yek, doyekan bi bîr bînim û dê kurtebehweriyeye xwe jî binivîsim.

Ji bo **Albrecht SCHÖN**, literatur, tê wateya bîreweriyaya mirov ya peyv û hevokan, karê nivîsîn û helbestê“ Li nik **Christoph PARRY**:“ literatur, dikare bibe bilêvkirina hişmendiya civakê, ji ber ku intrese û nirxên civakê vedijîne“.

Li dawiyê, literatur(tore) ji ber wê hindê giring e, çikû derbirîn e, bi zimanê civakê. Tenê bi toreyê ziman têtê pakkirin, parastin, xwedîkirin, taşdan, birêvebirin û pêşketin. Tore, ew nivîsa, ku hilgirê jiyana(bi tevayî) takekes û civakê ye, hilgirê nirxên (bi giştî) mirovahiyê ye, bi derbrînên ciwan û katêkir û pirsçander.

Form an jî stûnên toreyê:

Formên toreyê nema bi tine yên Kevin man e, belê di her formekî bi xwe de jî, pir cudabûn û ferehbûn peyda bûne.

Jêder:

- “ Berhemên Thomas Mann[Stockholmer Gesamtausgabe], bendê çîrokan, rûpel 388, 1966“

Helbest û şirovekirina wê?

Gelek pênasînên helbestê hene, her ravekerek pênasîneke wek epostomolojiya xwe dide helbestê. Gelek torehezan, helbestkar û helbesthezan li ser vî babetê bîr û hizrên xwe li ser kaxezan raxistine, ez jî dê li vir li derdora helbestê rawestim û çawanîtiya ravekirina wê.

Li nav kurdan, helbest henasa wan ya bi tinê bû, ku bikaribin, di rêka symbol û meteforan re, derbibirin û bi azadî derbixin.

Helbest: Peyv, hest û hizir e, ku dikare bi gelek durv û forman xwe li ser kaxezê an jî her mediyomeke din birêse. Helbest dikare bi rêzbend û terazû be, kîte be, an jî xîz û xalên vala bin. Helbest, vehûnana gelek terz e.

Ev hemî jî pêdivî ye, bikevîte xizmeta naverok û huner û ciwaniya vî zayendê jîndar û hunerane de. Form, tenê helbestvan dikare bo xwe hilbijêre. Ew e dikare peyv, hest û pîvanên xwe pêşkêşî helbestê bike.

Zor caran, ji vir an jî ji wir tête bihîstin, an jî xwendin, ev çî yarî ne, ku nivîskar bi belavkirina van peyvên dîke!

Ev belavbûna reş li ser spî, an jî nivîs li ser kaxezê, dikeve nav huneriya avakirina helbestê bi xwe. Ev şêwenivîs, giringiya wê li beramberî ya naverokê bi xwe ye, eger nepitir jî be.

Çimkî gelek caran şêwe û durv qedera naverokê destnîşan dikin û ew şêwenivîs armançek ji armancên nivîsê, ku huneriya wê ye pêk tine.

Di helbestê de, mirov nikare gelek peyvan bi kar bîne, her weha şirove, pêşniyar û çareserî ne ji erkên helbestê ne.

Erkê helbestê ciwanî, hunerî û pirsçandin e. Elementên bo wan erkan, peyv in û bi kêmtirîn peyv, wêne, naverok diyar dibe. Lewra buyer, daxwaz, armanc, xewn û hêvî rawestegehên helbestê ne.

Helbestvan, çirûskan dide, lê lempê vênaxe. Kilîtê dide, lê dergeh nîşan nade, dinehwirêne, lê stranê nabêje, xêzan dikêşe, lê wêneyan nîgar nake. Helbest sîber e.

Helbest bo xwêner derfetê vedike, ku hizrên wî bikevin liv û tevgerê. Hişê xwêner têve dide, ku di hundurê xwe de di geriyên û pêkoleke berdewam de be.

Helbest rê li ber helbestvan bi xwe jî vedike, ku li hizra xwe vegere û rola xwe ya xwêner bibizav bike, biyavan bibire û asoyên peyv û derbirînê binase. Bêguman rola çêjê jî di hilbijartina xwêner de heye.

Her tekstek xwênerê xwe peyda dike. Helbestek dikare bo yekî ciwan û xweş be, bo yekî din nexweş be. Pêdivî ye, em jibîr nekin, ku gelek xwêner di dema xwendinê de, li wî hestî, wan wêneyan digerin, ku derd, kovan, xweşî, çêj û henasa wî derbibirin.

Xwendin û ravekirina Helbestê:

Xwendin prosesek e, bi pileya xwêner ya ciwanî, zaniyarî û hunerî ve girêdayî ye. Di xwendina helbestê de, çêj, xweşî, aramî, hêminî zîrekiya di warê helbestê da, giring in.

Em çawa dikarin helbestekê rave bikin?

Di şirovekirin û ravekirina deqekî helbestî de, xwêner derbasî prosesa danênê dibe û di be parçeyekî giring ji serboriya xwendinê. Xwendevanekî çalak tête damezirandin û bi vê damezirandinê re, helbest ji asteya xwe ya sadeyî, saveyî û hêsan, dibe berhemekî bi qalîte, ji bilî ku êdî xwendin bixwe dibe armanc û çêja ji xwendinê dibe, nekêmtir ji ya deq bixwe ye.

➤ Di xwendina helbestê da, **xwendina yekem** û çêjwergirtin giring in. Xwêner dest bi xwendinê dike, lê berya dest pê bike, pêdivî ye li ba wî zelal be, ku ew bi xwe bo xwendinê amade ye. Xwêner xwendina yekê dixwêne, bi hêminî dipûnîje û guh dide hestên xwe, ka bi kû ve dilivin? Berbi kû ve diçin? Careke din xwendinê dubare dike, tiştê bi dilê wî nîşan dike. Di hizra xwe de digêrîne, ka ev tekst çî dibêje? Bo nimûne:

„**Ger dê hebûya me itîfaqek..**“. **Xanî** bi mercekî dest pê dike, ew jî yekîtî ye, wate derdek heye, ew jî netifaqa me kurdan e.

➤ **Sernivî:** xwênerê helbestê dikare, pir sûdeyê ji vê xalê webigire, ji ber ku pirr caran, sernav dibe rengvedana naveroka deqî. Ka gelo çî têkilî di navbera tekst û sernav de heye? Sernav dikare alîkar be, bo vekolîna babeta tekst? Eger na, ji xwe bila bimîne dawî. Nimûne: **Mem û Zîn**. Diyar e ku proses di navbera du zayendan de ye. Evîn e, Bedbextî ye, ...?

➤ **Naskirina şeweyê nivîsê** gava sêyem e, di prosesa xwendin û şirovekirina helbestê de. Ev Helbest bi rêzbend û terazû ye? Kêşeya folklor e, Sonet e, sirûd e, evînî ye, melankolî ye, derd in, şîna mirovekî ye? Helbesteke evînî ye, helbesteke siyasî, civakî ye? Çî girêdan di navbera naverokê, babetê û şeweyê tekstî de heye? Bo nimûne: Mem

û Zîn, nivîseke bi rîtim e, navê xort û keçekê ye, xwêner ji hizra yekem ve, dê berê wî bi deqekî evînî ve biçê.

➤ **Rengê Helbestê:** Pêdiviyê bête naskirin, ku helbest kîtane ye, rêzbandane ye, herrikbar e, an jî neherikbar e? Girêdana Form û naverokê di gel hev? Guncîna babetê û durv bi hev re?

➤ **Xwendina diwem:** Xwendina helbestê piştî cara yekê bi dengê bilind tête xwendin û xwêner li dengê hest û dilê xwe guhdar dike. Rîtma deqî nas dike û di nav xwe de, digihe wê gengaşiyê, ev form, deng û naverok li hev dikan an na? Gelek peyv melodiyeke taybet didin û guh jî fêrî hinek deng û rengan bûye, wek ku xwêner jî fêrî babet û naverokan bûye. Aya dengê van peyvan, çî melodiya danganî, an jî melodiya hizrî li def xwêner peyda dikan?

➤ **Şeweyê nivîsê:** Hevok û lêkdanên tekst, kurt in, an jî dirêj in? Zimanekî hêsan e, an jî aloz e? zimanekî nû bikarhatî ye, an jî zimanekî cûtî ye? Dubarekirin di tekst de heye an na? Zimanekî hawarî, xîtabî, hêvîxwazî ye? Zimanekî hêsan û imperetîv e?

➤ **EZ-EW/EM:** Nivîser/helbestvan çî cînavî bi kar tîne? EZ a lurîkî? Kî dipeyive? Eger EZ be, di çî rewşê de ye? Çî dem e? zimanekî konkret e, an jî zimanekî xwedî fezeyek û boşiyeke vekirî ye? Hêsan e? bi kêf e? neliserhev e? aştiyan e ye, an jî bi qehr e? Berê xwêner dide lixwevegerê?

➤ **Dialog:** Xîtab bi kê re ye? TU? Nivîs digihe wî? Kartêkirin çendî li min wek xwêner dike? Ta çî radeyê hest dikim, ku tişta helbestvan nivîsiye, bi hest û hizra min re hevpişk e?

➤ **Wêne û bikaranîna wan:** Wêneyên zimanî, Simbol, nîşan, hevwaterî. Wêne çî ne? Fantazî, real, rast, hizrî, heyîokî, kurt, dirêj, çuqiliyane? Xurustî, mîtolojî û gelek ên din? Ev şêwewêne di gel babetî diguncin? Motîvên wan, bingeha wan ya hişmendî û nehişmendî? An jî Meşehdek e, mîna wêne ye, ku rewşeke taybet ya mirovekî, derdibire?

➤ **Biografî:** Ev helbest biyografiya helbestvan e? Dîrok e, rastiyan rêz dike? Pendane ye (**Taxûr** ê Bengalî)? Îmajekê bo ronîkirina tekst dide? Li vir hez dikim nimûneyekê ji

helbesteke Goethe bînim“ **Straneke şevê ya koçber**“ di vê helbestê de dibêje „*Ew ji geriyane westiya ye û niha vehesîne divêt*“. Eger em baş çav li sernivîsê û naverokê binêrin dê bo me diyar be, herdû dixwazin babetekê bibêjin û dibêjin jî, ku yê axêver ji jiyane, ji geriyane westiya ye.

➤ **Cih û dem:** Ma rola demê û cihê di helbestê de jî heye? Bi xwendinê mirov tê derdixe, ka di navbera destpêkê û dawiyê de, çi qas dem heye. Ka li çi deverê ev buyer qewimiye? Ev cih û ev dem, hest û hizran dilvînin? Bo nimûne, dema helbestvanek ba têxe zindanê, tê wateya neazadiya mirov li cihê helbestvan lê dijî, an jî li ser dinivîse heye. An jî dema helbestvan ji guhertinan bêhêvî dibe, dê helbesteke bêdem binivîse.

➤ **Nirxandin?** Piştî gelek xwendin û ravekirinan, xala ku xwêner helbestê binerixîne têt. Gelek caran, ev xal bi hukmî ve (Baş, nebaş e) tete guhertin. Mîna ku me di destpêkê de gotî: Her xwênerê, li gor zanebûn, zaniyarî û serpêhatiyên xwe tekst rave dike, pêdivî ye, em xwe ji hukmî dûr bixin û tekst şirove bikin. Çi di vê helbestê de heye, ku min li ber radiwestîne? Babet hingivte min? Form û durv nû ne, dubare ne? Girêdana durv û naverokê pêk ve çi ye? Peyv û babet? Deq çi di hundurê min/Xwêner de livand? Ev helbest bi dilê min e, ji ber ku kurt e? Hesane? Dîrekt û sava ye?

Melankolî û şînî ye? Bi peyvên hindik, mebesta xwe gihande min?. Gelek pirs bo xwêner peyda dibin. Bêguman di xwendina yekem de, hinek akam li ser xwêner dibin. Pêdivî ye, xwêner jîderketina bi xwendina yekem û encama xwendina dawî bide ber hev û binere..

Jêder:

Mem û Zîn, Ehmedê Xanî

Lyrîk/Xweşxwan,

şêweyek ji helbestê ye

Eger em, li kurdî binerin, ku ji kevin de, ev şêwe heye û li ser zarên dengbêjan, ji nifşekî bo yê din hatiye veguhestin û ta vê serdemê jî, di rêka beyt, sebeqe, qesîde, heyranok, payîzok uhd, gihaye me.

Lê ez ê li ser navên wan yê di zanista toreyî de rawestim û wan bi nav bikim. Nayê wê wateyê, ku ew navên kurdî nerast in, belkî berovajî wê hindê. Ji xwe her têgeh, di binavkirina xwe de, di pêvajoyên, dîrokî, civakî û rewşenbîrî ve derbas dibe. Dibe ku têgeh ji hêla wateyê ve gelekî nêzîkî hev bin, lê dîsan jî neyek in.

Lyrîk:

Hilperkîn û pêkanîna kelecana di hundur û hizra guhdaran de. Kartêkirin bênavber tê, digihe wê radeyê, ku Lyrîkvan, xwe ji bîr dike, li xwe hayedar nabe. Kesayetiya helbestvan û babeta ku dibêje di nav hev de dibuhijin.

Lyrîk, tête têgehiştin, lê guftûgo li ser nabe, çunku kesayetiye, razber e, neşênber e û nayête gelemper û giştîkirin. Ev peyva, Lyrîk ji kû hatiye? Em dikarin wek kurd bi kar bînin? Ma peyveke kurdî heye, ku bi wê rolê radibe û eger hebe çi ye? Ev pirs û gelek pirsên din di serê min û bêguman di hizra xwêneran de jî dilivin.

Peyva Lyrîk {**λυρική (ποίησις)**} peyvek yewnanî ye-lîstkek bû, ku peyv li hev tanîn û berev bi hev ve diçûn û yekî li amûrekî bi navê Leyra (Amûrekî têlane ye) dida, di pey re bû zayendekî toreyî di gel Epîk (Destan û Drama).

Ev şêwenivîs hemî bi kêş bûn û rîtma wan ya derve hebû. Peyva Lyrîk şûna peyva Poetry (Helbest) jî digire. Seydayê çigerxwîn û gelek helbestvan û helbestkarên me yên berê, peyva xweşxwan bi kar tanîn, wate yê xweş dixwêne, an jî yê dengê wî xweş û xweş dibêje. Ta niha jî, li gelek deverên Kurdistanê û ji wan jî Şengal, dibêjin dengbêjan **şa,ir** wate helbestvan.

Bêguman Lyrîk, wek zayend û bi nivîskî gelekî, kevin e, kevintir ji bikaranîna wê peyvê bi xwe ye, çunku li ba çîniyan, Babîlonan, milletên îranî, hindî û cuhûyan hebû, bo

nimûne (Mizamîr yê tewratê, Stirana herî bilind ya Salomos).

Ji xwe eger em behsê edebiyata devkî bikin, ji xwe vedigere rojên pêkhatina dîroka mirovayetiye. Eger em, berê xwe bidin, rîtual, qewl û beyt û sebeqeyên kurdan (êzdiyan), dê kevnariya wan bibînin, ji xwe di selîqeyên beytên feqe û derwêşan da, bi xwe hest bikin, ku ew me derbasî hundurê dîroka bi sedên salan dikin.

Mebest jê ku kurdan ev zayend **Lyrîk** ji zû ve bi kar aniye, lê bi navên cuda û ta niha jî çu lêkolîn li ser wan çênebûne, ku taybetmendiyên, dengane, peyvê, hevokê, rîtim, kartêkirina civak, kartêkirina derûnî htd, diyar bikin.

Ev jî zeviyekî beyar e, lê pir giring e, lêkolîn li ser bibin.

Ev hemî li rojhilatê hebûn, ji tekstên **Kirîşna** bigire ta bigihe, Evra, Tao, Mîtra, êzdî, Zerdeştî, Yarsan, Ehlûlheq, elewî, htd.

Lê bingeha vê, mîna li jor hatî nivîsîn, ji yewnanî Grîkî) tê û ji dema Antîk ve, ku bi kom Beyt û qesîdeyên olî (sebeqeyên olî) pêk ve digotin. Ev têgeh, heta niha jî bi mûzîk û stranê ve girêdayî ye. Nimûneyeke bi nav bo wê hindê, helbestvanê Antîk yê bi nav û deng Horaz e.

Li ba me kurdan, wek di jorê de hat, bi qesîde, sebeqe, beyt, û stranên şeran ve girêdayî bû, çunku ev têgeh kartêkirineke wî derûnî li naxê guhdêr/xwêner heye. Ev Rîtim, aheng û deng di navbera peyv, rist, malik û beytê de, têkiliyekê ava dike û pêk ve dibin yek parçe, ku jê re dibêjin lyrîk.

Gelek caran bi kurdî di vê demê de, navê helbesta stranê lê dibe. Di gel ku helbesta stiranê hevwatera têgeha POESIE/elmanî, Poetry, Verse/ingilîzî, Poésie/Firensî, şîir sanatî, şîirsellik/turkî .

Li welatên rojava jî, ev tekstên lyrîkî dihatin stiran, ta sala 1500 p.z.

Lyrîk, Wênekêşeyeke hizrî ye, hizra mirovî, hestên wî, nîrxên wî, jinûvebirêkxistina wî, di hişê wî de, vediguhêze bo peyvê, hemî dîtin, nêrîn, nîrx ji realîteyê azad dike, realîteya xwe lê dike. Wan peyvan diguvêşe, wan pêk ve di hizra xwe de didrû û hemî dibin parçeyek û ew mirov derdibire û ev tiştê ciwan encam dide, ku jê re dibêjin, Lyrîk/ xweşxwan. Ez bawer im, ku têgeha xweşxwan li bejna Lyrîkê tê.

Di toreya cîhanî de, çend formên Lyrîkê hene:

1. Stiranên govendê= Ballad: Ev peyv **Ballada, ballata, balada**, di sedsala 15an de, li nik romanên ji bo stîrana govendê dihatê gotin. Ji xwe peyva **Ballet** jî wê hatiye. Li Ferensa, di qûnaxên navendî de, bi watera straneke bi çarçeweke hunerî dihatê naskirin. Li Ingeltîra **Ballad**, wek straneke bû, ku ji yekî bo yê din dihatê guhestin, lê naveroka wê bi êş û kovan bû. Bi kurtî Ballad, strana ji bo govendê tê gotin, lê buyerek, an jî babetek tê de heye. Li ba me kurdan jî ev şewestran pîrr in û bêhtirîn ji wan evîne derdibirin û gelek ji wan erotîk in, behsê sing, ber, maç, hingil û gelek tiştên din dikin (Miradê Kinê). Ji xisletên wan stîranan, ku lîrz û

qewmînek tê de peyda dibe, mirov pirr kêfxweş an jî pirr xemgîn dike. Pêdivî ye bi rêzbend û terazû be. Bo nimûne:

“Yer yaman lê qudretê

Te, z birim helaketê

Ramîsankê bide min

ez kefilê te û cinetê” Folklor

2. **Sirûd = Hymn:** Sirûd bi xwe di demên Kevin û antîk de, pesin, sena û medih, bi naverokeke olî bûn. Eger em li kultûrên Kevin mîna ya mesriyên Kevin binêrin, pesinê xwedawendê wê demê **Fir, ewn** bû. Di Tewratê de, ku *psalmên* (mezamîr) wê bûn. Li ba girîkan, sirûda bi nav û deng ya **Dionysos** bû ya bi navê **Dithyrambus**, ku li ser **APollon Pään** digot. Di kultûra me kurdan de, belkî **qewlê Şerfedîn** sirûda herî bi nav û deng be. Taybetmendiyek wan sirûdan heye, ku guhdaran bi hêz dike. Di vê serdemê de, êdî sirûdên netewî derketin. Ew bi xwe jî helbest in.

3. **Stran = Lay:** Tekstek nivîsî ye, ku hatibe awazkirin û di gel mûzîkê tete gotin. Di stiranê de, hestên mirovan diyar in, nîşan hene û hevokên bi zanebûn û hizir (wate netenê lihev hatî), hatine sazkirin. Têkiliya di navbera peyvê û ahengê de, bi hêz e. Di demên berê de, mirovek bû, li amûrê mûzîkê dixist û distrand jî, mîna li nik me kurdan, yê tembûrvan û bilûrvan, stranvan jî bû. Lê di dema niha de, ev hatiye guhertin. Kemeçevan hîn jî lyrîkê dibêjin, lê pirr amûr derbasî mûzîkê bûn û yê sazvan negerek e bibe stranvan.

Divê em tişteki din bibêjin, ku dengbêjên kurdan, ew bi xwe bûn, yê ev deqên lyrîkê çêkirin, awaz didanîn, êdî di pey wan re nifşekî bo yê din vediguhest.

4. Haiku: şêweyek ji şêweyê helbesta ye, ji kevnetora Japana ye, 3 grûp in û her grûpek 5,7,5 kîte ne. Tekstê Haiku, deqekî kenok e, dikare pêkenîn an jî pend be, li ser sê xêzan belav dibe. Dema xwêner dêhna xwe didiyê, bêhina surrealizmê jê têt. Haiku forma helbestê ya herî kurt e, ji 17 tîpên dengdêr pêk têt. Haiku pesnê wêneyekî surîştî dida (peyvên demên salê bi kar tanî, mîna Jap, Kigo). Ji bilî wê niha fomên Haiku yên azad jî hene û yek ji wan helbestvanên Haiku yê bi nav û deng, belê damezrênerê Haiku yên modern, Masaoka Şîkî.

5. Hindek Haiku ji Suzukî Harunobu (1724- 1770)

Du keç li ser Berenda, spêdeyê sar, zelal

Sinober pencerê dixemilîne

Henasa min qerisî

Hizra min

te karîbû tê bîne der

Ka wê çi bibaye?

Tîrêja rojê yarî dikir

Di hundurê pencera vekirî ve

Di kete oda min

Helbestvan mija payîzê

Xwe li nav daristanê û li ser mêrgê radida

Mantoyê nemukurhatinê ye

Masaoka, Shiki (1867-1902)

Bayê êvarê

Pişkuvîna gulên spî

Hemî tişt hejiyan

6. Rap:

Di folklorê kurdî de, ev şêwe di demên kevin de hebû, dema dengbêjên kemeçevan tekst bi dirêjahî digot û di pey re, melodiyeke hîcaz an jî beyat, di pey re dihat. Bo nimûne dengbêjê Efrînê Bavê Selah strana Lewlaw dibêje. Ev Rap ji kû hat? Rap, parçeyek ji kultûra Hip-Hopê ye ku wateya wê (biqutin, req bin) an jî Rîtim û helbest. Di van demên dawî de, Rap xwe ji rehên xwe azad kiriye.

Mediyomên ji bo lyrîkê , kaxez, flaş, komputer in. Li nav wan xêzan, xwêner dikare robarên hestan hest bike û rîtma tekstî bişopîne. Kartêkirina naverokê li ser şêwe heye, her wisa jî berovajî. Lyrîk di hundurê wêneyan de geş dibe, kartêkirineke kûr dike û kelecaneke bi hêz diafirîne. Forma lyrîkê hemereng e, xwêner/guhdêr xwe tê da dibîne, hizrên wî yên kûr, yên ji bîr çûne vedigerîne. Lyrîk lertzê dixwe rîtma kêlîka jiyana xwêner/guhdêr û dûzan jî dike.

Dibe ku ji bo pênasîna Lyrîk gelek tişt bêne nivîsîn, an jî gotin. Lê di behweriya min de, lyrîk ewe ye, ji ber ku **EZ**

wisa bi nav dikim. Xwênerê/rexnegirê min wisa dibîne, baş e
û eger wisa jî nebîne, dîsan baş e, ji ber ku hîn gelek xwêner/
rexnegir hene û gelek lyrîkvan jî hene.

Zimanê helbestê û spehêtayiya xwendinê

Nivîsîn, êrîşa berdewam li dijî ziman e. Cengeke bêdawî di navbera nivîsîn û ziman î de heye. Ziman xama nivîsînê ye. Nivîsîn herdem aleya cîwaziyê hildigire û bilind dike. Helbest jî ew kêlîka herî aloz e. Ziman di helbestê de, hilgirê nasnameya wê ye, li ber dergehê dîrokê. Nivîsîn jî xweşiya xwe, di tarmariya zimanî de dibîne.

Helbest her dem derbirîna wê kêlîka mirovane bûye, ya dihingive sinorên pîroziyê di hebûna wê de. "Helbestvan ji asîman hatiye, lê bi zimanê erdê diaxive". **Poetîzma Aristo**

Peyvên helbestê mîna sihrê an jî leylanê ne, mîna destpêka dîtina avê di beyabanê de ye. Ziman an jî peyv, di helbestê de, parçeyê herî biçûk e, hilbûna şemalka xwe wedigire. Helbest wateyê dide peyvê.

Helbestvan, peyvan ji rengên nepakij di demên nû de, pak dike. Peyva helbestane ji kurtepiesta awazên zimanî derdikeve û helbestvan jî wan peyvan rût diyar dike. Ji xwe ev sedem in, ku helbestvan ziman ji rewşek xav bo rewşeke têkçûyî hilo dike.

Ziman nikare ji dîrokê ji derkeve, mîna jinek cil û bergan ji ber xwe bike. Ziman ne tinê peyv, derbirîn, wate, simbol û nîşan in. Ziman gel û xak e, dîrok û bîranîn e. Ziman parçeyek ji nasnameya me ye, nasnameyeke bi hêz, bi bizav û dînamîk e. Ziman li vir ranaweste, berdewam e, lê formê hunera xwe bi dîrokê diguhere. Hebûn bê ziman nabe.

Peyv, hebûnê diafirîne. Bi wateyeke din: cihê ziman lê hebe, guhertineke berdewam bi hev re, di navbera biryarwergirtin, merem, şaşîştî û şikestinan de heye.

Cihê jiyan lê hebe, dîrok lê heye. Ziman mirovan dike mirovên tekane/ individium. Dema ku helbestvan jî zimanê xwe ji rengên rojane û cûtî azad dike, weha jî nikare ziman ji çermê wê bikêşe û nikare rehên wê winda bike, an jî ziman ji rehê wî derbixe, dûrbike û derbixe. Her helbest mîna dareke di qadê de çandî ye û rehên wê ava jiyanê ji civakê û dîrokê dikşîne. Lê çuqiliyên wê darê digihin asîmanan, xwe di asoyekî, ji diyalogeke bêdawî de, di navbera „Ez û yê din“ de belav dikin. Helbest di navbera hest, hêvî û bawerîpêdanan de, ciwaniyên nû û harmoiyê peyda dike.

Rastiyek heye, divête neyête jibîrkirin, ku rastî û xewin, realîte û xapandin ji ber helbestvan direvin, ji ber ku ew wan

wek efsane vedihûne. Li vir diyar dibe ku zimanê helbestvan bi kar tîne, ne tenê helbestê pê dinivîse, belê wê dike mesajeke xwedayî, ku dixwaze hemî deman, kultûran û helbestvanan bike êk.

Alavê herî giring yê helbestê, ziman e. Pirsê herî pirr têtê kirin, li ser mij û tem, an jî netêgehîştina xwêner ji hin helbestan re, di zimanê wê de ye!

Mebest ew e, ku zimanê helbestê, bibe zimanê axaftinê, wate, peyva helbestê wateya ferhengî û tenê wateya ferhengî ya di hişê civakê de werbigire.

Ev bi xwe daxwazek e, ku helbest ji erkê xwe yê ciwaniyê bête birrîn. Mebest ji zimanê helbestê yê nû ew e, zimanê hunerê yê hevbeş e. Xwêner dixwîne mîna li filmekî temaşe dike, guhdarî dike mîna di atmosfêreke mûzîkane de ye, li ser dipûnîje mîna li tabloyekê temaşe dike.

Peyv û gotinên helbestê, ji şênberên(regezên) avakirina xulyaqetê“ Gerdûnê“ ne (Av, agir, ba û ax). Dema helbestvan peyvekê ji wan bi kar tîne, diyardeya şênberê bi giştî dide. Nayê wê wateyê, ku helbest tenê xwe bi bêjeyên kevin ve girêdide, ku ew vehûnana rêûresman in.

Zimanê helbestê, ne bêje tenê ye. Bêje parçeyek ji zimanê helbestê ye. Lê pêkhatina bêjeyan, wêne, lêkdan û hevokan pêktîne. Ev wateyên din yên derveyî zimên û wateya rojane an jî zimanê peyivînê didin.

Ji ber ku gelek caran erkên sincî û îdolojî dibe barê helbestê, helbest jî dikeve dava xîtab (discure) û nerînên (vision) teng de û bi çûna buyerê re, helbest jî dimire.

Zimanê helbestê, zimanekî bi şîfre û kod e. Erkê xwênerê çalak û berhemdar e, wan şîfreyan ji hev derbixe û wan rêz bike. Dema helbestê ne giştî ye û cihê wê jî ne giştî û gelemper e. Cih û demên helbestê taybet in, bi helbestê bi xwe ve girêdayî ne. Lewra jî derbasî kûrahiya dîrokê dibe. Wate dîrok dibe wargehê helbestê.

Negerek e, helbest zimanê rojane pêkbîne, lê gerek e mîtolojiya jiyaneke rojane, taybet biafirîne. Pîrr diyarde hene, ku biyaveke dûr û asoyekî fireh li ber lêkdana helbestê vedikin û ciwaniyeke taybet didin helbestê, ew jî diyardeyên xîtaba dahênanê ne, ji pêşxist û paşxistina bêjeyan, tîrbûn û himbiziya bêjeyan, dubarekirina bi sûd, wêneyên hestane ...Erkê peyvînê, an jî xîtaba rojane, erkekî ragehandinê ye, lê erkê xîtaba helbstî erkekî ciwanî û dahênanê ye.

Bêguman e, ku bêje helbestê ava dikan. Ev bêje hene, lê pêdiviyê helbestvan wan di helbestê de bi rêkûpêk bixe, wan bi şeweyekî vehûne, ku ne mîna zimanê peyvînê be, wan bêjeyan bi lêkdan û tevindaneke din ji qalibê rojane derbixe, daku hêzekê bide wan lêkdan û hevokan, ku sinorê xwe yê ferhengî derbas bikin.

Karekî gelekî giring heye, ku zimanê helbestê pê radibe, ew jî derketina wê ji rêka peyvînê ye. Ev ji helbestvanekî bo yê din cuda ye. Her yek li gor têgehiştin, serpêhatî û zanebûna xwe şêweyê bikaranîna bêjeyan di helbestê de, rêbaz û şêwevehûnana helbestvanî diyar dike. Dahênerê zîrek ew e, yê bikaribe hêza zimên bo xwe bi kar bîne, bi ziman bilîze, daku taybetmendî û cîwaziyekê bide deqê xwe.

Helbestvanê zîrek, piştî xwe, di deqê xwe de, bi çend xalan bi hêz dike. Ew xalên ku tevina xîtaba wî li ser ava dibin. Ew xal pêkve bi têkiliyên cuda cuda pêk ve girêdayîne.

Ev girêdana wan nijyaran, wan xalên hundurîn, vebêjiyeke nû dide deq û ciwaniya zimanî berbiçav dike.

Li vir, çî dibe, taku ciwanî dibe taybetmendiya zimanê helbestê û dibe erkê helbestê bi xwe jî? Ziman ji vehûnana xwe ya rojane û normal derdikeve, gelek caran sinorê rêzimana wî zimanî jî dişkîne û bêjeyên hevok û lêkdanan bi temtêl û rêgayeke din pêrgî hev dibin û danûstendinê di gel hev dikin, wate mîkanîzmeke din ji bo vehûnan û tevingirêdanê li nav deqê peyda dibe. Deq ji pêpeloka ragehaninê, digihe pêpeloka bedewî û dahênanê. Daku helbesta me jî ji warê xwe derkeve, pêdivî ye, xijiqandin di zimên de bibe û xijiqandin (= ne şêweyê ziman î yê peyvînê) wek sîmayekî giring bo avakirina helbestê, ne ku tenê bo ciwaniya peyvan bête dîtin.

Ziman endamê herî giring e di avakirina deqê toreyî de. Afirandina wêneyan di helbestê de, mîna têkperîn û reaksiyona helbestvanî ye, hêzekê dide helbestê, xeyala xwênerî têvedide, ku careke din deqî ji hev bixe, li hev siwar bike, zimanekî metaforê bide helbestê, ziman ji rotînê derbixe, ahengeke nebihîstî bi guhê xwênerî bixe. Daneberheva (beramberkirina) zimanê mentîq û zimanê helbestê, xwêner berbi sergêjjiyeke bêdawî ve dibe.

Ciwaniya xwendinê

Her xwendinek bi bedewiyeke taybet ve pabend e. Xwendin rexnegirtineke veşartî ji nivîsînê re ye. Her gava xwendin kilîta wê ciwaniyê winda bike, nikare şîfreyên nivîsînê veke, wisa jî ciwaniya deqî winda dike û deq û nivîs bênirx dimîne û pêdivî bi xwendinê jî êdî namîne.

Mîna ku ciwanî û bedewiya danê/ nivîsînê heye, wisa jî ya wergirtinê/ xwendinê hey û nekêmtir e ji ya nivîsînê.

Em çawa dikarin rexne li deqekî bigirin, wate bixwênin?

Eger hat xwêner nivîs wek bûnewerekî dubare bibîne, hinga ew derbasî hundurê xwe dibe, xwe dixwîne, xwe, serpêhatiyên xwe, zanîna xwe, jiyana û kartêkirina li jiyana wî bûyî, li ser deqî ferz dike. Deq bi sinor dike, digire, dergêhê asoyan li ber deq û zimanê deq teng dike û dadixe.

Wate deq ji hêvî, mesaj û şîyanê bêpar dike. Bi wateyeke din deq li gor xwe dibire û difeslîne. Ew hişê mişt ji hizir û ramanên dema buhurî, têkiliyên xwe yên aborî, civakî, nirxên sincî û kêşeyên derûnî dike xemila deqî û deq dibe bûnewerekî derveyî xwe.

Dibe ev reng-xwendin sedema pirsiyareke gelekî giring be, dema her xwênerê kilîta vekirina deqekî bi dest nexe. Ev nivîs zor e, xwêner têngiye. Û ew nivîsa ev reng-xwêner têngiye, pirsê yekem ew e: Bo çî nivîskar nivîsa xwe asê dike?

Xwendina ku xwêner li xwe di hundurê deqê li pêşberî xwe bigire, xwendineke kesayetî ye, xwendina bîranîn, gencîn, imbara rewşenbîriya xwêner bi xwe ye, ne xwendina deqî ye, ku di rewşeke din de ye, di mercên kultûr û rewşenbîriyeke kesayîtiyeke din de ye. Li vir jî pîrsek xwe di hişê me de beşdar dike û diçîne: Ma dibe, ku xwêner hemî nivîsan bi yek pîvanê bajo, bixwîne û bipîve? Ma ev şêwe-xwendin derveyî demê ye, eger pîvanên xwendinê bi vî şêweyî bin?

Xwendina bi vê mîkanîzmê li deq dinêre, xwendineke bêgîyan û bêliv e, her weha dem jê re tune ye. Di prosesa dahênanê de, afirandin û çandina pîrsan, asoyan li ber ravekirina pîralî, pirtşêwe, pirdeng û jinûve-xwendinan vedike. Lewra xwendina xwêner ji xwe re, pîrsan beravêtî dike, dînamîkiya nivîsê xilûxavî dike. Nivîsê ji erkên wê, ku afirandin e, dûr dike, deq dike qurbana yekdîtin û yekxwendinê, binax dike. Nivîsîn bi xwe, qada dan û stendinê ye, qada dialogê ye û qada cengeke hunerî û îdolojî ye. Di wê qadê de, xwêner regezê navîn e, bandor lê dibe û di nav cengê de nikare bê kartêkirin bimîne, eger ew xwênerekî berhemdar be.

Çawa ev şêw-xwendine, dikare piştguh bibe? Her deqekî afirînde, pêdivî bi xwendineke bi şêweyekî nû ye. Wek ku deq bi derbirînên cuda, taybet bi daner, giyanekî nû werdiger, şirovekirin/xwendina deq jî ciwaniyeke nû bo deq

peyda dibe û deq bi giyanekî din vedijîne. Her xwendinek afirandinek nû ye.

Bi vî « *şêweyê xwendinê, ku xwe bo qadeke nû ji xwendinê re amade dike, spehîtiya deq û huneriya wî, ji pîvanên kevin azad dibe û dibe xwedî livek û bizaveke nû, taybet bi xwe* ». *Astätische Erfahrung.., H.R.Jauß, r. 186*

Dibe xwedanê dema xwe, cihê xwe, kesayetî û epystomilojiya xwe. Ev jî di beşdarkirina regezên di navbera xêzan de peyda dibe. Ev şêwe-xwendin zemînekî nû bo damezirandina pirsan xweş dike û dibe hogirê deq di geşt û seyrana wî de, di nav buyeran de, an jî çirûsk û kilîtên deq ji hev vediwejêre.

Ev şêwe-xwendin, rêka bikaranîna zimên ji nû ve nas dike, nirxekî cuda dide deq, dibe rêka guherîn û pênasîn û bidestxistina zanînan. Ya herî girîng, bi wê xwendina helbestiyane, dorhêlên bedewî û hunerî yên deq bi şêweyekî nû û estetîkeke nû dadimezire. Di vê pileya xwendinê de, pirsgirêkên deq ji hev dikevin.

Ew pirsgirêka ku carcaran dikeve navbera daner û xwêner de, namîne, ji ber ku êdî daner, xwêner û rexnergir dibin yek û her yek, ku yek in, bi boşahî û biyavên deqî, yên demên cuda, ciwaniyeke nû werdigerin.

Ev şêwe-xwendin, astenga di navbera daner û xwêner/cemawer ji qadê radike, ji ber ku êdî xwêner bi xwe dibe stûna afirandinê û dibe biyavê siyem ji nivîsê re. Xwendina kûr „(Implizite Leser“ Wolfgang Iser“), xwe berdide

kûrahiya nivîsê, ji hinavê deq asoyên pirsan li dar dixê, xwedî ciwaneyêke bilind e. Nirxê nivîsê, bi şiyana deqê û derbaskirina sinoran ve girêdayî ye. Bi dînamîkiyeta deq ve berbest e. Wate her xwendinek, dergehêkî nû bo sementîka deq e, azadkirina deq ji qewarên şûngirtî ye, herifandina nîrxên pîroz e.

Xwendineke wisa, li damezirandina pirsan xwedî derkeve, dûrî bersiv û danîna çareseriyên yekrê, yeknerîn, yekbawerî ye. Li vir ciwaniya deq li dor çend pîrsên ji xwe, sema dike:

1. Çawa deqekî vekirî tête afirandin? Wate deqekî li dijî hemî pîroziyan/qeydan be.
2. Çawa deq dikare radeya dialoga rewşenbîrî bike xwedî ciwaniyêke necûtî?
3. Çawa dergehê rexneya deq bête damizirandin?

Di prosesa dahênanê de, deq xwênerê xwe bi xwe re diafirîne û bedewiya xwe jî li gor têgehîştina xwêner dike pîrs.

Jêder:

- Astätische Erfahrung und Literatur , .H.R.Jauß, UTB, 1971
- Der Akt des Lesens, Wolfgang Iser, UTB, 1970

Drama

Yek ji zayendên herî giring yê toryê, ku kartêkirina wê dîrekt li ser hiş û hestên xelkê heye, drama ye. Ev Drama, çi ye? Ji kû hatiye? Çend şêweyê wê hene?

Têgeha drama, di jiyana normal de, wek wateya sosret tête fehemkirin, dema mirovek bibêje “guherîneke dramatikî di jiyana wî de çêbû” wate tûşî belayeke mezin bû. Wate, vê têgehê di hişê civatê de, şopeke xerab hiştiye.

Drama, peyveke, ku ji zimanê yûnaniya kevin hatiye „δρᾶμα dráma“ wate, dan û stendin. Eger em baş dihnê xwe bidin peyvê, dê bibînin, ku ew di hundurê xwe de, rolan di deqekî, şano, opêra de an jî sînariyo belav dike.

Ji wan deqên, hestiyar, kovandar û matmaydar, re, drama tête gotin. Drama di gel pexşan û helbestê, stûnên sereke yê poetizmê ne.

Ev şêwenivîs, li ba yûnan pirr kevin, xwe digihîne 500 ta 700 salekî berya zayînê.

Di wan demên antîk de, çend navên ku ta niha şopa xwe li ser vî zayendî hiştin li Athen peyda dibin, mîna Sophokles, Euripides û Aischylos, hene.

Di wê demê de, ew mîna helbestvanên kul û kederan (Trajîdî) dihatin naskirin. Ji xwe Aischylos, helbestvanê yekem, ku helbest nivîsiye têtê hesêbê. Aristoteles di pirtûka xwe de, Poetîk praçe dikir û dibêje, ku drama ya trajîdî û pişt re komîdî helbestên herî pak û pakij in (ji hêla giyan ve). Ji wê demê ve jî, europiyan kiriye destpêka dîroka drama Europî.

Di wê dema ku li rojhilatê tore û di hundurê wê de, drama gesh bû. gelek destanên kurdî, mîna Mîrmeh, Xerîbû, Memê Alan û gelek yên mirov dikare bibêje, ku eve kevin in, mişt in ji drama trajîdî, li Europa lîstik û yariyên derûnî hebûn, lê mirov nikare wan mîna drama li qelem bide.

Di serdema Renaissansê, guhertinek bi ser drama antîk de peyda bû. Drama bi şêweyê vebêjîyê demeke dirêj serdest bû (çîrokbêjî). Ji kevin de, drama bi herdû şêweyên xwe,- wek bikarhatin- trajîdî û komîdî hebû, lê bê bingeheke tiyorî û bîrdozî bû.

Di destpêka sedsala 17an de (1600pz), dest bi danana qeyd û bendan bo wê. Li ba Shakspeare û Lope de Vega, di destpêka sala 1600î de, hîn jî şanoya kevneşopî bû û bê tiyorî bû, lê şongeriyên Fransizî hatin û yasa bo drama yê danîn, ew jî li ser bingeha hersê yekîneyên

Aristotalis û ji wê demê ve, norm bo dramayê peyda bûn û dikarî roleke kartêker di civakê de bilîze.

Ji ber wê rolê jî, peyveke Napoleon ya giring di vê derbarê de heye dibêje: „ şanoyekê bide min, ez ê civateke berhemdar radestî te bikim“

Yarî, lîstik û akterî di sedsala 18an de, ber bi pêş ve çû. Ew tîtal, rê û resmên kevin jî bûn şêweyê û bingeh bo avakirina drama û bipêxistina şanoyê bi giştî. Êdî kêf û bîranînên bhiya jî bi şêweyekî ji şêweyan bûne babetên şanoyê.

Lê di sedsala 19an de, Melodrama, derbasî dramayê bû û hêza hest û şêwyê derûnî bi hêz kir.

Li Elmaniya û bi hatina J.W. Goethe re, drama û bi taybetî tarjîdîk, kete qûnaxeke nû de. J.W.Goethe, drama tarjîdiya kevin, wek tarjîdiya dilxwaziyê bi nav kir, wate, mirov dixwaze vî şêweyî binivîse û bilîze, merc nîne ku weha be, lê tarjîdiya modern“ Melodrama“, pêdiviyê bête nivîsîn û lîstin.

Piştî van pêvajoyan, qûnaxeke nû bo şanoyê û bi taybet dramayê dest pêkir. Di sedsala 20an de, bîrdoziya şanoyê giha qunaxeke bilind, ku êdî li dûv pêdiviyên jiyane, drama bi xwe jî ji bilî komîdî û tarjîk, bi şax û per bûn û gelek şêwe û nav derketin. Drama civakî, drama ravekirinê, an jî drama forma vekirî û ya girtî.

Ji xwe dema Mediya di navînga sedsala 20an de, geş bû, radio, TV û Filmê sînemê peyda bûn, formên nû bo

dramayê peyda bûn, mîna drama filmî, drama êzgeyê (guhdarîkirinê).

Li van qûnaxên nû, em dibînin û dixwênin, ku formên nû bo şano û dramayê peyda dibin, ew jî li gor pêdiviyên civakê û çînên wê ne.

Rewşa mirovan, di her warî, dibe sedema peydakirina formên cuda bo şano û dramayê. Rêbaz û metodên rahênan û dermankirina giyanî bi xwe jî ketin nav formên dramayê û wek Psychodrama (Siko-drama) hate binavkirin.

Di van salên dawî de, deqên dramayê gehiştine qûnaxeke nû ku jêre şanoya postdrama tête gotin. Di vî serdemî de, wate serdema toreya Internête de, cudabûneke nerim di navbera jiberxwegotin (improvisation) û nivîsîna diyalogê de, di rêya formên guhertina rolan de, peyda bûye.

Li demên Aristotalis, drama, hunerekî di navbera danûstendin û diyalogê de bû. Lewra di dema Antîk de, Drama xwe tenê ji çîrokên qehremaniyê (Dastan) cuda dikir. Lê li vê serdema nû, xwe ji romanê cuda dike.

Drama bo wê hindê ne, ku ji bo şanoyê tête nivîsîn, çunku ji bilî nivîsîna tekst, çend ferman û şîret têne dan û nivîsîn û yê derhêner, şirovekirina ji deq re, dike kar û çalakî û daxwazê ji lîstikvanan dike, ku wê rolê, bi vê livê û vî tonê axaftinê bilîze.

Ji xwe regez û elementên ku îro roj, şano bi giştî û drama bi taybetî bê wan nabe, mîna dîkor, ronî, bûne xalên sereke, daku renekî ciwan bidin û kartêkirinek şûngirtî bikin.

Aramanca Drama, karekî baş, serketî û kartêker bibe û dakeve ser textê şanoyê, daku bibe xwedan roleke kartêker li civakê .

Drama hêdî hêdî, şaxên xwe mezin kirin. Ji wê rola ku civakê biguherênin (rola şoreşgerî!?), derbasî biyav û qadên din bû, mîna vehesîna giyan û jiyane (Opêra).

Drama têgehêk ji têgehên şanoyê ye, ku di rêya tekst û yarîkeran re, bi diyalog û formên cuda buyerekê, êşekê, pêkenînekê digihîne bîneran/guhdêran. Di perawêzên dramayê de, mirov carnan têbîniyan dibîne, ku derhêner bo lîstivan dinivîse, ew bi xwe jî parçeyekî giring ji dramayê ye.

Dramayên taybet hene, ku tenê bo xwendinê têne nivîsîn, dibêjin wan dramayên xwendinê. Em gelek caran hindêk drama bi gelek şewenivîsan dibînin, ku hem bo xwendinê û hem bo bişanokirinê ne.

Di dawî de, drama şaxek û beşekî toreyê yê giring e, bo şanoyê û lîstikê tete nivîsîn. Drama yek ji kevintirîn şeweyê axaftinê ye.

Di destpêka bûn û hebûna mirov, lawir û giyandaran de, diyalog peyda bûye û diyalog, beşê bingehîn ji dramayê ye.

Tiştâ ku drama dikare bike, rêxweşkirin bo çareserkirina pirsgirêkan be, pirsgirêkan wek heyî û bi zimanekî ciwan binivîse û bilîze.

Di nivîsîna dramayê de, tinazok, zimanê laqirdiyane û pêkenînê, dikarin bibin dilxweşker û hêsanîkirin û sivikirina pejirandina rexneyên civakî.

Drama danûstendina deq li ser kaxezê ye, têkiliya şanoger bi bîneran re, li ser textê şanoyê ye, beramberkirina astengî, alozî û çareseriyên e, kenê ji dil û giriyê kêlîkê ye.

Wate, dema her yekî diyalogê bike, pêdiviyê ji xwe bipirse:

Eger min karek kir, dê çi biqewime?

Ev kar pêdivî bû?

Min nekira dê çi bûbaye?

Û di dawî de, birayara min ya karî durust bû?

Drama Trajîdî, di ciwaniya Hegelî de, mîna beşekî giring ji poetîzîmê ye.

Kurteçîrok

Kurteçîrok çi ye?

Têgeha kurteçîrokê di destpêka sedsala 20 de, ji peyva Ingilîzî „Short stories“ peyda hatiye. Kurteçîrok formekî toreyê taze yê kurtepexşanê ye. Nîşana sereke ya vî formî, nivîseke himbiz e(TÎR), ku naverokê bi ser hev de tîne.

Ev têgeh bi demê re xesletên prosa kurt girtin û li wê gore xwe biyava xwe fereh kiriye. Forma toreyî ya nêzîkî wê Novel e, lê cudabûna di navbera Novelê û kurteçîrokê de, ku Novel 30 rûpelên nivîskî dibezîne dike. Novel ji kurteçîrokê bêhtir nijyargerî ye(Structuring). Kurteçîrok zayendekî ji zayendên toreyê yê herî giring û zor e.

Gelek torezan û rexnegirên toreyê kurteçîrokê ji girintirîn zayendê toreyî dideynin û dibêjin, kurteçîrok ji romanê re bû bingeh û li ser hate avakirin. Lewra jî, şeweyê nirixandina romanê ji ya kurteçîrokê necuda ye. Ji hêla dîrokê ve, cih û warê kurteçîrokê yekîtiya welatên Emerîka ye, ku li piştî şerê di navbera başûr û bakur de bû.

Ev behwerî, ne hemî nivîskar par vedikin, hindê dibêjin, di dawiya şerê navxweyî (1861-1865) dest pêkir de ye û hin din dibêjin, dawiya şerê cîhana diwem e. Li gor lêkolînên kurdan yên heyî, dibêjin kurteçîroka kurdî, di destpêka sedsala 20an de, di kovara Jîn de ye, ku F. Temo yekemîn çîroknivîs e.

Li Elmaniya, destpêka dîroka kurteçîrokê dawiya şerê cîhana diwem e. Hinek mêjonivîsên toreyê dibêjin, sedema derketina vî zayendî, lezûbeza di nava civakê de peydabûyî de bû, ku jiyana xelkê guherî, nemana metiryalên xam û belengaziya piştî şerê diwemîn û sedema siyan ewe, ku ji bo rojnameyan, nivîs û pexşaneyên kurt pêdivî bûn, lewra kurte çîrok bo vê hindê baş bû.

Sê pêşengên çîrokên cîhanî yên bi nav û deng hene, ku hîmên vî zayendê toreyî danîne, ew jî ev in: G.J.Mobasan, J. Joyce, A. Tchekov.

Keresteyên kurteçîrokê:

Pênasîneke 100% bo têgeha Kurteçîrokê nîne, ji ber wilo jî, çi keresteyên konkret, bo wê tune ne. Lê nayê wê wateyê, ku kurteçîrokê hindê xeslet hene. Di toreyê wê serdemê de, ancax nivîskarê kurteçîrokê di cihbicihkirinê de, bikaribe wan keresteyan destnîşan bike, yên bi têgeha kurteçîrokê ve têkildar in. Lê du tiştên sereke hene, nabe ku di kurteçîrokê de tune bin, ew jî

1. Girêbestin(Action /Eng. Handlung/Germ.) (ew sedem û girêdanên buyeran pêk ve, yên bi hev ve girêdayî û di têkilî û dan û stendinê de ne)
2. Pirsgirêk (conflict), dema du enî li hember hev bin û di demeke ne destnîşankirî de, pêk ve, li devereke bin, ku pêdiviye nepêk ve bin.

Ev herdû xalên, li jor hatine destnîşankirin, hinekî dîmenê kurteçîrokê diyar dikin, lê nayê wê wateyê, ku ev bi tinê ne, an jî tenê di kurteçîrokê de hene. Ev du kereste di Novel, çîrokan de jî hene. Hin xisletên din hene, ku dikarin bibin xislet û xwêner wan di kurteçîrokan de dibîne. Lê ne giring e, ku di her k.çîrokekê de serî hildin.

- Biyaveke kurt
- Yekrast derbasî hunerê kurteçîrokê bibe, çi buyer, çi cih an jî dem û leheng be, bê pêşgotin, an jî xweşkirina zemînê.
- Jinişkavebûn
- Xaleke destnîşkirî, an jî dergehekî vekirî
- Hebûna girêkan û avakirina pirsgirêkan
- Kesayetiyeke an jî 2, fîgurên sereke bin, ku buyer li ser wan ava bibe û bi dan û stendina wan bi hev re, vebêjî, diyalog an jî dramayeke biçûk peyda bibe. Yek ji wan bêguman wê bibe yê sereke
- Hinek parçeyên vebêjîyê, jiyana çîrokbêjî vedibêje

- Vebêjiyeke kronologîk
- Metafor û nîşan
- Zimanekî nêzîkî helbestî himbiz (di pesinê de)
- Fîgur (Bêhtir mirov)
- Babetên serdemî yên jiyane û pirsgerêkên wê
- Veguhêzbariya cih û demê.

Çawatiya avakirina kurteçîrokê:

Kurteçîrok nikare cihekî mezin bigre, lewra pêdivî ye, nivîser li mijara xwe baş hayeder be, ku dema wê, demeke çavmiçûbelkirinê be (Flash), biyava demê ji saetan nezêdetir bin û eger xule û sanî bin hîn baştir e, ji ber matmayîn li def xwêner pitir peyda dibe.

Bikaranîna buyerê, di demeke kurt de, dihêle xwêner bi balkêşî û matmayîn bixwîne.

Xwêner ji xewê hişyar dike (Kurd dibêjin, serê wî li heda dide) û wî mecbûr dike, ku ta bi dawiya k.çîrokê bixwîne.

Bo nimûne:

1. „ Girîlayekî 15 salî ye, diçe şer“. Li vir Pirs girêk derdikeve

Dayik û bavên wî. Zarok û şer. Bindestî û berxwedana bo stendina mafê rewê.

Jiyana zarokê sinêl û jiyana li ser çiyana di nav şer de) û gelek tiştên din jî, dihêlin xwêner berê xwe bide jiyana lehengî, ku wê çî bi serê wî bêt!

2. „Malxweyê malê diçe ber dilovaniya xwedê“. Pirsên bîr kirin, hem dibin pirsgerêk û arîşe û hem jî action.

Jin û zaroyên wî hene? Eger hebin, dê dayik çî bike? Wê kar bike, daku zarokên xwe, yên biçûk, rêke dibistanê û abora wan bike? Karê jinê di civakê de? Têkiliyên jinê bi malbata wê û mala xezûrê wê re? Wê zarok bêbav çî bikin? Û gelek pirsên din.

3. „ Keçek evîndar e, lê evîndarê wî belengaz e û nikare daxwazên wê pêkbîne, şol bi yekî dewlend dike“ Wê çî bi Evînarî bêt? Wê keçek di jiyana xwe de, bi yê dewlend re bi kêf be? Eger mêr pê bizane ku wê hez ji yekî din dikir, dê çî bike? Hevalên wê, dê çî jê re bibêjin?

Min ev babetên jiyana hilbijartin, ji ber dizanim, dê her xwênerek, hinek xalên din di ser ve zêde bike û hinek pirsên min nivîsîne nepejirînin.

Êdî xweşiya xwendinê ev e. Diyalog, dê ne tenê di hundurê çîrokê de bimîne, belê wê derkeve derveyî wê û pijkên wê li xwêner jî bikeve û ew dê di gel xwe diyalogek nehênê bike.

Hem xwêner bi buyer, leheng, cih, dem û civakê biramê û hem jî hişekî pêkolkirina guhertinê peyda dibe.

Kurtçîrok rê nadit, ku vebêjê dirêj be, an jî bi wateyêke hunerî, hevok ên kurteçîrokê kin, puxt, tîr in. Di kurteçîrokê, rê ji çîrokên di ber nijyara bingehîn re nîne, xwêner bi wan hevokên xwe, derbasî tekstê rewş û pergala dike.

Xwegotin û xwevebêjî di kurteçîrokê de, di hundurê diaylogê de bi pêş dikeve û danûstendinên pirsan li nik xwêner çêdike. Vebêjî dikare mîna fîlmekî dengê diyalog û danûstendinê têkel bike.

Di kurteçîrokan de, serê tayî dive bikevîte destê xwêner, bi çî şêweyî be nexem e, çî matmayîn be, jinişkevebûn, ken, girî an jî hungirîn û kêf be.

Jêder:

- يوسف الشاروني, القصة القصيرة
- Wicki pedia, short stories

Bingeha tiyoriya romanê

Roman çi ye?

Roman wek zayendekî toreyî, ku em beramberî helbestê, dastan, efsan û çîrokê biken, hîn taze û nû ye. Ziman, çêlîka şoreşa bajaran e. Dastan û efsane, li ser zarêd dengbêjan dihatin gotin û veguhestin, helbest jî ji ber rîtma wê ya bi sanahî zû dihate ezberkirin û veguhestin.

Yekemîn car têgeha Romanê, di sedsala 12an de, li Fransayê peyda bûye û bi vî şeweyî pênasîna wê hate kirin: “Çîrokek dirêj û kurt e, vegotinek pexşanewî ye, li ser çarenivîsa civakekê û jîngehê tête vegotin”¹ Nivîsînên li pêş sedsala 12an, ku bi romanî dihatin nivîsîn, ji wan re roman dihate gotin, ji ber zimanê miletî jî weha bi nav dibû (linguaroman). Di sedsala 13an de, vers û pexşan têkilî êk bûn, peyvêd kevin wateya xwe ber bi edebiyatê û toreyê ve guherand, û hin bi hin vî têgehê wateya xwe fereh, zelal û bi sînor kir, ta giha sedsal 18an û wir da, têgeh ber bi asoyên din ve çû, lê di çarçewa toreyê de, heta îro maye û derneketiye, ku roman bûye diyardeyeke piralî “Phänotyp”. Romanê di dema nû de, wateya xwe ya taybet ber bi pêş ve bir û îro roj hemerengî û şeweyê xwe bi gavên mezin bi cih kirine û bi hemerengiya xwe jî li def xwêner hatiye pejirandin.

Eger em seh biken û bişopînin, dê bibînin ku roman piştî

şoreşa pîşesazî bûye weke xwarinê ji xwendevanî ra û roj bi roj rola wê mezin dibit.

Wek diyar û nas e, li welatên rojhilatê roman ne ji demeke dirêj ve ye, bo nimûne, li def ereban, ji sedsala 20 ve ye û serkêşên wê Cemal Xeytanî, Taha Husên û Nejîb Mehfûzê hilgirê xelata Nobêl in.

“Roman, nivîs e, deq e. Ew deq e, ku xwendevan xwe di nav bûyer û naveroka wê de dibîne.”

Roman çarenivîsa cîhana mirovekî diyar diket. „wate roman mirovekî, lehengekî û kesayetiyekê dikete xala bingehîn di nivîsê da û buyer li derdora wî û bi wî diçin û tên. Bêguman divêt ev kesayetî xwedî taybetmendiyan ciyawaz bin. Dema destpêkê ya roman, nivîserê romanê serpêhatiyêd xwe bi rengê wêjeyî, toreyî dinivîsîn. Wate, romannivîs bi xwe lehengê romanê bû. Kêm zêde, roman kesayetiya nivîskarî raçavî xwendevanî dikir.

Roman çarenivîsa bûnewerekî, karûbarê civatekê, behweriyekê û derdora wan nîşan dide û raportan li ser wan dide, wate, mirov regez û elementê sereke ye, di romanê de. Mirov di romanê de, navenda bûyeran e. Bermayî, bîranînên zaroktiyê û derdor û hêl, dibin xemla romanê, wate sê regezên sereke ji bo romanê hene ku her roman nikare xwe ji wan rizgar bike:

1. Leheng ên romanê (fîgûr=Leheng û kesayetî)
2. Dem di romanê de

- a. dema nivîsînê
- b. dema romanê
- c. dema xwêner

3. Cih di romanê de

Tevna vehûnana romanê,

4. Struktûra romanê jî regezekî sereke ye, di avakirina romanê de.

5. Makdera rewşenbîrî ya romanê, ku bi xwe carnan dibite rewşbîriya romannivîs.

Ji xwe rengeroman hene, wek romana dîrokî, zigurdî, romana cengê, ya ger û geştê, romanên siwariyê, evînê, feylesofi û romana ziman î ya modern, ku hemî zayendên toreyî dikare himbêz bike.

Li dor mercên vê de, têkiliyên vebêjerî ne, beramber kurteçîrokê û novelê ya mezintir e. Wate rûpelêt wê pitir in.

Kesayetî/ fîgur

Ji ber ku her nivîs ji hêla mirov ve, tête afirandin, dê mirov jî faktor, ekter û rolgerê herî sereke di nivîsê de be. Wate xalê pêşî, pêşberî xwendevan(mirov) bibe, dê kesayetî/fîgur/leheng be. Parçeyê herî girin di romanê de, li nik yê xwendevanî kesayetî ye. Pêdivî ye, bi hest, nest û handanên xwe jîndar be. Kesayetiyên romanê, ji kesayetiyên rastteqîne, kûrtir û zelaltir in.

Kesayetiye çalak ye romanê ji kesayetiye bi rastî heyî ciwantir, kirêttir, çalaktir an jî tirsonektir in. Ye xwendevan jî dixwaze, di romanê de, kesayetiyeke xwedî taybetmendiyekê, ne yeke ku rojan her karê roja berê diket bibîne. Ji bo romanekê, kesayetiyeke lidijhev, bikarhatî, çalak têrê nake. Ye xwendevan dixwaze romanekê bixwîne, ku ne rotin û wek ye berî xwe bin.

Dema her dahênerê/xwendevan/rexnegir, li ser deqekî romanê raweste, di destpêkê de, kesayetî tê ber çavê wî û di hişê wî de form û naveroka wê kesayetiye diçe û têt. Kesayetî di romanê de, mîna dil e, di jiyane de bo mirovî. Kesayetiye romanê dikarin, aloz û bi raz bin, lê herdem jî mirov dikare wan bi yek ji wan pênc hestên xwe hest bike. Nivîsîn, an jî vebêjiya kesayetiye bi sewda, hest û rastîberçavangirtinên xwe, girêdayî wê hindê ne, ka ta çi pêpelokê kesayetî dikare serdestî alozî û astengan be. Ji ber wilo jî, kesayetî li def xwendevanî, tete, dîtin, hestkirin û nêrîndarkirin.

„Paradoksa çiroka vebêjiyê: Di destpêkê de, karakterê(cirr) kesayetiye heye û divê bi wî karakterî dest pê bibe, ji bo-ji bo çi vê çirokê dibêje û mebesta wî jê?-bête têgehiştin.1 Fîgur û kesayetiye romanê bi gelek şeweyan tîn bikaranîn, hin ji wan hêsan in û hin jî aloz û kompleks in. „, lê çendî rola kesayetiyan di deq de, bingehîn, an jî perawêzkirî be û çendî nav û kiryarên wan belav û belawela bin, an jî jêderên

wan winda yan jî diyar bin û çawatiya wan çawa be, dimîne regezê herî nêzîk bo dilê xwendevanî, ku li ser biaxive.“**2**

Fîgurên romanê kesayetiyên sereke, an perawêz bin jî rola her yekî heye. Kesayetiyên sava û hêsan, alîkariyê di xurtkirin û bihêzkirina çîrokê de dikin û interesa xwendevanî ji bo xwendina romanê pitir dikin. Pêdivî ye, axaftina her kesayetiyekê di gel rola wî bigunce û eger ne wisa be, dê tekst qels bike an jî dê xwendevan dûtî xwendinê bike. Nasnameya kesayetiya bêjeriyê, di hundurê deq de, ne pir azad e. **R. Barthes** dibêje: “**kesayetî enacama karekî afrander e** „**3**.

Kesayetî di lêkolînên piştî nijyargeriyê de, mîna rênîşanekê (**signe**) lê tete nerîn. Wate du dîmenên wan hene. 1. **Rênîşanderî (Signifiant)**. 2. **Rênasberî (signifié)** Xwendevan dixwaze bi kesayetiyên romanê re bibe dost an jî dujmin, dixwaze hûrgiliyên wan bizanibe. Ji xwe di avakirina kesayetiyên aloz di romanê de, divê wisa agahî li ser wan an jî derdorên wan hebe, ku xwendevan ber bi asoyên mijûlî û lixwevegerê ve bibe.

Cirr û karekterê kesayetiyên romanê tene damezirandin, dema xwendevan hest bike, ku tişt jê kê m e, ku ew bi xwe bibe ew. Wate çawa kesayetî dikare xwe materiyalîze bike.

Mary W. Shelley (nivîskareke ji „Frankenstein“ e). dibêje: „ bila rêza me ji kesayetiyê re ne Sampatî û hezkirin be“**4**. . Li

vir diyar dibe, ka ta çi radeyê xwendevan beşdariyê di avakirin û dewlendkirina kesayetiya romanê de dilîze. Ji bo em bikaribin, baş di kesayetiya romanê de bigihin, pêdivî ye em vegerin xeslet, cihê jêhatî û rabirdûya wî.

Karektera mirov di hewa û seqaya civakê de perwerde û xwedî dibe. Bo nimûne, di Romana **Helîm Yûsiv** de (**Gava Masî tî dibin**), Masî û Rênas ji du cihên cuda ne (di gel ku kuramê hevin, lê nizanin), yek li Amedê mezin bûye û yê din li Binxetê. Wate du sîstem û du civakên hinekî cuda. Yek dikeve nav refên Girîla (Rênas, ku zewicî ye û zarokek wî heye), ji ber ku zimanê wî qedexe ye, mafê wî tête xwarin û keça wî nikare bi kultûra xwe perwerde bibe. Lê Masî dikeve nav refên Girîla, ji ber ku Berfîn dît, jê hezkir û da pey şopa evîna dilê xwe. Ev, şêwe çûn û derbederbûn, Şêxê Sen,ianê Feqiyê Teyran tîne bîra me. Eger li Cîhanê jî em temaşe bikin, yekî ku here zanîgeha Oxfordê, nemîna mirovek li Harlem (Newyork cihê belengazan) dimîne ye.

Di nêrîna lêkolînerên derûnnasiyê de, pêdiviyê karakterê kesayetiyên, bi kêf, şermok, bizdonek, tenaz be, hest bi gunehan bike ûtd, her wisa jî pêdivî ye, zîrek, tembel, xwedî taybetmendî be. Ez ne bi mebesta, ku divêt romannivîs derûnnas be dibêjim û ew jî jê nayête xwestin. Belê pêdivî ye, li suruşta kesayetiyên xwe bikole, têbigebe û fêr bibe, bo çi mirov weha dikin? Çi dikin û çi dibêjin?. Ev xalên wisa giring in, ku nivîskarê romanê bo avakirina kesayetiyên xwe xebateke bêhempa, di hemî hêlan de bike. Van tiştan

hemian, mirov ji derdora xwe dizane û tenê bi wê zanebûnê mirov bi xwebawer dibe û karê xwe baş dike. Eger **Ibrahîm Sîdo Aydogan**, jîngeh, dever, exlaq û asteya xelkên xwe, tona dengê Mobîla Nokia, nizanîba, nikarîbû, di romana xwe de, ya bi navê **Leyla Fîgaro** serketî be.

Qehewexane û çayxanên Amedê bo lehengên xwe kirin qada çûn û hatinê, qada rev û xweveşartinê, qada tîtal û irf û adetan. Ev hemî ji ber ku dever nas dikirin û lêkolîn li ser kir û biyavên hişên kesayetiyên xwe berbi asoyên vekirî ve birin. Wisa jî bixwebaweriyek bo xwe û kesayetiyên romana xwe peyda kir.

Di romanê de, kesayetî dikare bibe rênîşander û dikare bibe rênasber. Dema ku vebêjer, ango kesayetî agahiyan dide, dibe rênîşander û dema li ser wî bi hevokên kurt agahî têne dan, hinga dibe rênîşanber. Xwendevan jî ew e, yê dixwaze bizanibe, ka kî çi got û çi kir û çawa kir? Lewra wêneyek li nik peyda dibe di rêka: „

1. Agahiyên ku vebêjer vedigêre
2. Agahiyên kesayetî bi xwe vedigêre
3. Encamên xwendevan di rêya naskirina kareter û sincên kesayetiyên re.“**5.**

Avakirina kesayetiyê:

Xala her pêşî, bo avakirina kesayetiyê tête hizra romannivîsê, binavkirina kesayetiyê ye. Ev xal jî bi kiriyar û

axaftinên kesayetiye ve girêdayî ne. bi nêrîneke hûrbînî li van herdû xalan, kesayetiyeke tekstane, ku cuda ye ji kesayetiye realîter, tê damezirandin. Hinek navên ku layîqî kar û peyvên wan, li kesayetiye xwe dikin. Bêhtirîn nivîskarên kurd û li ser serê wan xwedê jê razî **M. Ozün** (Bîra Qederê, Mirina Kalekî rind), ku navên layîqî kiryar û rolên wan li kesayetiye xwe dikin û hin nivîskarên din hene, bizavê dikin, ku navekî li dijî kiriyar û peyvên wan li kesayetiye xwe bikin. Bo nimûne: Helîm Yûsiv (Gava Masî tî dibin). Ev binavkirin, pêdivî ye, nexweber be, wate tenê hatibe hizra nivîskarî û lê kiribe, belê nivîskarê serketî, nav mîna bombeyeke nîşaneyî derbasî nav tekst dike. Nivîskar, kesayetiye xwe dipêve, lêdikole ji hêla derûnî û civakî ve. Wate binavkirin dikare bibe kilît û gelek dergêhên girtî, di hundurê tekst (Roman) de veke.

Ji hêla xwendevan ve jî, kesayetiye tete lêkolan, daneberhevkerin bi kiryarên wî re, bi hest û hundurê wî re. Nivîskar kesayetiye dadimezirîne û xwendevan alîkariye di afirandin, kemilandin û bilindkirina wê de dike. Hinek dahêner stratîjiya xwe bi tevayî ji bo liva kesayetiye xwe dideynin. Bo nimûne, nivîskarê me Jandost, di romana xwe ya dawî de, Martîne Bextewer, li nav pelên dîrokê geriyaye, navê diravên wê demê derxistine, li dîroka bajarokê Herne kola ye, qeşe û petrikê wê de, kî bûn zaniye. Li dîroka bazirganiye, bo bajarê Heleb, Şam û Felestîne, kolaye û xepartiye, daku bizanibe, çi rengê kaxezan bûn, europiyan bo firotinê tanîne rojhilatê û astengiyên xwe yên zimanî, çawa

çareser dikirin. Eve bêguman pêdivî bi danana konseptekê û stratîjîyekê bo romanê hebû û ez bawer im, evê planê gelek dem jê wergirt û stend. Ev stratîjîya hanê, kiriyarên kesayetiye û liva wê di hundurê deq de, destnîşan dikin. Mîna Grimas gotî: „rola kesayetiye ya kiriyarane dadimezirîne“ 6

Xwendevan rûbirû bi kesayetiye re dibe, çavdêriya rolan dike, peyvên kesayetiyan dike, dengên biyanî di peyvên wan de dike, kartêkirina rewşenbîriyê li ser wan, dengê civakî, dengê tenane dike, wan vedigerîne jêder û makderan. Lê hinek dahêner(xwendevan) hene, kesayetiye tenê regezê tekstane dibînin, ew kesayetiya tekstî diafirînin. Ya herî rast, xwendevan biyavên nîşanane di hundur, liv, axaftin û kiriyarên kesayetiyan de destnîşan dike.

Di kurdî de jî, mîna yên Mihemed Ozün, kesayetiye wî xwedî lêvegerên dîrokî ne, mîna Mîr Celadet, Memduh Selîm Beg, lê hin jî xwedî lêvegerên kiriyarên rûdanên civakî û siyasî ne, mîna Masî, Li def Helîm Yûsiv..

Nêrîna min, eger nivîskar kesayetiye xwe, li ser bingeha lêvegeran damezirîne û pala xwe bide jîwarî û hebûna wan di rastiye de, dê nivîsa xwe dûrî demên bîn (Paşeroj) de bike. Kesayetiye xwedî lêveger, kesayetiye demên buhrî ne, ne ye dahatûye ne. Lê ji nivîskarekî bo ye din û li gorana stratîjîya romanên wan tene guhertin. Eger nivîskar/dahêner, kesayetiye demên buhurî bikar bîne, helbet dê bi asteya

hizrî ya wan ve û mentiqê wan ve jî girêdayî be (Ta radeyekê), dê êdî tekstekî dûrî xwe û nêzîk yê din û bo yê din biafirîne. Dibe ku wan binivîse, lê dikare bînwana kesayetiyên dîrokî bîne qûnaxa em tê de.

Dem di romanê de.

Dema tekst.

Pirs ber û hêla nivîsê û xwendinê destnîşan dike.. Ivor Armstrong Richards

„ Di rojêke yekşemê beriya nîvro de, li destpêka saleke xweş; kurekî firoşger ji pragê, bi navê Georg Bendemann, di jora xwe de, nameyekê bo hevalê xwe yê dema zaroktiyê, ku demek dirêj penaha Petrsburgê bûye û nedîtibû, dinivîse. Georg diramê, ka pêdivî ye, ez wî hevalî pê agahdar bikim, ku ev ji demeke kurt ve, bûye bi dezgîn. Di dawiyê de, wî li ser plana zemawendê dengkir û derbasî jora bavê xwe bû, ku eve çend meh in, ku pi yê wî bi wir neketibû“ 7

Li vir **Franz Kafka** demê dike, mertalê xwe û derbasî hundurê wê çîroka xwe dibe, daku desthilatdariya bavê xwe nîşan bide û intîqamê ji wê serdemê bike.

Dem diyardeyê kevin e. Mirov ev diyarde ji zû ve naskiriye û vê nasînê, berdewamî daye hebûna wî. Ev têkiliya di navbera mirov û demê de û berdewamiya wê, wateyê mirovayetî daye demê û dem bûye parçeyek ji serpêhatiya wî. Ev sedem e jî, ku mirov herdem xwestiyê,

demê bixe bin kontrola xwe û xwestiya desthilatdariyê li ser demê bike.

Dem bûnewerekî herdem zindiyê mirî ye. Dem di hişê mirov û serpehatî û wijdanê wî de kûr e, ji ber wan têkiliyên xurt û bi hêz di navbera wî û demê de.

Dem hilgirê agahdana mirin û jiyana mirovî ye.

Dem tişteki wisa, ku mirov zane û nizane çî ye.

Augustîn di bersiveke xwe de, li ser pênasîna demê dibêje: „, dema ji min nayê pirsirin dizanim û dema tête pirsiyarkirin nizamim“ **8**.

Ji bo ku em ji babeta xwe dûr nekevin, dê bizavê bikim, ku di çarçewa tekst (deq, heyber) de, dem, biyav, nîşan, teknîkên dema tekst û destnîşankirinên dema tekstî li ser van çend xêzan belav bikim.

Bêguman, nivîsa li ser demê di pexşaneyê (roman), cihê rawestanek berferah e, lê ji ber sedema belavbûnê, di mediuma rojnamê de, dê bi kurdî rêz bikim. Gava em li ser demê diaxivin, pir pirs, di hişê me de rûdidin û serî hildidin.

1. Dem çî ye?
2. Em çawa dikarin demê destnîşan bikin?
3. Erkê wan nîşanan çî ne?
4. Dem çî wateyê li deq zêde dike, li çî deq zêde dike?
5. Ew wate, dikarin bi nêrînekê li ser tekst derkevin?

Biyavên demê di tekst de

Gelek nêrîn û guftûgo li ser vê babetê ji hêla literatûrzan û rexnegiran de, hatiye kirin. Dê nimûneya Michell Botour û Z. Teodorv li vir deynim. M. Botouré sê deman di tekst de destnîşan dike „ dema nivîsînê, dema xwendinê û dema xwelinavxistinê(muxamerê)⁹“. Z. Teodorv, demên deq li gor vebijîya tekst destnîşan dike û dibêje „ dem ên hundur û dem ên derve he. Demên derve.

Dema nivîskar, dema xwêner û dema dîrokî. Dema hundur, dema çîrokê, dema nivîsînê û dema xwendinê“ **10**.

Hinek dem hene, em nikarin, lêkolînê li ser wan bikin, dema dema nivîser û nivîsînê û dema xwêner û xwendinê, ji ber ev dem bi çêja wan ve girêdayî ye, ne bi dema tekst ve, ku lêvgera wê tenê tekst e.

Nivîser û xwêner, dikarin rûpelekî bixwênin û binivîsin û piştî duh salî din dest pê bikin.

Em kîjan demê behs bikin!/? Dema tekst, dema qewmîna buyeran e, qûnaxa buyer tê de rû daye. Dema tekst ji nîşana pêya demê di tekstî de dest pê dike. „*Di rojeke yeksemê beriya nîvro de*“ **11**.

Ev dem jî bi dawî tê, bi nîşana dawî ji demê di tekst de.

„**çend meh in**“ **12** “

Di bikaranîna demê de, gelek caran nivîser bi xwe destnîşan dike, ka wê çawa bi kar bîne, yê bi kronolojî, ango demê bi rêzê li dûv hev, an jî ji nîvî, ya ji dawî (Falshback). Ya giring, ku dema realîte û dema deq têkilî hev nebe û ne bi pîvanekê bêne pênasîn.

Dem û nîşanên wê di tekst î de.

Ev nîşan di pêvajoya deq de, xwe di çend teknîkan de rûdidin.

Nîşanên demê yên pêşî, ku li ser şilîta nivîsînê derdikevin, nîşan ên ku mîna hevok, mîna kîte û nîşanên rêbazane. Her nîşanek ji wan jî bi şeweyekî şirove dibe. Bo nimûne **Nîşana demê** wek de. Ev sê qûnaxên wê hene.

1. Netîşteq, wate ji sifrê dest pê dike. Sifir di demê de jî dema niha ye” Niha ez diçim bazarê.
2. Beriya niha,(dema buhurî). Berya 2 salan, min tenê helbest dinivîsandin.
3. Dema hîn nehatiye. Piştî salan, wê bajarê min bibe simbola pêkvejiyanê

Hevok û nîşana demê:

Ev nîşan di rêya vebêjiya hevokê de tê, ne di rêya lêker, an lêkdanê de.

Eger av hebe, wê dar û ber, kesk bimînin. Ev hevok, nîşana dema nehatî destnîşan dike, lê ya rast, ev hilgirê dema kevin, ya beriya niha ye, ji ber, ku ji komek serpêhatiyan ev hatiye. Carnan pêdiviye, em hevokê ji hêla hiş ve, li ber çavan deynin, da bizanibin, eve nîşana çi demê ye

Kîte û nîşanên demê:

Xwêner dikare di pêvajoya vebêjiya deq î de, binase, ka eve çi dem bi kar hatiye.

Bo ninûme: Agah lê hebe, derbê ji pişt ve, li te nede, eve wekî mar e“ Ev jî dema buhurî ye. Wate nîşana karên wî yên bêdelêl, encama bihevrejiyanê û serpêhatiyekê ye

Rêbaz û naskirina demê:


Di vir de, xwêner ji şewazê nivîsîna nivîserî derdikexe, ka eve çi dem e, ew jî bi awirdanekê, ka çi peyv pirr bi kar aniye û ew peyv, girêdayî çi demê ye. Nimûne.

„peyva çûbû“

Teknîkên dem tekst:

Di tekst î de, aheng û rîtma wî heye, ka sivik e, giran e, an jî berebere(paralel) e?

Hinek nivîser hene bi demê jî dilîzin.



Wate û erkên demê di hundurê Tekst de:

Dibe ku nezelal be, an jî nivîser bibêje ev nekarê min e, ez pir xwe bi demê re mijûl bikim.

Lê ya rast, dem regezekî here sereke di nivîsînê de ye û kempasa(Bûsîle) nivîsînê ye. Di çiyar de, mirov pêdivî demên berê sibehê û berêvarê ye. Di beyabanan de, dem miriye, lê dikare neperawêzkiî jî be. Axaftin û vebêjî di buharê de, di hundurê tekst de, wateya wê cudatir e ji dema payîzê, an her werzekî salê yê din. Wateya demê, ne dicihekî ji nivîsê de diyar dibe, belê di vebêjî û siyaqa deq tevî de diyar dibe. Di deverên ku dem tê de negiring be, dema buhurî bi kar tînin û serpêhatî û jêhatbûnên bavûkalên xwe tînin bîra xwe. Di jiyarê de jî wisa ye, dema mirov ne yê serdema xwe be û nikaribe mîna mirov şopa xwe bihêle, xwe davêje dara malbatîyê.

Teknîka demê di nivîsê de, behweriya yê dahêner ji demê diyar dike. Demê mîna ,,

1. Bûnewerekî nijyargerî di deq de dibîne
2. Teknîkeke tekstane bilind dibîne
3. Nêrînek eksîstensiyêl (Wicûdî, hebûn) ya dahêner ji qûnaxên dîrokî dibîn.“ 14

Di dawî de, dem di romanê de, bûnewerekî sereke ye, gelek hêlên veşartî yê nivîser derdixe, her wisa nîşaneke bo biberveçûna mirovî ve, bi demên buhurî, an yê demên nehatî ve.

Pirs ber û hêla nivîsê û xwendinê destnîşan dike.. Ivor Aremsstrong Richards

Cih û fezayê Romanê

Di romanê de, rola cih roleke sereke ye. Cih regezê giring e di avakirina romanê de. Di cih de buyer diqewime, di cih de leheng dilive.

Cih dibe boşahî (Space) û hemî regez û karên romanê himbêz dike, ciwaneyekê dide wan. Cih têkiliyên di nav buyer û kesayetiyên de bicih dike, atmosfêrekê peyda dike û dibe alîkar bo avakirin û pêşdebirina romanê bo qûnaxên din.

Wate cih hem ew xaka ku leheng li ser digerin, hem buyer li ser diqewim in, hem dem bêhna xwe vedide û hem jî fezayekê bo romanê diafirîne. “ cih carnana dibe sedema hebûna romanekê, carnana dibe armanca kar bi tevayî” 15

Cih di romanê de, ne ew cihê erdnîgariyê ye, ku parçek xak, li deverêkê bi xwe ve digire, belê ew cih e, ku jîngeh, mirov, kul û derd, hêvî, daxwazî, tîtal, nirx û buyerê deverê diqewime.

Cih di romanê de, bûnewerekî çalak bi sere xwe ye, kar dike û kartêkirin lê dibe. *“Cih, di gel kesayetiyên romanê û ramanên wan dikeve têkilî û guftûgoyê, cih bi nivîserê romanê re dikeve gengeşiyekê”16*

Bêguman cih di avakirina buyeran de jî, roleke sereke dilîze, çunku li cihê ku şervan hebe, çiya jî heye. Li vir diyar dibe ku cih bi hemî hêz û rola xwe kartêkirinan li avakirin û tendensa buyeran dike.

Ji ber vê yekê jî, li ser romannivîsî fere ku giringiyeke berbiçav bide cihê, ***“daku hinek mentûq bide buyera çîrokbêjiyê, her wisa jî guhdaneke bêhempa divêt bi yekaneyên cihê, ku kesayetiyên romanê tê de diçin û têtên bête dan, çunkî xwêner êdî bi kûrbûn li nîşan û simbolan, ku hem buyer û hem kesayetî bi erkê veguhestina wan dilîzin, temaşe dike”***¹⁷

Cih di romanê de, dêmên xwe yên bingehîn werdigirin, dema kesayetî dilivin û buyer pêktên.

Ev diyar dike, ku vebêjiya buyeran, boşahiya romanê diafirîne û yekaneyên romanê bi hev ve girêdide û têkiliyên bi hêz di nav wan de ava dike. Bê cih, kesayetî pêrgî hev nabin û buyer jî naqewimin. ***„Cih ji derdorên xwe nayête birîn, cih e yê tiştan ji hev cuda û dewlemend dike“***¹⁸

Di gelek romanên de, navên cihan têtên diyarkirin û dibe xwêner wî cihê binase, lê ya rast ew cihê romanê ne ew cih û dever bi xwe ye. Nivîskar hinek fantaziya di avakirina cihê vedihune, daku ciwaniyeweke cuda werbigire. Nivîserê romanê bi hevokên xwe yên vegêrane, cih di xeyala xwe de ava dike û di rêka wan hevokan re, cih biyavên cuda werdigire û xwe ava dike.

Cihê di romanê de, li xeyala xwênerî radiweste.

Dema romannivîs jî cihan bi nav dike, an jî pesina deveran dide, dîmenê wan bi peyvên ciwan û bedew dike, tenê ji bo hizr û xeyala wergirvan bilivîne, çunkî binavkirina cih, dibe destpêka avakirina cihê romanê.

Feza an jî cih di romanê de, hemerengiya wê geş dike û wê ber bi asoyên cîhanî ve dibe.

Cih dibe dîmenê ciwaniyê û sinorê, ku bo buyer û lehengan hisret, derd û qûnaxa bêhinvedanê ye.

Wate cih hemerengiya cîhanê diyar dike û dibe yarîgeha kesayetiyên. “ *Xala cuda ya romanê, ku ew mozayîka yarîgehê (Cih) dadigire û pêşwaziya figurên di metirsiyanê de ne dike, ku dawiya wan nine, lê wan himbêz dike. Ew li dûvhevbûna windabûna sedemê buyeran di romanê de, diyardeyên normal in*” 19.

Dibe ku xwêner di vê nivîsê de, têgeha cih û têgeha Feza bixwêne û bibêje, ma ev herdû têgeh ne yek in?

Di lêkolînên tiyorî de, lêkolînên li ser cih, an jî feza di romanê de kêma in û ne ji zû ve ne. **G. Poulet** di vî babetî de, bi navê **fezaya Proust î**, nivîsî bû, hemen hemen feza bi wateya cih hatiye.

Daxwaza **G. Poulet** ew bû, ku pêdiviya lîsteyeke morpholojî û funksiyonê ji cihê romana re bête danîne. Ew lîste nêzîkî lîsteya ku **Philipp Hamon** bo kesayetiyên di romanê de pêşniyar kiribû.

Hinek pênasîn hene, ku feza bi wateya cihê cografî dibînin, çunkî di romanên de, nîşanên biçûk yê cografî diyar dibin, “*bo livandina hişê xwêner û diyarkirinên metodîk yê cihan*” 20

Lê dema **Julia Kristeva** li ser fezayê cografî dinivîse, em cih bi delalatên wî yên şaristanî ve tédigihin. Çunkî feza di rêka cîhana çîrokî û vebêjiyê ve tête damezirandin.

Her cih di her qûnaxeke dîrokî de, rengê ji rewşenbîriya wê qûnax û deverê rûdide, ku Kristeva navê (**Idiologéme**).lê kiriye.

Idiologéme ew tîtalê rewşenbîrî giştî yê qûnaxeke dîrokî ye. Li vir dixwazim bibêjim, ku dema em dibêjin cih di romanê de, wate pesina deverekê têt û dem radiweste. Lewra em dibînin di romanê de, gelek cihê cuda cuda hene. Ev cihên cuda, pêk ve dibin fezaya romanê.

Dema **Helîm Yûsiv** di romana xwe ya bi navê „ Gava masî tî dibin“ behsa wan çiyên dike, an jî her deverê ku Girîla şer hebûnê lê dikin, mebest jê ku atmosfêrekê biafirîne û nexweşiya jiyana Masî di wê rewşa zor de bîne ber çavan.

Her wisa jî di rêka vebêjiyê de, bayekî, boşahiyekê û fezayekê wek name bo xwêner dihinêre û xwêner wê jiyana sext û zor ya girîlan li wan deveran wek name werdigire û bi wî çavî li berxwedana wan kesan, di kesayetiya Masî û hevalên wî de, dinêre. Evîna wînda ya Masî û Befrîn jî carnan dibe qurbana siloxan û behweriyan.

Lê di romanê de, cihekî din heye, ku jêre tête gotin, cihê tekst.

Ev cih, cihê ji navnîşanê li ser qewarê pirtûkê, ta dawiya pirtûkê ye û belavkirina wê nivîsê li ser wan rûpelan e. Bi kurtî em dikarin bibêjin, fezayên(Space, Raum, L'espace) romanê, ku ji cih mezintir e ev ên jê in:

- Fezayê cografi
- Fezayê tekst
- Fezayê nîşaneyî Sementîk „ delalî“ ew wêneyê ku li ba xwêner peyda dibe.
- Dema xwendina romanê. Wate zimanê vegêriyê, vî fezayî diafirîne.

Di dawî de, regezên ku Feza” boşahî” dadimezirînin û ciwaniya deq ber bi asoyên dûr ve dibin û ciwanî digihe pileya dahênanê, ew cih û deverên di rêka vegotin û vebêjiyê ve diyar dibin. Feza jî wan deveran digihîne hev û têkiliyên cuda di navbera wan de girêdide. Destnîşankirina cih û bigewdekirina wî di romanê de, dihêle ku xwêner bendewarê pêkhatina buyerên cuda be.

Em dikarin berheviyekê di navbera cih di roman ê de û dîkor û text di şanoyê bikin. Çu buyer bêy ku li cihekî rû bide nîne, lewra pêdiviyê romanivîs vegêriya xwe bixin qewareyekî cihane de. Hinry Mitterand, di pirtûka xwe ya bi navê “vegêriya romanê” behwer dike ku, cih e yê vegêriyê pêktîne û bi vî şêweyî, diyar dibe ku çîroka xeyalê nêzikî rastiyê dibe.

G. Genntte li ser giringiya cih di romana (**M.Proust**” gera li dema winda”) weha dibêje: “ *xwêner her dem dikare seredana wan cihên nepenî bike, wisa difikire ku dikare li wir bimîne û bijî*” 21

Zimanê Romanê

Ji ber ku ev zayendê toreyî, (roman), gelek dergehan li ber zimanî vedike û hevsar bi dev zimên ve berdide, , lewra bûya sedema ku gelek nirxvanên toreyê xwe bi mijara zimanê romanê ve mijûl bikin.

Di kurdî de û bi tabetî zaraveyê kurmanciya jor, kê m nivîsîn (li gor tiştê, ez pê agahdar), li ser vî mijarê giring hene. Dibe, ku nivîsîn li ser zimanê vê romanê an ya din be. Bi kurtî, di nav lêkolînekê de hatibe, lê wek teyorî bi taybet, ez jê neagahdar im.

Zimanê Romanê û nêrînên cuda

Zimanê romanê bi gelek şêweyan, ji hêla lêkolîner û rexnegiran ve tête nêrîn. Serederiya hindê rexnegir û lêkolîneran di gel zimanê romanê ew e, ku ziman mîna metriyalekî derbirînê, hilgirê hizir, naveroka tekst û biyavên wî yê lêvgerê didîtin û dibînin. Beşekî din, zimanê romanê bi şêweyê, rewanbêjîyê (wêneyê helbestî, daneberhekirin, bedewiya ziman, hêzbûna ziman, hêsanbûna ziman, sivikbûn, an jî ziviriya wî) didan ber pirs û lêkolînê. Wate lêkolîna li ser zimanê helbestê dibû, bi eynî şêwe li zimanê romanê jî derbas dibû. Ev şêwe vekolîn, çawatiya romanê, wek zayendekî toreyî din û avakirina vebêjî û derbirîna wê ya zor û hêza wê ya rewanbêjî û lêkdaneyî, li ber çavan nedihate girtin. Hindê rexnegiran jî berê xwe dane zeviyên din, bo

nirxandina zimanê romanê, jêderên ziman yên civakî bi yên derûnî ve girêdidin.

Ziman bi têgehên şiroveya Freud î,(hiş û nehişî, girêdana tekst bi kesayetiya dahêner ve) bestiyê, an jî pabendbûna ziman bi civakê û çînên wê ve, biyavên derbirîna wê ji cenga civakî ve. „*Ziman ber bi jîwariyê û derbirîna şeweyê objektîv yê civakê diçe. Wate Roman û zimanê wê di bin barê îdolojiya abstrakt û propogenda civakî ve ma*“22.

Mijarên stîlîzimê dihatin piştguhkirin. Peyva pexşaneyî, ta bi demeke nêzîk, mîna peyva helbestî û bi wê têgehiştina teng di hate têgehiştin.

Di qûnaxa bihêzbûna zanista ziman (**Linguistic**) de, lêkolîn ber bi asoyên din ve çû. Êdî asteya deng, morfolojî, lêkdan(**Syntex**), amajayî, nîşaneyî (**Signific, Simioloji**), bi şeweyekî zanistî ji hev hate hilweşandin. Şiroveyên nijyargerî(**Structure**), li ser bingeha cimikan (ziman/ axaftin, aksa lêkdanewe/veguhêz, nîşan/danîşan) hatin kirin.

Li ba **Formalîstên Rûsan** û bi taybetî **Michael Bakhtin**, yekaniya romanê ji pirziman, pir dengî û pir şewaz(**stile**), li derveyî sinorê lêkolînên zanistî yên kevneşopî man. Bakhtin, zimanê romanê û geşandina wê, bi rewanbêjiya nû û stîlizma romanê ve girêdida. Di destpêka sedsala 20an de, Bakhtin berferêh li ser zimanê romane nivîsî: „*nirxê wêneyê vebêjiyê*

û zımanevaniyêyê derbirînê û cihê wê wek zayend veğerand“ 23.

Nirxê zımanê romanê têgeh û têgeheştinên nû dane ber vekolînê û wisa jî têgehîna zayendê romanê ji pîvanên helbestê cuda kirin.

Wate, şêwaza romanê ji alav û amûrên rewanbêjîyê yê kevneşop bi dûr ket û ta radeyeke baş xwe ji wan azad kir. Em dikrin bibêjin, ku bi tegehînên nû dewlendkir, bêy ku ji taybetmendiya zayendê romanê û qalîteya wê kêmbike.

Dema ku roman ji wan alavên rewanbêjî kevin xelas bû, şêwazî(Stilizim) pêdivî bi têgeh û têgehînên xwe yê teknîkî nû ji xîtaba romanane bi xwe bû. Ev şêwe lêkolîn, berê xwe da xîtaba romanane (vegêriyê) û xwe ji wan alavên ku pê xîtaba helbestî (Wêne, Rîtim, rewanbêjî, peyvên hîlbijartî) tête şirovekirin û têgehiştin azad kir û nema êdî kirin merc bo vekolîna li ser pexşaneyê. Ev şêwaza Bachtînî, „*dîmenên resenane yê pexşaneyê diyarkir û sinor û çarçewa wê reseniyê bi xwe jî destnîşan“ 24* kir

Bachtîn di herdû pirtûkên xwe de,(**Das Wort im Roman. In: Die Ästhetik des Wortes= peyv di romanê de, û Formen der Zeit im Roman= formên demê di romanê de**) têgehên nû di lêkolîna zımanê romanê de, derbasî termînolojiya stîlîzimê: mîna monoloj, bileofon, hemerengiya wêneyên romanane, diyalog, hevdeq(Intertextuelity), parodîs. Ev têgeh ji bo lêkolînê bioethik û semantic, teoriya ciwaniya wergirtinê bûne bingeh û yê mîna **Julia Christiva** bo lêkolînên xwe yê li ser roman û helbestê kirin bingeh û sûdek mezin ji wan

wergirtin. Bachtîn zimanê romanê ji çarçewa wê ya ferhengî û hevwaterî derxist û gihand avakirina deqekî romanê ku piştî xwe bi biyavên pexşaneyî, pirdengî, têkelbûna xîtab û şewazên zimanewanî bi hêz dike.

Lewra jî Bachtîn cudabûnek kire nav romana monolog û ya bileofonig de.

Cudabûna di navbera romana monolog û bileofonig de: Romana monolog:

Di behweriya Bachtîn de, romana monolog, romaneke îdolojîk e, bi dengê ye û şeweyekî vegêriyê bi kar tîne. Di romana monolog de, vebêjer hertiştî dizane. Ziman li hev dubare dibe, rîtemek bi tenê heye. Stîla nivîsînê jî bi yek şeweyî ye. “Ev nêrîn bi tenê li ser romana monolog ya li Rûsiya bû”. -Lê nayê wê waterî ku romanên monolog hemî wisa bin. Bo nimûne, romanên Franz Kafka, Jams Joice, Himengway, Virginia Wolf, di hêla xwe ya hunerî, pirdengî û vebêjiya guhêrbar de, dighin hevraza hunerî û ciwaniya toreyê-. Nivîskarê vî şeweyî, çarenûsa leheng û vebêjerê xwe bi xwe destnîşan dike. Nivîskar desthilatê mutleqe li ser tevin û metna vebêjiyê, ya leheng û tekstî.

Romana Bileofonig:

Romana pirdeng, vebêjiyeke(vegêrî) berfireh e, zayendên cuda û cîwaz, cudahiya nêrînê vebêjiyê û zimanewanî ye.

Romaneke, ku biyaveke mezin bo xwêner dihêle. Xwêner, li gor ku bo wî digunce, xîtaba xwe li ber çavan bi nêrînên cuda vedirêse. Nivîskar şeweyên cuda û hemereng ji ziman, name, pesin û tevnê bi kar tîne.

Di hundurê zimanî de, dikare zaraveyên herêmî cuda bi kar bîne, her wisa nîşanên intertextualite, lêvegerên dîrokî, hunerî, wêjeyî, felsefe, ragehandin û olî jî. Bi kurtî, romana pirnijyar, pirdeng û pir zayend e. “*Romana demoqrasiyê ye, di tevna xwe îdolojîk, avakirin tekst û zimanewanî de*”.²⁵

Zimanê romanê, hunerî, ciwanî û rewşenbîriya romanê destnîşan dike. Bi destnîşankirina van hersê stûnên guhêrbar yê romanê, nivîskarê romanê ji hêla têgehiştina wî di wan her sê waran de jî diyar dibe.

Zimanê romanê bi şeweyê romanê bi xwe ve girêdayî ye. Zimanê asayî û sade bo romana realist, naturalist û şeweyê romana modern. Zimanê kevnar, di gel wêne û wekhevîyên bo romana kevnewarî ye. Zimanê helbestî bo romana zimanî tête bikar anîn.

1. Zimanê fotogirtin an jî yê asayî:

Ev zimanê asayî, zimanekî pir bi jiyana rast û rasteqîne ve girêdayî ye. Piştî xwe dide, repotaj, têgehînên teknîkî, belge û carnan bi buyerê re dibe yek bi yek, wate buyerê vediguhêze, bêy ku erkên ciwanî(estetîk) li ber çavan bigre. Serkêş an jî romannivîsên vî şeweyî Phlopeer, Balzac, Emil Zolla. Di romana modern de jî, ku zimanê sade bikar tanîn, dixwestin rengdêriya şeweyê realîst bidin nivîsên xwe, dûrî

biyavên boşahî û xeyalî, dûrî xejiqînên mezin, ji wan Alan Rob Greé, Natali Sarout, Richardo.

2. Zimanê tradîsiyon û kevnewariyê:

Ev şêwe roman berê xwe dane ziman, zimanê kevnar bi kar tanîn û li derdora wê bi wêneyên ciwan, nîgarkirina ziman, naverok û peyvên tradisiyonel, derbaskirina buyerên dîrokî, zimanê xwe dixemilandin. Romannivîsên vî şêweyî dixwazin bi vî rengî bidin diyarkirin, ku romana wan pirdeng û reng dibe. Bi vî rengî jî em dikarin bibêjin, ku ev şêwe îdolojiya di nav xêzên xwe ve derbasî romanê dike. Di şewaziya nivîsînê de jî, ew nêzîkahiya stîlîzmî û dîrokî di demên romanê yên cuda de, ku roman himbêz dike, peyda dibe. -Demên guhêrbar, demên licihmayî, demên kevin û nû-

3. Zimanê helbestî û mecizaî, an jî romana zimanewanî:

Ev şêwe roman, hêza xwe tev berdide li ser ziman, asoyan li ber vedike. Ziman vebêjyê, helbestê, vegotinê, pexşaneyê, simbol, zimanê bêhtir ji yekwate, bikaranîna xijqînên zimanî, bi kar tîne, bo afirandina ciwanî û estetîkek bêhempa. Wate mîna „*Y.V. Tadié*

dibêje: ziman dikeve navbera axêverê vegotinê û axêver helbesvaniyê“26.

Ev yên me li jor li dor wan nivîsî, dibin regezên binecih yên romanê, lê regezên nebinecih, ku li gor her nivîskarî, her demê, her cihî têne guhertin jî hene û ew jî struktûra romanê, rewşenbîriya romanê, nêzîkahiya rêbazan û baetan ji romanên berdem û hevdem û şêweyê vebêjiya romanê, ger roman EZ, TU, Ew an jî romana bê cihnav.

Lêveger:

1. Sibylle Knauss, „Schule des Erzählens= xwendegeha vebêjiyê“, S.88
2. صبحي الطعان، عالم عبدالرحمن منيف الروائي تنظير وانجاز ص62
3. *Roland Barthes S/Z*. Frankfurt/M. 1987, Suhrkamp. ISBN 3-518-28287-5 [S/Z, 1970]
4. http://www.fantastik-online.de/kw/k/schreib_a/kw_k_schreib_a002.htm
5. بنيه النص الروائي من منظور النقد العربي د. حميد الحمداني ص51
6. محمد مفتاح دينامييه النص ص105
7. *Kafk, das Urteil= Hukum“Werke 1-51*
8. *Gesamtwerke Augustinos, 5, s.65*
9. ص19_20 بنية الشكل الروائي_حسن البجراوي
10. تحليل الخطاب الروائي_سعيد يقطين8
11. *Kafk, das Urteil“Werke 1-51.*
12. *Kafk, das Urteil“Werke 1-51.*
13. عالم عبدالرحمن منيف الروائي_صبحي الطعان51
14. ص53عالم عبدالرحمن منيف الروائي_صبحي الطعان
15. - بجاواى، حسن، بنية الشكل الروائي، المركز الثقافى العربى، بيروت، الدار البيضاء، 1990 .
16. يوسف كرم. تاريخ الفلسفة الحديثة، ط5، القاهرة، دار المعارف، 1986م، 222.

17. Lotman, Jurij M.: "Das Problem des künstlerischen Raums in Gogols Prosa= kê şeyên hunerî di fezaya pexşana Gogol da. In: Eimermacher, Karl (Hrsg.): Aufsätze zur Theorie und Methodologie der Literatur und Kultur. Kronenberg Taunus 1974. S.200.
18. مصطفى الضبع. استراتيجية المكان, القاهرة, الهيئة العامة لقصور الثقافة, أكتوبر 1998م, ص60
19. Zur Theorie des modernen Romans Karl Migner: Tendenzen der Romangestaltung im 20. Jahrhundert
20. بنية النص السردي د حميد الحمداني ص. 53 المركز الثقافي العربي
21. المركز الثقافي العربي ص.65 بنية النص السردي د حميد الحمداني
22. Zima, Peter V.: Roman und Ideologie = Roman û îdolojî. Zur Sozialgeschichte des modernen Romans. München 1986.
23. Bachtin, Michail M.: Das Wort im Roman= pey di Romanê da. In: Die Ästhetik des Wortes= ciwaniya peyvê. Hrsg. v. Rainer Grübel. Frankfurt 1979, 154-300.
24. Bachtin, Michail M.: Formen der Zeit im Roman. Untersuchungen zur historischen Poetik. Frankfurt 1989.
25. Der Roman als demokratische, repräsentative Kunstform des bürgerlichen Zeitalters (Hegel, Lukacs)
26. Migner, Karl: Theorie des modernen Romans= bîrdoziya romana moderin, Kröner Verlag, Stuttgart 1970

Beşê cihbicihkirinê

Leyla û Fîgaro ber bi kû ve...?

Leyla Fîgaro romana nivîskar Ibrahîm Seydo Aydogan, piştî Reş û Spî, ya diwemîn e. Ev roman ji weşanxaniya Elma li Istenbolê hate weşandin. Ji 163 rûpelê 21x14 pêk tê.

Dema min ev roman xwend, pir li xweşiya min hat û li her deverê min behsa romanê dikir û min xwestibû li ser binivîsim, lewra jî min çend caran bi hûrbînî xewnd û bi çavekî rexnegirî lê temaşe kir. Lê piştî xwendinek kûr û pir û pirsên ku min ji rêzdar Ibrahîm Seydo dikirin, gîham encamekê ku ez xwe bi destê xwe dixime bîreke bêbinî de û min dest jê berda. Min newêrbû vê rîzîkoyê biçim. Piştî demeke dirêj bi ser de çûbû, dîsan li serê min da, xwe berdim qada nivîsîna li ser romanê, ku divêt bi rastî bibêjim, ji qada şerî ji min re zortir e.

Berahîka ez xwe berdim nav dojecha Leylayê û qedera Fîgaro bişopînim, dixwazim têgeh û têgehîştina xwe ji hêla tiyorî ve li ser romanê biçesipînim, da di dawî de, bizanim, ka gelo Leyla Fîgaro dikeve çarçewa romaneke çawa da?

Cihê romana moderin, rastiya jiyana mirovî ye û hundurê wî meydana vebêjîyê ye, û têgihîştina mirovî ji demê, gerdûn û EZ re pîvan bilind e ya boşahiya hundurîn e. Rastiya helbestiyane di hundurê romanê de, dest ji hûriktîştên realîteyê û caran nerealîteyê jî bi nermahî li gor serpêhatiyên xwe bi realîteyê ve berdide.

Di navbera van herdû nerînan de, jiyana romana moderin serê xwe hildide û berfereh dibe û pêwendiyên civakî, di bergeha nûnertiya helbestî de, ber bi xwe ve dikşîne.

Dixwazim li vir bibêjim, bila xwênerê vê kurtelêpîrsînê hêvî neke, ku ew dê pêngê hukmekî, an jî xalên serkeftî û neserkeftî bibe. Eger xwêner weha bawer bike, dê ew jî mîna Leyla û Fîgaro, ka çawa poşman bûn, dema dev ji hev berdan, bi xwendina vê nivîsê poşman bibin. Ez jî xwendinekê li vê romanê dikim, wek her xwênerekê ku beşdariya nehişmendiya xwe bi tevayî bibe.

Di lêkolînên toreyî de, mijara xwendinê bi du terzên cuda hatine pêşkêşkirin:

1. Bi pirrengiya xwêneran ve girêdayî ye, ji hêlên civakî, dîrokî, pirane an jî yekane ve.

2. Bi wêneyê takexwêner ve, ku ew karekterekî taybet e, an jî vebêjerek e.

Bêguman di navbera van herdu nêrînan de xaleke winda heye, ew jî ev e: zeviyê xwendinê û şêweyê xwendinê bi xwe ye. Ev jî ji xwênerekî bo xwênerekî din cuda ye.

Lê xwendin çawa be û çilo bibe, bila bibe, pêdiviyê qadên diyar û elementên nebeşdar amade bike. Li vir dixwazim bibêjim ku Romana LEYLA FÎGARO ne tenê dihingivê réalîteyê, belkî wê diafirînê. Dixwazim weha dest pê bikim: Gelo çawa deqek dikarê bihêle em gerdûneke xwe ya sîberane ava bikin? Kîjan hêl ji Romanê dihêle em berhemekî ava bikin di dema xwendinê de? Ê em bi xwendinê re ber bi kû ve diçin?

Ev pirs û gelek pirsên din, dê ta demeke dirêj bêbersiv bimînin, ya rast wê gelek bersiv bêne dan, bêy ku nerînek ya din xîş bike û tine bike.

Xwêner çendî zîrek û zane be, dê nikaribê bi hemî hêlên romana Leyla Fîgaro ve xwe mijûl bike. Ez dê li ser çend xalan rawestim ku bi rewşa bedewî, huneriya romanê ve têkildar e, ango forma avakirina romanê, ji hêlên estêtîkî û sêmantîkî ve. Di wê baweriyê de me ku xwênerê vê nivîsê bixwe armanc e û parçeyek ji prosesa xwendinê ye.

Kurtegotinek li ser romana LEYLA FÎGARO û hundurê wê

Ev Roman behsa evînekê dike ku 5 salan dirêj kiriye, lê di rojekê de, ji hev dixeyidin û di dawiya rojê de li hev vedigerin.

Bi kurtî ev e, lê di hundurê xwe de çend mijaran hildigire, mîna evîn, windabûn, hêvî û poşmanî.

Romana Leyla Figaro li ser çar beşan hatiye belavkirin û her beşek jî bi çend hevokan dest pê dike û di serê her şaxekî ji van beşan de jî ji cihên cudacuda hevokan tîne, carnan bi şêweyên stiranana, carnan pendana, carnan helbestana ji ên kurd yê kilasîk û...

Beşê yekem:

Her ji destpêkê ve em pêrgî serhejînekê dibin ku nivîskarê romanê, Ibrahîm Seydo Aydoğan, berê me didiyê û me di nav mij û dumanê de dihêle û dixwazê em bi xwe pîl û çirayên xwe derbixin, pêşî li xwe û hundurê xwe û piştî li nav rûpelên wînda ji romanê bigerin, ji ber rûpelên di pirtûkê de têra romana Aydoğanî nakin.

Destpêkirina Leyla Fîgaro bi hevokekê dest pê dîke û ku her di destpêkê de çarenûsa pêwendîya di nav Leyla û Fîgaro de dixê nav hêsir, girî, ger, êş, hêvî, windabûn, dîtî, dilxirabî û poşmanî û vegeê de. “ Ha mejiyê mirov û ha dojeh..” (Leyla Fîgaro, rûpel 5)

Gelo ma pêdivîye em pirsîyarekê ji xwe bikin, gelo nivîskêr çima bi vê hişkahiye dest bi romana xwe kir? Mebesta wî jê çi ye? Çi serborî ne ku ew êxistiye bin bandora jixweacîzbûnê? Ê gelek pirsên din jî ku di beş, bend û paragrafên di hundurê pirtûka evînê û Qedera Fîgaro de? Erê çima dojeh? Çima Fîgaro? Çima Leyla?

Ez nizanim dê hetanî çi radeyê rast be jî, lê ez vê pirsê berî herkesê ji xwe wek xwêner dikim? Bo çi Ibrahîm Seydo ev navnîşan ji bo romana xwe hibijart? Bo çi ev rengê qehewî û bo çi ev keman? Dibe xwênerên hêja bibêjin, ev çi dinivîse, lê min di destpêkê de nivîsiye, ku ev roman romana form û dirûv e, ne romana babet, mijar û bûyera ye, romana tevin û hûnandinê ye. Lewra jî ez bi van pirsan dest pê dikim.

Min di destpêkê de ew hevoka Qedera Fîgaro nivîsî û piştî vegeyîyam berg û navnîşanê, ji ber ez bawer im ku girêdan her ji destpêkê ve bo min diyar dibe û ji bilî wê jî diyar dibe ku nivîskêr, ne tenê rahiştiye pênûsa xwe û çîroka xwe nivîsiye, lê belê bi mebest û pîlan û tektîk, teknîk û huner nivîsiye, her ji bergê bigire ta peyva dawî.

Aya Nivîskar bi rastî Figaro, wek wî fîgurê ku Mozart û G. Rossini ew mîna fîgurekî neberbihev ve di opêra xwe ya bi navê „Zemawenda Fîgaro“ de bi kar aniye? An jî ew dirama kenok ya dramatorgê fransî Pierre Augustin Caron de Beaumarchais (24.1.1732 –18.5.1799) „Berberê ji Siviliya“, ku por û gijola wî tişteki taybet bû û wek mirov jî taybetmendiya wî hebû.

Bêguman min ev pirs kirin, ji ber di encama xwendina xwe de, min dît ku Fîgaro xwedî taybetmendiyeke ye, dema li ber pencerê radiwestê, dema mitalan dike, dema gulan av dide, dema pirsan di hişê xwe de diçîne. “Ma dîroka hemû evîn û hezkirinan ne ji bo kulan bû ji xwe?” (Rûpel 119) Jixwenebaweriya Fîgaro bi şêweyekî ji şêweyan hişt, eger bi mebest an jî bêmebest, rengê qehewî li berga romanê bikeve. Bêguman peyva Leyla jî eger ji Leylan hatibe -ji bilî ku navekî erebî ye. Em dizanin ku kurd di pir caran de tîpa “N” ji dawiya peyvê ji bo sivikbûnê tavêjin-. Ew kesayetî jî dilxirab, weswaskî, şermîn, fediyok û jixwenebawer e jî. Ev rewş ya herdu lehengên sereke yên romanê dihêlin ku jiyan, dirûvê jiyanê, demên nivîsê, cihên nivîsê, bûyerên nivîsê têkevin nav mij û dumanê.

Du peyvên dûrî hev, yek rojhilatî û yek rojavayî, hev digirin û simfoniyeke jixwenebawer, winda û gêj ji derdê evînê, xeleka yekem ji pêdeçûna vê derya vebêjeriyê vedihûne û her weha di xem û bixwerepeyivîn sirûdên poşmaniyê de melevaniyê dike.

Leyla Fîgaro qedera xwe û xwêner dike nav kefteleftê de, berhevkirinekê pêşberî me dike, ew jî mejiyê mirov û dojah e. Di jiyana xwe de, tiştê normal nenormal dibîne. Destê xwe bilind dike, nikarê û naxwazê li pêşberî zehmetiyan raweste, lewra jî xwe çemî her deverekê dike ku mîna baweriyên wî teslîmker in. Fîgaro, bi berovajî mêrikê rojhilatî di destpêkê de, dixwazê xwe ji meydanê derbixe û hertiştî têxe hustuyê xeyinî xwe de, lewra di beşê yekem de, rê dide xwe ku li ser Leyla tevna romana xwe vebêje û weha xwe tavêje bextê Albert Camus: “*Îro min dev ji mêrê xwe berda, belkî jî do bû, ez nema dizanim..*” (R. 17)

Her di destpêkê de, lehengek ji lehengê romanê, ku Leyla ye, dikeve nav mij û dumanê, xwe ji bîr dike. Winda ye, gij e. Netenê wilo jî, her bi cînavê nebeşdar û dema bihurî dest bi windabûna xwe dike. „*Diçû. Wê sar bû an na, hayê wê bi xwe jê tune bû.*” (R. 7)

Dema mirov dest bi xwendina romana Leyla Fîgaro di cihê ceh de, pê hest dike ku vebêjer û nivîskar yek in û çîroka xwe dibêje, lewra her ji destpêkê ve xwe avêtiye meydana çîrokbêjiyê.

Ev şêwe vebêjî bûye şêweyê romana postmoderîzmê û nivîskar vebêjeriyê dike, mîna nûçegîhanekî û mirovekî çîrokan bide hev. Li vir I.S.Aydogan bîranînên xwe belav dike, dike par û parçe, naxwaze rabirdûya xwe vegeîne, di wan kêlîk û demên xweş de li gel Leylayê kela dilê xwe bi rabirdû dişkîne û di kêlîkên xweş de derbasî

mitalan dibe. Leyla bo wî dibe alavekî xwejbîrkinê. „*Dema bihurî jî bo wî poşmaniyê tenê li şûn xwe dihêle*“ (R.7) Carnan piştî xwendina romanê, min ji xwe re digot, nivîskarê romanê kel, derd û mebest û lîstikên xwe ên hunerî û tişt dixwest bibêje, di beşê yekê de got û hemî hunerên ku pê roman dixwest ava bike, bi kar anî, ji „flash back“ heye hevokên kurt, di destpêkê de ku mebest jê hilweşandin û balkişandina xwêner bû, belkî jî windahiya nivîskar bi xwe bû û di pey re hevokên dirêj ku mêrgên zimên, cihê nepenî ta bi dawî, ji bilî çend nîşan û çirûskan û demên curbicur di kavlê nehişiya xwe de diberin semayê.

Lê vê qasê kela dilê wî têr nabe û qunax bi qûnax êdî xwe tavêje dema bihurî, hem çavê xwe ji bedewiyê dixwaze têr bike û hem jî dixwaze di rêya Leylayê re tola xwe ji serpêhatiyên xwe ên nebiserketî werbigire. Dîsan jî ji ber mentalîteya xwe ya bêdeng peyvên weke xwe derdibire dema dibêje Leylê: “Navê te çi be jî, tu bedew î û delal î. Lê gava ez dibêjim: *Leylê, ez kulên dilê xwe derdibirînim,..*“ (R. 39) Dixwazim li vir bibêjim ku cihê lehengên romanê û cihê roman lê radiweste, ji hev par û parçe dibe, xwêner di her parçeyekî ji ceh de dikare fîgur û lehengekî bibîne, ji ber lehengên wî bi lîstikên xwejbîrkin û windabûnê hatine xemilandin, yek bi ser ê din de dikeve û her yek ji wan ji malzarokên cihan derdikevin, cih û deverên xwe dikujin, deveran tînin bîra xwe, di şikeftên bîr û hizirên xwe de, livên laşê xwe bi şeweyekî nêzîkî pesin û xeyalê didin ber çirûskên

jîwariyê û nasnameyên xwe, ji pêwendiyên di navbera xewn û realîteyê de pêk tînin.

„Ji bo ku li rewşa wî hebekî fehem bikiraya, li pencereyên din nihêrî. Got belkî jina wî vegeyriyabe malê û wê ew nedîtibe. Di pencereyan re kesekî din nedixuya.“ (R. 51)

Her li vir dixwest ku bi xwe bide qebûlîkirin, jina wî dê dilê wê lê bixe û berê xwe bide malê û bêhîntngiya wî, -eger mirov bi şeweyê şirovekirina Freudî şirove bike-taybetmendîya wî diyar dike û ciwanîya cihê wî ku li vir pencere ye, dike nîşana dûrmezyînê û dike boşahiyeke fîguran „Fîgaro û jina wî“, her weha deng û vebêjê li vir û ji vê pencerê wate û pirsan hildigirin û kesayetî bi xwe jî dibe pirs û li cih belav dibe..

Dixwazim bibêjim ku romana Leyla Fîgaro romana pirdever e, bi şeweyê vebêjîyê, lê mirov nikarê cih û deveran destnîşan bike, wek ku mirov nikarê bibêje eya Dilber û Leylê yek in, an jî Fîgaro û Leylê bi xwe yek in, û li dawiyê dibin du li mîna hev in??!!

Aydogan pesindariya xwe di rêka Leylê re digihîne wan ên din û di rêka tolê re wan jî bi bîr tîne, wan ji bûnewerên mirovane vediguhêze bûnerwerên cihî, belê li wir jî wan nahêle bûnerwerên cihê ên dema niha, dibe bûnewerên dema bihurî. Li vir qehwe cihê navberê ye, di deqî de, mîna cihekî nêgatîv diyar dibe.

Li vir Ibrahîm Seydo Aydogan li ser têhna dema niha dema bihurî vedigerîne, wan kêlîkên zehmet û zor ku bo wî dîrokî ne, wî tînin demên bihurî ji bo ji nû ve xwendineke din li wan bûyeran bike: “Bûyera Evînê” . Mîna G. Lokaş dibîne, romannivîs vedigere dîrokê bo biyavên dokumentî an jî dîrokî û çêja xwe ya xeyalî çîrokbêjî di yek demê de pêk bîne. Ji ber wilo jî rola romannivîs nivîsandina dîrokê yek weke ku regezekî vebêjî be.

Fîgaro liberçavanîna rewşa civakî ji bîr nake, di demên ku Leyla spêdê zû diçe qehwê û gerson çayê jê re tîne û xwarinê jî. Çawa xort demên wî ji fediya sor dibe û çawa dibêje Leylê „xwişkê“ û Leylê jî diyar dike dema ku yek ji yekê re bibêje „xwişkê“, tê çî wateyê. Herweha Leyla dîsan bi şeweyê monolog li ser navê Fîgro dibêje: *“Binihêre, xelkê me digel hemî xerabiyên xwe jî çiqasî baş e û ji alîkariyê hez dike; li tu welatê din tu nikarî tişteki weha bibînî.”* (R. 65)

Di Leyla Fîgro de, dem li bin guhê hev dikevin, çî demên çîrokbêjiyê bin û çî demên deq bi xwe bin, ew jî ji ber ku roman hemî bi şeweyê „flash back“ hatiye avakirin û di şûn re, vebêjiyek monologî û ketina navbîranînan weha li demên nivîsê kirin. Lê divê yek li vir jî bibêje ku dema fîzîkî di romanê, ango dema ku Leyla ji mal derketiye û ta poşma bûye û vegehiyaye, demeke kronolojî ye, ango li pey hev ji spêdê ta êvarê ew 14 seet in. Di rêka vebêjiyê re mirov karakterê lehengên romanê dinasê.

Di romanê de bûyer yek e, lê bîranîn û vebêjiya wan gelek bûyerên kevin derbas dike, ji ber wilo jî bi hostetî romannivîs şêweyê vebêjiya sîberî têkildar bi şêweyê realîte ve bi kar tîne û carcaran dike şêweyê poetîkî jî, bo xemleke din bide romanê û xwendina wê bi xwêner xweş bike û ew jî di rêka pesin re.

„Meşiya. Bala xwe da darên ku şaxên wan niha bûbûn tembûra bayî û tev li yên spîndaran ku tazî nebûbûn, dişibiyên orkestrayêke Harmoniyê.“ (R. 18)

Vegêr, ez dikarim çîrokbêj di rêka vebêjiya xwe re dîmen, resim û tûtalên xelkên Amedê diyar dike ku em dizanin Amed e û ku tenê di rêya nemra turumbêlan re tê naskirin, ku bi 21 dest pêdike. Ev roman bi rastî em dikarin bi romaneke bajarî li qelemê bidin, ji ber wan nîşanên ku tê de hatine, ji jina biçê qehwê rûne û çayê bixwaze, ji nemrê telefonan, ji estegehên otobûsan û ji pir tiştên din, ji bilî ku ziman xwe bi çî şêweyî nêzîkî zimanê çandiniyê nake, lê belê zimanê bazirganî tê de mişt e.

Romanivîs xwe dispêre gotin, stiran, efsane, helbest, û peyvên zaneyan. Eger em werin û wan pêşpeyvên ku li pêşiya her xelekê ji yên pirtûkê nivîsînê, dê pêdivî tenê ji bo wan lêkolînek pir dirêj bibin, ji ber her bikaranînek ji wan û girêdana wê bi xelekê re dikare xwêner têxe gerînokekê de ku qet jê dernekeve..

Dibe ku gelek xwêner babeta vê romanê ne mezin û ne seyr bibînîn, lê dixwazim bibêjim ku ev roman girifteke herî mezin tîne qadê ku ew têkiliya Rojava bi Rojhilat re, di dema ku Fîgaro mîna xortekî pir zîrek di hundurê romanê de diyar dike ku çawa dikare li gor civakê xwe biguncîne û xelk jê hez dikin, lê di hundurê xwe de, nexweş e, bêtaqet e, ango mîna her mirovekî rojhilatî ye jî di dawî de. Di hemî romanê de, kesayetiyekê ji wan kesayetiyên rola xwe nelîst, ji ber çîrokbêj/nivîskar/leheng li ser destê xwe rolên wan dinijandin, lê qet jî estêtîka xwe wîna nekirin, hestewriya wan ya mirovane, rastiya hunerî û ciwaniya wan ya bilind hiştin ku ta yê simsar were bi hewara wan ve û dema xwe ji wan re vala bike.

Bi rastî nivîsîna li ser vê romanê berê mirov dide bêdawîbûna nivîsînê, ji ber di her xêz û xelekê de, an jî wan peyvên serxelekan, mirov dikare bi pir şêweyan rahêje romanê, lê dixwazim bibêjim ku Ibrahîm Seydo her li destpêka romana xwe mirov ber bi bîreke bêbinî ve dibe û mirov disincirîne û dibêje seqabûn jî tune ye. „Ha mejiyê mirov û ha dojah“ (R. 5)

Mirov dikare vê romanê li ser çenda xalan dabeş bike: Jixwenebawerî, bîranîn, poşmanî, resm û rêyên civakê, cenga kevin û ya nû , Rojhilat, Rojava, xêr û şer.

Cihên ku di romanê de balkêş in. Qehwe, li ber penceran, cihê gulan, balkon, êstegeha busan, oda Leyla, mala Cemîla Qenepe û mala Dîlberê.

Romannivîs hewl daye erkên her lehengekî, an jî her cihekî li gor pêdivî bîne cih, lewra jî di dema di kafeteriya de, deftera xwe ya nemrên telefona derdixe, û wan navan li pey hev û nemrên wan dinivîse, da li vir aso li ber deq vebin û nexetimê, herweha dema yê simsar tirimbêla xwe tîne û dîsan dibe. Leyla jî ji bo hezkirina wê ji Fîgaro re û tîrsa wê li ser, tê û lehengekî bi navê Muqedesê diafirîne. Ev jî ji bo rê li ber vebê û were Fîgaro biparêze.. Ji bo ku roman bê reh nemîne, romannivîs destê xwe davêje dastanên kurdî û bi şêweyekî zîrekî wek bûyer derbasî nav romanê dike, bi şêweyê çîrokbêjiya ku me li destpêkê nivîsîbû.

Memê Alan û Dastana Fatima Salih Axa têkilî hev dike: „Ji bo evîna wê ji bavê wê re şivantî kiribû û xweha mîrê Botan jî ku wê û yarê xwe yê ku ew jî mîrek bû hevdû di xewnekê de nas kiribûn û gustîlên xwe bi hev ve guhertibûn. “ *Û piştir e têkilî dastana Siyamend û Xecê dike: „Û wê xweha heft birayan jî ku ji ber pezkovî re şer kiribû û bi dû re di newalê re wer bûbû. “ (R. 90)*

Di dawiyê de, dibêjim zimanê romanê bi zimanekî hêsanî, rojane û rewan hatiye dariştin. Lê di gelek caran de, di vebêjiya xwe de, lehengên romanê dibin yek, ta yek di

hundurê ê din de tête bişaftin mîna rola Bedewê û Leylê. Ji bilî wê jî carcaran di hundurê vebêjîyê de dest bi şirovekirinê dike: „ Tu wê dinasî?“ Got: „*Na, lê belê tiştêkî kekê Fîgaro ye.*“ (R. 69)

Romaneke mîna romana Leyla Fîgaro mişt ji xwewindakirin, ponijîn, poşmanî û şikestin, her fîgurek hewl dide wêneyê xwe ê dîmenên ê din re bibîne, dixwaze her yekî weke xwe bike. Di romaneke weha de ku hertişt mîna hev e, pêdiviya lêkolîneke derûnî ji her lehengekî re, her cihekî re, her bûyerekê re heye. Ez jî di wî warî de ne pispor im, lewra bawer im dergehê lêkolînan li ser vê romanê nayê girtin, ji ber ev nivîs asoyên bêdawî ji hemî hêlan ve divê.

Bêguman romanek weha bi babeteke biçûk, lê hewqas hunerî û hunera vehûnanê, bi tevneke kompleks, dikare ji nişka ve xwêner ber bi xwejbîrîkirinê ve bibe, mîna lehengên xwe yên ku xwe windakirin. Romanek weha asteya ciwaniya xwe bi xwêner re bilind dike û çêjeke afirander pê re peyda dike.

Jêder:

1. Karl Migner: Zur Theorie des modernen Romans.
2. <http://www.magic-point.net/fingerzeig/literaturgattungen/roman/roman-theorie/roman-theorie.html>
3. Hans Sanders, institution Literatur und Roman, edition Suhrkamp, SV, erste Auflage 1981, nr. 668
4. Ibrahîm Seydo Aydogan, Leyla Fîgaro, weşana Elma

Gulistan û Şev, romana Hesên Silêvanî

Hizr, ez û şev dê li hêviyê bin

Di avakirina berhemekî vebêjîyê de, gelek fakter hene, ku rolê dilîzin, ji wan

1. Avakirina vebêjîya demê
2. Avakirina vebêjîya cihê
3. Avakirina vebêjîya nêrînê

Destnîşankirina lêkolîna li ser kurte-romana Hesên Silêvanî „Gulistan û şev“, bi şêwaz û rêbaz, destnîşankirina hûrgilên vebêjîya berhem e.

Ji bo em xêzên bi giştî yê vî berhemî bi çarçew bikin, pêdivî ye, em du xalên sereke ji bîr nekin:

1. Deq, hebûnekî bi serê xwe ye, mirov dikare deqê ji hundur ve şirove bike, lî pêdiviyê fakterên derve ji sosiyolojî û derûniyê yên cuda jibîr neçin, çunku ev karîgeriya wan fekteran dikar deq ber bi aso û biyavên din ve bibe.
2. Pesindan û derbirînên nirxdar, deq ber bi dubare û sêbarekirina xwendinê ve dibin.

Daku em vê nivîsê berbi bîrdoziyê ve nebin, em dest bi xala yekem bikin:

1. Navnîşan „Gulistan û şev“:

Navnîşana pirtûkan, dikare bi çend erk û karan rabe, lê du erkên wê yê sereke hene.

- Binavkirina berhem „ sinordanîn û destbikarkirina jihevexistina berhemî“
- Bidestxistina tayê destpêkê ji hizrîn û şirovekirinê „ watedayîn û jihevwejartina nîşan û sementîka lêkdanên deqî“

Ev sernivîs xwe li ser 2 asteyan dilivîne.

1. Li ser asteya lêkdanê, ku ji 2 peyvan **Gulistan/ şev** û nîşanoka pevgirêdanê **Û** pêkhatiye. Ew bi xwe hevokek hêsan e, lê zîrekî di wir de ye, ku her peyvek dikare yekjimar û pirjimar be. Wate şev jî û Gulistan jî, du peyvên ji hêla hijmarê ve nenas in, wate, dergeh li ber şirovekirin û hizirkirinê li dawî vedikin û ev jî, yekser xwênerî beşdarî prosesê xwetêkelkirina deqî dike. Dibe ku xwêner bibêje, lê şev yekane ye, çunku ev buyer û bîrhatin hemî di şevê de, di hizra Gulistan de, pêkhatin. Bêguman ew rast e, lê ew hemî piştî xwendina berhemî diyar dibe, ne beriya xwendinê. Wate Silêvanî, bi stratîjîke zîrekane, ew herdu idiyom(têgeh), hîlbijartine. Ev lêkdan, mîna fîlmekî ye, mîna tabloyekê ye, dergeh li ber pirsan vedike. Ev çi şev e? Gulistan çi ye? Gulistan kî ye? Şev û Gulistan çi

ji êkudu dixwazin? Şev çi tîne serê Gulistanê? Şev wargehê xem û razên Gulistan e? Gulistan çi ye? Nav e? Cih e? Boşahî ye? An jî cihê bêhinvedana tirs û kabûsa ye?

Em dikarin li ser pileya lêkdanê (Syntext), bibêjin, navnîşan imbara berhemdana pirsan, ku xwêner li dûv bersivan rêdike, wî dixê nav deqê de, wilo jî hêdî hêdî, tammijî dibe û dikeve dava deqê de.

2. Li ser pileya ferhengî, ku zeviyên amajeyî“ sementîkî“, rêk û pêk dike û bi têkiliyên gelemper û mukum wan digihîne hev.

Gulistan: = Nav/gulxane/ hêvî/ razîkirin/bêrîkirin/êş/xewn/ xanima diltenik/ dayik/ Jin/ Evîndar/ Dilxerab/ kenok/ giryok

Li vir Gulistan, hem hêvî, hem hevjin û hem jî berdewamiya encamdana şerî ye, wî şerê, ku xêra wê, Dilşadê wê, heval û hogirên wî û zaroyên wê tê tune ye. Weke ku Gulistan, nîşana dirêjpêdana çîrok û rûdanên wê ye, di sernivîsê de jî, destpêşker e, bo damezirandin û vehûnana xewn û hêviyan. Her çend e, Gulistan, kilîla dergehê derbasbûna şeva dirêj û gîrobûna rawestandina şerî ye, lê dîsan bi wateya xwe ya metaforî (Istî,ara), wargehê bêhinvedana hizran e û dibe şûnwarê şevên ji şer westiyayî.

Şev: = Bêdengî/ tirs/ saw/ hêminî/ raz/ xapandin/ xewn/ hêvî/ Veşargeha evînê/ imbara bîranînan ûtd..

Di gelek berhemên helbestî de, şev, wek peyv, wek wate, wek wêne û wek pergala tete bikaranîn. Eger em bi taybet berê xwe bidin Kurdistanê, dê bibînin şev li defmiletên serdest û xwedî welat, wek simbola hêminî, tenahiyê ye, lê li defmiletê kurd, ji ber ku bîndest e, şev nîşana, xwedûrkirina ji ber zîlm û zorê ye, xweveşartin e ji ber zîndankirin û eşkencekirinê, bitinêman e ji tîrsa dezgehên zordestî û mêtîngîriyê, ji bilî ku şev simbola digelxweaxaftin e, „monolog“, digelxweman û lixwevegeriyên e. Bêguman, Hesên Silêvanî jî ev peyv ne weha destnîşan kiriye, belkî mebest ew e, ku şev wek dem, veguhêze şev wek cih û boşahiyeke vebêjîyê, da ciwaniyeke din bide kurte romana xwe. Şev wargehê monologa romanê ye, wate, imbar û hilgira kesayeti, buyer û vebêjîyê ye. Şev wek navnîşan, serê tayî ye, ku Silêvanî dide destê xwênerî, daku beşdarî xem û azarên, Gulistan, nijyarên derdorê, zarokên wê, çiyayê welatê wê û tîrsa nedîtinê bibe.

Li vir şev, rawestgeha sereke û yekem e, di pêrgîbûna di navbera deq û xwênerî de. Sernivîs, çavbelbûna destpêkê ye, di estetîka dijayetiya şerxwazî û rewşenbîriyê de. Wate, şev du wateyên felesefî bi xwe ve hildigere „şer û xêr“, ku ji sereta ve, wek buyer, wek leheng, wek dem û wek feza, xwe li biyava berhemî dialîne.

Ji bilî ku şev, dikare wan wate, nîşan, simbol, aso û werçepan himbêz bike, lê amjeyeke din jî dide, ew jî bêhêvî û xwexapandin e. Daku Silêvanî wî şerê felesefî, ku ji destpêka dîrokê, ji dema Gilgamêş ve heye, berdewam bike, şev mîna regezê şer= (parçê 1) bi kar aniye, çunku regezê 2an bi mebesta posîtîv=başî= xêr hatiye.

Li vir diyar dibe, ku Gulistan û şev, nîşana hebûna deqî ne û parçeyek ji lixwemukurhatina ye. Gulistan û şev deqê Silêvanî hişyar û agahdar dike, sinorê di navbera hebûn û nemanê de, hêvî û windabûnê de ye. Sernivîs kilîla wî deqê girtiye, û nasnameyê dide deqî.

Bêguman e, ku ev têgeh, pir nivîskar û helbestvanan bikar aniye, bo nimûne:

„ Şîrazî (Gulistan), M. Teyib (şev û Bêdengî) û gelek din, ku naxwazim navan rêz bikim. Ev hevdeqî ye, di navbera vê sernivîsê û wan de, lê ya giring, ku Silêvanî eve pêkve kirine êk û hevdeqiyek(Intertextuality) di navbera sernivîsa xwe û berhemê xwe de peyda kiriye. Wate sernivîs, kilîla deq e, belkî tîrêjên deqî ne. Lewra jî Gulistan, hem leheng e, hem hêvî ye û hem bêhinvedana şevê ye.

Şev jî bo Gulistan, dem e, şûnwarê derd, xem, hizir, xewn, tenahî, lixwemukurhatin û derbirîna raza ye. Ev hemî jî di şevê de, bi Gulistan re çêdibin.

Dr. Xalid Hisên weha dibêje:

“ Pêdiviyê, em amancê bi wê hindê bidin, ku hevdeqî (In tertextulity) sîmayekî stratîjî yê deqê sernivîsê ye, belê dê hevdeqî nasname û antolojiya xwe winda bike, eger biyava xwe ya hevdeqiyê winda bike, bi hevdeqiyê sernivîs dibe deq di “ sîstema wêjeyê bi gelemper de” .¹

2. Kesayetiya Kurte-romanê

Wek me di destpêkê de amaje pêkirî, ku Gulistan, wek kesayetî, nûnertiya beşê 2an ji jiyânê û felsefa li ser avakirî dîke, ew jî xêr e. Gulistan kesayetiya kurte-romanê bi tenê ye, vebêjer a bi tik û tenê ye. Dema ku nav tîn û derbasî nav romanê dibin, hinga biyavên nasnameya kesayetiye berfireh û kûr dibin. Lê di vebêjiya Gulistan de û anîna her navekî, rabûna bi erkekî ye û bihevgerêdana, cih û buyeran e.

Bîrhatên wê şeva dirêj û bendemanê, dihêle Gulistan, jiyana tal û nexweş bo xwêner rabêxe.

Di her bîrhatinekê de, şeweyê jiyânê bi hemî dêmên xwe, yên reş û sipî ve derdixe pêşber xwêner î. Li vir Silêvanî, kesayetiye inaye, daku bibe zimanhalê wî û derbirînê, ji wê helwesta wî li dijî şerê dijwar û bo me kurdan û bo miletan û cîhanê bêûde ye û giyankuştin û kêmkirin û binaxkirina herkesayetiyeke ye.

¹ Dr. Xalid Hisên, Fî nezeriyetul inwan= di bîrdoziya sernivîsê de” rûpelê 163

Digel ku kesayetî, ji buyerê cuda ye, lê azadiya xwe bi tevayî wernagire. Bikaranîna, cînavên mîna ez, tu û ew, berbi dijî daxwaza vebêjerî diçin.

Li gor *Emil Benveniste*, (*Cînavê nebeşdar*(nelivir= EW), *ne kesayetiyekek mukum e, belê şêweyekî zardevî ye, erkê wî, derbirîna ji nekesayetiye(nasname) ye*)¹

Em dikarin vî tiştî bi zelalî di Gulistan û şev de bibînin..

„*Ma ji kû ve, bavê wan hinde sor û spî ye? Ew reş esmerê simbêl boq!*”²

Silêvanî li ser zarê Gulistan, ku fîgura sereke û bi tenê ye, di romanê de, çîrok, bîrhatin, kêş û pîrsgirêkên, ku encamê şer in, derdibire. Ji wan derbirînan jî navê her kesekî ku îna ye, ew bi roleke, ku wateya navê wî hildigire dilîze.

„*Erîf, Henzel*”³4. - *Ango wek navê xwe ye Henzelê we? Na, na gelek ji navê xwe burandiye*”⁴

Ji bo em kesayetiya Gulistan“ Vebêjeya romanê destnîşan û bi sinor bikin, pêdivî ye, pala xwe bidin aksa xwêner, ji ber

¹ *Emil Benveniste kêşeyên zimanî yê giştî= Allgemeine Probleme der Sprache” R.128*

² *Hesen Silêvanî „ Gulistan û şev“ R. 23*

³ *Hesen Silêvanî „ Gulistan û şev“ R. 32*

⁴ *Hesen Silêvanî „ Gulistan û şev“ R. 32*

di dawî de, ew e yê ku di rêka xwendinê re wêneyekî bo xwe durust dike. Ew jî di rêka:

1. Tiştê vebêjer dibêje
2. Tiştê ku kesayetiyên din dibêjin. (li vir, gotinên wan ên din jî, tune ne, tenê deng û basên wan di rêka Gulistan re digihîte derve.
3. Encama ku nivîskar di rêka nasîna hel û mercên kesayetiyê de bi dest dixe.
 - Xala balkêş, ku ev diyaloga di deqî de, tenê ji xeyal an jî bîrhatinên Gulistan in, yên ku wê Dilşad digel êkudu derbas kirine. „*bi rastî tu tê...Ma tu behwer nakî?*“¹.

Dibe ku gelek romanivîsan, jin wek leheng di romana xwe de bi kar anîbin, lê Silêvan di kurte romana xwe de, tenê, lehengek, fîgurek bi kar aniye û ew jî jin e. Dibe xwêner dema bixwîne, bibêje ev diyalog bi kê re ye? Dilşad, dayka dilşad î, herdû zarokên wan, Henzelê erîf, Odîşo, Hêmin, Wijdan, Hamid Hemud, Hesên mihemed Osman, Suham, Buşra, Huda, Menal, Leyla, Wefa, Ebid Efendî, Firokvanê nemir û...t.b.d.

Ev bi hemiyana di rêka vebêjiya Gulistanê agahdar dibin, ku wan demên bi Dilşadî re, jêre behsê kiriye, an jî ew buyerên, ku Dilşad bi xwe behs dike, Gulistan hizra wan dike an jî wek me di destpêkê de got, Nivîskarî çu azadî nedaye Gulistan û Gulistan bi wê deverê de biriye, wek wî xwestiye.

¹ Ya berê, r. 13

Lewra dibînin, hizr, mitale, nenivistin, bendîman û dawî jî dema berê spêdê di xew ve diçe, di „ kaxezek dî ya pêçayî, Rûpelê çardemîn“ dixwîne:

„ *Gula min...Bi nûra behîvên ji nû dibişkuvin, ez ê bihatama,*“¹

Di bikaranîna van navan de û rabûna her yekî ji wan bi erkekî, tenê bo temamkirina buyerê û avakirina fezayekî romanane ye, ku bişê berdewamiyê bide wê aramnc û mebesta romannivîsê romanê. Kesayetî di „ Gulistan û şev“ de, li ser 2 asteyan destnîşan dibe:

1. Asteya karîger, ku têgehiştineke giştî sade werdigire, erkan pêktîne, bi kesayetiyê wek kes mijûl nabe.“ Dilşad“
2. Asteya nûnertî, ku kesayetî wêneyê takekesî werdigire û rola xwe di axaftinê û vebêjîyê de dibîne, di gel kesatîyên din de, yekaniyên sementîkî ava dike. „ Gulistan, Erîf, wijdan, Hêmin“

Li gor **Greimas**: kesayetiya Romanê „ *dikare bi tenê rola vebêjer bibîne, daku rola jê re hatiye pilankirin bilîze*“².

¹ Ya berê r. 80

² Buniyet Alnes al serdî, Dr. Hemîd Alhemdanî, r. 52

Buyer:

Eger em bi hûrbînî tîrêjên xwendinê derbasî giyanê romanê bikin, dê bibînin, buyer jî yek buyer e, ew jî şerê di navbera Îraq û Îranê de ye. Lê ji bo ciwanîyekê bide tevna romanê, evîn, diltengiya efserî ji xwendinê, gera li nav bexçê şehîdan, bêrîkirin, tercumaniya pirsên efser bo Hesên Mihemed Osmanî, çûna havîgeha Selahedînê û...Balkêş e, ku bêhtirîn wan nijyaran bi cengê ve girêdayî ne.

Di Romanê de jî, hevoka ku dikare bibe navgîn, an jî nijyara sereke, ango ya bingehîn ev e:

„Hindî ceng e, jiyan her bi xem e, bi jeng e...şalûl nivistiye, mit e, bêdeng e“¹



¹ Hesên Silêvanî „ Gulistan û şev“, r.44

Her li destpêka romanê, 2 bîrûbawerî, dijberî hev radiwest in.

1. Guman. 2. Hêvî.

„ *Bi rastî tu tê / - Ma tu bawer nakî? /.../ -Bi serê te yê ezîz ez ê bêm, lê dibe piçekî gîro bibim./ Bila...Bila...hema tenê tu werî, çendî gîro dibî xem nake*“¹

Li vir diyar dibe, ka çendî jihevduketin zor e û çendî mirov bawerî bi paşeroja xwe nîne û neşê planekê bo jiyana xwe deyne, çunku jiyana di welatekî de, ku ceng lidar e, mirov bi hesabê miriya, an jî şikestiya ye.

Ew hêviya mirovî ku heye jî, dikare di navbera xulekê û ya din de vemire. Bendewarî jî, bendewariya çarenivîseke nediyar e. Yên di rewşê de, şîn, xem û girî dibe para wan, jin û zarok in. Ya balkêş jî ku li vî şerî kes nesûdmend e, nexasim, ku êdî kurd be jî. Ew buyera efser û Hesên Osmanê baş bi erebî nizane û Dilşad tercumaniya wî dike, susreta pergale diyar dike. Ne ew bi berpîrsê xwe behwer e û ne jî berpîrs bi çavekî yeksan li wan temaşe dike.

„ *Hesên Mihemed Osman! / Ni,em Seyidî...Efserî li xwe negirt, silavê jî jê wergire..*“².

Hesên Silêvanî, di rêya vebêjera romanê re, hindêk êşên civakê yê biçûk derdixê qadê, mîna Dilxirabî, nebehweriya jinan bi mêran . Li vir dema navê Wijdanê tete holê, Gulistan

¹ Ya berê 13

² Ya berê, r. 33

dilqermişî dibit û guman li def hene, ku di navbera wê û Dilşadî de, tişte heye.

„Zilam ne yê baweriyê ne, divê em hevsarê wan bernedin“¹

Di vê kurte-romanê de, xwêner pêrgî hûrgiliyan dibe, ji xwendina yekem, negiringî diyar dibe, lê eger xwendin dubarekir, dê bibîne, ku ew yekane, an jî ew buyera biçûk, roleke sereke di avakirina boşahiya romanê de dilîze. Bo nimûne:

„Perar, dema li dû daxwaza hevalê wî Hêmin î, em çûne havîngeha Selahedîn, ez pê dihesiyam, ruhek dî jî hatiye ser ruhê wî, heç ku ne li nav dar û berên havîngehê diçû. Dê bêjiyê li nav mêrgên Buhuştê peyase dikir. Ez mendehoş bûm, dema yekser destê xwe danî ser milê min û got: - Erê ma rast e çiyayî dil heye?....., bo çiyayê Sefînî serê xwe bi bawerî û mêranî bilind kiriye navçavên asmanî û gazî dikir çavê rojê: -Ez ê her te ramûsim..ne îro sibehî...sibehî na dusibe..ez bêdeng nabim heta te neramûsim“².

Ev diyar dike, ka van çiyayî çend raz hene, ka çendî vî miletî zor û zulim xwariya, ta kengî ev milet wê bo hineke din şer û cengê bike? Ev hemî pirs bûn, ku li wê demê, dihatin kirin, ku ew dem ji hêla siyasî ve jî pir zor bû bo kurdan, kurd bêhêvî bûbûn.

¹ Hesên Silêvanî „ Gulistan û şev“ 26

² Ya berê 18

1. Dem:

Li vir 2 dem hene.

1. Dema buyerên romanê, ku wan salên şerê îraq û îranê de ye
2. Dema romanê, ku ev hemî di şevê de ye. Gulistan, rojanên xwe yê digel Dilşadî tîne bîra xwe, wan buyerên, di demên cuda cuda de, li ber çavên Gulistan mîna fîlmekî derbas dibin.

Bi pêşdebirin û paşdebirina demî, ku Silêvanî bi zîrekî bi kar aniyê, ketiyê xizmeta wan diyalogên duqolî ku derbas dibin û her weha berê vebêjîyê berbi tevneke nû ve bîriyê, ew mecbûr kiriye, ku kurte-romanê, ne romanê binivîse. Ew mecbûr kiriye, destê xwe bavêje zimanekî helbestî, ta bi dawî, ku pir caran di metinê berhem de, romansiyet jê difûre.

Ji ber ku bîrhatin in, di wê şeva -xwedê neîne serê tu xuliyaqetî-, Silêvanî, mecbûr maye, dema buhurî bi kar bîne, ji ber ew pergala demeke nejiwêvebuhurî li ber çavên xwêner radixe..

Di wan deverên romanê de, ku dema paşerojê bi kar tîne, ew jî hêvî û daxwazên wî (Di Romanê de hêvî û armancên Gulistan in) ne .

Bikaranîna dema buhurî, tirs ji paşerojê ye, bîrkirina jiyana û susretên hatine serê gelê kurd e. Silêvanî vê jî li ser zarê yekî ji hevalên xwe, ku nave wî Ednan e dibêje:

“Jîn şev e, şeva tarî ye û deh dev e”¹.

Li vir, ji ber sîstema vebijiyê, bi sîstema romanê re nagunce, Silêvanî şiya ye, ku vebêjerê xwe teklîf bike, daku mufareqatên vebêjiyê” **Anacchronies narratives**” biafirîne.

Ji her mufareqeke vebêjiyê re, aso heye. Asoyê mufareqê jî ew xêza di nav

“xala vebirîna vebêjiyê û destpêka veşandina buyeran de ye”²

Boşahî û Cih:

Li vir, min idiyoma **boşahî** (Feza, Space), berî **cih** danî, ji ber ku cih di **Gulistan û şev** de, mala Gulistanê ye, lê di bîr û hizrên xwe de, dice, Bexçê şehîdan, Havîngeha Selahedîn, mala Wijdanê, Kerkûk. Em dikarin bibêjin şeva ku Gulistan bendewarê Dilşadî bû jî, bikin boşahî, ku dikare beramber cih bête pênasîn.

Boşahî çi ye? Ta niha lêkolînên ku di vî biwarî de hene, çu pênasînek mukum jêre nedîtine, lê em dikarin bibêjin, ku ew di romanê de, parçe-cih e,. Nav jî lê dikin, **feza geografi**. Lê **R. Bourneuf**. Weha boşahiyê dide nasîn

“Boşahî, ew sinorê herî kêr e, ji nîşanan “Geografi” ku bo xala destpêkirina livandina xiyala xwêner têtê dan, an jî bo dîtînen cihan yên rêbazane”¹

¹ Ya berê, 78

² *Buniyet Alnes Alserdî, Dr. Hemîd Alhemdanî, r. 74.*

Silêvanî jî, nave cihnan tine û wan wek pirs dihêle

*“ Hêmino lawo, tu li kû yî? Ho hevalê E, ezemiyê û Kornîşê û havîngeha Selahedîn, ka tu? Ne dût e tubêpasport çûyî wê cîhana te digotiyê Buhušta mezin ”*²

Navê 4 cihan têt, xwêner derbasî xeyalan dike û pirsan li def wî çêdike: çima ev dever? Çi bîrahtinên wî li wan deveran hene? Û gelek pirsên din li ber xwêner vedike. Ev bi xwe boşahiyeke, nîşanewî (simiyolojîk) ye

2. Zimanê romanê:

Belkî pirr seyr e, ku babeta sereke, ya romanê ceng e, lê Silêvanî bi zimanekî helbestî, stûnên romana xwe avakiriyê. Hevokê ne pir dirêj, dût ji simbolên pêdivî hizrên kûr. Buyer û armanca wê li ber xwêner raxistiye û dibêjîyê, ka tu çi dişê lê zêde bikî. Silêvan gelek regez, mîna pesnê zêde derbasî tevna romanê nekiriye, ji bilî wan parçeyên Erotîkî, ku di behweriya min de, bo çêjxweşiyê hatiye. Cînavên ku di romanê de bi kar hatine: Tu/ Ez/ Ew û hun. Tu û ez yek in, lê wek rol xwe bi êk diguherin, çunku wek me li pêş jî nivîsî, rola Gulistan gihandina bîr û hizrên Dilşadî ne. Ez li vir nabêjim, ku Dilşad nivîskar bi xwe ye, lê parçeyekî mezin jê hildigre. Belge bo wê hindê, ew neazadiya ku Gulistan di wê şevê de wergirtî. Xîtaba deqê romanê, li ser 3 asteyan têtê belavkirin:

¹ Ya berê, r. 53

² Hesên Silêvanî, „ Gulistan û şev“, r. 57

1. Têkiliyên di nav sîstema demane ya rêzbuyeran di vebêjiyê de û sîstema demane ya wan buyeran û tevdira wan di deq de.
2. Pêwendiyên rêzekane (neseqî), yên dirêjiya buyerên vebêjiyê û yên deqî dighîne hev.
3. Pêwendiyên lertzane, wate hêza dubarekirina buyeran di vebêjê û deq de.

Silêvanî, ev aste jî bi zimanekî himbiz, tîr, helbestî, kirine alav û bi zîrekî bikar anîne.

Em dê we zivrînin baştirîn pesindana vê pergale..

“ Alavên xwe bi zîrekî û pişeyekî bilid bi kar anîne. Bo nivîsîna deqekî cuda, dest avêtiye teknîka helbestê, bo kurtkirin û himbizkirinê, û sînemayê di parçekirin û têkiliya deman de, û şanoyê di diaylogê de, ku asteya lertzîne bilind dike”¹

Di wan hevokên kurt de, xîtabeke romanane tête avakirin, ku buyer pê ava dibin, vebêjê seranserî berhem dibe xwedî wateyek û delaletekê, wate her hevokeke ne bêwat ye. Ji ber “hevok nûnertiya xîtabê dike”, wek Martinieh dibêje û ji ber ku xîtab(Discourse) yekênî, rêbaz û sîstemên bingeîn yê wî heye, weha jî babetê serbixwe diafirîne. Lewra em dibînin, ew hindêk pesnên kurt ji hêla Gulistan ve, li ser zarê Dilşadî, pergaleke Entropologî ya miletê kurd diyar dike.

¹ Yûnis Mihemed, *Meqalat neqdiye fî al nisus Se,ibeh*. R. 151.

” *Min baş berê xwe dayê, ez li dor zîvirîm, min ew nivîsîna li ser xwend: “ Gora şehîdê firokvanê nemir ê niştimanperwer(...) yê ku li şerê Barzan, di sala 1931ê de de hatiye şehîdkirin...Yek ser min got: Nefret lit e be seyê nemir...tu li kû derê û Barzan û kurd li kû derê!”*¹.

Li vir, rewşa kurdan, ya dema dût û nêzîk diyar dike, her weha kîn û xezeb û çavsoriya şerxwazan, li hemberî kurdan diyar dike.

Belkî gelek xalên balkêş hene, ku berê Entrologana berbi wan ve biçê. Yeke din ji wan xalan, ku Kurd, çi di Newrozan yan berî Newrozan, diyarî evîndar, destgîr û hezkiriyên xwe dikin. Dibe ev xal, li def Silêvanî, wek erf û tîtalekî şaristanî hatibe pêş, lê bo Entropologekî balkêş e bizanibe, ka çawa dibe:

*“Berî Newrozê bi sê çar rojan, deh destekên nêrgizên geş û bêhinxweş û şidiyayî anîne mal..”*²

Mirov dikare pirsiyar bike: çima Nêrgiz û neguleke din?

3. Teknîk, huner û ciwaniya romanê

Di vê kurte romanê de, Silêvanî bizav kiriye, sûtê ji hemî teknîkên hunerî, ku dikarin bibin stûn bo hêzkirina bingeha

¹ Hesên Silêvanî „ Gulistan û şev“ .R. 42

² Ya berê, r. 43

berhemî bi kar anîye. Her di destpêkê de, bi pirsekê dest pê kir: “ *Bi rastî tu tê.. Ma tu bawer nakî*“ ¹

Li vir dergehê xeyal ta bi dawî vedibe û dibe şelpe-şelpe pêlên pirsan di hizra xwênerî de. Ji bilî ku ev teknîk, ji bo deq asoyekî geografi û delalî kûr û pirravekirin werbigire, lê çêjeke ciwanî jî diafrîne. Ew hêza hevguncînê di navbera razberya(Zatê) me de û pîvan hundur yê babetê de, tete aktîvkirin û asoyekî bêsinor ji ciwanîyê derbas dike. Li vir ciwanî digihe lûtika xwe ya bilind, çunku xwe nas dike. **J.B. Boriev** dibêje:

„ *Ciwaniya babet, ne bi serketina objektîv ya pîvanên deq yê hundurîn e, belê bi wê çêja ku mirov jê dibîne û hest pê dike, dema destê xwe bi temamî dideyne ser babetê û wî zeft dike*“².

Gulistan û şev, gelek hûrgiliyên, ku ji xwendina yekem, xwêner giring nabîne, himbêz dike. Lê di prosesa xwendina 2an û bêhtir de, xwêner bi xwe jî nema dikare xwe ji „ Desthilatdarî“ ya wan derbixe. Ji ber bi xwendinê re, desthilatdarî qayim dibe, bi hêz dibe û fereh dibe.

„ Min şekrokek avête bin zimanê xwe û yek dayê û bi salûsî gotiyê:

¹ Ya berê, r. 13

² Gînadî Bospelov, Hunerî û ciwanî, wergêr Ednan Camûs. R.203

- *Ez dibînim gelek şerm e, heger em neçin ahenga mala Hevala te Wijdanê.*“¹

Li vir bi şeweyekî, Gulistan xwestiya, desthilatiya xwe biçespîne û bizanibe, ka dê Dilşad çi bersivê bide û eger hat û got erê jî, dê li wir rewşê bibîne û tê derbixe, ka çi di navbera Dilşad û Wijdanê de heye? Ha li vir bikaranîna 2 desthilatan e, **wek R. Barth** dibêjit:

„ *sîmayên şeweyê çîrokê du desthilat in, 1. Dirêjkirina nîşanan seranserî çîrokê 2. Derbaskirina biyavên neçaverê, di wan xejqandinên zimanê de.*“² .

„ *Never trust the artist, trust the tale. D. H. Lawrence, “ The Spirit of place” “ ji lehengî qet behwer neke, lê ji çîrokê behwer bike.*“³

Li vir behwerkirina xwênerî ji çîrokê û nebehwerkirina wî ji fîgurî, xwênerî ber bi xwendineke nû ve dibe, wate ka li pişt hevokê çi heye? Leheng çi dibêje? Wate çi pergâlî radixe? Eve sîmayên hunerî û ciwaniya deqî ye, ku dikare hewqas babetên nedîrekt bi xwe ve bigire.

Di Gulistan û şev de, Silêvanî, di dergehê Evînê û bêrîkirinê re, qebaheta şerî bi me daye pejirandin. Wate sinorê hevoka direkt derbas kiriye û dest bi avakirina nîşanan kiriye,

¹ Hesên Silêvanî „ Gulistan û şev“ .R.26

² *Derbasbûna ravekirina nijyargerî ya çîrokê(erebî), R. Barth, werger Dr. Munzur Al eyaşî, R. 82*

³ *Franz K. Stanzel, Theorie des Erzählen= bîrdoziya vebêjyê, R. 200 2. Verbesserte Auflage. UTB 904 Vandenhoeck*

fezayekî sementîkî peyda kiriye, ku huneriya wê ji ciwaniya wê nekêmtir e. Rast e xwêner di pileya herî bilind e, di kurte-romanê de û di avakirina çîrokên nû de, bo bejna deqê berdest bi ciwaneyeke toreyî nû bixemilîne.

Silêvanî, bizav kiriye, ku bi harîkariya faktorên derveyî toreyê, bi taybetî fakterê civakî, ciwanî û huneriya deqê xwe pêşberî me bike û di rêya wî fekterê giring re, ku kartêkirina wî li ser takekesan pirr e, kiriye ta radeyeke bilind, tişt a ew dixwaze bike gencîna xwênerî. Ev di Receptionstheory de, di salên 80 û 90 iyan ji çerxê 20ê de, ji hêla hin bîrdozzanên toreyî mîna **H.R.Jaub, Jacques Leenhardt** û vê dawiyê, yê holendî **Rien T. Segers**, dema yê dawî, asoyên hêvî ji wan tê kirin, bi harîkariya çend têgehên sosiyologiyê mîna

*“ pile, nirx û rol, şirovekir û derbasî ravekirina toreyî kir ”*¹

Wate regez û fekterên derve jî, dikarin kartêkirinên giring, hem li peyamhinêr û hem li peyamgir bikin..

Serencam:

Ev kurte-roman “ Gulistan û şev”, ji hêla nivîskar Hesên Silêvanî ve, di dawîya 1987an, nivîsîna wê bi dawî hatiye û heta niha 3 caran hatiye çapkirin. 2 caran, bi tîpên erebî-farisî û cara dawîn bi tîpên kurdî, latînî, ku ji hêla

¹ R.T.Seger, *The Evaluation of Literary Texts*, ji Peter Zima, *Literarische Aesthetik=Ciwaniya toreyî*, UTB.1590, Franke R.262

weşana Lîs ve, di Gulana sala 2007an de hatiye çap û belavkirin. Ev nivîs, li ser bingeha vê cape hatiye nivîsîn.

Ez dizanim, ku ji hêla teknîkî ve, dibiwa ez bihingivim, şêweyê nivîsînê(Diyalog(drama), sîneme (vebirîn û flashback), zimanê helbestî.

Lê ji ber ku berya min çend nivîskarên rêzdar, mîna xwedêjêrazî çîroknivîs Yûnis, ku bi hêz û ciwanî û puxt û dewlemendî behsa wan şêweyan kiriye, lew ra min xwe têkel nekir, ji bilî ku bi tenê min behsê kir, ku ev teknîk jî bi kar anîn e. Roman, jiyana wan kurdan e, yên leşkeriya serdestan dîkin, jiyana mirovên hez ji roniyê dîkin, lê pêşberî astengiyan dibin, romana rewşenbîriyê li dijî nexwendin û nezanînê.

Romana evînê ye û serketina wê, li dijî guman û wiswasê. Romana wî mirovî ye, ku tenê mafê wî di bîranînan de bijî. Romana wî mirovî ye, yê bixwaze, bi ser Sefînê bikeve. Romana pirsên nehatî bersivdan e, ku li hêviya xwêner î ye.

Di dawî de, ez kesekî dawet nakim, bo xwendina romanê, lê dê bibêjim, yê nexwendî û nexwîne, ew e yê zerarmend.¹.

¹ Têbînî: min caran, têgehên, latînî, û carnan erebî bikaranîne, ji ber, min ditiye bêhtir wateya wê ya delalî dide, an jî beramberî wê min bi kurdî nizanî çî ye, vêca daxwaza lêbuhurînê ji ber wê nezaniyê ji xwêneran dikim.

Jêder:

1. Dr. Xalid Hisên, Fî nezeriyetul inwan= di bîrdoziya sernivîsê de
2. Emil Benveniste *kêşeyên zimanî yên giştî= Allgemeine Probleme der Sprache*
3. Hesên Silêvanî „ Gulistan û şev“ weşxana Lîs, 2007. R. 23
4. *Bunîyet Alnes al serdî, Dr. Hemîd Alhemdanî, Navenda Lêkolînên erebî,*
5. *Yûnis Mihemed, Meqalat neqdiye fî al nisus Se,ibeh. R. 151.*
6. *Gînadî Bospelov, Hunerî û ciwanî, wergêr Ednan Camûs. R.203*
7. *Derbasbûna ravekirina nijyargerî ya çîrokê(erebî), R. Barth, werger Dr. Munzur Al eyaşî, R. 82*
8. *Franz K. Stanzel, Theorie des Erzählen= bîrdoziya vebêjyê, R. 200 2. Verbesserte Auflage. UTB 904 Vandendoek*
9. *R.T.Seger, The Evaluation of Literary Texts, ji Peter Zima, Literarische Aesthetik= Ciwaniya toreyî, UTB.1590, Franke R.262*

Kelevajî, pirtûka Kamiran Haco

Kenê mişt êş û bêrîkirina wan çîyan

Dibe nivîsa herî zor ew be, ya ko mirov kesayetiya wî yê li ser binivîse binase. Ji xwe dema ku yên dinivîsê û yê li ser tête nivîsîn, ji yek deverê bin...

Çawa dê nivîskar xwe dûrî hêla emsiyonel bike? Dibe ji metodeke nivîsînê bo ya din cuda be.

Li vir du nerîn, an jî liberçavdîtin hene:

1. Xwêner weha tê bigihe, ku ev nivîs mîna erkekî xizmayetî ye û çepiklêdane bo hev.
2. Ji hêla nivîskarê pirtûkê ve, bi rengê bête têgehiştin, ku tiştên kesayetî derbasî nivîsê bibin. Dibe jî weha mîna peyva kurdan: „ Geyayê hewşê tehl e“ bête fehemkirin.

Ev be, yan jî ya din be, dê pêkolê bikim, xwe dûrî akam û kartêkirinên ji derve li ser deq bikim û dê bi şeweyekî bihingivim çîrokên vê pirtûka bi navê Kelevajî.

Kelevajî, pirtûkek kurteçîrokan e, nivîserê wê rêzdar Kamîran Haco ye. Pirtûk ji nav weşanên weşanxaneyê Avesta ye, ku li sala 2001, li Stenbolê hatiye çapkirin.

„Kelevajî“, ji 14 kurteçîrokan pêk têt, babetên cuda cuda, rûdanên cuda cuda û buyerên cuda, li pêşberî xwêner datîne û wî bi xwe jî derbasî rewşên cuda dike.

Ji bo ez pirr li xwênerên hêja dirêj nekim, em, pêk ve werin nav jiyana wan lehengên belengaz, lê ta dawî mêrxas, bi rûmet û kezebşewitî û welathez ji hêlekê ve, ji hêla din ve jî fîgûrên Qabîlane, bêzirav, pîrbêj û bêwate..

Sernav û nîşana vê pirtûkê, sernavê kurteçîrokekê ye, ku di pirtûkê de heye.

- **Stêrka Rijiyayî:**

Ev çîrok bi xwe, serxt û binxetiyê û susretên ku di pey danîna sinor û tuxûban re hatine, nîşan dide. Lê ji wilo bêhtir, behsê irf û tîtaleke civakî pir nexweş dike, ew jî anîna jinbirê, piştî mirina birê ye.

Di vê çîrokê de, Pêşo evîdarê Nazê, keçka gundî ye, dilê wî mişt evîn e û xortekî dilgerm e. Suruşt jî wek bayê serê wî, hînkayiyê belav dike. Ji bo babeta çîrokê were qada nivîsê, vebêjer dest bi monolojêke bêpeyv dike û birayê wî Qenco tê bîra wî.

Li vir, dîmenê nexweşiyê hin bi hin derbasî derûnê wî dibe, ta dengê teqîna mayîna ser sinor hate guhê wan. Jina wî Qenco jinbî dimîne. Li vir çîrok derbasî werçepeke nû dibe. Bavê Pêşo ji pêşo dixwaze jinbira xwe meher bike, da namûsa wan, li ba wan bête parastin.

Pêşo di civateke Paşdemayî de ye, bav xwediyê her biryarekê ye. Biryar tête wergirtin, Pêşo mecbûr dikin, ko bi jinbira xwe re, ya digotiyê keko, bizewce. Pêşo, dinya li ber tarî dibe. xewna wî ye, ku Nazê bibe hevsera wî.

Roja jinbirê lê meher dikin, ji malê derdikeve, ew jî berê xwe dide sinor û mayîn pêde jî dipeqe.

Di vê çîrokê de, Nivîser, çend qunaxan re derbas dike.

1. pesnê suruştê, ku nîşana xewn û hêviyên Pêşo ye.
2. bîrhatina, ku birayê Pêşo Qenco serxet bûye, û rola vê serxetbûn û binxetibûnê di birîna têkiliyên di nav kes û karên deverên li ber sinor „Dagîrkerî“
3. Birayra bavê û irfên civatê (Civaka paşketî).
4. Nepejiranda biryarên civaka paşketî.

Di van qûnaxan de, dibînin, ko nivîskar, siyaset, civaka patryarkî û xwestina avakirina civakeke din, pêk ve derdixe qada nivîsînê û deqê xwe jî bi vê hevokê bi dawî tîne: „*Rondik bi melûlî bi ser hinarkê rûwê wê de herikî...*“¹

• Kelevajî

Nivîskar, behsa mirovekî bi navê Evdo dike, ku li yekî digere, kela dilê xwe li axaftinê bişkîne. Fîgurekî din, ji gundê wî, belkî di temenê wî de, bi navê Hesê li ber dîwarekî bi tenê rûniştiye. Jiyana xelkê gundan, çûn û hatin, ji derve û bo gundî, qaçaxçîtî. Ji bo lertz têkeve deq de, hindekî Hesê ji axaftina pir nake, ew jî daku dijberiyekê di navbera leheng û

¹ Kelevajî, Kamîran Haco, Avesta, 2001, Stenbol, R. 11

fîgurên xwe de, peyda bike, wate, ji bo zemîn bo diyalogê xweş bibe.

Mebest ji vê yekê mentelîteyên cuda cuda ji komelegehê diyar bike.

„- *hey xwedê rihê te bistîne... ma ez kufirîm ku me pirsek ji te kir...*

Û bi tundî rabû ser xwe û bi lez meşî...Lê Evdo bi xwîna xweyî sar....., hêjî diwest çîroka xwe dewam bike^{cl}

- **Şagitê jîr.**

Ev çîrok, li ser berbendkirina zimanê kurdî li dibistanê ye, behsa zarokekî kurd bi navê Azad dike, ku mamoste ji ber zîrekiya wî, jê hez dike.

Azad ji gundê xwe, her spêde, berbi gundekî din ve, diçe xwendegehê, ji ber xwendegeh li gundê wan tune ye. Lê Azad nikare têbigihe, ka çima ew bi zimanekî din, li xwendegehê dixwênin?!. Ev pirs hişê Azad ê şagirt li hev dixe.

Azad li derfetekê digere, ku ji mamoste bipirse. Pirs bi wî re radiziya û hişyar dibû, ta derfetek dît û ji mamoste pirskir.

Lê Mamoste..; pê dikeve, lêdixe, wî birîndar dike. Azad û hevalên xwe sedema vê refleksa mamoste nasnekin.

Li vir, sîstema bicihkirina mamosteyên xwedî bîr û rayê şovenîst, li deverên Kurdistanê, diyar dike. Wisa, awayê têramana xelkê, di rêka şagirtê jîr Azad re, ku wî cureyê

¹ Ya berê, r. 15

neheqî û zulmê û nenaskirina nasnameya mirov ên din, yên ji neteweyên cuda, dide xuyakirin.

Mebest ew ye, ku siyaseta asîlmîlasyonê ji kevnesalan ve û ta roja îro berdewam e.

Di vir de jî, dîsan 2 bîr û ra diyar in: yek, dixwaze mîletê kurd xwe di rêka mamoste re û zimanê xwe jibîr bike. Ya din, ya şagirt, pê hest dike, ku neheqiyek hey. Azad, li vir, bi wê bêgunehî û savayiya zarokaniya xwe, pîrsê gerim dike.

- **Dilpakî:**

Li gora nivîskar î dibêje, wî ev çîrok li ber seqa çîrokeke, ku ji êzgeya dengê Emerîka bihîstiye, vehûnaye. Ev çîrok li ser civaka Sûriya û rewşa karkeran e, ka çawa ew karkerê bi rûmet û nebertîlxwer, di rewşeke xerab de dijî û cil û bergên qetiyayî para wî ne. Bedil û turmbêl û qesr û qûnax, yên wan in, ku melaqî, dizî û bertîlxwarinê dîkin.

Cengîr, karekî dilsoz e. Li kolmelgeha şêkir kar dike. Di mala Cengîrî de, dema tê malê şekir tune ye. Ev e, halê belengaz û dilpakan.

Dîsan duberekî di vê çîrokê de, di navbera bertîlxwer û yê durust de, di navbera yê dewlemend û belengaz de, di navbera yê xwedî bîr û bawerî û yê keysbaz de, diyar dibe.

- **Hêvî.**

Çîroka hêvî, li ser Kalekî e, ku hindek mêvan, dawiya şevê li dergehê wî didin- „Telebe“. Piştî dergehvekirinê, wann nas dike. Ew ji bo welat, xebatê dikin, di gel wê jî gazindên xwe ji wan dike, ku di demên zor û zehmet de, wan piştta miletê xwe berda. Xwarinê dide wan.

Ew jî li ber êgirê dadayî, cil û bergên xwe zuha dikin. Di guft û goya di gel kalo de, telebe soz û peymanê didin ku vê carê terka çiyayên welatê xwe nedin, ta mafê kurdan bi dest neêxin.

Ev sozên wan hêviyê bi kalo re çêdike. Bi çûna teleban re, nîvkenek, xwe li ser qermîçonkên rûyê wî nîgar dikin. Duqoliya bîr û hizrên vê çîrokê ji,man û reviyânê, xebat ji bo maf û şerê dagîrkeran, dibin sedema peydabûna hêviyan li ba kalo û diyalog dibe sedema dana soz û peymanan ji hêla şoreşger/Telebe ve.

- **Mêrxasiya Silo.**

Mirovekî gundî, temenê wî 70 sal e. Xalê Silo dikeve nav bîranîn, xewin û pesnên xwe de. Xalê Silo, li her civateke rûdine, behsa mêrxasiya xwe dike. Genc û zilamên gundî, rojên xwe derbas dikin.

Çîrokên xalê Silo bi wan xweş tê. Di dawî de, zilamên hukumetê (Muxaberat), tên xalê Silo, dibin û wî têr lêdan dikin. Xalê Silo jî, dema wî azad dikin, xwe tavêje destên wan bo biramîse...

Di vê çîrokê de, vebêjer/nivîskar, dixwaze bersiv li ser buyerên ku diqewimin, bêne dan. Ev pîrbêjîya xalê Silo, dikare mîna navtêdanê jî, bête têgehiştin.

Wisa diyar dibe, ku dezgehên hukümetên serdest in, her tiştî, devgem dikin û qet qebûl nakin, ku mirov di malên xwe de jî, behsa xwe bike, xwe mezin bike.

Tenê di wan welatan de, serok heye, serok yê mezin û cihê pesinan e. Lê ji hêla din ve, gotin û kirin ji hev têne xuyakirin.

• Destgirtî.

Biryarwergirtina mirovên xwedî vîn û pileyek zanebûn giring e. Di vê çîrokê de, 2 kesên sereke ne, wate du fîgur in, yekî birayara xwe wergirtiye, ku ji bo welatê xwe, bo şoreşê, bo azadiyê, berê xwe bide çiyê. Yê din dudil e. Ji hêlekê ve, peyvên bavê wî, ko dixwaze berê wî bide leşkeriyê.

- Li gor bav, yê leşkeriyê bi dawî tînin, dibin mêr- Ji hêla din ve, evîna wî (Sosin), ku dixwaze bibe hevsera wî. (Bavê wî sozê dide wî, ku xelas bike, dê Sosinê jê re bixwaze). Hevalê wî, bi peyvên xwe, şoreş, azadî, xebat, welat, kartêkirineke mezin li derûna wî dikir. Wî jî, dixwest mîna hevalê xwe bibe xwedî birayr.

Di dawîya çîrokê, ku dixwaze were malê. Lê ji dêvla were iznê, termê wî bi ser dê û bavên wî de tînin û ji wan re dibêjin, ku bi buyerê hatiye kuştin. Lê xebat ji bo welat berdewam e.

Ceng di vê çîrokê de, di navbera yê xwedî biryar û yê dudil e. Ceng e, di navbera awayê nû ji jiyânê, ku mirov bi xwe xwedî biryardanê be û mirovê biryara wî ne destê wî de be. Ceng e, di navbera jixwebawerî û jixwenebaweriyê, di navbera rêka rast û ya nerastiyê de.

- **Bajarvanî**

Çîroka xortekî ye gundî, ku bar dike û li bajêr bi cih dibe. Demeke gund nedîtiye, bêriya gund û kes û karê xwe kiriye. Diçe gund û li wir dixwaze, xwe wek yekî bajarvanî bide diyarkirin, - Spêdeyê qehwê vedixwe û naxwaze taştê bixwe. Lê di liv û bizavên wî de, di rûniştin û rabûna wî de, berya hertiştî awayê hizirkirina wî, hîn ya gund e.

Bizava xwerizgarkirina ji erfên gund, wek armanc diyar e, lê nehêsan e û tiştên seresere mîna vexwarina qehwa spêde û nexwarina taştê, mirov nakête bajarvanî. Monoloja yê xwedîgirevî bûye bajarî, diyalektîka di navbera rastiyê û nerastiyê, wekxwemayîne û xweguhertine de ye.

Mekanîzmên çîroknivîs bi kar tîne, mirov ji hizran, digihîne sinorê ken. Erê bi qerf û tinaziyan dinivîse, lê bi wan, rastî û kêşeyên vê guhertinê, belo dike.

- **Jiyan xweş e**

Buyer li balefirgehekê digere, ku jinek bi mêr, di gel xwişken xwe hatiye pêşwaziya mêvanekî, ku dê ji geştekekê bê. Li

qehewxanekê rûniştîne. Li wir xortekî levhatî ji, li ser mêza teniştî wan rûniştîye. Diyar e ew jî bendewariya mirovekî dike, ku dê ji sefer e bêt.

Li wir, çavên wan li hev rast tînin, dilê wan dijene. Bi awirên çavan, hest û nestên hev dixwênin. Jina 41 salî û xortê nûgihayî, di gel ku cara yekem e hev dibînin, lê dilê bo hev lêdide. Balfir dideyne.

Awirên wan li hev dikevin û her yekî mêvanê xwe pêşwazî dike û bi rêka xwe de diçe. Ew awir ûgermiya hestên hundurîn, û korpên dil, di kêrhatî wan de dimîne.

Ev çîrok tîtalên civaka kurdewarî diyar dike.

Kolmelgeh û civak maf nade jinê, ku hestekî xweş pê re peyda bibe, nedem e bibe, bi mîr û zaro. Li vir çîroknivîs bi buyereke weha xwestiya jiyana normal ya herkesî, wek rastiya wê diyar bike. Eger çendî, li gor sîstem û zagona civakê berbander e, lê rastî ew e, ku her mirovek, çi jin, mîr, xort û çî kal, dema hest dilve û dilê evînê dike korpên, êdî çu dîwar û sinor nikarin, wan hestan vemirînin û wê korpênê rawestînin.

- **Xewneke xweş**

Buyera palên pambû, yê wan qîzên gundê Maşoqê, rojavayî Kurdistan, nêzîkî bajarkokê Tirbespiyê, kartêkirineke mezin li gelek xelkê kiribû.

Ji wan jî, nivîskarê vê berhevoka çîrokan, ya ku em behsa wê dikin. Çîrok weha ye, ku qîz û keçên kurdan, ji belengazî,

mecbûr dibin, herin liqatê, pembûçinînê. Spêdeyekê, berê sibehê, jin bi pîkabê diçin û kamiyonek li wan dixê.

Qîzan, di gel xewnên wan dikuje. Nivîskar, çend babet û avahiyên biçûk di çîrokê de ava dike, mîna evîn, ciwanî, berpîrsiyariya wan li hember malbatê, daku tevna çîrokê bixemilîne, xwêner bi xwe re bigihîne wê xemgîniya, layiqî wê susretê. Li hêla din, rewşa aborî ya xelkên herêmê diyar dike. Ji bilî wê jî, awayê jiyana xelkê deverê, wek heyî vedihûne.

- **Bextreşî.**

Hemo pir ji Elî hez dike, behweriya wî bêsinor pê têt. Herdû ne di yek rêxistinê de ne. Hemo di gel 15 kesan êrîşî qereqolê dike. Vêca ew qereqol ya kê ye? Pirs li vir e. Ji xwe eve trajîdiya kurdan, ji sedê salan de ye.

Bira, bira dikuje. Bi hêsanî dikevin pîlanên û davên dijminan de. Berjewendiyên nehezên xwe bi cih tînin. Çîroknivîs, wan herdû fîgurên hevtemamker, lê di eynî demê de, dijberîhev, derbasî tevna çîrokê dike, daku susretê bigihîne, sinorê dawî ji qerf, mixabinî, bêpersiyarî û kembaxiyê.

Li dawiyê, yê fermana îşkencê dide, dostê Hemo yê pêbawer, Elî ye. Êdî bextreşî û malxirabûn, êş û gomana Hemo destpê dike, mezin dibe.

Baweriya wî bi xebatê kê m dibe.

Elî biryara berdewamiya işkencê dide. Nivîskarî xwestiye ev çîrok, protestoyek be li dijî her yekî kurd, ku şerê birayê xwe bike, çendî bîr û baweriyên wan ji hev cuda bin.

- **Egal**

Di çîrokê de, Kamîran behsa tîtalekî dike, ku ketiye nav kurdan de. Danîna egalê li ser destmalê, ne ji cil û bergê kurdan e. Min bi xwendina vê çîrokê, tola gelek salên nexweş yê çûyî, bi ken hilanî. Baş bû, kesekî ez nedîtîm, dê bigotaya ev mirovekî şet e.

Çîroknivîs li ser zarê lehengê xwe dest bi pesin û erênîyên egalê dike. Dema dikeve zindanê, egal dibe çekekî, li dijî wî, têr lêdan dikan.

Di nav re, xwediyê egalê tîne bîra xwe, ko bav û kalên wî kom û koloz didan serê xwe. Di çîrokê de, nivîskar rola oldaran, di derbaskirina tîtalên biyanî diyar dike û wan tewanbar dike.

Vebêjer, pîvanê di navbera başî û xerabiyên egalê de dike.

Li dawiyê, ku ew bi xwe zîyanê jê dibîne, êdî nema sûde dike.

Li vir, çîroknivîs, ev simbola biyan, kirye behane, ku tiştêkî giring bibêje, beriya mirov karekî bike, pêdivî ye, li pîvanên xwe baş bikole, daku li karê kirî poşman nebe.

• Bijî Kedxwarî

Selîmo, lehengê vê çîrokê ye, biraderekî li binxetê, xebatkarê partiyeke siyasî ye. Selîmo kar û barê xwe yê siyasî, li nav gundiyan dike.

Berpirsiyariya wan dike. Camêr xwedî nav e, bi ziman e, xwedî tiyoriyeke baş e. Di danûstendinê û rêvebiriyê de, dikeve hin şaşîyan.

Bi duçerxê xwe (Piskilêt), li gundên pê ve girêdayî digere. Hêviya wî, piştî bidawîhatina civînan, xwarineke xweş bixwe. Xwarina xweş moral dide Selîmo, ku xebatê bi hêz bike.

Lê vê carê, Selîmo, mêvanê xebatkarekî ye, ku neamade ye, mirîşkên, ku debara malbata wî li ser e, bide mêvanê xwe.

Selîmo tore dibe û dixwaze bi fen û fûtan û bi navê programa Partî, goşt bixwe. Çinaro yê belengaz û xizan, ji ya xwe nayê xwar, tenê mast û hêkan pêşniyar dike.

Çinaro, li Selîmo vedigerîne, û dibêje:

„ Bi *rastî min progama partî ne xwendîye, lê min zanîbana programa partî wisa ye, ez nediketim partî de...*“¹

Piştî demekê nameyek ji serokatiya partî tê û Selîmo ji partiyê tavêjin, bi sedema ku ew li dijî pêşketinê ye.

Ev çîrok nameyeke, an jî mîna waneyekê ye, bo serkêşiya tevger û endamên wê jî, ku xebat, li ser bingehên zanistî û

¹ Kamîran Haco, kelevajî, r. 15.

moderin bête kirin, dûrî berjewendiyên kesayetî û xwenepixandinê.

• Leheng

Çîroka lehengekî kurd şoreşger e, ku ji çiyayên welatê xwe hez dike.

Şîreta kalkê xwe tîne bîra xwe. Li wir, li ser wî çiyayî, pirsên berê, yên ji kalkê xwe dikirin, têne bîra wî û ji nuh ve, di keser û axînokên kalkê xwe digehe.

Li çiyê azadî heye. Li hêla din jî xebata ji bo welatê xwe, parastina xaka xwe û bidestxistina mafê milletê xwe heye. Di tevna çîrokê de, lehengê bênav, bi kuştina leşker dilteng dibe. Xeyal di hişê wî de, digerin.

Dibe hindê ji xizim û malbatê, an jî dezgîra wî, bendewarê wî bin. Mixabiniya xwe li hember wî şerê li ser wan ferz bûye tîne.

Çi bike? Eger wî ew nekuştaye, dê leşker ew bikuştaye.

Di dawî de, dema şerê xwe dikin, li derdora qereqorê kom dibim, birîndar dibe,.. şehîd dikeve. Li ser rûpelên kaxezên wî, peyva Aştî hatiye nivîsîn...

Bi giştî ev in naverokên çîrokên berhema pirtûka kelevajî ya Kamîran Haco. Tevin û tevngirêdan, vebêjî û forma wê,

ciwanî û bingehên wan çi ne? Dixwazim bi xwendinekê bihingivin wan û pêkolê bikim, ko çirûskekê bavêjin, nav tariyê, belkê êdî bi xwendinên din, ji hêl û derdorên din, ji tariyê, ronî bizê.

Di şirovekirina çîrok û vebêjiyê de, mirov dikare bi gelek rêbaz û metodan, lêkolînan bike. Piraniya çîrok û romanên, li ser du2. rêbazan hatine şirovekirin ew jî ev in:

1. Şirovekirina civakî, mebesta wê wek li nik **Lukács û Goldmann**, ku hevahengiya di navbera struktûra tiyorî û struktûra civakî de, diyar bike.“ **Homologie der Struktur**
2. Rêbaz, an jî xwendegeha şirovekirina derûnî, bi hemî şaxên xwe ve „Freud/Lacount/C.G.Jung. Ev tiyorî, giraniya xwe berdide, ser tiyoriya ne Hest “théorie de l ,inconscient, ku struktûra edebî, wek xîtabeke zor î çarçefkirî ya nehestane. Nimûne bo vê yekê lêkolîna Freud li ser pirtûka Jansen „Kradîva“ û ya Lacount li ser çîroka d, Edgar Poe ya bi navê Nameya hatî dizîn“

Dema mirov bixwaze, deqekê şirove bike, giring e ew nîşan û kiryarên hundurîn yê kirdeyan li ber çavan bêne dîtin. Ew jî bi sê rengan diyar dibin: „

1. Nîşanên kes, cih û demê

2. Çiloyiya vegotinê „çespandin, behwerkirin, dibenabe û goman“
3. Nîşanên nêrînan, ku bi nerîna vebêjer ve girêdayî ye.“
1

Xalên liserawestan pêdivî ye ev in:

1. Forma vebêjiyê

Di pirtûka li ber destê me de, Kelevajî, Nivîskar bi xwe vebêjer e. Lewra pêdivî ye em bizavê bikin, ku têgeha Vebêjiyê li ser 2 xalan vekin:

- Çîrok, ku buyerên taybet û guncayî bi xwe ve diigirin.
- Pêdiviyê rêka vebêjiyê bête destnîşankirin.

Li vir, nivîskar e, yê behsa buyeran dike, cih û deveran destnîşan dike.

Nimûneyek, ku nivîskar ne vebêjer be, tune ye, ji bilî, dema dibe diyalog, an jî monolog. Ji xwe:

„*Vebêjerî regezê bizava demê di vegotinê de ye, pesin alavek û, wêneyê cih dadimezirîne. Du biyavên vebêjiyê hene :*

1. *Biyava serrast. (Dem, vegotin û tendensa demê diyar dike).*

2. *Serjêrî. (Biyava ku cih destnîşan dik û hemî tê de digerin).*

¹ بلاغة الخطاب وعلم النص د. صلاح فضل عالم المعرفة 164 ص/99

*Û di yekbûna herdû biyavan de, valahiya „Space“ çîrokan
ava dibe“¹*

Di forma EW de, nirxê edebî û karîgeriya ciwaniyê, di encamê de, deq destnîşan dike. Eger nivîskar bi forma sêyan EW çîrokên xwe binivîsîne, tê wê wateyê, ku dê bi 2 rolan bilîze û 2 erkên wî jî hene-

Li ba Kamîran, erk û rol di nav hev de hatine buhujtin- ku jê re dibêjin: („Form of doppel Perspektive (Knower and Sayer)“ wate zanewer û vebêjer, da bikaribe hoşyariyê bide û bibe berdevkê xwêner.)²

Nimûn: „*Bi vî awayî Cengîr karê xwe bûrand.....Cengîr gelekî westiya bû û birçî bûbû. Deriyê malê vekir, roniya çirayê da rûwê wî.... Û nedixwest jina xwe ji xew şiyar bike....Pîreka wî ser xwe ji nav nivînê rakir derxist û bangkir:*

- *Cengîr, ma te xwarin dît?*

- *Belê min dît.“³*

Eger em ji xwe re li vê nimûneyê temaşê bikin, dê bibînin, nivîskêr li ser Cengîr dinivîse, wek ko ew bi xwe ye û hemî tiştî jê dizane, tanî ku dizane, ka çengîr çawa hizir dike.

¹ . *Physiologie des Romans Nelly Cormeau. ji pirtûka Wolfgang Kayser
“Wer erzählt den Roman“ Klotz Darmstadt 1965 R. 197.*

² *Theorie des Erzählens; Franz K. Stanzel, UTB çapa diwem, 1982. R. 22*

³ *K.H., Kelevajî, r. 22*

Çawa dûrî fen û fûta ye, çawa naxwaze jina xwe ji xew hişyar bike. Bi peyvekê nivîskar, dibe vebêjer û dibe xwêner.

Di gel ku xwêner dikare weha jî bibîne, ku nivîskar wek dixwaze, deqê xwe bi rê ve dibe û kartêkirina xwe li lehengê xwe dike. Fîgur dibe berik di destê nivîskêr de, wî li gor idolojîya xwe dibe û tîne.

Eger em ji hêleke din ve temaşê bikin, dema vegotin dibe diyalog, forma vebêjiyê tête guhertin û em li hember deqekî dînamîkî radiwestin. Êdî mîkanîzma liv û tevgerê, ta bi asoyên dawî vedike. Wisa jî, rêkê li ber deqekî asofereh vedike.

Deqekî bêdawî, an jî bi dawiyê ve kirî, bêdumahî, li ber xwêner dideyne. Ji xwe Dînamîkiya van kurteçîrokan, di dawîlênehatina wan de ye û nimûne jî :

Stêrka rijyayî“ Rondikek bi melûlî bi er hinarkê rûwê wê de herikî...“¹

Kelevajî „*Hêjê dixwest çîroka xwe dewam bike.*“².

Şagirtê jîr“ *Ji xwe re digot çima mamoste ji ber pirseke piçûk bîna wî teng bû, bi vê dijwariyê lêxist..?!*“³

¹ K.H., Kelevajî, r.11

² Ya berê, r. 15

³ Ya berê, r. 18

Deqê vekirî, xwêner dike beşekî bingehîn ji prosesa dahênanê û wî bi çîrok û serencamên wê ve girêdide.

J.Habermas dibêje:

„ Vebêjer ê EW, buyer, mijar, cih û demê hildibêjer e, dinexîne, bi me dide hestkirin û wek dixwaze, jiyane bi me dide nasîn û li ber me-wek ew dibîne- nehênîyên wê eşkere û diyar dike“¹

2. Fîgur û leheng:

Leheng û fîgurên çîrokên pirtûka **kelevajî**, fîgurên sade ne, xebatkar û têkoşer in, karkerên dilsoz in, pale ne. Bi giştî, tev ji civaka gundan tên, ji bilî Selîmo, di çîroka Bijî kedxwarî de, û xwêner dikare lehengên, çîroka Dilpakî û ya Bextreşî jî ji bajêr li qelem bide.

Lehengên wî yên jin, di çarçefa evîna laş û şikandina rêesmên civaka paşketî de dilivin.

Lehengên wî, mirovên di civatê de berhemdar, lê ne karîger in, wate nivîser bi xwe bi kar û erkên wan radibe.

Fîgur, dema hest dikin û diramin, li ber çavan tene girtin, lê wek vebêjerekî bi xwêner re napeyive. Wate, ne ew diaxive, li vir, xwêner êdî mecbûr dibe, fîgur bi xwendina xwe bixwîne û şirove bike.

¹ J . Habermas, Die Universalitätsanspruch der Hermeneutik in Hermeneutik & Ideologie-Kritik. Frankfurt/M. S.159 sal 1971,

Lehengên pirtûka kelevajî, bi bawerî, jiyana xwe, wek xwe, wek nivîser dixwaze, bi rê ve dibin.

Ji xwe, di dawî de, nagihin armancên xwe, lê armancê bo nifşên din zelal dikin.

Ev xal siha xwe tavêje li ser hemî çîrokan û atmosfêra çîrokan di valahiyekê de dihêle. **R. Jacobson** dibêje:

„ Ev daxwaza Nivîskar/vebêjer e, ji bo bihêzkirina huneriya çîrokê û gihandina wê bo pileyeke bilind ji estatîkê“¹

Kesayetî di çîrokê de, sereke ye, mîna navend di şanê de.

Di hundurê wan çîrokan de, kesayetiyên nesereke jî hene, rol û kartêkirina wan li fîgurên bingehîn, mezin e. Ew jî di hundurê bîranînên lehengan û monoloja wan de, diyar dibin.

Bo nimûne Kalik di çîroka **Leheng** de. Sosin û hevalê wê yê çûyî leşkeriyê, di çîroka **Destgirtî** de. Zarokên bi **şagirtê jîr** e di xwendegehê de û...

Ev bi xwe babeteke bi serê xwe ye, mirov dikare bi ferehî û li ser bingeha çarçika Semiyotîk „ Carré sémiotique“, Ya Grimas, lê bikole, hinga hinga dibe babetek bi serê xwe.

3. Cih û deverên çîrokan:

Mijar û babetên vê berhevokê, cihê wê, valahî û boşahiya wê, destnîşan dikin.

¹ Die Typologie des Erzählers. B1. S.346-392. Den Haag-1962

Bi giştî, em, dikarin bibêjin, ku qad û meydana lehangan, serxet û binxet e. Hilbijartina vî cihê, û kirina meydana liv û tevgera lehangên xwe, bi meremke siyasî ye. **Kamîran**, dixwaze, di rêya kar û çalakiyên wan lehangan re, giringiya deverê diyar bike û ez dikarim bibêjim, dikariya ta radeyeke baş ciwanî û giringiya deverê bi xwêner bide qebûlkin.

Ne tenê pê bide pejirandin, belkî wî berbi wê qadê ve bikêşe û sempetîya wî ji qad û lehangan re bi hêz bike. Bi wateyeke din, qad kiriye hêlîna idiyolojiya xwe.

Derdor, cih, dever, di tevna çîrokê de, regezekî pir giring e û bêyî wî nabe û..

“ *Eger tevin û lehang, navend û kakilê şanê bin, dever, ew Sytoblazma ye, ku kakil û navend tê de melevaniyê dikin*“ ¹

4. Ziman

Wek me li jor nivîsiye, ji ber ku meremeke siyasî, li pey wan çîrokan, heye- di gel yên civakî, tîtal û nîştimanperwerî- û hatine idiyolojîkirin, dê zimanekî weha di asteya lehang û deveran de bî, daku bigihe merema xwe û xelkê pê hişyar bike, an jî bi kêmanî wan agahdar bike, ko metirsiyan li ser jiyana wan heye.

Di destpêka çîrokan de, an jî di nav tevna çîrokan de, pesnê dever (çiya), qîzan, kela dilê evîndaran dike.

¹ *Physiologie des Romans Nelly Corneau. ji pirtûka Wolfgang Kayser “Wer erzählt den Roman“ Klotz Darmstadt 1965 R. 197.*

Zimanê pesnê bi kar tîne. Pesin nîşana cih e û buyer nîşana demê ye.

Di çîroka yekê de, her bi pesin dest pê dike:

„*Hundurê odê bi ewrên wê roja buharî tarî bûbû û li derve xunaveke hînik û xweş pê re dihat, bêhna axê bi xwe re tanî*“¹

Li vir hevoka pesnê hevokeke dirêj e.

Ev xesletên pesnê ne, lê hevokên buyeran kintir in, bo nimûne jî, her ji wê çîrokê û di wî rûpelê de, ji ber ku karek dibe, aksiyonek dibe, hevok kurt e .

„*Pêşo. Li ber pencera vekirî rûniştibû û li derve dinerî..*“
„*_ tu dibêjî wê qîma xwe bi min bîne?*“²

Di hin deveran gelekî vebêjyê dirêj dike, bêy ku pêdivî pê hebe:

„*Kalo, li qelevîska rûniştibû agir xweş dikir, qermîçonkê rîwê kalo, nîşana meznayiyê bûn*“³.

Dema mirov dibêje: Kalo, xwe berya vê hevokê jî diyar e, ku kal e, êdî pêdivî nîne, ku weha deq û hevokan zêde bike. Ev ziyane digihênin deq, ji hunerî û ciwaniya pergala buyer tê de, kêr dike. Ne tenê li vî cihî, belê di hindêk çîrokên din

¹ K.H., Kelevajî, 9

² K.H., kelevajî, 9

³ ya berê, r. 27

de jî, pergâlê dide diyarkirin û dîsan dest pê dike, ku şirove bike û pesin vedihûne.

Di çîroka kedxwarî de, dîsan hevokên, ku dibin barekî giran li ser deq, bêy ku sûd jê hebe pergâlê dubare dike:

„ .. *Lê belê gotin tiştêk e û kirin yeke dine..Carna Selîmo dikeve şaşîna praktîk de...lê di hêla teorî de tu caran şaş nabe..*“¹.

Dubarekirina pergâlê, karekî nerewa ye, ji ber ku hevoka pêşî, wateya zanîna bi tiyorî û şaşiyê parktîk diyar dike.

Tiştê herî balkêş, di vê pirtûkê de, gelek ji wan çîrokan, bi hevokên yek wateyê bi dawî dibin:

Stêrka rijiyayî „ *Rondik bi melûlî bi ser hinarkê rûwê wê de herikî..*“²

Şagirtê jîr: „ *xwîn diherikî.. çima mamosta ji ber pirseke piçûk bîna wî teng bû û bi vê dijwariyê lêxist..?*“³

Dilpakî: „ .. *û pêre pêre hêsiran di çavê wî re avêt*“⁴

Hêvî: „ ..*roniya êgir dida rûwê kalo, hêsir ji çavên wî dihatin û tevlî dilopên baranê dibûn..*“⁵

Ev bi xwe pêdivî bi tu komentaran nîne.

Bi vî awayî, hemî çîrok, forma deqê vekirî bi xwe digirin.

Dibe armanca nivîskêr têkelbûna xwêner e û hestkirina wî bi

¹ Y.b, r.57

² Y.b, r. 11

³ Y.b, r. 19

⁴ Y.b, r 23

⁵ Y.b, r. 27

êş û azarên xelkê belengaz, yê şoreşger, yê dilpak e. Her weha Kamîran di çîrokên xwe de, di vê pirtûkê de, bizav kiriye, hemî regezên çîrokê, ji dem, cih, leheng, buyer, vegotin, form û naverok, di gel hev bike yek û hemî pêk ve, bi erkekî rabin, ew jî xizmeta bîr û behweriyê wî ne. Mirov dikare di hevokekê de binivîse“ ji bo, welatê xwe, xebatê bikin, çiya û deverên xwe bernedin“ .

Di çîroka **Leheng** de, siloganeke din hildide Aştî..“

Li ser vê xalê Baxtîn, bi xwe jî dibêje: „*endazî û strûktûra çîrokê watiya xwe ya gelemper bi bihevrekarkirina hemî hûrbîn û regezan, distîne*“¹.

Di dawiya vê pirtûkê de, çîroka bi navê **Leheng** heye.

Di vê çîrokê de, guhertin, di behweriyên vebêjer/ nivîser de çêdibe û ber bi aştiyê ve diçe. Awayê bikaranîna tevna çîrokê û tevgirêdana wê, dişibehe tevna romana Ulysses ya J. Joice û Çiyayê sibirbaz ya Thomas Mann.

Di herdû romanên de, em lehengekî dibînin, bi xwe re diaxive, bersiva xwe dide, monolojeke kûr e, lê xwedî konsept e û di tevnê de, tayê konseptê diyar dibe.

Di çîroka Leheng de jî, fîgurê çîrokê, ku bênav e û bi mebestwate leşkerê nepenî ye- bi xwe jî hizir û bîran tîne bîra xwe û bi taybetî, dema ku wî leşkerê, tê şerê wî dikeve mitalan de, çima min kuşt?

¹ نقد النقد، تزفيتيان تيودورف. ترجمة سامي سويدان. منشورات مركز الانماء القومي. ص75

Belkî dezgîra wî, an jî xizmên wî bendewarê wî bûn.. Li vir dest bi girêdana yekem ji tevna behweriya xwe dike û di dawî de, konspet jî aştî ye.

Di şirovekirina derûnî ya C.G.Jung de, li ser Ulysses, kesaytîkirina(narrativer akt), fiilê/ karê vegotinê, motîv û formê vebêjîyê, guftûgoyeke vekirî bi hev re dikin, tanî dibin diyarok (diyardeyên berçav di hundurê lehengan de û dibe „*bixwebehwerbûna leheng û fîguran bi xwe*“¹).

Li vir, ew monoloja bi leheng re çêdibe, di gel ku şer dike, lê tenê peyva AŞTÎ li ser her kaxezekê li ser deftera bîranînê wî heye.

Jêder:

1. Kelevajî, Kamîran Haco, Avesta, 2001, Stenbol,
2. 99/ 164 بلاغة الخطاب وعلم النص د. صلاح فضل عالم المعرفة
3. *Physiologie des Romans Nelly Corneau. ji pirtûka Wolfgang Kayser*
“*Wer erzählt den Roman*“ Klotz Darmstadt 1965
4. Theorie des Erzählens; Franz K. Stanzel, UTB çapa diwem, 1982. R. 22
5. J . Habermas, Die Universalitätsanspruch der Hermeneutik in
Hermeneutik & Ideologie-Kritik. Frankfurt/M. sal 1971
6. Die Typologie des Erzählers. B1.. Den Haag-1962
7. نقد النقد، تزفيتيان تيودورف. ترجمة سامي سويدان. منشورات مركز الانماء القومي
8. C.G. Jung. Typische Erzählungssituationen.

¹ C.G. Jung. Typische Erzählungssituationen. S. 142f

kelehên ava. P.S. Dêreşî

Derxistina kelehên ava ji kêrahiya dêrokê û melevaniya Seîd Dêreşî

Gera li kilasîkan, di nav rûpelên dêroka mirovayetiye de, li def miletên xwedî desthilat û azad, karekî normal û pêdivî ye. Lê vekoler pêrgî çî asteng û aloziyên giran û zor nabe. Ji bo miletêkî wek miletê kurd, ne tenê zor e, belê bêhtir ji zoriyê ye, ji ber sedemên dagîrkirinê û berbendkirina mirov, nasname, ziman, ba, xak û kultûra kurdan. Lewra vekolîna di vî warî de, ji bilî, ku erk e li ser şanê rewşenhizr û bîrewerên me, belê karekî pîroz e. Vekoler hemî astengan, ta bigihe têkçûna xwe ya fîzîkî, li ber çavên xwe dideyne.

Pirtûka Kelehên ava, ji hêla vekoler Seîd Dêreşî, bi cefayeke pîr û karekî zor, giha ber destên xwênerên kurd. (lê mixabin, bi tenê bi tîpên aramî hatiye weşandin) Li ser qapê dawî vekolerê pirtûkê weha dinivîse : „Berkarê vê kitêbê verêja çend sala jixwewestandinê, verêja rêvîngiyekê ye ji vê qana erdê bo qana henê, ji vê dewletê bo dewleta henê, ji vê qolaçê bo qolaça henê, ji kulînka vê

mizgeftê bo kulînka mizgefta henê, heta perekî yan çend perê diryayî û tozgirtî û hibir lê heşftî bi dest xwe bêxî.

Serê çend sala ye ez van perkên helweriyayî vediçemînim heta eve jê derkeftî. Wesa xuya ye ku miletê me di kevin da û heta niho jî bihayê van perka nezaniye, nizanin ku dîroka me tê de ye, jîna me ya rewşenhizrî, bingehê me yê çandî dê li ser wan hêt avakirin, her wekû tevaya miletên dinyayê xwe li ser vê çendê ava kirî“ r.5

Ez dikarim bêtirs bibêjim, ku S. Dêreşî, di warê çûyîna di nav cergê dîroka wêjeya kurdî de, tozhilandin ji ser rûpelên wê, derxistina vê wêjeyê ji tariya dîrokê û pêşkêşkirina wê bo xwendevanên kurd û her mirovekî bixwaze kevnetora kurdî binase, yek ji melevantir vekolerên kurd e.

Seîd ê Dêreşî, ji demeke dûr û dirêj ve, di warê xepardina edebiyata kurdî ya kevneşop de hatiye naskirin. Pirtûkên wî li ser jîyan û berhemên helbestvanên kurd Feqiyê Teyran, M.Ehmedê Nalbend û Wîdayî, ji bilî derxistina komelek gotar û vekolîn di kovarên wêjeyî kurdî de, li derve û hundurê welêt de, pirtûkaxaneya kurdî dewlemend kirine . Lê di vê pirtûka ko em dê li ber çavên xwenêran raxin, cefayeke mezin kêşaye. Dêreşî li gelek welatan û deverên rewşenbîriyê geriya ye(Berlîn, Başûrê kurdistan, bakurê Kurdistan ..), pisiyar ji her kesekî ko bi kilasîkan ve mijûl e, kiriye, guh li her yekî ji wan girtiye û her têbîniyek li def

xwe nivîsiye, tanî ko reşbelek û belegeyên xwe danehev û bo me di qewarê vê pirtûkê de pêşkêş kiriye.

Pirtûka Kekelhên ava, komeka vekolîn û têkstên kilasîkî, bi pîtên aramî (erebî, farisî), di sala 2005an de, ji hêla weşana Spîrêz ve, bi spasî, hatiye weşandin û belavkirin. Pirtûk ji destê mezin e DINA 4 e û 556 rûpel e. Vekoler, bi berahiyekê dest bi nivîsa pirtûkê dike û bi nivîsa wî ya bi sernavê DÎ(u)mahîk bi dawî tîne.

Di destpêkê de (Berahî), Dêreşî behsê wê hindê dike, ko dema mirov bixwaze li ser dîroka kurd ya kevin û kevnarên kurdan binivîse, pêrgî pir astengan dibe, ta digehe wê pêpeloka, ko êdî çî di destan de, ji bilî mixabinî û gazindan neman.

Wan gazindan jî li her war, kes û diyarokan de belav dike. Bo wê jî destê xwe avêtiye, pêşgotin (Dîbaca) a Hemza Begê Meksî ya ji bo Mem û Zîn ya seydayê E. Xanî, ko li Amûdê sala 1947an hatibû çapkirin û parçeyek jê di vê pêşgotina xwe de bi cih kiriye, dako wê behweriya xwe ya me li jor nivîsî biselimîne.

Di parçê dawî di pirtûka kelehên ava de, di bin sernavê Dumahîk da, behsê babeteke pir giring dike, ew jî helbesta nûjen (Nûxwaz, serbedayî) ye.

Diyar e, nivîserê me jî, mîna nivîserên neteweyên serdestî me (ereb, ecem, tirk), ketiye nav wê guftûgo û gengeşiyê de: Eya helbest di dema mirinê de ye? Rola helbestê lawaz bûye an na? Hîn rola helbestê ma ye?

Bi taybet di vê pirsê dawî de, nivîser vekirî dibêje, êdî cih ji rondik û zêmaran re nemaye û piştî sala 1991ê, ko hemen hemen welat çêbûye, avakirin bo wî divêt û cihê helbestê nemaye. Pirs li vir têtê kirin: Baş ev welatên, ko azad bûne, pêşketine û bûne xwedî kartêkirineke mezin, divêt dest ji helbestê berdin? Çima hîn helbest di nav wan de heye? Çima hîn helbestvan dibin xwedî xelat û nîşanan, mîna Nobel, Kurt Tucholski, Erich Mariya Remark û...tbd.? Aya erk û rolê helbestê, tenê bo zêmar û rondikbarandinê ye?

Naxwazim li vir pir dirêj bikim, çimkî ev babetekî serî bo heye, lê bi dawî nabe. Tenê dixwazim bibêjim: ko ew helbesta rola wê hişiyarkirina xelkê di dema şoreşê de bû, îro rola wê bilindkirina asteyê hunerî ye, dewlendkirina ciwaniya ruhê mirovî ye, vekirina asoyên nû li ber zimên e, bêhinvedana wî giyanê ko ji şer, ceng û kefteleftê westiya ye, dane wateyeke din bo ciwanî û bedewiyê ye û beriya hertiştî, vehûnan zimên bi terzekî nû û berçavkirina ciwaniya veşartî ya vê jiyane ye. Helbest bêhinvedana ruhê jiyane ye, bi gerdûnê re xwe nû, keşxe û bedew dike.

Seîd Dêreşî di vê pirtûkê de, melevaniyek di dîroka toreya kurdî kiriye, kedeker pîroz û bêwestan daye. Derbasî quncikên tarî yên dîrokê bûye. Ji bo armanca xwe bi vir da û wir de, li dûv reşbelekê, nûçeyekê, çûye. Di pirtûkxaneyên mezin de, ko bi sedê hezaran reşbelekên hemî neteweyan û bi gelek zimanan di wan de heye, giryaye. Lewra em pirtûkek dewlemend, bi qelîte û pir agahiyên nû û navê nû dibînin.

Dibe, ko navên hinekan di pirtûkekê yan ya din de hatibe, lê danehev, lêpîrsîn û vekolîna li ser van reşbelekên, di rewşa neteweyekî mîna netewa kurd, karekî yekcar zor û aloz e.

Nav û naverokên Pirtûka Kelehên ava

1. Berahî
2. Jîna Feqiyê Teyran
3. Cihê jidayîkbûna Feqiyê Teyran
4. Dîroka torevaniya kurdî ji kîjan xalê dest pê diket?
5. Hêşetê di felsefa Feqiyê Teyran da
6. Nûbihara Xanî xwendengeheke hêja ye
7. Nûbihara Ehmedê Xanî ne bes Ferhengek e
8. Mela Mihemed Emînê Helalî û jîn û berkarê wî/ Pişka êkê
9. Îcazename li Kurdistanê..mînak: kitêba Mella Mihemed Emînê Goyanî/p.2
10. Diyaroka xwekuştinê..Xwekuştin li nik Nalbendî
11. Nalbend û helbesta Feslê Salê
12. Mirina Kurî
13. Feqî Reşîdê Hekarî û 2 helbestên wî

14. Kurtiyek ji dîroka jîna şêx Eliyê Hekarî
15. Ramana Beyt di ezmanê kurdî de.. û tekistek ji beyta Leyl û Mecrî(û)m
16. Strana Meriyem Xanê „ Were Domam“
17. Elî Herîrî, Maçin, Hesên û 3 helbest
18. Wîda,î
19. Berîkana di navbera Melayê Cizîrî û Mîr Îmadîn da
20. Madih
21. Mehmûd
22. Mustefa Beg
23. Mihemedê Zêbarî
24. Mela
25. Melayê Bateyî
26. Tahir
27. Şêx Mihemed (Huznî)
28. Sewadî
29. Mela Mihemed Emîn Berçî
30. Helbestên sêwî
31. Şêx Nurredînê Birîvkanî û beyta Qiyametê
32. Beyta Sekratê ..F.T? şêx N.B.?
33. Terkîba Mela Yûnis ê Herqînî
34. Dî(u)mahîk.

Em dikarin bibêjin, ko Seîd, di vê pirtûkê de, gencîna toreyê kurdî piştî vekolîn û lêpîrsîneke hûrbîn kom kiriye. Dibe ko pir zor be, ez li ser wan her 36 sernavan binivîsim ji ber du sedeman:

1. Dê nivîs pir dirêj bibe

2. Hinek ji wan bi tenê helbest û nav in û destnivîs ji kû wergirtiye.

Tiştta bo min balkêş, wek xwênerekî, ko ji demeke dirêj ve, vî vekolerî (S.Dêreşî) dişopînim, bûye pisporekî bêhempa li ser helbestvanê kurd î nemir Feqiyê Teyran.

Di kelehên ava de jî, bi dûr û dirêjî li ser Feqe nivîsiye û her careke li ser Feqiyê Teyran dinivîse, bi temtêleke nû û agahîyên nû û balkêş dide. Diyar e Feqe zeriya yeke bêbinî ye. Di vê Pirtûkê de, xaleke pir giring diyar dibe. Dibe ko li xweşiya gelek kurdan neyê, çimkî miletekî wek me kurdan hewqas sal bindest, dixwaze xwe bavêje devlinga dîrokê bo zanavê xwe biçespîne û bibêje va ez jî heme ji ber bapîr û filankes û bêvankes bûn.

Seîd, diyar dike, ko guman li ser nivîsîna Baba Tahir bi kurdî heye:

„ Lewra min divêt bibêjim, ko di destpêkê de, dema min hin nivîsên li ser Baba Tahir dixwendin, ez gelek kêfxweş dibûm ko helbestvanekî kurd di serdemekê husa kevin da bi kurdî binivîst..lê piştî min çend çarînên wî li vêrê û wêra he xwendin û ez li kurdiya wê geriyam, bi rastî û mixabin bêhêviyek bo min çêbû, ez ketim gumanê ko evî helbestvanî bi kurdî nivîsîbit“ R.28

Dibe ev giran be, an jî lêkolîn derkevin û biçesipênin, ko lorî jî zaravekî kurdî şêrîn e, lê bi rastî, eger kesek an miletek wî hestî neke,ko ji neteweyekê ye, bi çi mafî em wî mecbûr

bikin?

Wek li jor jî hatî nivîsîn ko pirtûkê 2 alî bi xwe ve girtine:

„ Di vê kitêbê da, min du al bi xwe ve girtîne:

1. Çend vekolîn li ser F.Teyran, Ehmedê Xanî, Reşîdê Hekarî, Mella Mihemed Emînê Goyanî, îcazenameya li Kurdistanê, şêx Eliyê Hekarî, Ehmedê Nalbend û çend mijarên dî

2. Hindek têkstê helbestvanên kevin, mîna: Elî Herîrî, Maçin, Hesên, Wîda,î,

Berîkana di navbera Melayê Cizîrî û mîr Imadîn da, Madih, Mehmûd, Mustefa Beg, Mihemedê Zêbarî, Melayê Bateyî, Mela Mihemed Emînê Berçî, Tahir, şêx Mihemed, Sewad, şêx Nûrredînê Brîvkanî (beyta qiyametê), Ehmedê Hekarî, Terkîba Mela Yûnisê Helqînî û hindeke din“ r.6 Nivîser tiliya xwe dideyne li ser gelek birînan, ko eve demeke dirêj di dîroka toreya kurdî de, hemen hemen cihê xwe girtine, bê ko lidûvçûn li pey wan hebe. Yek ji wan xalan, hebûna helbestvanekî kurd, bi navê Ebdulsemmed Babek e.

Du nivîsevanên kurd yê qedirgiran li ser vî helbestvanî nivîsîne, yek ji wan xwedêjêrazî Sediq Bahadînê Amêdî ye, ko dibêje min helbestên wî bi erebî dîtin û pirtûka wî ya helbestî sê muceled in. Yê din şehîdê nivîskar Mele Enwerê Mayî ye.

Sêid dibêje: Seyadyê Mayî, behsê xwedêjêraziyekî dike, ko komelek ji helbestên farisî û kurdî tê hebûn dane min, min jî

di nav rûpelan de, dît ko helbestvanekî bi vî navî (Ebdulsemmed Babek) helbest bi kurdî nivîsîne“. Her weha berdewam dibêje: „ Heta niha bijlî gotina nemir Mayî, di çî jêderan de, nehatiye ko wî bi kurdî nivîsînek hebe“ r. 26 Wate Ne ew keşkoleya seydayê Mayî behs dikir hatiye dîtin û ne jî di çû jêderan de, hatiye ku ew nav bi kurdî nivîsiye. Seydayê Mayî di kovara Ronahî ya hijmara 5-6, şibat û adar sala 1961 helbestek li ser navê Edulsemmed Babek weşandiye, ko têde pesin û salixê buhara Kurdistanê dide:

„ Li Kurdistan binêre ey Perîxan
Li ser dil dê biçît jeng û temar e

.....

Her newroz e ey dil sed tebarek

Were geştê, sema ye li çar kenar e” r. 27

Vekoler bi guman e, ko ev ristên jor, yê wê heyama, ko Ebdulsemmed Babek tê de jiyay be.

Di heyama Babe Tahirê Hemedanî de, behsa helbestvanên şêx Adî dike û navê Pîr Reşê Heyran û di dema kurê Şêx Adî de „Şêx Sen= Hesên“ Şêx Fexrê Adiyân dike.

Li vir ez bi mixabinî dibêjim, ko ta niha dîroknasên toreya kurdî nêzîkî vê babetê nebûne û di behweriya min ji ber van sedeman:

1. Pîr Reşê Heyran, Qatanî, şêx Fexrê Adiyân û Pis çem, helbestvanên kurdên êzîdî ne û di dawiya wan helbest (Qewl, beyt, sebeqe, duwa)ên wan de, navên wan mîna hemî kilasîkên rojhilatê hene. Lê ji hêla dîroknasên toreya kurdî

ve, nenas in, an jî sedemên olî hebûn, ko derbasî nav rûpelê dîroka torevaniya kurdî nekirine

2. Gelek ji oldar ên êzdiyan jî ditirsiyan wan helbestan (Qewl, Beyt, sebeqe û duwa) belav bikin.

3. Gelek ji oldar ên êzdiyan ta roja îro jî dibînin, ko hesbandina wan di nav refên helbestvanan de, ji qîmet û nerxê wan yê olî û civakê kêr dike

Her çi sedem jî hebe, bi behweriya min, eve xaleke pêdiviyê li ser bête gengeşekirin, her weha cihê mixabiniyê ye, ko xwediyê vê pirtûk, behsê babetê kiriye, lê wî jî mîna yên berahîka xwe, xwe zehmet neda û helbestek ji yên Pîr Reşê Heyran, yan her yekê ji wan di nav kelehên ava de neweşandiye.

Vekoler Dêreşî wek pisporekî di biwarê helbestvanê nemir û nûkerê helbesta kurdî Feqiyê Teyran, bi dût û dirêjî li ser jîyan, berhem, buyer, çelengî û helbestvaniya wî dinivîse. Li vir xaleke pir giring behs dike û diyar dike, ko yekemîn kes behsê Feqiyê Teyran kiriye, ew jî Seydayê Xanî ye, ko di Memo û Zînê de, wek helbest vehûnaye dema dibêje:

„ Min dê elema kelamê Mewzûn alî bikra li banê gerdûn
Bînave ruhê melê Cizîrî pê hey bikira Elî Herîrî
Keyfek we bida Feqiyê Teyran heta bi ebed bimaye heyran”
r. 10

Ji bilî jêdera Mem û Zîna Xanî, ko navê Feqiyê Teyran aniye, Aleksander Jaba (Mem û Zîn) Rodînkî, Dr. Bileç şêrkûh (Hawar), Ela,edîn Sicadî, Mele Mihemedê Zivingî (Eqid Al Cewherî), Mihemed Emîn Zekî - Dîroka Kurd û

Kurdistan-, Ebdulreqîb Yûsiv, Sadiq B. Amêdî -Hozanvanêt kur-

Vekoler, li jiyana F.T kola ye û li gor tîpên ABC û wek mînak”

“ Feqî di dawiya destana Şêxê Senanî da, du cara sala bi dawînanana wê nivîsiye, carekê bi hejmarê û carekê bi tîpên Ebcedî. Her wek dibêjit:

Lew (mîn û 'h) soht eşeqhê di dehsed û sala sihê Xelqino ji wê mey meste,ê tewîl diket hikayetê

...

Meksî ji eşqê sohtiye ev qewl li şêx nû gotiye Hale xwe tê da gotiye ji xeyn û lamê hicretê. Ev herdû tîpe,('X. L), ('X 1000+L30= 10030).” R. 12

Ev pirtûka em berê xwêneran didinê, di naveroka xwe de, pîrr dewlemend e, lewra mirov nikare li ser her xalekê raweste. Lê ji bilî wan xalên jor, ko me behiskirî, dê li ser çend xalên din bi kurtî rawestin. Em di vê pirtûkê de, hindê helbestan dibînin, ko navê nivîserê wan nediyar e (helbestên sêwî) û nav û helbestên hindê helbestvanan dibînin, ko jiyana wan di nave pêlên dîroka pîrêş de windabûne, mina Madih, Mehmûd, Maçin(Macin), Mistefa Beg, Mihemedê Zêbarî û Mela. Vekoler ji ristên hindê helbestan pêkol kiriye, nave wan, dema nivîsînê, cih û devera lê hatî nivîsîn derbixe, dako bo xwêneran diyar bike. Beriya ez vê nivîsa xwe dawî bînim, dixwazim çend têbîniyan li dawiya vê nivîsê raxim:

1. Mixabin ko navên û babet ne li ser bingehên Chronoljî,

ango li gor dema zayîna wan. Bo nimûne, vekolîna li ser Nalbend, di rûpelên berî vekolîna li ser Eliyê Hekarî û Şêx Nûredîn Birîvkanî, ko herdû jê kevintir in.

2. Bi min baştir bû, eger ew yên jiyana wan nediyar, di beşekî taybetî de bûya.

Xaleke giring heye, di pirtûka Kelehên Ava de, min dive amancê pê bidim, ew jî ev e: - Vekoler, hemî pêkol kirine, da bişê destnivîsan ji mal û hicrikên mela û şêxan yê tarî derbêxe. Belgenameyên ko li seranserî pirtûkê nîşana karekî yek car zor û pir dirêj e, lê sebr, aram, hez û viyana vekoler ji vî karî re û ew hestê niştîmanperweriya bilind ya li def, hêla karekî weha hêja encam bide. Di dawî de, ez behwer nakim, Pirtûkek hewqas westan, vekolîn û lêpîrsîn û kar bo wê bûbe, dê ev nivîs bes be, ko mirov di naveroka vê pirtûka bi nerx, li ser toreya kurdî hayedar be. Bi hêviya berhemên hîn hêjatir, ji vekolerê kurd Seîd Dêreşî, ko pirtûkxaneyê kurdî dewlend bike û destxweşiyê lê dikim.

Jêder:

- Kelehên Ava, weşanên Spîrêz, Duhok, dsal, 2005

Dr. Fadil û Nijyargerî.

Zimanekî mîna zimanê kurdî, hewqas sal, bindest û berbendkirî, dikare dewlend û fereh, di rêya werger, felsefe, hizir, roman û hemî beşên zanistê bibe. Di bazinê vê carê, dê li ser pirtûkekê rawestin, ko rêbazek ji rêbazên hizrî daye ber xwe, lê pitir di hêla Antropolojiya û toreyê de ji destpêka sedsalên 20an ve, ta dawiya salên 1980 bi kar hatiye, ew jî pirtûka rêzdar **Dr. Fadil Omer** re, ya bi navê Nijyargerî (**Structuralisme**).

Ev pirtûk, wek ez jê agahdar im, pirtûka diwem e, di vî warî, ko ya yekem pirtûk, ji hêla rêzdar **Şerefxan ê Cizîrî** bi navê **Structuralisme** bû, ko li Swêdê hatibû çapkirin. Ji bilî wê û bi taybetî bi kurmanciya jor, min nedîtiye, ne jî bihîstiye, lê dixwazim bibêjim, ko lêkolînên li ser rêbaza **Structuralisme**, ji salên 1990an ve, li nav weşanên rojavayî Kurdistanê, lib-lib serî hildane û bo nimûne, lêkolîna rêzdar **Heyder Omer**, li ser Huneriya Memo û Zînê û li ser çîroka **seydayê Cegerxwîn**, Reşoyê Darî, ji bilî wê jî, di hindek nivîsên din, ko di kovarên toreyî, giştî de derketibûn.

Di Pirtûka **Nijyargerî -Derazîkek Destpêkî-** de, hêja **Fadil**, ji bilî dewlemendiyeke bo ziamnê kurdî, ko babetên weha bi xwe ve bigre, belê bo pirtûkxaneyaya kurdî jî, berhemekî bi

nirx e, ji ber li ser vê rêbaza giring, wek me li destpêk nivîsî, kêr berhem bi kurdî hene.

Dr. Fadil, bêhtir ji derazînekek destpêkî, xwe berdaye, nêv dîrok û pêkhata vî têgehî û vê rêbazê, belê di gel hebûna pir makder û lêvegeran li ser vê mijarê, bi wan zimanên erebî û Ingilîzî, yê Dr. baş pê dizanî, lê bizav û pêkol kiriye, bi xwe û wek xwe şirove û analîze biket.

Eve jî xaleke herî giring, li def nivîskarekî jixwebawer. Her di despêka vê pirtûkê de, ew gengeşiya di nêvbera, seranserî (giştî, gelemperî) û taybetî de, pirs û bersiv, hebûn û pêdiviyên wê, mirov û bûnewerên din, dide diyarkirin.

„ Li vir her dîtinek, her hizrek, her pêşniyazek, tov yan reha rexna xwe di gel xwe peyda diket“¹

Li vir diyardeya kategoriyên pêzanîna rastiyê, li ba **Immanuel Kant** û şagirtên wî, tîne bîra me. Mirov dikare nêrîna di pirtûka **Nijyargerî** de û thêsa fîlosofê elmanî **Şopênhew (Schopenhauer)** Jiyan mîna daxwaz û têgeheştin bide ber hev.

Ji xwe Dr. Fadil, mebesta xwe bi eşkere dibêje, ko wî xwestiye xwe dûrî têgeh û termên akadîmî bike ve, da nivîs bigihe, hemî xwendevanên kurd. Wek ez tê gehîştim, dixwaze, xwêner nêzîkî pirtûkê bike û serê wî bi têgehên akadîmî neêşîne û wî ji xwendinê necefilîne. Li vir pîrsek bi xwe têt: Eya mirov dikare babetekî zanistî û akadîmî, bê

¹ Dr. Fadil Omer, Nijyargerî, r. 9

têgeh û termên wê, ko ew bi xwe ji pêwendiyên van têgehan pêkhatiye dûr bike?

Ji bo pêşniyaz û mebesta xwe, nivîserê pirtûka Nijyargerî, ferhengokek, di behweriya min de, bi serketî, di beşê dawî ji pirtûkê de, pêkaniye. Ji bilî ko, çav li hindek jêderên din, yên li derveyî başûrê Kurdistanê hatine weşandin, li ser vê mijarî negerandiye.

Lê ev jî ji nixê vê pirtûkê qet kêr nake, çunku **Dr. Fadil**, bi xwe di warê zimanzaniyê de, pêkolên wî yên nixhêja hene.

Pirtûka **Nijyargerî**, li ser end parçeyan belav bûye, her beşek jî hindek ji bi têrî li ser rawestiya ye û hindek, xalên sereke di wî biwarî de dane niyasîn. Em bi hev re, wer in û wan beşan binasin:

1. Dergeh:

Di vî beşê de, li ser afirandina mirovî, bûnewerên din, tiştên bo wan pêdivî, têkiliyên wan û li ser mirovî bi taybet zêde çûye û ketiye warê biyolojiya, bi vî şewyî, dixwaze daneberhevekê, di nêvbera laşê mirovî (regezên, an jî elementên mirov) û elementên zimanî de bike.

Weha dinivîse:

“ Eger, em, pêkhatina laşê mirovî û pêkhatina zimanî hevberî êk bekeyn, dê wekhevîyek hejî lêrawestîna diyar bit: Eger deng etmên zimanî bin, bêguman birgeh dê

*Pirtîsk bin û morfêm dê nijyarokên biyolojî bin û peyv
dê xane bin û riste dê şane bin,...htd.*¹

2. Destpêk yan Dumahîk:

Nivîser, li vir destnîşan dike, ko nijyargerî(Binyatgerî), rêbazêke hizrî û rexnegirî ye, li destpêka sedsalên bîstan serî hildayeû li dawiya salên şêstî ji sedsala bîstan, Hilweşangeriyê (Deconstruction), hevrikî pêre kiriye. Wate di vî beşê de, Dr. Fadil, li ser dîroka nijyargeriyê radiwestê, kengî dest pêkir? Kî bûn nifiş û refên yekem? Û çî guherîn bi ser de hatin, kengî wek tête gotin mirin? **Aya raste mir?**

Nivîser bi xwe jî mîna hemî vekolînerên li ser vê rêbazê, Zaniyar û zimanzanê Siwêsirî Ferdinand de Saussre, wek destpêker dibîne, wate xwendegeha **GENF** ya hizrî û bi taybetî piştî weşana wan semînarên wî yên di bin navê „Kursên zimannasiya giştî“, ko piştî wexerkirina wî hatibû weşandin. Ji xwe di „Nijyargeriyê de, ya giring ew e, ko têkilî di navbera elementên zimên de, sîstemekê û taybetmendiyê ava dikin û dibe xala herî sereke di vekolînên li ser rêbaza Nijyargeriyê., yê diwan behsê **fomalîstên Rûs** dike, ko ji „Tîtiyanof“, **Roman Jacokson** û... **Roman Jackobson**, tevî xwendegeha **pragê** jî bû.

Li vir dixwazim bibêjim, ko **F.de. Saussre**, wek bavê Structuralisme li qelem tête dan, lê di pey re, xwendegeha

¹ Dr. Fadil Omer, Nijyagerî, r. 20

Emerîkî tê û li pey ya Kopenhagen û **Cercle Linguistique de Prague**, ko piştî konfiransê **Danhaagê** 1928an û Konfiransa **Phonetik ya Amsterdamê** 1932an, bû

Claude Lévi Strauss, ko ew rêbaz li ser Antropolojiya û bi taybetî li ser wan hozên Indiyanan yê mirî û li ser efsaneyan, di warê Ethnososiology bi kar anî. Bazina Prague, an jî wek pişt re bi nav bû, xwendegeha Pragê Nijayrgerî, ji qûnaxa nijaygeriya Kosonant, bo nijaygeriya **Funktional** veguestin. Structuralisame ya Emerîkî, Kopenhagen, Prag, Formalîstên Rûs û bi taybetî Nijaygeriya Ferensî Sementîk û simiyotîk, di rêya **Tzvitian Todorv, Rolan Barth, Gérard Genette, Michel Foukout** û di pey wan re **Juliya Kristiva**, bi hêz bû.

Jaque Durrida jî bi xwe, di gel **Foukout** bû, lê di pey re, hevrikî, mîna ko Dr. Fadil nivîsiye, di gel wan grûpan kir. Di gel, ko **T.Todorv, R.Barth, F.Genette, Bashlér** û **J.Kristiva** xwe bi warekî din ve mijûl kirin, ko ji wan re di pey re hate bi navkirin „**Receptions Theory**“, ko serkêşê wê, **Wolfagang Iser, Weiß-Blumenberg** û **Hans Robert Jauß** bûn. Bi taybetî pirtûka **Iser** ya bi navê „**Der Akt des Lesens**“ **Kiryara Xwendinê**, kartêkirinek mezin kir, ji ber ko, vî zaniyarê toreyê, dikarîbû, çend şeweyên xwendinê destnîşan bike.

Dr. Fadil di vî beşî de, bi şareziyek bilind, wan guhertinên di rêbaza Nijyargerîyê de, bi nimûneyên kurdî û hêsan şirove dike, her weha, li ser sîstema **Naum Chomiskî**, lîsteyek ji pêwendîyan, ko rêziman bingeh e, di deqê xwe de diyar dike. Di dawîya vî beşî de, bi çend pirsan bi dawî dike:

1. **Erê bi serhildana hilweşîngeriye de (Deconstruction), nijyargerî dimirêt, yan radibit?**
2. **Erê Nijyagerî- bi têgehê berfeh- reha mirinê heye, yan rêbazeke hizrî ye, ji rastiya hebûnê û guherînên wê û erkê nijyaran peyda bûye û dê her mînit?**¹

3. Têgeh û Terim:

Nivîser di vî beşî de, pêkol kiriye, ko diyar bike, ka ev têhgeh, bi çi peyvê, hatiye nav gorepana toreya kurdî. Dr. Fadil di wê bawerîyê de ye, ko

„peydabûna her têgehekî, dibe pirek pêdivî bo bûna têgehî, cudakirinê û gihandinê û têgehiştinê“²

Nivîser, li pey lêkolîna xwe, dibîne, ko ev term bi hindêk têgehên cuda hatiye nav zimanê kurdî, mîna (**Binayd/Binyat/Binyadgerî/avahî..**), herweha diyar diket, ko yê ev têgeh, êxistine nav zimanê kurdî de, para pitir daneberheva ber peyv û têgeha erebî ye.

¹ Dr. Fadil Omer, Nijyargerî, r. 37

² Ya berê, r. 34

Yek ji wan rêkan jî ev e, ko ji peyva Structuralisme, ko ji Structure hatiye, derbasî zimanê me yê edebî bûye, bi wateya Kêlehî, Pêkahtin, avahî.

Encama vî beşî, ko ev têgehên, yê bi berhevkirina terma erebî, têra têgehê Structuralisme neket, çunku:

„yê ewropî behsê pêkhatin û bejin û kêlehiya tiştan diket û yê erebî ber bi binemayê tiştan ve ye, anko binyatê tiştan, nexasme herdû ji peyva bin peyda bûyîne“¹

Nivîser, piştî lêkolînê dibîne, ko peyva Nijyar bêhtir nêzîkî **Structur** e

Li dawiya vî beşî, sê têgehên li hember hevîn dideyne

Structure	Nijyar
Structuralist	Nijyarger
Structuralism	Nijyargerî.

Dixwazim li vir bibêjim, ko peyva Structuralisme, peyveke latînî ye, bi wateya çêbûn, bûyîn, pêvebûn, pêgehandin û bihevexistin e, wate ne tenê kiryarek e, kiryar û kirde ye. Di Ferhengên toreyî de, û yê synonoman de, weha hatiye

*“ **Strukturalisme**= rêbazekî zanistî zimanevanî ye, ziman jî mîn sîstemekî nîşanan yê girî tête tegehîştin“²*

¹ Ya berê, r. 37

² **Duden, Deutsches Universal Wörter Buch R. 1488**

Eger em, li jêderên toreyî temaşê bikin, dê bibînin, ko çend xalên sereke, di pênasîna têgehê Structuralisme de hene, Tevin, ciwanî, rêkxistin, têkilî, hizrî, pêgehandin, movik deqê toreyî, şirovekirin, lêkdan, bikaranîn û nîşanaweran= Delalet.“¹

4. Nijyar:

Di vî beşî de, nivîser, diyar dike, ko her nijyar pêdiviyê navekî xwe yê cuda werbigire û ji ber ko nijyar babeta vê pirtûkê ye, wek Fadil dibêje, pêdivî bi serrawestanê heye:

1. Nijyar wek giyanekî serbixwe çî ye?

2. Ji çî pêk dihêt?

3. Çî erk heye an hene?“².

Nivîskar, nijyar bi 2 şêweyan dibîne **a.** Leşdar. **b.** Hizrî.

Nijyar li ba nivîskarî ji çend tiştan pêk têt:

1. Cudabûn di navbera nijyaran de.
2. Her nijyarek pişikdarî di avakirina nijyarên din de bike.
3. Pêdivî ye, xweragir bit
4. Rolekê bigêre
5. Şiyana guherînê hebit
6. Pêdiviya xwe dubare bike û bête dubarekirin.

¹ صبحي الطعان .عالم عيد الرحمن منيف R25

² Dr. fadil Omer, Nijyargerî, r. 40

Dr. Fadil, pêşniyar diket,

*„ko Signified/ Signifier, wek nîşanewer= Dal“erebî/
Nîşandar= Medlûl bi kar bêt, an jî têgehên biyanî bi
kar bînin“¹*

Li vir, pêdivî ye, bête gotin, ko di deqekî de, netenê nijyarek heye, belê gelek nijyar û pêdiviyê, karê toreyî li ser bête kirin, mîna kesixandin, rêkxistin, jihevixistin û liêkdan,, mîna Van Dick, di tiyoriya xwe de, li ser Structure dibêjit, anko tiştê zêde bavêje, bo deqekî bi rêk û pêk û afirander derbikeve.

Xaleke din jî heye, dixwazim li vir behs bikim, ko kêmtê beheskirin, ew jî Nijyar, pir caran mîna navend, an jî sentrûm têtê bikaranîn, lewra, rexnegerek mîna Subhî Te,an, dibêje nijyara pîvazane, wate, pîvaz ji gelek qatan pêk têt, di her qatekî de, navendek heye, mîna ko deq jî, pirkîte ye, dibe her kêteyek nijyarek bit, girêdana wan nijyaran, an jî wan navendan, nijyara mezin dadimezirîne.

Min dixwest wateya nijyar bizanim, wek Dr.Fadil di destpêka vî beşê de, nivîsî bû, lê diyar e, mebesta wî pêkhatên nijyar bi xwe bûn, eve jî rengê ji rengê pênasîna ye, dema mirov nêzîkahiye, li pêkhatin tiştê bike, di encamê de, nêzîkahiye li wî tiştê bi xwe dike.

¹ Ya berê, r. 45

Wek pênasîn, dixwazim, ya “**صبحي الطعان**”, li vir binivîsim, ko bi xwe ji ya **Van Dick û Michel Foukout** nedûr e, lê taybetmendiya wê, xalên herî sereke di liserkarkirina nijyaran diyar dike:

„ Nijyar(Structure). Tevna spehîtayî ye, ko movikên deq, li ser asteya vebêjî û hizrî, tê de bi ceh dibin, li gel pêwêndiyên xaçeyane, guncane û şirovekirinên lêkdanane, nîşanewerane û nîşandarane“¹

Mercê herî bingehîn, ko deqek serketî be û mercên dahênanê hebin, hebûna tevina ciwaniyê di deqî de ye.

Ji bo ez pir li we xwênerên rêzdar dirêj nekim, dixwazim, tenê navê beşan ji bilî beşê 10an, ko merema vê pirtûka bi nirx e, binivîsim.

5. **Pêkhatina dinyayê.**
6. **Rastiyên zanistî, li hember rastiyên Aşopî.**
7. **Sinorê gerim**
8. **Karlêkirin, jiyanê û sîsteman ava dike**
9. **Sinorê Agahî-Zanînê- têgehiştinê**
10. **Nijyargerî:**

¹ **صبحي الطعان عالم عبد الرحمن منيف R25**

„ pêdivî ye nijyargerî wekû rêbazeke têgehiştinê û şirovekirinê, serederiyeye zanistiyane di gel hemî bûneweran û verêja wan biket. “¹

Nivîskar behwer dike, ko sedema ragehandina mirina nijyargeriyê, ji ber ko di warê bizava hizrî û aşopiya mirovî de, gelek asteng keftine pêş wan.

Nivîskar berdewam dike û dibêje:

„Bi dîtina min helwestêgelek zanayan, ji sozeke mirovaniyê dernakevit û helwestê wan pitir helwestekê Idolojî –dînî-sincî ye ji her helwêstekê dî, çunkî nijyargerî wekû rêbazeke rexneyî di ser rexneyê re nîne, lê çunkî girêdayî rastî û jêderên gewherînên hebûniyê ne, lew pitir ji her rêbazekaa dî dê nêzîkî metodên zanistî be. “²

Di behweriya nivîserî de, yên ala mirina nivîskarî hildane, ew nijyargeriyê serveserve têdigihin.

Li gor pêdeçûna dîroka structuralismê, yên vê alê hil didin, bi xwe nijyarger in, lê kesekî ko bibêje ez nijyarger im, qet nîne. Bi taybetî **Rolan Barth**, sementîkîstê ferensî, ko di pirtûkên xwe de „ **nivîsîn di pileyeya zêro de**“ û **Sêmentîk**“, xwestî ye, berdewamiyê bide nijyargeriyê, bi wateyêke din, ji

¹ Dr. Fadil Omer, r. 79

² Ya berê, r. 79

Poststructuralisme (Mita-structrulaisame), ko bi xwe jî nijyargerî ye.

Ew bi xwe nivîskar namire, lê rola wî tête guhertin û dibe xwêner, wate, sêqoliya prosesê ji **Nivîskar(Peyamhinêr)-Nivîs(Peyam)- Xwêner(Peyamhilgir)** û pêwendiyên di navbera wan de, dibe duqolî û dimîne têkiliya diyalektîk, di navbera xwêner û peyamê de û xwêner, li gor pileya xwe ya zanistî û marîfî, di peyamê digehe û li vir, em nêzîkî **Reception Theory** dibin.

Di vî biwarî de, Dr.Fadil pirsên pir giring radixe û deqekî vekirî li ber xwêneran datîne, ew jî ev in:

1. Biyava hizrî ya mirovan çi ye?
2. Ji çi pêk dihêt? Çawa û bo çi ye?
3. Ev bûnewerê xwe di kelaxkekê hestî da veşartî û leş bo meremên xwe bindest kirî çi ye?
4. Erê mirov pêk ve nijyar bi?
5. Endamekî din yê leşî ya tişteki din e? Bo çi hizir û berhemê hemî nijyar bin?
6. Xwêner dikare zayendên toreyê(Helbest, Roman, çîrok, şano) û yê suruşî (mirov, dar, çiya, av..), mîna hev bixwîne?
7. Her regezê, endamek, elementek, berhemek, xwendinek taybet bo pêdivî ye?

8. (pirsek beşdar, lê neya gotî), erê xwendin di her demê de, wekû êk e?

Berahîka vê gotarê bi dawî bînim, dixwazim pênasîna nijyargeriyê, mîna ko para pitir, ji lêkolînvanan li ser yek in, li jêr binivîsim:

„ Nijyargerî(Structuralisme) ji latînî hatiye, bi wateya pêkvekirin, desiplînkirin, bûyîn û çêbûn, ko dikare wek taybetmendiya, şeweyekî zanistî, hêza karînê, hizirkirinê, an jî wek rêbazekî di beşekî zanistî û lêkolînan de bête bi karanîn, û nijyar dikare li hemî sîstemên zanistî yê hene, vekole. Li hember wilo jî, xwêner dikare her elementekî di nava sîstemên têkiliyan de, bibîne û li ser têkiliyên di navbera wan elementan de(nijyaran) de bixebite.“¹

Nivîserê pirtûka Nijyargerî, rêzdar Fadil Omer, weha, pirtûka xwe bi vekolînekê li ser çîroka Dr. **Segvan Xelîl Hîdayet**, wek nimûneyeke karpêkirinê, ya bi navê Dergeh bi dawî tîne. Naxwazim bêhtir ji wê bibêjim, ko pir serkeftî, bertiyoriya xwe bi kar anîye û ji bo barê xwêneran sivik bike, ferhengokek li rûpelê 105-109 çêkiriye.

Di berahîka dawiyê de, pirsekê bo rêzdar Fadil vekirî dihêlim û dibêjim, eger mirov têgeh û terman wek latînî, an jî zimanê orîgînal bihêle, dê nebaştir be?

¹ http://www.uni-trier.de/uni/fb2/ldv/ldv_wiki/index.php/Strukturalismus

Pirtûka „ **Nijyargerî, derazînkek destpêkî**“ di sala 2005an de, li Duhokê ji weşanên Êkîtiya nivîskarên Kurd-Duhok, hatiye weşandin. Çapxana Hawar, Duhok-Kurdistan, 116 rûpel, destê Dina 5.

Têbînî:

- 1. Dr. Fadil**, navê jêder û makderên xwe li dawiya pirtûkê rêz kirine, lê tiştê min dixwest, tê de hebe, ew hevok, kîte, paragraf ên ji wan jêder û makderan birî, wan bixe, nav kevanan û rûpelên, ji bo lêvegeran, wan binivîse. Lê ev tucaran, ji nirx û qîmetê pirtûkê kê nake.
- 2. Min navê jêder û makderan yekser li pey peyvên wan danîne, ji bilî ew yê tenê hijmara rûpelan e(R), jêder ji xwe pirtûka NIJYARGERÎ ye.**

Jêder:

- Dr. Fadil Omer, Nijyargerî, 2005, Yekîtiya Nivîserên kurd – Duhok, ç. Hawar
- Duden, Deutsches Universal Wörter, ISBN 3- 411-05503-0
- صبحي الطعان عالم عبد الرحمن منيف. 1996, Şam
- http://www.uni-trier.de/uni/fb2/ldv/ldv_wiki/index.php/Strukturalismus

Helbest û Dr. Kamîran Bedirxan

Dr. kamîran Bedirxan, yek ji wan pêşeng yê rewşenbîriya kurdî ye, ku hîmên toreya kurdî ya nûjen bi hêz û dewlend kiriye. Dr. Kamîran di hemî biwarên nivîsê de para xwe avêtiye nav û bi ser ketiye, sedem jî ev in:

1. Gencîna wî ya rewşenbîrî li ser asteyekî bilind û akadîmî bû
2. Bi êş û derdê gelê xwe û civaka Kurdistanê ve girêdayî bû
3. Hestên berpirsiyariya netewî li ser xwe û malbata xwe baş dizanîbû
4. Hêviyên ji hêla Kurdistaniyan ve ji wan, ku dihate kirin tim li ber çavan bû.

Bêguman, nivîsa li ser Dr. Kamîran nehêsan e, çunku wî di warê, wergerê, helbestê, çîrokê, pexşanê, dîrokê, olê û siyasetê, civakê û gelek tiştên din de nivîsandiye.

Em jî dê li ser biwarê helbestê û helbestvaniya wî vê nivîsê bi çarçew bikin.

Dr. Kamîran jî mîna gelek helbestvanên û ronakbîrên kurd e, ku pir guftûgo û nivîsîn, li ser berhemên wan nehatiye nivîsîn û ew berhem bi şeweyekî rêkûpêk nehatine nerixandin.

Dr. Kamîran yek ji wan helbestvanên kurd e, yên li degehê nûjeniyê qutane û bûne pêşeng di gel helbestvanê

xwedêjêrazî Qedrî Canê Dêrka çiyayê Mazî. Berhema ku mijara vê nivîsê ye, pirtûka helbestî „Dilê kurên Min“ e.

Ev dîwan ji weşanên kovara Hewarê 1932an hate çapkirin û yekem berhevoka kurdî bû, ku çend helbestên bêkêş û rêzbend himbêz kir. Pirtûk, li çapxan Tereqî, li Şamê, çap bibû.

Dr. Bedirxan ji destpêkê de, û bi vê pirtûkê, berê helbesta kurdî ji koçk û dîwanan berbi civak û netewê ve dibe, dema dibêje:

*„ Ev çend sal ên dilê min, qet negeş e
Dinê tarî, dinê êvar û geş e
Dilê min qet neavabû, nebû geş
Buhara min, pahîza min hemî reş
Di çolê de, di deştê de tenê me
Qey rondik im, qey ez şîna dine me?
Xweş buhar e, lê xerîbî jarî ye
Min çikir, ku dine li min tarî ye“ Welat û dilê min“*

Di van malikan de, dilşewatî û hisreta welêt, li def Dr. Kamîran diyar dibe.

Derdê xerîbiyê, bêkesî û piştê, bêomêdî û bêhêvîbûnê. Dr. Kamîran jî, mîna her kurdekî ta roja îro, dengê xwe bilind dike, diqîre û zimanhalê wan dibêje,

„ Ma şîn û girî tim para me kurdan e“.

Dr kamîran pergala gelê xwe û serdema ku tu de dijî berçav dike.

Dr. Kamîran jibîr nake, ku helbest tenê ne ji bo rewş û pergala gelê xwe bigihîne xwêner, belê wê rewş, êş û gazindan bixemilîne û bi ciwanî pêşkêşî xwêner bike.

Wate, ew naxwaze hêla babet û naverokê bi ser hêla ciwanî û huneriyê bixe, naxwaze, ku yek li ser hesabê ya din be. Dr. Kamîran baş derdê millet û welat dizane, lê hîn baştir derman jî dizane. Derman pêşkeftina civakê ye û pêşkeftina civakê bi xwendinê û zanebûnê têt. Lewra dibêje:

*„ Hej ji welatê xwe bike
Di mirin û di jînê
Binivîse, bixwîne
Xebat, xebat felat e“ lo..lo“*

Her mirovek şeydayê tiştêkî ye, lê Dr. Kamîran şeydayê welat û xaka xwe ye. Bo welat dike hawar. Bo azadkirina welêt bangî mirovan dike, daku xebatê bo azadiyê bikin, bo xelasî û rizgariyê bikin. Li benda her tîrejekê ye, ku derkeve, dakû sûd jê werbigire û welatê xwe azad bibîne.

*„ Kekno werin xebatê
Spî bûye rojhilat
Bi zanîn û mektebê
Ava dibe ev welat“ „ Welat“*

Ev mirov ji bîranîna naxwaze bête der, hisreta welatî, dar û ber, deşt û çiya, zozan û feraşîn, dol, newal û gelî, bûne hevjiyanên wî û digel wan sebr û arama xwe tine.

*“ Nûbihar, nûbihar e
Deşt û çiya mêrg û dar e
Kanî û çem xweş û sar e
Tim kenîn e, tim geşî ye
Xem û hêstir çavreşî ye*

*Bêdengî ye, bi reng û zad
Heyv ronî ye xwe daçaqand
Gul û bilbil hev ramîsand
Tim kenîn e, tim geşî ye
Xem û hêstir çavreşî ye“ Nûbihar“*

Dubariya di dilê Dr. Kamîran de, xwe davêje nava helbestên wî. Ev bêomîd û bêhêvîtî, tete veguhestin û dibe têvedana ji bo xweşî û azadiyê.

Li wir jî, bo ew xweşî û azadî bi cih û war bibe, divêt biçûkêt kurdan dilxweş û bi xwebawer bin. Lewra berê xwe dide zarokan û bo wan jî helbestan dibêje, berê wan berbi zanebûn û xwendinê e dibe, bêyî ku wan biçûk bibîne, berovajî xwe dike zarok û bo wan behsê welatê xwe dike“

*„ Ez kurdekî biçûk im
Welatê min mezin e
Tijî rêl û çiya ye
Tijî berx û bizin e“ „ kêfxweşî“*

Beşên civakê, di bala Dr.Kamîran de ne,. Ew wekî rewşenbîrekî, baş dizane, kengî civak bi hêz dibe, kengî saxlem perwerde dibe û kengî dê bigihe azadiyê.

Zarok, dengê civakê yên paşerojê ne û jin jî „stûna male ne” Stûn û bingeha şana biçûk ya civakê ne, eger ew şan tendurust be, civak bi tevahî tendurust e. Kamîran jinê ji bîr nake û serboriya wan jinên Kurdistanê dinivîse, ka çawa canfîda bûn, dema jiyana wan teng bû, mireweta wan rê neda wan xwe bispêrin dijmin, belê xwe avêtin robarî û xwe xendiqandin, daku dijmin bi dîlkirina wan şa nebe û mêr û mirovên wan yê xebatkar mecbûr neke, ku xwe bidin dest dijmin.

***“ Wekî dijmin nêzîk bû
Bêguman bi we nikarî
Sêzde keçên Kurdistan
Xwe avêtin rûbarî“ „ Kêfxweşî“***

Dema ku jin mamosteya perwerdeyê be û zaro berbi zanebûn û paşerojê geş ve biçin, dê civakeke malav bête damizirandin.

Dr. K.B. mîna nojdarekî destê xwe dideyne ser birîna gel û vî welatê birîndar. Ew dizane çendî zor e, mirov li ser xaka xwe biyan be û baştir jî dizanî, ka bindestî çendî zîyanê digihîne giyanê mirov, derûna wî dixê nav mij û tem û moranê.

Ji ber wê hindê, ew bi zîrekî nav di kurdan dide, daku taxûpaşî nekeve hiz û bîrên wan, daku xwedî armanc, hêvî û omêd bin:

„ Lo kekê min megirî

Dinê wisa namîne

Em jî rojekê dê rabin

Paşiya me kenîn e“ „ lo...lo“

Dr. Kamîran Bedirxan di helbesta xwe „Canê min têşe“, gotinên pêşiyên tîna bîra me, dema dibêjin“ Kurmê darê ne ji darê be, fermana darê nîne“.

Ew xemgîn û bi keser e, wek E.hmedê Xanî ji bedbextî û neyartiya kurdan têşe û naxwaze kurdan bi vî şêweyî bibîne, ku xwe bi xwe hev bikujin, an jî bêbextiyê li êkudu bikin.

Ev êşa herî kambax û diwar e û ev jî bûye sedema neserketina kurdan û xala sereke di têkçûna serhildanên kurdan de. Eger **Xanî** dibêje:

„ Ger dê hebûya me îtîfaqek...

Vêkra bikira me inqiyadek“

Dr. Kamîran dibêje, tifaq û serketina me di destê me de ye.

Dijminê me di nav me de ye, ew jî bêtifaqiya me ye:

“ Welatê me bêkes e

Dijminê me nekes e

Em in dijminê welat

Êdî bêbextî bes e

Lawno wer in hawarê

Fêkî bibin ji darê“ Canê min têşe

Zimanê Helbestên Dr. Kamîran, zimanekî sade, sivik, zû digihe xwêner, zû helbest xwe radigihîne û zû têkilî di navbera xwêner û deqî de peyda dibe.

Ew jî wek helbestvanên wê de, dixwaze di rêka helbestê re, millet bi pêş ve bibe, lewra erkê helbestê li def Dr. Kamîranî, hişiyarkirina milletî ye, fêrkirina wî ye û berê wî berbi zanebûnê ve birin e.

Di dîwana xwe de, ne tenê helbest ên bi kêş û rêzbend pêkanîne, belê yê bêkêş û neyek serwa jî.

„ Xuş, xuş û xuş!!

Ma çi ye?

Ax, gêsî dilebitin

Gir, gir û gir!!

Ma çi ye?

Rê hesin diçe û tê“ Tevde“

Dr. Kamîran, di helbestên xwe de, ji jîngeh, cografîya û derûdorê jiyana kurdewarî dûr neketiye. Ew rêgezên ku li ser xaka kurdistanê hene, kirine peyvên helbestên xwe, ji wê jiyana koçerî û çandiniyê tevna helbestên xwe hûnane:

„ Gul bi bûk in, bi bûkik in

Pal û newal çî xweşik in

Tim kenîn e, tim geşî ye

Xem û hêsir çav reşî ye „ Nûbihar“

Kamîran Bedirxan destpêşkerê helbesta kurdî ya nûjen e. Gelek caran behsê helbestvanê nemir Goran dikin, ku wî pêşengiya nivîsîna şêweyê nû helbestê di kurdî de kiriye, lê bi ya min ev neheqiyê li helbestvan Qedrî can, Celadet Bedirxan û Dr. Kamîran Bedirxan dibe. Eger em bi zanistî berê xwe bidin vê mijarê dê bibêjin, ku Dr. Kamîran yê yekem e, çimkî pirtûka wî „**Dil kur ên min**“ yekemîn pirtûk e ku di nav rûpelên xwe helbesta bêkêş belav kiriye. Bêguman ji bîr naçe, ku **Ebdulrehman rehmiyê Hekarî** yekem kes bûye, ku di kovara Jîn de, ya 1918 li Istebûlê derdiket nivîsîne, lê wek pirtûk Dr. Kamîran e. Yekemîn pirtûka helbestan ya Goran çap bû, di sala 1950î de, „ **Firmêsk û Huner**“, **Buhuşt û bîr**“ de bû.

„ Kamîran Elî Bedirxan di 21'ê Tebaxa 1895'an de li Stenbolê hatiye dinyayê. Bavê wî du jin anîn e. Herdu jî

Çerkez bûn. Diya wî ya duyemîn e. Navê wê Senîhe ye. Kamîran Elî Bedirxan ji ber ku bavê wî memûr bû û gav û deqe vebuhtina wî derdiket li gelek deveran geriyaye. Li cihên mîna Stenbol, Edîrne, Qonya, Enqere, Eqqa (li Filîstînê ye), Selanîk û hwd. geriyaye.

Kamîran Elî di demek zû de ket nav xebatên siyasî. Peywira yekem ji Komela Peşketina Kurdistan (Kurdîstan Tealî Cemiyetî) girt. Ew, birayê wî yê mezin Celadet Elî, Ekrem Cemîl Paşa û Faîq Tewfîq di sala 1919'an de diçin Kurdistanê. Zabitê siyasî yê navdar ê Îngilîz, Noel jî li ba wan e. Berê xwe didin Meletiyê. Armanca wan ji bo azadiya Kurdistanê destpêkirina xebatê ye. Çîrokê em ji Kamîran Elî guhdarî bikin: "şerê Cîhanê ya Yekemîn qediyabû, Dugela Osmanî têk çûbû. Fikra avakirina welatek Kurdan ya li rojhilatê belav bibû. Bi fermana Komelê Ez, birayê min Celadet Bedirxan û serdarê Îngilîz Noel ji bo girtina destega êl û mîrên Kurdan derketin gerê. Qonaxa pêşin mala Hecî Bedir Axayê Kehtayî bû. Ew dostê bavê min bû. Me jê re digo "apo". Me go: "Ger destega êlan were girtin wê dugelên serkeftî alîkariya me bikin. Ji bo vî divê hûn alîkariya me bikin." Ew jî go: "Hûn neyartî û dijberiyên nizanin. Li vir her axayek bi serê xwe ye. Kes kesek qebûl nake û hûn Dewleta xwe jî çê bikin kes serê xwe li ber ê din danayne. Pêşniyara min ji we re ew e ku hûn dev ji vî karê berdin." Têkiliyên me yê din jî vala derketin û paşde zivirîn Stenbolê.

Ew di sala 1978'an de 83 salî çû dilovaniya Xwedê. Lê li dû xwe gellek berhemên bi wate hişt. Helbest, werger, mijarên

lêkolîn û bi taybetî jî xebatên li ser bingeha Zimanê Kurdî. “

Ji www.ciwan-post.com

Berhem ên Dr. Kamîran:

1. Dilê Kur ên min, helbest
2. Elfabeya kurdî
3. Elfabeya min
4. Rêzana zimanê kurdî
5. Ferhenga Kurdî
6. Zimanê Mader
7. Destpêka xwendinê
8. Parçeyên bijarte
9. Xwendina kurdî
10. Tefsîra Qur,anê
11. Ders ên şerî,etê
12. Çarînên Xeyam
13. Proverbs kurd, bi Lucy Paul Margerîtta re.
14. Helbestên Kurdî
15. Der Adler von Kurdistan
16. Helbest ên kurdî bi ferensî
17. Berfa Ronahiyê
18. Turkçe Izahli Kurtç Giramer.

Jêder:

Dilê kurê min, Helbest,

Jihevxiştineke nîşaneyî, Mihsin Qoçan **û** **(Befra li hêrê)**

Ev nivîs, sala 1993an, di kovara Aso hijmar 2-3 û 4an de, li rojavayî kurdistanê hatibû we di hijmara 2an de, hatibû weşandin. Ez niha ji nû ve dinivîsim serrast dikim, bêy ku ji naveroka wê tiştêkî biguherim, ileh ku ne şaşiyekî zimanê be.

Eger em bixwazin, xwe ji têbînî û rexneyên kartêkirina bihereyî dûr bikin, pêdivî ye, em xwe nêzîkî vekolînên zanistî, bi metodîk û nêrîn bikin, çunku ew dê asteya nivîsînê û ya xwêner berbi asoyên vekirî ve bibin û biyavên nû bi me bidin pêkolkirin.

Ez dê bizavê bikim, ku ew têgehên ku min berê bi kar anîbûn û niha yê nû peyda bûne û cihê xwe di nivîsên li ser toreyê kurdî de dîtine, wan bi kar bînim.

Di dema ku ev berhevoka helbestan ya helbestvanê kurd Mihsin Qoçan kete nav destên min de û ji ber sinorên giyanî û cografî bo me nenas bû, lê piştî min xwend, lêpirsî, bo min diyar bû, ku li devera Badînan, stûnekî resen yê hîmê helbesta kurdî ya modern ne.

Ta ku babeta me qewarê xwe yê zanistî werbigire, pêdivî ye, em nivîsê têxin çarçeweyekî tiyorî û diyar bikin, ka rexneya nîşaneyî (nirxandin) çi ye?

Rexneya nîşaneyî, ew e, ya pesna nijara forma deqî di xaneyên deng, lêkdan, ferhengî û sementîkî de, dide, xwe dadixe kêrahiya deqê toreyê û biyavên wî dinase . regezên ragehandinê yên di nava deqî de veşartî bêvirî dike

Forma nivîsînê di „Befra li hêrê“ de:

“Ji bo nasnameya nivîsê diyar bibe, elementa hebûnê dibe xudan roleke mezin û prosesa nasnameyê destnîşan dike”. M. Heidigger, *Hebûn û zanîn*, r. 46 Di vekolînên sava û rasterast de, vekoler pêdivî bi wê hindê heye, ku li ser 4 pileyan raweste, ji hev bixe, li hev bixe û bigihîje wateyêke din, ku di nav liv û bizavê de be. Ew her çar pile ev in:

- Dengane
- Ferhengî
- Lêkdanewe

- Razberane (manewî)

1. Li ser asteya deng:

Dema deqek dadikeve ser kaxezê, şêwe û formekî werdigire, lê dema pêrgî xwêner dibe, deng peyda dibe. Ev têkiliyên di navbera bêje/peyv û wategehiştina wê de, li dar dikeve. Pirs di vir de, serî hildide:

Ev çi têkilî ye? Berê jêre hatiye pilankirin? Bi disiplîn e? di hundurê sîstemekê de av têkilî têne avakirin? Gelek pirs dikarin xwe di xeyal û hizrên me de hilbidin, lê ya girîng ewe ye, ev têkilî deq berbi kû ve dibin. Li gor lêkolînên Linguestîk, yêner moderin û nû jî û li gor Ferdinand de Saussure, têkilî di navbera peyvê û wateya wê de, ne li ser bîngeheke plankirî de û bê sîstem e, lewra jî peyv û wate di danûstendinên civakî de, wateya xwe werdigirin. Ziman bi xwe jî bûnewerekî civakî ye. Ziman ji nîşan, deng, wateyê(têgehîştinê) pêk têt. Tiştên girîng ku bête diyarkirin ev e:

1. Hêza tîpan. Cihê derketina tîpan, wate şêwe-tîp
2. Bilêvkirin û bilêvbûna bêjeyan
3. Mûzîka bêjeyan
 - a. Terazû
 - b. rêzbend (serewe)
 - c. Rîtim

1. Hêz û dengê tîpan:

Helbestvan Mihsin Qoçan, guhpêdaneke bi hêz dide ristin û hilbijartina peyva xwe. Bêje û hevok lib a Mihsin yarîgeha tîpan e û hevguncînek di navbera, bêje, lêkdan, hevok, deq û wateya deqî de heye. Hermoniyek heye, lê ji hêleke din ve jî semfoniyeke pêlderyane di konsertoyeke jihev cuda de bera nav xuxumê dide. Wan pêk ve dike, bêy ku savaiyî ya peyvê birîndar bike:

Ji biçîkatî ez têr dikenîm

Di xurîqêna da dixendiqîm

Hekû digotin

“ di demekê da

Diviya nêçîra heyvê bikeyin

Şiva dukanê li ber veda”

Paşî ez bi xo

Bûm nêçîrvanê yarekê“ R. 41

Li vir dawîya ristan girtî/girtî/ girtî/
vekirî/girtî/vekirî/vekirî/vekirî. Eger em seyr bikin, li destpêkê 3 girtî, li dawî 3 vekirî û di navê de, 1 vekirî û yek girtî. Helbestvan belenseke dengane, bi alîkariya tîpên rawestanê û tîpên livê pêk anî. Helbestvan li vir, desthilatiya xwe bi ser deqî de dideyne. Deq dikeve bin kontrola helbestvanî û hest û nest ên deq, diin yên helbestvan. Melodî jî di çarçewa wê azadiyê de ye, ya helbestvan dide deq. Dibe

pirsek bête kirin, erê xwêner li kû û kengî derbasî prosesa deqî dibe?

Ev destpêkirina deqî bi daçekekî û sinorkirina hevokê (Ez têr dikenîm, dixendiqîm), xwêner û deq pêk ve êxistin bin sîbera wan dengan de û wate li wan hate pêçan. Helbestvan sîmayên biçîkatiyê diyar dike û di dawî de jî li azadiyê digere û dixwaze hevî û xwezîkên xwe bi cih bîne û ew bi xwe dibe nêçîrvanê pirsgirêka rojhilatî (keç, Sex, Tirs û desthilat).

72. Hêz û dengê bêjeyê

Mîna ku her tîpek dengê wê heye û dûrbûn û biyava dengê tîpê, bi cihê derketina wê ve girêdayî ye. Komek ji wan dengan digihin hev û pêkve dengêkî cuda û bi hêztir derdixin. Axafatina bi zimanekî bi xwe jî komkirina dengan e. Zimanê her miletekî bi dengên xwe (bilindbûn, dûrbûn, nizimbûn, kurtbûn, dirêjbûn, qelewbûn û stûrbûn) ji yên din cuda ye. Eger em li egeran bipirsîn, ew jî pir in. Di vir de, suruşt roleke sereke dilîze.

Di helbesta „Xerîb im.. Xerîb „, Qoçan keser û kederên xwe, bêrîkirin û xem û derdên xwe, dike komên peyvan û dengê wan peyvan zermoniyeye azaran li dar dixê:

„*Paytextê min..*

Hekû dihê m di dilê te de berze dibim..

Di gêleşûka çavên te de

Xerîb dibim..

Ji gundê xwe“ R. 20

Her di destpêkê de, rîtma tîpê û ya peyvê, di gel nîşanên wê, xwêner berbi cîhanek, deverek, êşek û xewneke din dibe. Sîmfoniya xwe bi wateyê û daxwazê û destnîşankirinê bi dawî tine. Lê ev dawî, dibe destpêka hizirkirina xwênerî û geriyana wî li sedema wê xerîbî û bêrîkirinê. Ev core rîtim, netenê guh dide bikaranîn, belê hemî regezên hestan, jig uh, çav, hingivtin û hizirkirin û di gel wê hizrê wêneyên ciwan li ber çav û di hiş de, govendê radikin ser pêyan û hunera mûzîkê digihînin pileya wê ya dawî. Li vir, helbestvan berê me dide sê regez ên giring bo mûzîkê di helbestê de:

a. Kêş

Kêşeyên di berhevoka helbestvanê me de, şêweyên xwe yê cihêreng werdigirin. Qoçanî, di vê berhevokê de, ne bi tenê kêşek, an jî ew kêşeyên naskirî(Xanî, Bateyî, Herîrî..), ji pêlewaz, kêşeya Mesnewî (Cizîrî) û kêşeyên folklorî (F.Teyran, Qedrî Can û Goran), belê berê xwe daye, terpîn û kurpîna dilê xwe û li ser wan lerzan, kêşeyên xwe ava kirine:

“ Min û diziyê dujminatî

Digel êk hebû

Lê wê rojê

Wekû gula berberojê

Te lêvêt xwe sûrav dikirin

Ew tiliyêt te

Wekû biçûkekî sava

Yarî bi fistanê te dikirin” R. 64

Xwêner bi helbestê re diçe, ta radeyekê hevsar ê bêhişiya xwe berdide. Kêş li gor babetê kurt û dirêj dibe. Lerz digihe pêpelûka hêza dil.

b. Rêzbend „, Serwe“

Mîna ku Mihsin Qoçan, kêşeyên cuda bi kar tine, rêzbendên cuda û hema reng jî bi kar tîne, hemehengiyekê di nêvbera kevin û nû de li dar dixê, bêyî ku sîmat û rûyê xwe yê helbestî, yê ew dixwaze winda bike. Di helbestên Qoçan de, mîna rîtman, peyv û hevokên wî dikevin nav xircireke bêdawî de û dîlana dil xwe li ber tîna peyvê dixelîne vir û wir.

„, Berî noka..

Hezar çîrok min guh lê bûn

Hekû karwan

Di ketine rê de û

Lê dibû baran

Di befrê re diman û dixendiqîn

Hekû siyar..

Li ewr têt meydana dierenîn

Li kele-kela mêraniyê

Bi şûîrêt misrî

Leşê êkûdu dihencinînin “ R. 36

Di helbestê û di pir helbestên vê pirtûkê de, helbestvanî, bizav û pêkol kiriye, ya ew bi fer û pêdivî bibîne, di qewarê peyv û hevokan de, bike rêzbend.

c. Melodî û ahenga helbestên berhevokê.

Di avakirina helbesta bi kêş de, melodî û aheng, di qewarên form de xwe diyar dikin û bi hêsanî dibin tevna stranan. Lê helbesta formazad, ya pexşane, dikarin xwe li ser du şêweyan parve bikin

1. dengsaziya şêwe(hevahenga derve).
2. dengsaziya amjeyî (Sementîk)

Ev rengehevaheng ya yekem, wek li destpêkê jî amaj pê bû, ku rîtima tîp, peyv û hevokê ye. Lê ji ber tîpek bi tinê, dengê kurt dide, eger dengdêr be, em dê li ser hevahenga peyv û hevokê rawestin.

- Hevahenga bêjeyê
- Hevahengiya hevokê

Hevahenga bêjeyê:

Bêje: Wek diyar e, ku bêje, regezê pêşîn e, ku di deqî de rû dide û dibe bingeha avakirina deqî. Pêdiviya bêjeyê ji nerimbûna wê di hundurê deqî têt. Bêje xwedî hebûneke dengane, zimanane û sementîkane ye. Li ser zîrekiya helbestvanî dimîne, ka çendî asoyan li ber bêjeyê vedike, da ku wê ji qeyd ên civakî û rêzimanî û ferhengî azad bike. Di bêvirîkirina rola peyvê di deqî de, Qoçan î, asîmanekî berferreh, li ber peyvê vekiriye û bêje himbêz kiriye, bêy kû wateya dînamîkiya wê rawestîne, belê berovajî, ew azadî bûye motorê helbestê bi xwe li def helbestvanê me. Dema bêje bi azadî bête afirandin, derveyî hemî sîstemên bo wê hatî danîn, dê bikaribe rola xwe ya ragehandinê jî pêk bîne, lê ragehandina bi şêweyê xwe. Bêguman bêje xwedî gelek taybetmendiya ye mîna taybetmendiya morfolojî=gramarlojî (Nav, cînav, lêker, daçek rengdêr..û..), taybetmendiya subjektîv û xurustiya deng û nebr û rîtman.

Helbestvan li ser biyavên şênber û razberan kar dike. Bêjeya nenas sînore dûrçûn û gihandinê nasnake. Ew bêje sinorê xwe yê ferhengî derbas dike û dikeve zeviyê metaforan de. Di helbestên Qoçanî de, zevî û sinor têkel dibin, dema ku xwêner hest bike, ku gehîşte çêja xwe ji ahenhgbûn, dergehekî din lê vedibe, dergehekî nû, lê nehayedar:

„ *Kolan.. kolan*

Koz û kotan

Min têk vedan

Derzêt derî

Derî..derî

Min têk şîlan

Tiraş..tiraş

Pîş û hilaş

Min dane bayî û min hêlan

Paniyêt piyêt min bûne çam

Li te digerin“ R.10

Li vir dest bi peyva Kolan kir, çi kola? Li kû? Ya çi?
Giriya hat, lê dîsan vekirî ye. Ew çirûkên ku helbestvanî bi kar anîne, mirovî berbi ahengeke êşê ya veşartî û avis ji pirsan ve dibe. Ev pirs hemî û carnan nîvbersiv, atmosfêrekê dadimezirîne, bêje gur dibe û bi tamamî bêje bi erk ên xwe yên ragehandinane û sementîkî radibe. Bêguman lîstik û yariya helbestvanî bi bêjeyan, hêla ye, ku xwêner li geriyanê be. Geriyan li rîtmê, li ahengê, li wateyê, li rêzimanê, li ferhengê û li kesayetiyê û li navroka deqî. Wek ku helbestvan li geriyanê ye, li yara xwe digere, xwêner jî li yara helbestvan digere, daku bizane kî ye û bi kû ve çû.

Hevahenga hevokê:

Tîp (amur) û bêje, bi tina xwe nikarin bi rola naskirin û ragehandinê rabin, lê dema hevok saz bibe, bingeha axaftinê tête afirandin. Hevaheng û rîtma hevokê ji ya bêjeyê cuda ye. Hevok aheng û rîtmên curecure pêktînin, her wisa jî berê

xwêner li gelek deveran dimîne û çavên wî dibin nêçîrvanê çirûkên ku ji nav hevokê derdikevin, li ser hemî asteyên zimanî.

Hevok hêza xwe ji van xalên jêrîn wesigire:

1. bizava regezên hevokê yek bi yek digire
2. bizava hevokê bi xwe jî .

Ev herdû bizav, li nav hev dikevin, dibin pêl, dibin tevger û dibin du hêzên newek hev

„ Eger hatim

Balgehê te serdanê

Keziyêt te.

Min dest û tiliyêt xwe danê

Bo mijlê min vekirin

Min şe kirin

Hozanê xo..

Kirne gulav û lêkirin

Ji nişkekê ve..

Çirîsk ji goriya xo berdanê

Heta disjoin

Ma dê zanê çima canê

Jêder:

- Befra li hêrê, Helbest, Mihsin Qoçan, 1986an
- M. Heidigger, Sein und Zeit= Hebûn û zanîn, r. 46
- Jaque Durida, Hilweşandin û ravekirin.

Payîza çiya û Arif Hîto

di kurka xwe de çi hel-sane (helbest-efsane)
veşartine?!

Sîira min jî çavlêkirina aloziya ye
Diwaniyeke berboye min..
Sîira min jî çavlêkirina diwayiyê ye
Ez ê xerîb im ji paşerojê û xewna bihêt“¹

Çi alozî ne, yên Arif Hîto di xewnên xwe de, himbêz dike?
Çi çiya ne, yên daxwaza „gul û tivingê dikan“? çi hawar in?
Çi girayn in? Kî zarok in? Çi nûçe ne, yên guhên Arif î ji
Rادیویê venakin? An jî efsanekirina jiyaneke mişt
„mirovên wek mişkan in, li qolaçkan dijî“?
Girnijîna bîtanoka û cadeyên vala“ ne?
Di vê xirecirê de, helbestvanê pirtûka Payîza çiyay,
çi maçan, çi welatan, çi dewletan, ji zivistan, buhar, havîn û
payîzên şeran divêt?

¹ Payîza çiyay, Arif Hîto, r. 30

Erê Nabo, Mardox, çima roniyê li dadgeha Hamorabî hildigirin?

Erê şêx Ebros, dê çi li peyvên tîrfayê di helbesta Arifî de û dewleta Qoçanî de,, bike?!

Tanatos li her devereke Erotîkî, li çî xwe digere? An jî li Ankîdo, hîn kela dilê wan jinan piştî heft roj û heft şevan nekewandiyê û hînik nekiriye?

Dê mamosteyê erdnîgariyê, çi ji peyvên sor, li ser nexşeya xwe bike?

Erê Arifî bo çi em gihandin çemê Dicle? Çi li paş wî rûbarî heye? Çi çîrok, çi dîrok hene, ko hîne diyar nebûne!? Çi susret hatine serê vî rûbarî? Kî hatiye, kî çûye û çi bîrhatineke adarane ye dergehê hizra Arif Hîtoyî diqute?

Di pirtûka Arif Hîto de, ya bi navê **Payîza çiyay**, ko di sala 2004an, li çapxaneya Hawar, bi helîkariya yekîtiya nivîskarên kurd- Duhok, hatibû çapkirin, em pêngî pîrr pîrsên vekirî tîn, yên bîra me vedigerîne, şoreşên deverê, serhildana 1991, êşên civakê, wêneyên xemnak û evînên azarkêş, bihreya nivîskarên herêmê. Me vedigerîne efsane û metolojiya Mezopotamiyayê. Lehengên legend û efsaneyan, ji dema wan, ya mijê, dadixe asîmanê Duhok, li Kurdistanê,...

“Li roja êkê:/ Xuin bi tîrojken rojê gerim
bû..rehend gîrijî

Li roja diwê:/ Işqê xo di Taristana çavê reş de
nivand.. heyv gîrijî

Li roja siyê:/ Hizran xo di fezayê freh werkir û..
felek gîrijî

Li roja care:/ Karwanê li hev bûne reş û rê berze
kir...stira subehê gîrijî


Li roja pence:/ Çavên şebeqê yê baranê bi erdî ve man
û...giya gîrijî

Li roja şeşê:/ Şehîdan agirê newrozê helkir...
omêd gîrijî

Li roja heftê:/ Zarokan di peregeha êzîda ve, bixûr
sotin “¹

Em wer in navnîşana pirtûkê-Payîza çiyay-. Di rîtima
herdû peyvan de, û di wateya wan de ji hev bixin û
hermeneutîka wan binerin:

¹ Y.b., r. 24-25



Navnîşan, nîşana pênasîn û bi çarçevkirina deqî ye. Di pir caran de, navnîşan, kilîta dergehê deqê asê ye, wî ji tariyê derbasî ronahiyê dike, hebûna wî diçespîne û caran dibe nasnameya deq (pirtûk) jî.

Lihevraştatina bi navnîşana pirtûka Arifî re (Payîza çiya), para mezin ji mijar û atmosfêra helbestên wî bo me ronî dike. Ji hêla mijaran ve, xwêner çu astengan nabîne, lê çawa Arif ew mijar û babet û bi çî zimanî vehûnane, êdî pêdivî bi têgehiştineke ji hêla Metolojiya, dîrok, ziman, lîtertûra cîhan û nasîna herêmê, ji nav û nîşan, tîtal û simbolên herêmê heye. Pirtûka Payîza çiyayî, wan xalên, ko watedariya simbolîk ya Peyva payîz û peyva çiya bi xwe ve digire.

Êdî her peyvek dibe symbol û pêdivî bi background ya wê heye. Bi tenê em berê xwe bidin navûnîşanên deqên pirtûkê, dê wan xalên li jor hatîn nivîsîn bibînin û bêdudilî biçespînin.

Payîz....welatê min belghezame bi wexerê ve/ çiyaEşq doman e û xewn û befir/ Belatînk/Ez û hewê / Hesûdî (Daxisî)/şîir girnijî /Hinar.

Arif bizav kiriye, di helbesta xwe ya yekem de , di vê berhevokê de, sîmayê xîtaba xwe ya helbestane bo xwêneran diyar û eşkere bike. Ji hêla forma axaftinê ve, berê xwe daye xwêner û bi daxwaziya xwe, xwêner têkilî prosesê dahênanê û avakirina beşê nebeşdar ji deqê kiriye. Bi vî şêweyî, hişê xwêner êxistiye bin ezmûneyekê û Apîstomolojiya wî bêjing dike.

Gulê bide min, bêhna te jê bihêt

Yan Tifingekê û bêhna axê

Evro êvarî zûyî dada û bayek tezî ruyê min digest

Hawarên asmanî

Hilweşiyana zeviya

Girya zaroka..¹

Arif î dest bi pênasîna axaftina (Xîtab) xwe ya cuda kiriye û zanava xwe bi dest xwe ve î naye.

Di wan rêzikan de, sîstema hebûna nijyariya xîtaba xwe ya cuda destnîşan û tomar kiriye.

Li vir kiriyara nivîsînê ya subjektîv destnîşan kiriye û berê xwêner berbi mijar û babeta xwe ve biriye. Li vir Arif î xwêner(Ez) mendehoş kiriye. Ne tenê wisa, belkî xwêner

¹ Ya berê, 24-25

agahdar kiriye, ko va dê buyerek diqewime, nexasime, ko navnîşana pirtûkê, dergehê buyerê vekiriye, bi kêmanî nîşanekê didite xwênerî, ko dê tiştêk, buyerek, susretk, bobelatek, nexweşiyek, desteserkirinek ji hêla dijminî ve, bi ser axê de bêt, lewra dixwaze, ji bêhna axa xwe têr bibe, berahîka dagîr bibe. Li vir diyar dibe, ko helbestvan gelek serpehatiyên bi wî rengî dîtine, an jî bihîstine. Ne tenê weha, ji ber ko dê çarnûsa wî, piştî qewimîna buyerê, nediyar be. Ew dixwaze berxwedanê bike.

Ev ji hêla xwendina pêşî ve, xwêner ber bi rewşenbîriya xwe ve dibe û xîtaba xwe ya nivîskarekî liberxwedayî vedihûne. Di vê rewşê de, çu rê li pêşiya nivîsînê namîne, ji bilî ko sembolên babet û mijara xwe biafirîne. Ev deqê edebî yê em li hemberî xwe dibînin, deqekî par û parçe û vekiriye. Ji ber wisa jî, jihevweşana nijyara deqî, biyavên fereh, belavbûyî li ber xwêner vedike, li ber ravkirin û têgehiştinên cuda cuda vedike.

Ev xaçerêka di navbera herdû sembolên jor, bêhna axê (welat) û tifingê (berxwedan), kiryar in bi dînamîkiyeteke watedarî û bi hêz peyda dibe.

„ ji bo *Destnîşankirina boşahiyeke(Sphäre= Feza), ko sîmiyolojeyê hermeneutîkî dikaribe tê bigere, kar dike*“¹.

¹ Dr. Xalid Hisên, Nezeriyet Al.inwan, 2007. Altekwîn lilta, ilif we ddîrasat we terceme, Dîmeşq R.160

Dema xwêner pêrgî fermaneke weha dibe, ko mîna hêviyekê jî bête têgehîştin, di rastiye de, mesaja nivîskarî ye, hayedariyek e, rêga armançekê ye, realîteyê bi sembol û şîfre dike. Çi bo xwêner diyar dibe? Arif dixwaze guherankariyekê têxe jiyana hevvelatiyan, wan ji pileya tirsê û agahdariyê bibe pileya rahijtina tîfingê, destneberdana ji xakê, berhingariyê. Lewra, xwêner di malikên bi şûn de dibîne, ko fermanan, bi şeweyê hêvî û daxwazan dibêje:

„Maçekê bide min bêhna axê jê bihêt

Yan pelege agirî


Şevreşa warê me ronîket“¹.

Baudelaire dibêje “ Eger em bixwazin derbasî giyanê helbestvanî bibin, pêdiviye, em, li wan peyvan bigerin, yê di nivîsê de gelekbarê dibin. Ev peyv, dê bo me bibin kilît, ji bo şirovekirina deqî û dê bizanibin, ka helbestvan bi çi hizir û ramanan ve berbest bûye”²

¹ Arif, Hîto, Payîza çiya, r.4

² Horst J. Frank, wie interpretiere ich ein Gedicht? = çawa dikarim helbestekê şirove dikim, çap.5 UTB, çapxaneyê Franke- Tübingen, Basel 2000, R.41

Eger bi awirdanekê dihnê xwe bidin deqê Arif yê bi navê “Payîz....welatê min belghezame bi wexerê ve”, wek nimûne, dê çend peyvên sereke bibînin, ko dikevin xizmeta hizir û mijara deqî de



Ev deqê helbestî “Payîz....welatê min belghezame bi wexerê ve”, van hersê peyvên dike nijyarên biçûk yê helbesta xwe û hevok, lêkdan, wêne û fenteziyên xîtabqa xwe ya helbestiyane û carnar ya efsaneyane pêktîne. Li derdora wan nijyaran, hûrîniyên din bo alîkariyê ji wan nijyaran re peyda dike, ko em dikarin wek xwêner bibêjin, ew kilît û çirîsk in, yê bo me deqê Arifî ronî dikin. Bo nimûne, nasname, Stirana Azadiyê, Êlûn, şêx Abulselamê Barzanî. Ji bilî pêşmergeyê birîndar yê bi qêrîna xwe dîwar diherifîne.

Guman bo min wek xwêner nîne, ko ev deq, li derdora rewşa kurdan, astengên hatî pêşberî wan, li dirêjîya dîrokê, xiyaneta li wan hatî, hem ji hêla dagîrkerên kurdan ve, yên berjewendiyên wan di welatê kurdan de heye, ve û hem jî di nêv kurdan xwe bi xwe de. Lewra, em dixwênin, ko xwe carcaran disperse Mihsin Qoçan, yê bi helbesta bi navê Dewlet gotî ye. Arif weha dibêje:

“Cendek rêz bi rêz li ser kaxezên Muhsin Qoçan

Semayê dîkin û işqeke mazoşî

Bo welatê weku zevya di herdû çavên min de kolayî..

Dibîte seyran

...

Muhsin Qoçan .. têk hele ye

Ji yaxîbûnê û işqek har û peyvên ciwan

Sêgoşe ye.. ji jengên ter

Ji gulên zer

Ji dewletek azad û xweser.“¹


Em bi tenê, çavê xwe bidin wan her sê nijyaran, dê bibînin, ax, axa welatî ye û axîn jî her bo wî welatî ye. Şer ji bo wê xakê, qurbanî ji bo xakê ne, serkirdeyên şoreşan, mîn wî bi

¹ Arif Hîto, Payîza çiya, r. 12

nav kirî şêx Abdulselamê Barzanî bû şehîd û qurbanê wê xakê, şoreşa Êlûnê bo vê xakê û vî welatî bû.

Ev işqa Arif dilerizîne, işq û evîna welatî ye, nihêl, çiya, deşt, zinar û hevrazên wî welatî ne, ko Arif bi welatê Evînê bi nav dike.

Serencama wê ew e, ko nijyara mezin welat e û yên din nijyarên biçûk in.



Dema em bi hûrbînî li vê tabloyê binerin, dê bizanibin bo çî Arif xwe spartiyê dîrokê û bo çî hevok, wêne û hevoksaziya wî, ji çarçewa realîzimê derneçûye. Di gel wê jî, lertzên helbestî bilind û nizim dibin, mîna kurdîna dilî û di gel biyav û asoyên peyvê, hermoniyêke zimanewanî li dar dixê û li gor xwe û babeta xwe, bi erkên ciwanîyê radibe, mîna pêlên Dicle, hest, nest, hizir, raman, dîrok, çîrok, efsane, diyarde, xewin, baran, û qelaçên deverê, rîtima melodya işqeke hemdemî, hevçerx û nûxwaz vedihûnin.

Arif di Payîza çiyane de, amurên xwe yê helbestiyane, bi gelek şêweyan bi kar anîne, carcaran, zemîn ji xwêner re amade, dike, lê berahîka xwêner, bi xwe xwe amade bike, bi buyerekê, di demeke kurt de, wî mendehoş dike û di dergehekî tirsê, an xweşiyê re wî têkelî prosesa nivîsînê dike. Wek nimûne bo vê çendê, di deqê 2an de, yê bi navê „çiya..işt duman e û xewn befir“- ji xwe navnîşana pirtûkê ji herdû peyvên pêşîn yê deqê yekê û diwan wergirtiye-:

“ çibkên baranek nerim û tena
ruyê pencera min diquta
Ez ê mijûl bi nivîsîna namekê ve...,
Işt jê bibarêt
Gulleyek sarbûyî kefte ser berperê êkê û,
min xewnên xwe yê burî dane destê bayî

Peyvên nûtirikî ji nameya min ya iştawî werhan û

Bûne gulwazek nêrgizan
Ji bo berçema buhereke nû girnijîn
Lê...
Ewrên drewîn baran nebarand
Bilbilên xemgîn strana keyfê nexwend
Bişkuj venebûn

Soz xewar bûn

Hemi tiştên min wek xwe man”¹

Li vir, diyar dibe helbestvan dest bi rîtmeke hêmin û hêdî dike, atmosfêreke romansî bo xwe çî dike, ji ber dixwaze nameyeke evînê binivîse, lê dema gulle derbas dibe, her tişt têtê guhertin û buyer, rewşê ber bi jêr de, wate bi nexweşiyê de dibe. Li vir postera helbestvanê ferensî **Jaques Prévert** têtê hizra me, ko pencera wî vekiriye ye, çûk derbas dibe û têtê kuştin, êdî hertişt têtê guhertin“ Pencere vekiriye/ derve xweş e/ çûk derbas dibe/ 1+ 1 dibin 2/ 2+2 dibin 4/ 4+4 dibin çûk têtê kuştin/ êdî../ 1+1 nema 2/ 2+2 nema 4/ 4+4 nema 8“

Agahiya yekem bo nivîskarê nameyê baran rûyê pencerê diquta. Ew qutan gava yekem ji hayedariyê bû. Buyer ew ji mijûliya nivîsînê ve, hişiyar kir, gulleya li ser berpera yekem ketî bû. Li vir têkçûnê dest pê kir û hemî xewin hatine guhertin.

Ev hevdeqîya (Intertextuality) di nêvbera helbesta Jaque Briviere, ne ji wê hatiye, ko Arif ew xwendiyê, an jî xwestiyê weha mîna Prévert binivîse. Ev bêguman ji serpêhatiya wî ye û tesaduf e, ko avahiya vê kopeleyê û helbestvanê ferensî mîna hev hatine.

Huneriya nivîsê ew e, ya ko nivîskar, ji hemî şêweyên hunerê sûde û havil werbigirê, wan bi kar bîne, bêy ko ziyane bighîne şêweyê zayendê nivîsana xwe.

¹ Arif Hîto, Payiza çiya, r. 19

Di Pirtûka Payîza çiyayî de, Arif Hîto, carcaran, kurt, kin û puxt nivîsiye, di cihên din de, bi şêweyê vegêrana buyeran, li biyavên din, bi çîrokbêjî dest bi deqê xwe yê helbestî kiriye. Destpêkirina bi çîrokbêjiyê di avakirina helbestê de, xaleke rakêş e.

Wek li jor jî, hatî nivîsîn, bi karanîna vî şêweyî li gor xwendina min, çu ziyar negihandiye ruhê helbestê, belkî berovajî wê, helbest bi hêz kiriye, helbest biriye, ber bi asoyên demên buhurî ve, û demên buhurî bi lehengên wê ve, di gel xwe anîne qada vê dema ko helbestvan tê de dijî û ciwaniya kevin û nû têkel bûye, simfoniyeke çiyayî, di şevên payîzan de aniye dîlan, govend û semayê.

„ Kevin kevin..li dêr zeman

Li bajêrekî agir pêve û..mirin û viyan

Keçek hebû“¹.

Hebû ..nebû

Li rojeke weke evro

Torîneke nazik hebû.. digotinê Hinar

Hêvî bi kezîviyê ve dibûn rûbar

Di nav rengên gulîstaneke buharî de

Yarî dikirin çep û rast”¹

¹ Arif Hîto, Payiza çiya, r. 44

Arif dixwaze bi vî şêweyê çîrokbêjîyê, buyerekê destnîşan bike û ji encama buyera çîrokê wek waneyekê bide xwêner. Li vir gelek caran, ew nakokiya di navbera ezezî(narsîzim), xwedîtin û şîretkirinê, deq ber bi sadebûnê ve dibe û ji bo wê sarbûnê bikuje, bizavê dike, ko rîtmeke derve, an jî mîna kurte-helbesteke bi kêşe peyda bike:

“ Eve eniya min..keske bimaçîkirina/şemalkê ve

Eve dilê min...bergê sipî ye di xilwê ve

Eve destê min.. yê gurrî bîyî bi paqijiyê ve

Eve gava min.. ya pêtî bûyî bi çikiyî ve..”.

Misteka axa gerim û xuhdayî²

Xaleke giring, di vê xwendinê dixwazim destnîşan bikim, ko helbestvan, bêdudilî, xwestiye tabloyên xewnên xwe, rengîn bike, herweha bi mebest, têkilkirinek êxistiye di nav rola guhî de, ko kopleyên kêşsaz in û rola çavî de, ko pexşaneyê helbestî ye, vêca çi bi şêweyê çîrokbêjîyê, flaşê, matmayîn û mendehoşiyê be, yan her şêweyekî din be.

Pirdengî û pirahengî, sîmayên vê berhevokê ne û bi taybetî ew efsankirina leheng û buyeran, ko hêzek dane helbestan. Di gel girî, girmijîn e. Di gel çiya, nihêl e. Di gel rondikan robar û Dicle yariya dikin. Di gel xemê, mey bi Remezan Îsa serxweş dibe.

¹ Ya berê, r. 68

² Ya berê 15

Hêdî hêdî nehênî bi tiblên helbestvanê xwedê jêrazî, Selman Kovilî re bi girnijînekê wexer dikin û..

...

Serencam:

Payîza çiyayî ya ji heftê rûpelî ji destê 14 x 21, bi bergekî û layoutek û rengên axê û çiyayî yê ciwan, hêjayî, ne xwendinekê belkî gelek xwendina ye, ta ko xwêner mafê wê bidiyê û di gel prosesa dahênanê beşdar bibe.

Tyabetmendiya van deqan, ew e, ko helbest ber bi afesanekirinê ve birine, belkî xwêner mecbûr dike, da biçe perestgehên, êzdiyan, bexçe û gulîstanên Babel û bibe mêvanê Hemorabî û pirsan li ser dadmendiya îro pêdivî jê bipirse.

Ev pirtûk xwêner mecbûrî hilkişandina wan çiyayî dike, ew yê dastan û efsane û qehremanên wan damezirandine, xwêner pêdivî cegerdariya Trîfa Doskî dike, pêdivî rahijîna destmalan dike, pê sere govendan bigire û pey re biçe rondikên herdu çavên Muhsin Qoçanî, yê li ser dewleteke azad û serbixwe digrîn, vemale û pêdivî...û...û...

Li dumahîkê, berahîka vê xwendinê bi dawî bînim, dixwazim, di guhê birayê xwe Arif de, pistepistekê bikim û bibêjim “ xwênerno nexwênin, pirtûkê peyda bikin û bixwênin”

1. Pêdivî bi dehmen nebû, çimkî, ew erkê xwêner e, li sembolan bigere, ji bilî ko ev sembolên di pirtûkê de, yê

deverê ne. Ji hêleke din ve dikare mîn biçûkirina xwêner bête dîtin.

2. Dil diviya ziman, çarçewa behdîna çirandibaye û sinor bibezandaya.

3. Guman tê de nîne, ko ev deq, mişt ji wênayan bûn, lê wêne sade bûn, ne lêkdayî. Sedema wê jî şeweyê nivîsînê, têkelkirina çîrok, bîranîn, efsane, behî-helbest in, lê dîsan wênayên lêkdayî, wênayên asoveker in û peydabûna biyavên nû bo xîtabên helbestiyane.

4. Carcaran, helbesta pir efsankirî, dibe barekî giran li ser deqî û bi taybetî, dema ko wateya xwe ya li def xwêneran niyas derbas neke.

Bi giştî ..

Hinar... hinar

Demê dikevît.. dibête hezar.

Çendî bête xwendin weha jî dergehên nû vedibin û kilîlên wan dergehan di destê xwêneran de ye.....

Jêder:

- Payîza çiyay, Arif Hîto, Yekîtiya Nivîserên kur-Duhok
- Dr. Xalid Hisên, Nezeriyet Al.inwan, 2007. Altekwîn lilta,ilîf we ddîrasat we 6. terceme, Dîmeşq
- Horst J. Frank, wie interpretiere ich ein Gedicht? = çawa dikarim helbestekê şirove dikim, çap.5 UTB, çapxaneyê Franke- Tübingen, Basel 2000,

Fatma Savcî û Gula Qasid.

Nîgakirina êş û çiyayên xemdar

Di anonsekê de, di malpereke ji wan malperên Internête de, min maşêtek xwend, ko pirtûka Fatma Savcî, ya bi navê **Gulên Qasid**, hatiye weşandin, min jî pêkol û bizavên xwe kirin, ko ez pirtûkê bi dest xwe ve bînim, bo seyr bikim, ka vê xanimê, çi bi gulên xwe yên qasid re rêkirine!, Gelo çima qasidên wê, bi tenikayiya gulê, ew barên giran, ji kul, derd, kovan, xem, êş, zindan, şehîdbûn dost û hevalan, zinar, çiya, newal û geliyên birîndar, li wan kiriye. Gelo gunehê wan gulên yên li benda perîk û perwanan in, ko wan serpêhatiyên Fatma bibînin:
„Çilmisîn, xeyalên çend nişan di kefa destên me de..”¹

Pirtûka **Fatma Savcî**, ya bi navê **Gulên Qasid**, di sala 2006an de, ji hêla weşanxaneyê Avesta hatiye çapkirin. Ev pirtûk 111 rûpel in, ji destên navîn. Fatma helbestên xwe di vê berhevokê de, li ser sê beşan de, belavkiriye.

¹ Fatma Savcî, Gulên qasid, 23

Beşê yêkê:

**Gulên Qasid, ko navîşana pirtûkê ye, Dergûşa ji dara wîzê/
Guldanka jana/ Mêrgeşîna çavan/ Çelmisîn/ Şevên
dilketî/ Şêmuka qesrên kevir/ Xeyalên ji tîna Qelişîn/
Stranên Hevrîşimî/ Xewn bi ser zarokan de digirin/ Av û
agir.**

Beşê 2an:

**Weşiyek tirî/ Mirad dixemilandin/ Dilên li bîna
Bihokan pêçayî/ Li benda nofê Qulinga mam/ Êzdiyeke bi
şemil/ Kê dizîn stêr/ Ji nav bexçeyê heyvê/ Nefertîtiya
Misrê/ Negrîcan/ Hêkên neqîşandî/ Karxezal dibuhurin/
Stêr weşiyên/ keçika portatîf bircan li ber xwe bigrim/
moriyên kehrîbar/ tenêbûn spîsar bû/ Çavên zer ên
koçerekî/ tenekî nîvkuştî/Sûka qaçaxçiyên.**

Beşê 3an:

**Cêwî/ Dilop/ Rêwiyo/ Ken/ Şîpên bêrîkirinê/ silava evînê/
dara xweziya/ min dizî emrê xwe/ Ezîzê/ Bê dostanî
koçberiyek e/ Çawa bihewisînim/ Germahiya kenekî xwe
dikuje/ Lahîta lêdikim/ Di Xelaya evînan de/ tu yê bêyî/
Rozêrîn kelogirî dibûn/ Gihîştin/ Guldexwînek digrî/ Ji
dêvla çirayekê vemirîm/ Nere/ bîna te ji axê dihat/
bîranînên te.**

Her ji destpêkê ve, ko navê pirtûka wê ye, em dikarin bibêjin, ku Fatma dixwazê nameyekê, mesajekê, bo ezîzekî/ê bihinere, ew ezîzê ko bi dûrbûna wî/wê pir êşiya ye û li vir jî hesteweriya wê diyar dibe. Dibe ew bi xwe jî sedemeke derûnî be, ko belkî bi bêzanebûneke kûr, lê bi hestekî ji cihê nediyar, berhevoka xwe, kiriye 3 beş.

Eger em li her beşekî temaşe bikim, dê bibînîn, ko beşa yekê, nazdarî, bêrîkirin, xemgînî, dilşikestin, werarbûn, çelmisîn, têkel dibin, boş û gerim dibin, dibin pêl, dibin remiyên êgir. **Fatma** bi buyer ên bi êş, û yên ji wê re bûne serpêhatî, me dispêre qasidên xwe mîna ew dibêje:

„**Ev efsaneyên ciwan,**

beza hespên rehwan

û şikestina baskê qulinga ye

Ne ji berbiskên serfiraziyan

yan ji bejna zimanekî azad

ji dar û zimanê bindestiyê hatine birîn“¹

Fatima dest bi bîranîna cih û deverên buyeran dike û wan bi xem tîne bîra xwe û xwêner. Cih û deverên wê jî çiya/ kolanên xwînê/ guldanka janan/ zindan/ çav û mijanek mîna biyaveke êşê/ çol/ Çarçira(Mihabad)/ çemê Dêrsîmê/

¹ Fatma Savcî, Gulên Qasid, r. 11

sinor/Midyad/ Sîpanê/ payizoka dil û gelek deverên din, ko netenê hestewer in, belkî pir ji wan jîwar û xeyla têkel in.

„ Çavên me çira ne

ji bo desthilatdaran,

ew hez dikin wan vemirînin yek bi yek

li meydanên Mahabadan..“¹

Demên ko **Fatma** bi kar tîne, pir payîz tê de hene, her weha zivistanên ko lehî û tofanan bi xwe re tînin hene, şevên tarî û tama wan mîna zilindarê hene. havînên ku dixwaze carnan dilê xwe pê xweş bike, mîna çelmisîna qasidên wê, xwe di nav bîrahatin û bêrîkirinê de, dixendiqênin.

„û payîzên

ku ji herdû çavên me weşiyane

ser bi ser,

bi evînên xwe yên dilmayî

cardî diguherînin..“²

Wêneyên Helbestvana me, belkî rêkên rizgariyê ji wan xeman in, sivik û bêkomplêx, mîna dengê Evdalê

¹ Ya berê, r. 35

² Ya berê, r. 20

zeynikê û xatirxwestina hevalên wê yê li wan çiyayan xatir bi
fîzîkî ji xwestin.

**„ Hez dikim tiliyên min
li ser rûyê te bigerin
û şeraba dilxweşiyê vexwin em
ji çavên hev“¹**

Fatma li dergehê pir babetan da ye, lê babetên wê, hemen
hemen di bîranîn, û bêrîkirinan de, xwe bi çarçef dikan. Ji
wan mijaran, mirin, evîn, bêhêvîti, êş, zarokti, welat û rewşa
welêt, omîd, xwezî, jiyana di zindanê de.

**„Qeydkirî ne li bîra wan/ çîroka evînen nîvkuştî
û kenê cemirî
li nav pêlên giriyê wan..
Xwestekên xwe yê qedexe
li ser rûyê jiyane
bi darên gûhîjan ve
dixemilînin..“²**

¹ Fatma Savcî, Gulên Qasid, r. 82

² Ya berê, r. 20

Di vê pirtûkê de, **Fatma** bi şêweyekî dramatîk û bi zimanekî rewan û sivik, hemî êş û azariyên xwe yên nayên gotin jî, li ber me rêz dike û me vedixwêne wê qadê, ko em jî û ne kesek ji me jî dişê

“ **Me kir û nekir**

nikarî kenekî xêz bikin

li rûyê xwe yê evînê“¹

Fatma, di pirtûkê de, dest pê dike û êş, zaroktî, bêhêvîtî, bîranên nexweş/ jiyana bi keser/çilmisîn, mirin, ta rûpelê 26an rêz dike. Di gel wê jî bêhêviya wê ne sermedî ye, her di rûpelê 26an de, çirûskeke biçûk ji hêviyê li ba wê çêdibe dema dibêje:

“ **Lê nizam kîjan heyamê**

em di sînga xwe de jibîrkiri?

Çukû temenê me

hîna ji eşqa ber êvaran

Ji hevaltiya şevên dilketî pêk tê“².

Ji wir û pêde, **Fatma** di navbera omîd û bêhêvîtî û bîranînên xweş û nexweş de, geşt û seyranan dike.

¹ Ya berê, r. 21

² Fatma Savcî, Gulên Qasid, r.

Dixwazim bibêjim, ko carnan, **Fatma** bêhna xwe bi hevokên dirêj vedide, ta ko ji qewarê helbestê derdikeve û dibe bersiv, ji pirsên nepenî, yên dilê wê himbêz dikim, wate têhna xwe bi wan hevokên dirêj û bi wê vebêjiyê dişkîne:

„Peristgehek bawermendiyê ye,

her bejn û balek

ji dêvla hecê,

tenê dilê hev tewaf dikin

mîna xwişkeke dilo van himbêz dikin

hemî bira

li hemî dergeha

ji bo xwediyê dilê xwe

îbadetê dikin

bi zimanê hemî olan..“¹

Di hin caran de zimanê wêneyan dilê qîr û bangewaziyên Fatma têr nakin, lewra bi zimanekî sade, ko digehê zimanekî li ber dergehê nehelbestî qîr û hawarên xwe dirêse: **Were** zarok/ em dîsa biçênin/ darên biyan/ li ber kaniya çavên xezalan.“²

¹ Ya berê, r. 33

² Ya berê, r. 94

Ji bo ez serê we bi xwendinê re gêj nekim û we xwênerên hêja vexwênim pirtûka helbestan ya Fatma Savcî, ya bi navê Gulên Qasid, ji weşana Avesta 2006 Stenbol, ez dê bi pirsekê ji pirsên Fatma vê nivîsê, hem ji wê û hem jî ji we, bi dawî bînim:

Dixwazim bizanim,

kîjan demsal

dê kulîkan vekin

li birînên te?

Jêder:

Fatma Savcî, Gulên Qasid, weşana Avesta 2006 Stenbol

Ey êş û êş û Abdulkadir Musa

Eger li ba Freud û Foucault, li welatên rojavayî, babetên kultûrî, bi giştî xewin û evîn bin – ji ber ev herdû mijar zanavî diafirînin- ji bo xewin bibe jiyan û jiyan bibe xewn, dako zat/ kesayetî bi pêş bikeve, li welatên rojhilat, mijarên sereke ev in: xewn, êş û evîn , daku hêzek peyda bibe, ko bikaribe nasnameyê pêkbîne. Lewra jî, metin û tevna kultûr û wêjeya me kurdan, bi taybetî, li derdora afirandina nasnameya giştî û ya kesayetî digere.

Ev jî dibe sedem, ko gelek çaran, em, di hundurê hêzeke efsanewî derve de, dixwazin, hebûna xwe, berya nasnameyê teqez bikin û biçespînin.

Bi rastî, piştî min pirtûka helbestvan Abdulkadir Musa xwend, min nexwest pir dirêj li ser binivîsim, ji ber, di gel xwendinê, ez bi tama êşê û çêja wê hatim stirehan û guvaştin, tenê rondik û kelegiryan rêga çareseriya gêjbûn û dilêşana min bû. Deka çawa, dil êş û kovanan neazire:

„ Êdî, ne kolanên evî bajarê biyan min hildigrin

Ne di ezmanê wî de heye piçek

Surra bayê te, li ber pozê min

Carekê, nîv carê bi hêsanî hilma xwe vedi“ **Dayik û cendekên gemkirî**

Her xwênerek, ko derfet bo wî çêbibe û vê pirtûka A.Musa bixwîne, dê bizanibe, li ber dahênerekî radiweste, dahênrekî, ko êş, azarî, serpêhatî, têkçûn, şikestin û jiyana wî-ya zate wî-, jêderê hêzeke helbestane ne. Ev helbest ên, an jî ya rast deqên helbestî, yên berê xwêner, didin, hizirînê, bo bikaribe derbasî biyava kûr ya wan deqan bibe û ji xwe eger xwênerekî berhemdar be, dê neşê li ser qeraxan rawestê, dê pêkolê bike, derbasî kûrahiya wate, wêne, hevok û cih û dema helbestê bibe. Kenar û qeraxên helbestê jî, ne kêmtir ji kûrahiya deqî û naverokan, wê ciwaniya êş û kovanan himbêz dikin. Ev hemî jî mirov dikare ji sernavê pirtûkê bi xwe derbîne.: „ **Çengê te ez bi firê xistim“**

Ev çeng, yê nîşana balindeya ye, ko helbestvan pêk aniye, xwe ji çareçewa karên rojane dûr dixê. Ev çeng ê diyar dike, ko helbestvan berê wî li afirandineke cuda ye, an jî jiyanêke bi çêjeke din, bi êşeke din, di atmosfêreke din din û berahîka her tiştî, bi nerîn û asoyekî din.

Ev bask, per û çeng ê, netenê bilind dibin, lê dikarin li cihê xwe jî bimînin, giyanê wî/wê, evîna wî/wê bigihînin

asteyeke bilind, ji ciwanî û hêzeke Episthomoljî di heman demê de. Ev helkehelka peyvyan hêzeke efsanewî dide deqê helbestvan. Bêy ko me bibe û bîne, her li helbesta xwe ya yekem, bo me wî tiştî diyar dike:

„ Bi jor nekeve, lebta bayê bin çengê te

Hêlanka evîna min dihejîne,

min di xew re dibe, û..

*xewnên pîrebokan rê kuleka zarotiya min dide. **Ber bi jor ve...!?***

Ez dê gengeşiyê li ser ciwaniya van deqên Abdulkadir Musa bikim, ne ko cudabûnê di nêvbera pexşan û helbestê de bizanin, lê dê bi pragmatî serederiyê di gel wan bikim, mîna pexşanên helbestî.

Ez xwe bi çu pîvan û şihîna ve girênadim, bo ravekirina deqan, lê dê xwe nêzîkî deq bikim, bizavê bikim, bihingivim wan, wan himbêz bikim û wek xwênerekî, bendewarê wê bim, ka dê ev deq çi kartêkirin, li min bikin, min bi kû ve bibin? çawa min bigrînin û li nav govenda êşan min biçikînin.

„ Da dîlan bikin çiya, di şahiya mirina min de

Ez gorî dayê, va ez dimirim..

û buhustek ax nîne ji te ku tê de bergorbibim,

lewra di dilê xwe de, xwe vedişêrim û..

bi min re kovane buxuirek ji gola „Şêxê Doda“

û tayek „Endeko“ ji newala be „ zerahê“ da gora min re kêl

„Dayik û cendekên gemkirî

Li ser êş û azariyan, helbestê A.Musa vekirîna, û renek ji xwendina hevdeqiyê pêdivî wan deqan e. Her wisa jî pêdivî ye, bizanibin, ko deqên helbestê, dikarin xwe bi xwe rabigehînin hev û dikar in bibin bersiva pirsên êş, birîn, bîranîn, biyanî û havîbûnê. Lewra dibînin, ko deqekî bi gelek awayan hatiye vehûnan û her deqek dikare li ser çend beş û zayendên estetîkane parve bibe, Lyrîk, helbest, xweşxwan û ta sinorê drama jî. Ev deq têkiliyê biyografiya A.Musa û ya mê ne, êşa wan, berfa sipî wek kefen, aşîpa li ber baranê û rîtmên sofîyane. A.Musa, di gel peyvê li keştiya Nûh siwar dibe û carnar li bayî siwar dibe, bi ser çîyan û zozan digihîne û li wan evrazan wateyeke din, bayeykî din, û soyekî din dide wê peyvê:

Sawa çiya-

Em em in yên ji te danakevin

Siwarê keştiya te ne Nuhê-,

Ger tofana sed û yekê be jî

Em Cudî ji kulîna dilê xwe danayinin

Bo berztir bibin lutkeyên Zagros û Bêxêr

Hindirîn û çiyayê Kurmênc. **Saw çiya**

Istegehên Dilê te, mîn şanoyekê, li ber qeraxê pirtûxaneyekê , di pey re, çîrokbêjî derbas dibe. Bi awayekî romantîk, bi Jofîna xwe mest dibe. Di deqî de, şikestinek dest pê dike, dema dibêje:

„ Me tu navnîşan nedan hev??! **Istegehên dilê te**

Ev pirsnîşan û seyrnîşan, sergêjî, goman û tevlîhevbûna wî diyar dikin, belkî kêmtecrubeya wî jî. Di, vê helbestê de, xwêner, piştî bersivdana pir pirsan û yek ji wan, ko di dawî de tê û li ser evînê, pêrgî LÊ dibe:

„ *Lê.../*

Laşê min di livîna te de, ji hêsirên giryana Hans Curt Flemming şil e,

*û can ji evînê zuha nabe, ... lê....ê.. ê“ **Istegehên dilê te***

Lê ev nîşana rêgiriyê, li pêkhatina hemî hêvî û armancên wî digre. Xwêner li vir li hember, huner e, karekî hunerî ye, di hundurê de vera nû û deverên kevin de, diyalogeke nepenî heye, Girê Şermola/Zankoya Helebê/warê Hans Curt Flemming. Li vir, mesajên cuda cuda hene.

Li vir peyva **Umberto Eco**, di hizra min de beşdar dibe dema dibêje: “ Huner, -helbest jî di nav de- mesejêke pirralî ye, ji

pirr nîşan û wateyan, di her nîşanekê de, jiyaneke piçûk heye. Wate, nîşan hilgirê wateyan in.”¹

Helbest hunerekî vekirî ye. Rast e, regezên form (ciwanî, hunerî, rîtim, aheng, endaza giyofrafî û...) û nijyara zimanî giring in, lê ya ji hemiyar, li ser pileya deq, giringtir e, pirrwatedariya helbestê ye.

Pêwendiyên ahengsazî, rîtim û ciwanîyê di nêvbera A.Musa û Ahmed Arif de, diyar in. Kartêkirina wergera Dildar, her wisa jî awayê xwendina Ahmed Arif bi kurdî, li ser deqên E. Mûsa bêsinor in... Nimûne: Di helbesta **A.Musa** de: Dayik û cendekên gemkirî de, ne di cihekî tenê de, kartêkirina helbest û rîtmên A.Arif, lê diyar in:

Êdî, ne kolanên vî bajarê biyan min hildigirinne di ezmanê wî de heye piçek sura

bayê te, li ber pozê min

carekê, nîvcarekê bi hesanî

hilma xwe vedim” **Dayik û cendekên gemkirî.**

A.Arif jî di helbesta xwe ya sî û sê gullan de, ji wergera Dildarê Şeko, weha dibêje: “ Ev curme, egerê kuştina me.

Êdî, bi rêbirrî/bi derbirî

bi pêxwasî

bê xinizî dertê nave me” R. 88. ¹

¹ Pirtûka Dieter Burdorf. Einführung in die Gedichtanalyse, 2 Auflage, verlag J.B. Metzler. Stuttgart. 1997, r 156..

Li vir, derbasbûn û derketina hevokan, lib a A.Arif û A.Musa hevahengiyê di gel hev dikin. Nimûneyeke din:

Dimirim..

Ji bo te ha.. ma te hay jê heye?. Dayik û cendekên gemkirî.

Li vir, A. Musa, sudê ji 2 helbestên A.Arifî kirine, ew jê ev in:

“ Hiş, bila kes nebihûse.

bila nebihîsin dê mirim ha.”²

Helbesta din, ko heme hevok bi giştî biriye, lê nizanim, bo çi nexistiye nav du kevanan de?!

“ Te hay jê heye dîwarê kevir?”³ .

Ez naxwazim pir dirêj bikim, ka çawan, û çi ne, ev hevdeqî, hevheyberî” Intertextuality” ya di navbera wan de. Wek li jor hatiye nivîsîn, ev kartêkirina rîtim û helbestvaniya A. Arif li helbestvanê me bûye,- ne tenê li wî, lê li piraniya, helbestvanên “moderinnivîs”-. Mebest, li gor têgehiştina min

¹ . Ahmed Arif, Ji kesera te.. min pranga kevnarkirin, wergêr: Dildar Şeko. Tîrmeh.1990.

² Ahmed Arif, Ji kesera te.. min pranga kevnarkirin, r.41 wergêr: Dildar Şeko. Tîrmeh.1990.

³ Ahmed Arif, Ji kesera te.. min pranga kevnarkirin, r. 26 wergêr: Dildar Şeko. Tîrmeh.1990.

ew e, ko seqa nivîsîna mijarên herduyan nêzîkî hev in, êş, kovan, hesret û keder in. Ev car, nedûr e û ne jî seyr e, ko kartêkirin hebe.

Helbestvan, ne ko xwestiye, wî bişopîne, belê bi mebest, hişwerî an jî ne heşwerî xwestiye lîstika wan aheng û rîtman, hevok û sytaksan berdewam bike. Wate hevdeqiyeye bi mebest û armanc.

Helbestên A.Musa, ji nişka ve, bi kotekî, berê me didin êşên xwe, şevpestên xwe, çigareya xwe, şevên xwe yên bi dawî nayên, dako me bi wan êşan, wan bendmanan, wan asoyiyên rewrewkane û wî giriyê xwe yê bêhêsir piv bide, dako dever û simblên wî di hiş û sawêrên xwêner de, li ciwaneyeke din rast werin:

„û hêjî em ji şevê hez dikin

-ji xwe-

Çimkî em bi tariyê re ji dayîk bûne..

Pîrhevok, gurê manco, sînor, Gola Enter, Şêxê Doda, newala

Zerahê,

Hacûc û Macûc û saweke bêdeng Şermola“ **Sawa Bêdeng**

Cih û navên bi saw û efsanewî, dibin bersiva A. Musa, li ser şikestin û têkçûnên nû, li biyanistanê, wekî ko zimanhalê bibêje, ez bi tarî û têkçûnan re ji dayik bûme.

Ev şêwe helbest, dexzekê li nik xwêner ava dike, berê wî dide lêpîrsîn û xepardina deqan, dako taybetmendiya wan diyarokên tal û mijane de, binase. Eger hat û xisletek ji wan xwenasnekirinan, nehate naskirin, an jî derveyî sinorê hiş ma, êdî hinga dê bibêjine M.Foucault, ko sinor ji jiyana me re hatine kêşan û em di nêv çekmeçan û zeviyan de, li hişmendiya xwe digerin.

Helbestvanê me, xwêner vedikêşe goşeya xwe ya dahênanê û asoyên taristanê li pêşiya xwêner teng dike. Para evîn, mirin, beşdarî, nebeşdarî, çûn, çûn û çûnê, şev û şevê, sawir û şetî, li nik A.Musa, nekêmir ji hebûna wî, xemgîniya wî û serboriya wî ya zilindar e. Ew e, yê laş, li ba wî ji giyan bar dike û giyan, tûşî azaran dibe, dinale, dinale û diarihe. A. Musa, ji vê cîhanê, hingirî ye û sûravekên xwe di serê peyvê û helbestê re derdixe. Rûpelên biyografiya xwe vedike, tenê giryan, xem û kovanan dibîne, bîanînên wî, ew serpêhatî, keser in di bin xwelîdankê de:

Serpêhatî bi girî b dawî dibe.

Tu dikarî di çavê pêsemîn xoşewîsta min biwînî,

yan di hêstira we a dawî de..,

û ji bo tu jî nebî rupelek ji çîroka min..!

we di dile min werneke..

eve t êkçûnê ji min re berde..!?

....

Ê min...,

ne li ser te,

ne li ser xwe

-tenê digirîm-

Ji bo çavên xwe ji kirêtia

Evê îhaa pûşt bişom?!

Ê min...,

ji destê te t ê ku tu dilê min

mîna cigareya dawî-bi bêhnçikekê- bi dawî bikî

û.. xwe bi kesereke dawî ke ji xweliyê

di xwelîdanka sînga min de!? **Xweliya dil**

Subjektîvîzîm, girî û êş û kovan bêdawi ne. Bîrkirina, nalînên biluran, stranên kurdî, şunwaren kurdî, bêhinvedanên biyanistanê û melhema ser havîbûnên A.Musa ne

Em çî bikin, A.Musa, helbest qêrîna piştî mirinê ye û dilşahiya yê qurbanî ye!

Helbestvan A.Musa, wan helbest û deqên, mişt, kovan, keser, êş, xerîbî, girî, bîranîn û zugurdî, mişt qelebalx, bi

bêdengiyeke ciwan, û hunerkî zîz dinivîse. Di dema nivîsîna vê xwendinê de, mizgîniya weşana çapa diwan, ji weşanên Dezgeha SEMA hat. Dako hun dilê xwe ji êş û kovanan hênik bikin, seryekî bi çavên xwe li pirtûkê bixwin û....

¹ Min hijmara rûpelan yê Pirtûka helbestvanî nenivîsîn, ji ber ku şaşî hatibû çapkirin û di dûv re, careke din hate çapkirin, lê min ev nivîs li ww. Rojava.net belav kiribû.

Jêder:

- **Pirtûka Dieter Burdorf. Einführung in die Gedichtanalyse, 2 Auflage, verlag J.B. Metzler. Stuttgart. 1997**
- **Ahmed Arif, Ji kesera te.. min pranga kevnarkirin, wergêr: Dildar Şeko. Tîrmeh.1990.**
- **Abdulkadir Musa, Çengê te ez bi firê xistim“ Helbest, ji weşana Dezgeha Sema**

Gulnar Elî, Xezala Metîn û axînokên heyvê

Di nav xirecira nivîsa dîgîtal de, pir nivîs û pir nav rojane rûpelên malperan dadigrin, lê kê nav hene, ku bala xwêner dikêşin. Berahîka 3 salan, ez li nav malperên kurdî li helbestan bo xwendinê digeriyam. Di malpera Efrîn.net de, li hin helbestan rast hatim û min xwendin, di wê xwendinê de, min bêhna hevokên bi keser û xem û xerîbiyê kirin.

Dîsan penaberî, koçberî, xem, êş, bêrîkirin, welat û ..., hinavê min kelkeland. Min ji nû ve xwest bizanim nivîserê/a, kî ye. Gulnar Elî, ev vêca kî ye?. Roj çûn û hatin, serhildana Qamişlo hat, helbestek di malperekê de helbestên Gulnar û di nav wan de, yek li ser serhildanê bi navê „Wênek ji serhildana Qamişlo“ hate weşandin.

Ev helbest, bi dilekî mişt xem, peyvên neherêmî û wêneyên ciwan û kesergiran, hatibû xemilandin. Edî di pey re, min dizanîbû li hember helbestvanekê me, ku baş alavên helbestî bi kar tîne û di vehûnana wan êş û xeman, dûrî û bêrîkirinê de, jixwebawer e, dixwaze di tevindanîna helbestê de xwe be û nekopiyek be.

Ev jixwebawerî dibe boşahiya helbestî û hin bi hin wêne li peyvê rast têt. Alavên helbestê di bizava peyvê de, cihê xwe wedigirin û helbest dibe sirûda çiyar, xema mirovan, hisreta koçberiyê û pêk ve melodiya şev ên bi hêvî û xewnan sermest diafirînin

Di sala 2006an de, li Duhok, pirtûka wê ya ku li çapxaneyê Hawarê/Duhok hatibû çapkirin, bi destê min ket. Pirtûk helbestî ye, bi navê „Heyv û Duwazde heyv“, ji 20 helbestan pêk têt/104 R 21x14. Her li destpêkê, di diyariya pirtûka helbestî de, Xanim Gulnar, sînore bêrîkirin, xerîbî, evîn û hesretan dighîne asoyên dawî û ew jî ji kok û reh tete lerizandin.

Bêhtirîn, helbestên wê, duqolî wate ne(Xewn û rastî/, Ez û Tu/, ken û girî).

Ev dualîzma navnîşanan, diyalektîka di navbera xeyal û rastiye, xewn û hişiyariye, xerîbî û bicihbûnê, reş û spî, evîn û mirinê de, li qelem dide. Aram, hêvî, omêd û dilşkestinên serê xwe berz dikin û nijyarên deqê Gulnar kelpîç bi kelpîç

dideynin ser hev. Xwêner ji kû ve dest bi xwendina helbesta Gulnar bike, dê parçekî ji xwe tê de bibîne. Peyv sinorên xwe yê ferhengî diçirîne û ber bi asoyên wateyan ve diçe.

Gulnar ji helbesta xwe ya yekem, biyavên fereh û dirêj dide ber xwêner, yekser wî derbasî prosesa afirandina deq diket. Xwendevan berbi sinorên asê ve debit, barê pirsan bi ser xwêner de berdide û wî dike hevpişkê prosesa vehûnan, ristîn, afirandin û bikaranîna, tîpan, peyvan, lêkdanan, hevokan, wêneyan, buyeran di helbestê da û giyanê xwendevanî têkelî xewnan dike. Êdî xwendevan, xewn û helbest dibin piseke zindî, hevdem. Sinor dibe peyv û peyv dibe êş û êş dibe helbest.

Ev çi xewn e ji rastiyê xweştir?

Yan rastî ye, ji xewnê bihêztir!?

Ev çi derman e, kûrbirîn derkirîn?¹

Dualîzima helbestî, di nav xewn û ratiyê de, li nav bihêz û bêhêziyê da, di nav birîn û dermanî de, dibe yariyeke ciwaniyê, di nav kovanan de melevaniyê dikin.

Guman, dibe barekî, ku xwe ji hizrê wê navêje. Dema behwerî bi rastiyê neyêt, helbestvanvana me berbi xewnan ve diçit, daku birîn û êşêd xwe nojdar biket.

¹ Gulnar Elî, Heyv û Duwazde heyv, r. 7

Li nav vê diyaloga, bêserûbin, lerza helbestî xwe digihîne lotka bilind.

Ev jî hizra wan mirovan e, ku li her demê û her deverê li rastiye digerin.

Gilgamêş, li zindîbûnê bo xwe digeriya û nedît, Iskenderê Zûlqirnên li zindîbûnê gerya nedît, Nûh li zindîbûnê geriya nedît.. Ev hemî negihan mirada xwe, ji ber bi giyanekî mirovane dixwestin bigihin zindîbûnê, ya rast dixwestin zindîbûn bikin qurbana EGO ya xwe, lê Gulnar, dest ji êrîşa şênberiyê berda, zindîbûnê, hews û arama xwe di nav peyvên wê de dîtin. Zindîbûn, xewn û rastî bûne yarîkerên çalak, di qadeke hişk de û diyalog berev ciwaniyê da çû....

Ev felsefa hindûsa ye, ku li xwedayê xwe Evra, an jî Kirîşna digerin. Lewra rastî bûye hesta pêşî û bi xeyal û xewnan ve hatiya girêdan.

Li vir diyar dibe, ku ev hizra felsefiyane, an jî ji destpêka ku hizir pêkhatiye bûye hevoka Gulnar ya yekem û pê pîrsa xwe li nav çavên hebûn, nebûn, zindîbûn û heyhayê daye.

Zimanê rojane, nezimanê rasteqîne ye. Dibe ku ev ziman, zimanê derbirîna daxwazan be, lê nezimanê derbirîna xewnan e. Helbest mêrga xewnan, fantaziya û bêhinvedana peyvan e. Her li destpêkê, bo me diyar dibit, ku xanim Gulnar, ji rûdan, buyer û diyardeyên gerdûnê bi guman û matmayî ye, lê naxwaze vê bêhtîbûnê bo xwe bihêle, belê bi xwêner re

parve bike, xwendevan dike hevpişkê tekstê xwe û ta bi ezelê, dest ji tenêtiya vehûnana xewnan berdide.

Helbestvana me, di helbesta xwe ya yekem de“ Xewn û rastî“, xwe bo xwêner diyar dike û dide niyasîn, dema dibêje:

„Xezalek e çiyayî me..“¹

Navnîşana helbestê, xwendevanî berev diyalektîke bêdawî dibe. Êdî xwêner nema dikare bi alavên kevin, çêjê ji xwendina helbesta Gulnarê biket.

Xwendevan pêdivî bi alavên Epstomolojîyê, li ser asteyê berz û di gelek beşan de heye. Ji erdnîgariyê, tanî bi stêrnasiyê...

Carcaran nivîskar dibêjin, ku pirtûka yekem nasnameya me ye, lê Gulnar bi xwe xwe dide nasîn û bêtirs derbasî xwenasîne dibe.

Ev e jî nehêsan e, ji nivîskarekê/î re, ku bi pirtûka xwe ya yekem beramberî xwêner raweste.

Tiştê ku li ara ye, nivîskar di nivîsên/berhem xwe yê yekem de, bi lîrê in, lê li vir careke din Gulnar, bi peyvên xwe, xwêner bi xwe re hildikişîne, gopîtîka çiyayê Metîn û li wir jê re dibêje, ka ew kî ye û konê xwe yê helbestî di qada toreyê kurdî de vedigire.

¹ Gulnar Elî, Heyv û Duwazde heyv, r. 8

Dema got ez „ Xezaleke çiyayî me di helbesta xwe ya bi navê „ Xezal im“, ranewesta belê dol û kevir jî kirin beşek ji jiyana xwe:

„ Xezal im,
xezal di navbera Metîn û salan dol û kevirên yelan..“¹

Di evînê de, di elend û demên roj û şevan de, Gulnar destê xwe dirêjî evînê dike, dirêj bîrahatinan dike û dixwaze xeyalên xwe bike sirûd ên rastiyê û ber bi elend û deman ve biçe.

Bi ahîn û axînan rawestgehên xwe, qîrînên xwe, bêdeng vedihûne û li derdora war, felek, bêrîkirin, heval û hogir, dayik û xewnên xwe yên veşartî bi nehîni digere, bi evînê, gul û agir radike semayê û di nivê rêkê de, xwe dispêre cejna poşmaniyê dike. Tiştê herî balkêş, ku ev ahîn, hesret û xemgînî, keser û xerîbî ji dever û cih, bûne dever û cihên helbestê yên ciwan û tabloyên xwe bi wan xemilandiye, bê ku wan li perawêzan bihêle, belkî ew kirine nivşk û navenda deq ên xwe.

Ew tu, an jî yê din, li nik Gulnar, caran welat e, caran, evîn û xewn e, pir caran guman û tirs e. Ev e jî sîmayên civakeke konservatîv e, ku li her livekê ji hêla jinê ve, bi çavekî din tête nêrîn. Civakek, ku sîstema xwe li ser daxwazên yên din, ne yê xwe ava kiriye:

¹ Ya berê, r. 103

„ Ez û tu tenê
li vê dinê
evînxwazî ji berbangê“¹
„ji xwe xerîb im“²

Helbestvan Gulnar Elî, axîn xwe, êş ên xwe û hemî tiştî digihîne biyavên dawî, asoyan şîn dike û berê xwêner dide lixwemukurhatinê.

Ez û Tu, li nik Gulnar amorên lihevdana hestan in û şûnwarê lixwevegerîne ne.

Ez dibe tu û tu dibe ez, pêk ve dibin evîneke sermedî, ku bi tîpên axîne dixemilin:

„Axînka çavên te,
ciwantirîn tîp in di peyvên min de“³

Huneriya deq, erkekî helbestê yê sereke li nik Gulnar, lewra bizavê dike, bi dijberan di hundurê xewn û henasan de, di hundurê tîp û peyvên de, ahengeke helbestane biafirîne û mîna konservatorekî hemî amoran li hev bicivîne, denga bike yek û konserta xwe bi wan bixemilîne.

Li asîmanê peyvên stêrên bi xeml û rewş nîgar dike û bi rewanî, hewes û tirs, hest û lertzîne, xem, ken û girî wan geş

¹ Ya beê, r. 58

² Ya berê, r. 18

³ Gulnar Elî, Heyv û Duwazde heyv, r. 25

dike. Di nav mij û dumanê de, li xwe dizivire, bi hizrên xwe re danûstendinê dike, lê qet ji hêviyên xwe nayête birîn.

Di nav dijberiyên de, wêneyê hizrî, dengên cuda, dike mêrg daku atmosfêra helbesta xwe ji sînorên sanahiyê dût bike û berbi xwendevanekî çalak ve biçê. Tekst û xwendevanê xwe nêzîkî asoyên sînorên dût yê ji ken û girî mişt:

„konê reş ji bêxunaviyê xemilî
Di dengê poşmaniya ewrekî de
Silavên hûrbaranê bêjivan zivirîne

....

Dukêl e henasgeha hest bêrî lertzîn bêdengî şahî xem
ken û gi ...rî.. ye“¹

Çi dikare îro wê reşiyê bixemilîne? Kî dikare di nav xunava poşmaniyê da silaveke mişt hûrbaran bi ser biyaniya kambax da, belav bike? Kî dikare çiyayekî, robarekî, darekê, balindeyekî bibîne û silavên ji biyaniyê bike barê wî berbi welatî ve?

Ne tenê rewanî û xurrîna peyvên mîna robarê Xabûr û Zê, bilindiya Metîn û Gara, ku di bîr û hizrên Gulnarê de serî radikin, di semayeke bêminak de dilîzin, belê cih û deverên din jî yên Kurdistanê birîn û qîrînên wê dixemilînin û li ber wan buyerên diltezîne, bêdeng namîne û êşên kurdên

¹ Ya berê, r. 50

parçeyên din dibin êş û azarên helbestvana pirtûka Heyv û duwazde heyv.

Li nav hizrên helbestê war û cih di nav liv û tevgerê de ne, tişta ku di realîteyê da bêçare be, di helbestê de, mişte ji kovan û serdeseriyê Amed û Qamişlo xewnên rûs in, şevnem dilerize, dîroka reş û tarî li xwe vedigere, ji xwe dixwe û bi xwe re dilîze.

Ziman, alav û amorê sereke yê toreyê ye. Di helbestê da û bitaybetî ya postnûxwaz, ziman armance, lewra helbestvanên Postmodernîzmê û yê di dûv wan re jî, pêkolê dîkin, ku zimanêd xwe ber asoyên din ve bibin. Gulnar Xanim, jî bi zimanekî tîr-sanahî, lêkder-tekane, xwemalî-wergirtî, tevna helbestên xwe xemilandine. Di nav zimanê xwe de, têkiliyeke cuda digel peyvê kiriye, daku zimanê kurdî bi epstomolojiya rojavayî ve berbend bike. Ta radeyeke bilind biserketiye, belê muhra xwe, di nav zimanê de, li wêneyên helbestî, ciwanî û huneriya tekstî daye.

Ev pirtûka helbestî ya gulnar, ji hêla wêneyên helbestî ve, mişt in ji wan wêneyên, ku Gulnar, pêkol kiriye, bike şewazê xwe, her weha xwe ji zimanê herêmî dîr kiriye û bi zimanekî ku bêhtirîn kurdên heztore û hezwendin tê digehin, nivîsiye.

Ev bi xwe jî ji wê baweriya wê ye, wek helbestvaneke kurdistanî, ku êşa kurdan li hemî kurdan parve dibe. Ji

berhema Gulnar Elî, ya yekem, xwendevan bêhna pirdengî, pirrengî û multîkultûrî diket û bi wêne, ziman, tevin, vehûnana keskesorane dikeve nav baxê helbestê da li ber mestiya asoyên peyvên wê, piyala xewnên xwe bilind dike û dibêje noş Kurdistan, noş helbesta kurdî. endbûn. Gulna Elî, yek ji helbestvanên kurd yên jin, ku dikarin paşeroja helbesta kurdî bigihînin ber dergehên cîhangîriyê.

Jêder:

Gulnar Elî, Heyv û Duwazde heyv , 2007, Duhok

Maçeke gunehkar di êvareke kesk de Û Tirîfa Doskî

M*in dikey bûk
Û henasa min dorpêç dikey
Di kevlojankê posîde da hezar xewn dirizi*

Hezêt min di singê baranê da dinvin

Jiyê çavêt min du roj bûn..¹.

Eger tinê em awirekê bidin van çend xêzan, dê çend simbolên balkêş bibînin..

Ez / Bûk / kevlojank/ henas / dorpêçkirin / Xewn/ rizîn/ singa baran / nivistin/ jî /çav.

Heme her li vir, dê astengî û aloziyên civaka me tê de, li hember jinê bibînin û diyar bibin, ka jin çendî di hest û nest, kesayetî, daxwaz, hêvî, armanc û ta henasa wê, tete fetisandin, an jî bi darê zorê hestên wê dinivênin, di vê jiyana, ko ji bo temaşekirin û sûdlêwergirtinê peyda bûye.

¹ Tirîfa Doskî, Êvareyeka kesik, Yekîtiya Nivîserên Duhokê, r. 34

Eger em navê nivîsera/ê helbestên nizanibin jî, lê dê helbet bizanibin, ko jin e, xwediyê van peyvên tenik, hestewer û dilêş û gazinoker, Xwediyaya wan hezar xewnên nivistî **Tirîfa Doskî** temerudê dike. **Tirîfa**, di vê pirtûka xwe de, ya bi navê **Êvareyeka Kesik** û di gotar û helbestên xwe de, ne tenê temerudê dike, belê xebat û tekoşîneke bêwestan ji bo bidestxistina mafên xwe yên suruştî û kesayetî dike, lewra bêtirs û bi cegerdariyeke balkêş, di rêka bigewdekirina zimanê xwe, yê berbendkirinê nanase, helbestên xwe vedihune, zimanê laşî di vê berhovoka helbestî de diyar e. Ev jî nîşana hindê ye, ko helbestvan **Tirîfa**, dixwaze bi vî zimanê xwe yê sinoran biroxîne, dîwarên civaka kurdewarî, yên kevin û kivil biherifîne, li şûna wan civakeke şaristanî, ko mafê jinê, ji evîn, pejirandin, xwendin, zîrekî, kar û..., netenê bête parastin, belê di ber de tekoşîn û xebat bibe.

Berhovka helbestî **Êvareyeka kesik**, di sala 2005an de, li Duhokê ji hêla çapxaneyaya Zana hatiye çapkirin, ji destê navê û 93 rûpelan pêk têt. **Tirîfa Doskî**, di hundurê vê pirtûkê de, helbestên xwe yên, pirtûka yekem, ko bi navê **Straneke Spî**, di sala 2000an de belavkiribû, çap kirine.

Pirtûka yekem bi navê **Straneke spî** û ya diwan **Êvareyeka kesik**. Ev herdû reng Spî/kesik, rengê Spî/ destpêkirin/ hindekî xwe parastin/ aşî û şopdîtin. Rengê kesik, rengê şaxberdana di xakê de/ diyarkirina nasnameyê/ barîna xêr û bereketê û gehiştin.

Tirîfa bi derxistin û belavoka helbestên xwe yên kevin û nû, karekî baş kiriye, lewra xwêner dikare, danebehevekê, ji hêla ferheng, hevok, xeyal û sîber, ziman û şiyana bikaranîna zimanî, ciwanî, lêkdanên wêneyan bi hemî coreyên xwe ve û hunerî û endaza deqan...bike.

Di pirtûka yekem de, xwêner pêrgî, wêne û zimanekî hêsan, sade û bêlîstik û bêy liserkarkirin dibîne. Nivîserê xwe avêtiye, peyvên tekane, ko jiyana -belkî wê, an jî yên wek wê tamsar û bêwate kirine. Her ji hilbijartina navnîşana, jixwenabehweriya Tirîfayê diyar dibe:

(Xiyamet/Guman/Girîn/ Vemirandin/ Dehbe/ Namek bo kesî ne/ Merq û... Di van helbestan de, nivîsera me xwe dispêr bangewaziyên:

„ Ey piyawê spî/ ji herfên te dibim/

tu wek peyveka rwîs/ li bin berçavka xo/

seh dikey/ ey dildarê/ .. “¹

„Bo te çî bikem/ xulya hozanên xo ji bayê bigrim/

yan hozanê bikme naneka gerim/..²

Li vir, em, wê lerza ji xwe nebehweriyê dibînin, hem ji hêla zimanê bangewaziyê ve, ko dema mirov pêdivî bi karekî,

¹ Ya berê, r. 72

² Ya berê, r. 89

alîkariyekê bibe, xwe dispêre bangewaziyê û xîtaba yekser, her weha dema xwebewerî jî nemukum be, biryarek nayê wergirtin. Freud di şirovekirin û analîzên xwe yê derûnî de, li ser neşiyana, an jî nezelaliya birayrwerigirtinê, vedigerînê jixwenebweriyê.

Lê Xwêner, her di helbesta yekem de, ji Êvareyeka Kesik de, pêrgî zimanekî din dibe, wêne û xeyalên din dibe û rûpel bi rûpel, tê tîne der, ko li hember xanimeke nivîskar, ko temerudê li ser hertiştî dike, kirasê civaka kurdî li ser dihilîne, zimanê şehwet, lizet û ta radeyekê Erotîk, ko bi xwe jî serhildaneke, an jî vepejandin e, li hember zordestiya civaka nêr.

Xwêner li hember deqên helbestî radiweste, ko çu pîrozî, ji urf û adetên kevneşopî yên civaka kû tê de nagire. Xwêner, li hember helbestên hizir yên sêqoliyane dibe, ko ev jî tenê yeke li serê xwe siwar, dişê bi vî şêweyî bête qada nivîsê û bi vî rengî jî keskahiya xwe bo xwe, ne bo hin din dihêle û nade dest kesekî din. Nade evîndarê xwe, yê ko evîneke bêdawî, bi wî re parvedike, werîsê wê, evîna wê, hêza wê, keskahiya wê, nameyên wê, barana wê, maçên wê, gunehên wê, welatên wê, işqa wê, xewnên wê, bazinên wê, ez ên wê, yê wê ne.

Di gel hemî evîndariyê, hemî laşspartinê, hemî şevspartinê, hemî xewinspartinê û hemî spêdespartinê, lê hîn jî carcaran dudil dibe.

„*Min dikî bûk/ henasa min dorpêç dikî...*“¹

Tirîfa, pir hêzê dide zimanê xwe, hêza giyanî û helbestî jî, pê re digihe lutkeyeke bilind.

Xwêner bendewarê teqîneyeke zimanî dimîne, ji ber komên hest û nestan, yên êş û baranan û sêvên gunehkar, nema êdî di hensan de têne veşartin.

„*Gunehek wek reşebayek Te'hl/di bejan nêrgizekê aliya/*

û nêrgiz wek zarokeke damayî..wek xewneke tirsiyayî

Wek welatekî xoşî rijyayî..wek sinêleke bizdiyayî/

*Afretêk ji ruha firmêskêkê derket serçemyayî/ got: bibhurin.*²

Em bendewarê wê hindê bûn, ko niha dê bombeyeke zimanî bipeqe, lê nebû, di pey re, dîsan rîtm bilind kir:

„Ey serab û xewn û berd û çiya/

Ey Kurdistan û nihal û cade.. ey xewnêt sava/

min neşiya bergiriya leşê xwey bêxudan bikem“³

Ev rîtm, ya kela xwêner hildide û dadixe, şêweyê sîmfoneyeke bêdawî di guh û hizra wî de peyda dike. Ne tenê

¹ Ya berê, r. 36

² Ya berê, r. 9

³ Y.b., r. 9

di vê helbesta wê de, ko 2 simbol jêre kirine navnîşan, Baran û Sêv.

Ev herdû simbol, di bingeha rewşenbîrî, mêtolojî û metaforê de, dijber in.

Baran, nîşana xêrê, lihevhatinê, dilxweşiyê ye. Sêv, metolojiya Adem û Hewayê tîne bîra me, herweha di destana Xerîbo de jî, sêv roleke wê heye, sêv dikare bibe sedema gencmayîna Xerîbo, lê di dirêjiya destanê de, bû sedema pîrbûn û mirina wî.

Bi van herdû regezên dijber, Tirîfa dest bi nivîsa pirtûka xwe ya diwan kir û ji destpêkê da demên buhurî yên herî dûr û erkekî mezin avête ser milê xwêner, ko bibe yek ji regezên dahênanê û helbestên wê ber bi bêdawîbûnê ve bibe.

Xala bo min balkêş, ev ye, ko xanim Tirîfa, terminolojiya xwe, bi 2 şêweyan bi kar tîne, yek 2 qolî ye, mîna / Baran û sêv/ şev û xewn/ ez û bazin/ maç û şev.

Yên sê qolî, Maç, welat û guneh/ Sê nameyên kurt/ xirûra tawis, hewşa axê, reş/ belg, şevên bêstêr yên enfalan ..reş/ name.. hozaneka terr..binefş/..

Xanim Tirîfa dilê wê ji evînê sar nabe, diyarî kela dilê wê hînik nekir, belê helbestek jî bi Hoşeng î û ji bo wî got, peyvek jê re hinart:

„ Oh../ çend xerîbiya bêhna çixarê te dikim/

di gel bayî hilkêşim û mest bibim/

nizanim bo çî ber pêûsê min naçî/

dinivîsim zarok dibîte/

Hoşeng/

dinivîsim pirtûk dibîte /

Hoşeng/

Keftîme di çerxa demê te de.“¹

Dixwazim amancê bi çend xalan bikim, ko ez dibînim pir giring in, ew jî ev in:

Tirîfa bêtirs gotina tête ber devê wê dibêje, wan bend û zincîrên civakî diçirîne, laşê xwe bi xwe dike helbest. Xwêner tîne der, ko li nik Tirîfa her peyv dikare bibe helbest û gelek caran cihê xwe yê baş digire, lê carnan jî, li helbestê dibe bar.

„ Guneh demê hatî xewn hatin berhavêtin

Perokek ji rastiye bibû dirîşmê bera'itê

..

Di welatê gunehkara da werzan..zemen kire bwik“²

Li vir, hevok dibin bersiv ji pirsên sade re, ko nehatî kirin û li vir erkê ciwaniyê dadibeze.

Ji hêla din ve, belavkirina reş li ser sipî, bi şeweyekî rêk û pêk hatiye dariştin. Ji hêla poetizmê de jî, xwêner li hember pir wêneyên lêkdayî nû dibe, wêneyên, ko pêdivî bi westan û hizrê hene, pêdivî bi beşdariya xwêner heye

¹ Y.b., r. 34

² Ya berê, r. 31

*Spêde dixendiqit bi roj û gav û çirke guneh têne
tomarkirin/*

guneh fêrî piyasa bûye li ser xewna“¹

Ji bilî **inziyahatên** hişmendî, ko pirr in, **inziyahatên** rêzimanî jî hêzekê didin deqên helbestî û xwêner têve dide, ko xwendineke din, an jî pitir li nivîsên Tirîfayê bike.

Bo çavên xwêneran li ber monîtorê PC neêşe, xwendina kaxezê baştir e, çirûskên çavêş tune ne û navê pirtûka **Tirîfa Doskî** wek wê nivîsî, **Êvareyeka Kesik“** e.

Êvareka Kesik

„Pêşgotinek ji hêla helbestvan Bilind Mihemed/ Baran sêv/
Tirs/ Sê namên kurt/ Xewin/ Maç û guneh û welat/ Girîn/
Guneha min jibîr kirî/ Peyvek ji te re/ Ez û bazin/ Şivê dî/
hêiyê bêwejînekê/ Bo Leylayê/ Qedexetirîn name/ Rikoyê li
şevka sar/ Şevka baranê/ Agir

Straneka Spî

„Xiyamet/ Guman/ Bi ruheke Ehrîmen î/ Piyawê Spî/
Straneka Spî/ Vemirandin/ Dehbe/ Orkêstra FrîştanKolb/
Merq/ Namek bokesî ne/ Demê navê te bi tinê dimîne bajêrî.

Jêder:

Trîfa Doskî, Êvareyeka kesik, Yekîtiya Nivîserên Duhokê, r. 34

¹ Y.b., r. 30

Selîm Biçûk, di XEWNÊN REVOK de, li xwe guhdarî dike

Di felsefa ravekirina helbestiyane de û di tîrmênolojiyên ciwanîyê de, sê tayên pêdivî hene, ku me bighînin encameke nêzîkî xwedîtina di deq de, ew jî ev in:

1. Hingivtin û têgehîştina deq.
2. Ravekirin di rêya eyqon, nîşan û şiferyên deq de.
3. Bikaranîna simbolên, ku di deq de peyda dibin.

„Têrma “zarawe,, ASO û watedariya wê, dibe bingeh di Hermeneutika Felsefî, toreyî û mêtûyî de, ji ber ku ev babetekî cuda, di serboriyên, kevin û nû de ye, her weha serboreyekî ciwanîyê ye, di kêlîka asoyên bendewariyê de, yê ji xwendina her berhemekî toreyî re, ji hêla xwênerekî dema nû û ya dahatû ve, tete afirandin“¹

Ji ber ku ev kêşa INTERTEXTULITE=hevheyber=hevdeq e, ku beramber heyîna erkên deq radiweste.

¹ Belaxet Al Xîtab û Ilm al Nes. Dr. Selah Fedil „Alem almarîfe 164

Helbest, Ziman e, çavî ye dipeqê, qêrîn e, nasnameya veşartî ye, nîgaşa helbestvan e, serpêhatî û ramanên wî ne.

Pêdivî ye ji bîr nebê, ku her ziman alavên wî, boşeya wî, wijdaniya wî, û şêweyê derbirîna wî, taybet pê ye, zimanekî din dubare nakê, ne jî dikarê alavên zimanekî din bi kar bîne. Nivîsandin, jivandina regezên hêzên nepenî ye û derxistina wan e, xwendin jî wergirtina wan peyvan e, wek birûskekê di hundurê leylan, tem û mijê de, xwêner tu yî, ewê ku bîranînên te, di hundurê hestekî derbasbûyî de, dibin bihitîbûna pêşerojê, bê destûr şevê derbasî nav xemên rojê bikî. Hêjayî gotinê ye, ku helbest her û her genc e, dest pê nakê, livek e, sermedî ye, bi dilxweşî di azadiya bêsinor de dilerize, li dijî hemî qeyd û yasayan e, hilma xwe ya dawî dikêşe, bo dest bi ya pêşî bike.

Piştî vê pêşgotina dirêj, ku me ji bo babeta xwe ya vê carê kire dergeh, da bibe zevî û meydana guftûgoyê, ew ya ku me hemiyar pêdvî pê heye, bo qada nirixandina pirtûkan jî bixemilê û ji têbînî û rexneyan, ji hev sûde û mefa werbigirin, qene bîrozdozî jî, pê bi pê di gel dahênanê bikeve refê nivîsîna kurdî de, çimkî bê têgehiştina teyorî (Bîrozdozî), dê berhemên me seqet bimînin û dê zeviyê nivîsînê, ji zîwan û qûciran mişt be. Bi hêvî me, ku ne tenê rexne bête avakirin, belê her weha rexna li ser rexneyê jî cihê xwe bigire.

Em dê vê carê ji tûrikê xwe, pertûka hêja Selîm Biçûk ya helbestî, ya bi navê XEWNÊN REVOK, der bixin û dê

xwendineke sivik lê bikin, bi hêviya ku bişên çend çirûskên xilmaş ji xewê hişiyar bikin û di dawiyê de, xwênerên me, ji xwe re pirtûkê peyda bikin û bi hûrbînî bixwînin û her yekî çêjekê bi şêweyê xwe jê werbigirê.

Ev pirtûk ya helbestvanê me Selîm Biçûk, di sala 2003an de, hate weşandin, bi bergekî rengîn, ji rengê reş û goşeyeke zer di jêr qapê de û li jor, rengê tem û moranê ye.

Li parçê diwem ji qapa pirtûkê, wêneyê wî, di gel kurtebiographiyekê û parçeyek ji helbesta wî, ku têkiliyên peyvên wê bi rengên qapa pirtûkê ve hene, şev, xewn û nehtorîya xeman, di gora helbestê de, xwe dixemilênin.

Ev pirtûk ji hêla weşanxaneyê Angela Hackbarth Verlag, St. George hatiye weşandin.

Navnîşan û amajeyên wê:

Eger, em, bi hûrbînî navnîşana pirtûkê bixwînin, dê bigihin encamekê, ku helbestvan ta radeyeke bilind xewnên xwe şopandine, lê havîbûn û bêganetiyê kartêkirineke xwe ya mezin li jiyana wî kirine, her weha şikestinên jiyana rojane jî, xwe bêpar ne hiştiye, lewra Selîm bê rezamendiya xwe, ew rengê sor î tarî û rengê temê aniye ser qapa pirtûka xwe.

Li vê deverê naxwazim, bibêjim çima û çî girêdan di navbera navnîşana pirtûkê û xewnên şikestî û bîranînên wî yên tehel

de hene, çunkî, dê li ser van xalan, dema bême pêwendiyên navbera navîşanên hundur û deqên wan, binivîsim.

Helbet Xewnên Revok, ji kela wî derketiye û wek di helbestên wî de jî diyar dibe, ku li gorepana windabûnê ev xewn êkincî bûne û mêrg û çîmenên nepeniyê sirûdên xwe didirûn.

Sernav û nîşanên deqan:

Helbestvanê me, gelek zo di sernavan de bi kar anîne, sernavên¹⁰ helbestên wî zo ne, wek nimûne (Ez û TU, Ken û girî, hat û çû, dojecha bihiştî, Ez û şev...).

Li vir tê diyarkirin, ka ta çi radeyê kartêkirina ramana Zerdeştî û Êzdayetiyê li Selîm heye, her weha bandora çeprewiyê ji bîr nabê (Felsefa Marksî). Di van zoyan de, du pol li hember hev radiwestin, yek qels û bê hêz e, ew jî ew e, hêza din yê din/ ya din e, ku bi hêz e û helbestvanê me ji diltenikiya xwe, xwe kêr dike, lewra jî hêza kêr, yan jî bi wateya felsefî Ahrîman bi ser dikeve û Ahora Mazda di xem û azariyên xwe de dikele, lewra hêviyê dike. . Nimûne:

Serxweş neke serpêhatiya min!

ku hilkişiyam ser sêdarê û ben avêtin stoyê min
bikene!

Da bişewite sêdar bikene bila bibihîse mirin kenê te)¹

¹ Selîm biçûk, Xewnên revok, r. 100, 1001

Li vir diyar dibe, ka çendî ya din bi hêz dibîne, behwer dike, ku di mirinê de jî ew dikarê alîkariya wî bike û wî ne ji mirinê rizgar bikê, çunkî ew miriye û çû, lê di mirinê de bibihîse, ku ew lê dipirsê. Eve bi xwe tirajîdiya helbestvanê kurd e, ku di bin bandorên civak, sîstema netêgehîştina derdoran di wî de ye.

Selîm, hêvî û daxwazên xwe bes nakê, belkî carekê ya din / yê din, diltenik bibe û ji ya xwe were xwar û rehim û dilovaniyê li Selîm bikê û maweyekî di nav dilê wî de, bimîne, diyar e Selîm ji desthilanîn ketiye, ta bi dilê wî nema yê wî ye, weha dibêje:

şev baş!

şev baş melaka min!

Bimîne bi xêr û xweşî!

Li nav dilê min

....

Çav ranazin

Li hêviya

şev baş”

Rûpel “87¹”

¹ Selîm Biçûk, xewnên revok, r. 87

Destpêkên helbestan :

Her ji peyva yekem, di helbesta yekem de, di pirtûkê de, Selîm qîr, hêvî, daxwaz û lavlavê dikê û dengê xwe ber bi asoyekî vekirî ve dibe û deng lêvenagerê.

Tevî ku babetên hêvî, qêrîn û lavlavan cuda ne jî, lê dimîne, ku ew ji qîran nawestê. Li vir nekû ewî hêviyek bi vegera wan kesan, wan xewnan, wan omîdan heye, bi tenê diqîrê û kela dilê xwe hînik dike, çunkî tu sermiyan di dest de nemaye, ji bilî van qîr û hawaran.

“ Were!

Ji destpêkê

Vebêjin çîroka xwe

Çi bû? Çi nebû? “¹”

Vemale reşiya şevê(EZ û Tu R.9)/ Ax, hêdî bese (kanî, R. 11)/Di reşika çavên te de (Sisê R. 19) /..Li nav dilê kederê (Bablîsok .R. 105)

Helbestvanê me di bêhêviya xwe de jî dest ji girêdanên xwe bernadê, Eger Selîm di rengên Carl Gustav Jung de, rengê şîn werdigirê, di hundurê xwe de Sor e û sorekî tarî ye, çimkî li şikestinên xwe temaşe nakê û dibêje: -wê dem ji min biçê, eger bêm, wan şikestinan bixemilênim û sûde ji wan

¹ Ya berê, r. 5

werbigirim, dem wê bê, lê piştî ku ez silavekê ji yara xwe/ ya din/ yê din werbigirim.

Bîranîn û Serborî:

Ji ber wan xewn û xeyalên, ku Selîm bo xwe ava dikê û li ber çavên wî diroxin, dest bi hizir, bîr û bîranînan dike, li nav wan digere û hewl dide, çirûskên ku mayîn bide hev û pê kela dilê xwe ya tarî ronî bike û hînik bike, lewra jî ew qîr, hawar û lavlav in, lewra jî, xweavêtina vî bextî û wan deman e.

Hoy xewna min!

Rastiya derewîn!

Heşt salan li pey te

Bê aram digirim

Derew ya min bû

Xewn ya bû

Xeyal ya min bû

Min ji xwe bawer kir

Û ketin şopê“¹

Her li vir diyar dibe, ka çendî wî bi xwe ji xeyala xwe bawer kir û hîn jî dixwaze bawer bike, çimkî ew bi tenê çekê wî maye, ku bişê ji derya xeyalan rizgar bibe û şikestinên

¹ Ya berê, r. 95

xwe bi çavê serê xwe bibînê. Di gel vê hindê jî, Selîm dibêje
:

Baskek li nav dilê te

Li ba dibe

Yek li agirê dogehê

Diqijile

Û çavên..

Çav li dûriya hêviyê

Zîz dibe”¹

Selîm dixwazê wan xeyalan winda neke, di xem û pêjanên xwe de, li xwe vegere, xwe bibîne, ji xwe pirs ên nayên hizra wî bike û di tariyê de, sirûd ên deman ji tîrojken reşê vemalê. Ew pirs ên, lixwemukurhatinê û poşmaniyê ne. Li bext û qerar ên çep rast têt û xwe bi mijê re hildide, lê hêviya ronyekê

Were

.....

Dawiyê em vegeînin serî

Lê nepirse ji min

Çima berevajî digere xweza

Sînor tev hev dibin”¹

¹ Ya be^re, r. 95

Huneriya Helbestan:

Di vê pirtûkê de, diyar dibe, ku Selîm hewl daye ji çîrokbêjiyê, Folklor û zimanê xwe yê gundîtî û herêmi sudeyekê webigirê û hemî bixe xizmeta avakirina stûnên huneriya helbesta xwe de. Wek nimûne em bibêjin, her di destpêkê de, dibêje:

Were!

Ji destêkê

Vêbêjin çîroka xwe

Çi bû? Çi nebû? ²

Kurd dema di odeyan de, di şevên zivistanê de, çîrok digotin, digotin: - Hebû, nebû ji xwedê mezintir nebû, rehme li dê û bavê guhdêr û hazira bû...

Ji hêla din ve, lêkdanên xwe (Syntax) bi şêweyekî carcaran ne li gor hevoksaziya kurdî avakirine, ev ne ji netêgehîştina wî tê, lê ewî bi mebest ev xijqandinên rêzimanî peyda kirine wek ku Jean Kohen, dibêje: “nixumand serpehatiya min bi siya poşmaniyê/ Te gerim nake hêlîna min? / Digerînim kurmê bedena xwe li çolên penaberiyê / Bila bibhîse mirin kenê te...” Ji van şêwe hevokan pir bi kar tîne, eger em li gor

¹ Ya berê, r. 5

² Selîm, biçûk, Xewnên revok, r. 5

rêzimana kurdî biçin, pêdiviyê lêker li dawî bê, ango hevok weha bibin

“Serpêhatiya min bi siya poşmaniyê nuxumand/ hêlîna min te gerim nake / kurmên bedena xwe li çolên penaberiyê digerînim / Bila mirin kenê te bibhîse..”

Di hin cihan de, xijiqandin, dirêj e û di hinan de, kin e. Ev çi sûdeyê dide helbestê?

Bêguman dema helbest di şeweyê axaftina xewza de bêt, dê her kes bişê bibe helbestvan, lê nayê wê wateyê jî her mirovek zimanê xwe xweher bike û peyvê deynê şûna peyvê wê bibe helbestvan. Ev şeweguherîn eger bi zanebûn bêt hêzekê dide wateyê û asoyên watedarî li ber xwêner vedikê û ya diwan, rengê ji rengên aheng û terazûya hundurîn di deq de pêktîne. Selîm ta radeyekê hêlaye ez wek xwêner bi çêjeke cude hest bikim, lê di cihên din de jî, hewl daye, ku ji rêzbend û kêşê dûr bikevê (Wezin û Qafiye).

Ev li ser xwêner dimîne, ka çawa, dikarê di gel biguncê yan na. Ez bi xwe dibêjim, ev fêlbaziya zimanewanî encameke posîtîv li nik min neda, di hêla terazû û ahenga hundurîn de, lê di hêla dengê kesayetiya wî de babeteke din e, dûr û dirêj e, pêdivî bingegehên Sosiyo-psyşolojî ye, û ev e jî ne cihê wê ye û belkî têgehîştina min tê de kême, herweha analîza Freudî dişê van xewn, xeyal, şikestin, lavlav û hêviyan, bixe

bin çarçeweke tirsra ji olê, ji nepeydabûna evînek rast, hezker û berdewam, yan jî tirsra ji civakê..?! Ez nizanîm!?

Ji hêla wêneyên helbestî yên Selîm bi kar tîne ve, bêhtirîn ji wan li derdora xewn û xeyalan, êş û xerîbî, dûrî û bêrîkirin, mirin û keser û gelek şikestinên, ku carnana jî bi hêvî û lavlavan avîs. Diyar e, bêhna êş, keder û xemgînî serçopê wêneyên Selîm in û di gel wan xwe derman dikê.

Hêvî dibin lêlan / xwezî dibin xeyal/ tu sibe hêviya daleqandî / bi

te bi dawî tê mizgîna mirinê /

Carcaran, ji peyvên dijwate wêneyên xwe ava dike, Ev peyvên dijwate, dualîzma rastî û xewnê, serpêhatin û hêvî, reş û spiyê ye. Dualîzma Ez yê niha û ez yê dixwazim bibim. Gelo, Tenêti û çixar e, an ken û girî, an dîtî û jiberçavçûn e!?! di vî biwarî de, nivîskar û nivîs, ji yek êşê vedixwin û pêk ve, ji ber dergehê mirinê/jiyan dizivirin.

Hat û çû/ kenîya giriya/ jiyan mirin/Bihîşt dogeh/ ronî tarî/ tu ez.

Li vir pêdivî peyvê ye, ku wêneyên di pirtûkê de hene, ne xwe, ne jî wateya di hundurê çivakê de, derbas kirine, lewra ahenga dirûnî di nav awazên xormalî yan jî stranên duqolî de dihêlin, û nagihin radeya simfonyekê, ku ji dengê dilê dildar bête der..

Babet

Babetên ku Selîm di Pirtûka xwe ya helbestî de, anîne, diyar in, xwêner nawestînin Ev babet li ser Bîranînên wî di gel çend hevalên wî yên ezîz in, ku jiyana xwe qurbana welatê xwe kirin, ew ên Selîm di gel wan salên xwe yên xortanî û germiya bûyeran derbas kiri bû, hevalên wî bûn, lawên gund û bajarê wî bûn, mamoste û şagirtên wî bûn (Naifê Haco, Xebat, Nezîr, Sebrî..).

Babeta diwan, evîndarî ye, vêca ev evîndarî ya welat, jinê, dê, bavê ku nedîtî ye? Hemî têkel dibin û di hundurê bîran, hêsir, xem, xewn, lavlav û hêviyan têne der û dîlana xwe di cihekî nenas de, di demeke nenas de, digêrêne.

Di dawî de, ez, dibêjim ev qurtek bû, ji tiştê ez têgehîştim, lê bi hêviya xwênerên din bi hûrbînî bixwînin û têbînîyên xwe li ser binivîsin, bo em hemî pêk ve, bikaribin karekî baş ji çand û toreya xwe ya giranbiha re bikin, bo em xizmeta zimanê xwe yê eve bi çendê salan ji çarçewa mala dernektiye û dijminan oksêjên jê birîn, tevî wê jî li ber xwe daye, di rêya folklor û çîrok û çîvanokên me re.

Careke din dibêjin, her xwendinek, avakirinek e û pirtûka Selîm çu pêdivî bi ferhengan nîne.

Jêder:

- Belaxet Al Xîtab û Ilm al Nes. Dr. Selah Fedil „Alem almarîfe 164
- Selîm, Biçûk, Xewnên Revok, weşanxaneya Angela Hackbarth Verlag, St. George

Baran û hebûneke berze. Perwîn Mihsin

Perawêz:

Hebûneke Berze, dikare bibe rewşeke derûnî ya mirovekî/ê, ku serî lê geriya be, an jî dikare gîhandina berbi armancekê be û ji nişka ve têkbiçe! Dikare berbidawîbûna labîrentekê be û li xêza dawî li êkudu bête alandin. Ne ev, ew û ewa din e, ev navnîşana pirtûkeke helbestî ye, ya helbestvana hêja Perwîn Mihsin e. Ji sernavê vê pirtûkê du xal bo min diyar dibin:

1. Baran, ji xwe wek simbol, ji kevin ve, nîşana ber, danê û xêrê ye. Li def Perwînê wateya xwe ya metolojî, simbolîk û civakî jî dibezîne, xwe digihîne radeya hêvî, xewn, hevgihandin û berdewamiya jiyaneke bextewer.
2. Ev navûnîşan du peyvên dijber hildigire Hebûn û Berzebûn. Hebûn li vir, li nasnameya xwe ya toreyî digere, li alavan digere, daku stûnên hebûna xwe di nav helbesta kurdî ya hevçerx de çêbiket. Perwîn pêkolê diket, ku berê xwendevanî her ji destpêkê de, berbi xwe ve bibet, wek jin, wek mê, wek bûnewer û wek xudan hest û derbirînên cuda, ji miroveke cuda, di

demeke cuda de, bi hebûneke cuda. Lê ev pêk ve jî dibin sedemên, ku êdî nema bizanibit, bi kîjan amûrî destpê biket, lewra peyva **Berze** dikite temamkera hebûnê.

3. Helbestvana me bi newekhevî û dijberiyekê pêrgî xwendevanê xwe dibet û dixwaze xwendevanê xwe bikete hevpişkê prosesa dahênanê. Jibilî wê jî bi wêneyekî hizrî xuru sedî sedî xwe înaye beramber wergirî.

Encama van hersê xalan, Perwîn Mihsin, dixwaze bo me bibêje, eve ez im, ka ez? Wate me berev hizreke mijane, diyar û nediyar bîr û buneweriyar, me carnan berev xeyalan ve dibe û dergehê guman û texmînan, mij û temê li ber xwênerî vediket û carnan destê xwe bi êş, îşq, evîn, xurbet, tenêti ve diket.

Destpêk

Şirovekirineke maqûl ji helbestan re, ku xwendevan têbigihe, bi xwe jî hunerek e. Hunera şirovekirinê jî çend hêmayên xwe hene. Bêguman em dê di vê kurte lêkolînê de, ya rast, di pêşkêşkirina pirtûka Xanim Perwîn Mihsin de, nikaribin hemî hêmayan destnîşan bikin û li ser her hêmayekî şiroveyên cuda bikin.

Bi xwendina min ji helbesta yekem re, min ji nivîsera me Perwîn ev pirsîyar kir:

>>Tu bi zimanê farişî dizanî û te xwendiyê? Bersiva wê jî na bû û li dûv NAYê, çima te ew pîsyar kir li min vejeriya.. Min got: bêhna Forox Foroxzad ji vê helbestê hat. Rast e ev helbesta Perwînê **Te dem heye?** Ne yek mijar e, lê şêweyê derbirîna îshq û evînê û germahiya bêrîkirinê gelek nêzîkî êk in, ji bilî wê şêwazê avakirina helbestê jik

Were da wek du zarokan / li ber baraneke shirr bikeyne xar.

... netirse! Nahêlim berze bibî/ herdû destên te te dê di nav paxila xwe da helgirim.

Netirse! Nahêlim sermest bibî/ ku hizir bikî li ser sîngê min tu bimirî/wek siwarê hespê sipî/ xeyalên min bo xwe bibe..rûpel13,14

„Min guneh kir:

*Aşiqê min î şê ez te dixwazim../ agirê şehwetê di çavên wî de vêxim/ û di piyalê de şerab sema kir/ leşê min li ser sîngê wî lerizî/ li ser textê nazelîn../ oh min gunehê kir,/ ew gunehê bi dilê min bû“ **ji Dîwana F. Foroxzad Asîr**“*

Tenê em kêliyê van herdû parçeyan di bin çavan re bibin, dê gelek wekhevîyên wate, hevok û mebest bibînin. Li destpêkê Forox daxwazekê diyar dike, ku evîndarê wê bihêt û Perwîn dibêje: were. Li def Perwîn zimanê leş heye û li def Frox jî weha, perwîn bang dike û dixwaze aşiq xeyala wê bibe, lê Forox bi xwe di nav xeyala xwe de(şehweta) dijî.

Bêguman mebesta min li vir, neku bibêjim Perwîn li ber bayê Foroxê helbesta xwe vehûnaye, lê dibêjim ew hestên jinane yên nazik, digel ku civak cuda ne, gelek nêzîkî êk in û her yekê ji wan dergehê asoyê li ber xeyalên xwe vekiriye.

Têkiliya deq bi xwendevanî re:

Jibo em bizanibin ev têkiliya di navbera helbestê û xwendevanî, pêdivî ye, em bizanibin em digel çi deqî ne. Desthilata vî deqî li ser xwendevanî çend e? Xwendevan dikeve prosesa dahênanê? Xwendevan jî desthilatdariya xwe li ser deqî birê ve dibe? Ev pirs û gelek pirsên din, dê pêrgî me bibin. Mebest jî neew e em bikaribin, an jî nikaribin bersivê bidin, lê ya giring em dê çawa bihingivin nivîsîna xanim Perwîn Mihsin? Û eger em bişên

Xwe nêzîkî henasa helbestê bikin, divêt em bi kîjan hîmî ve xwe mijûl bikin? Daku em ji hêla pirs û bersivan derkevin, dê parçeyekî ji helbesta wê ya bi navê Te gul heye?

„Dengê te/ digihîte guhêt min/li demê tu gazî min dikî û/ dibêjî: Ax çendî hez ji te dikim!

Baş bizane/ herrojeke dûrî te/ hizir dikim mirina min e./Ka dengê te?R.89

Hîmê helbestê ziman e:

Jiber em dişên şirovekirinên xwe bi rêka zimanî bikin, şêwe, naverok û nivîsîn bigiştî di rêka re biniyasîn, pêdivî ye, em bizanin, ka ev ziman çendî kartêker e,

xwegihênder e û peyam e? li vir bi hest destpê dike, DENG û bersiv jî hest e/ Bihîstin(GUHDARÎKIRIN), ev diyalog birê ve diçet, ta ku digihît asteyeke din û ew jî hest e EVÎN (ax çendî hez ji te dikim). Li vir, kela helbestê bi pelokan berz dibîtin, deng/bihîstin . Tu /MIN û keser û evîn. Em ji çi hêlê ve bihêne van hevokan, dê bibînîn, ku diyalogeke, dikare xwendevanî bi xwe ve bibestêne, wate xwendevan dikete min desthilata xwe û wî di hundurê dramayekê dibe. Li vir rawaweste, belê bêhnê li xwendevanî bi van çend hevokan diçikîne, dema mirinê bi nedîtina wî ve girêdidet

„Baş bizane/ herrojeke dûrî te/ hizir dikim mirina min e“
Xwendevan dike gunehkar, dema jê pisyar diket „Ka dengê te“

Li vir bo me diyar dibit, ka çendî deq desthilatê xwendevanî ye, wate peyam, sinorê peyambar, an jî wergirê peyamê dibezîne. Lê di berdwamiya helbestê de, peyamhinêr xwe sist dike, ji desthilata xwe û peyamê kêmdike û hêviyan ji xwendevanî/peyamwergirî ku gazî wê bike

„ Hêvî dikim bitinê careke dî/gazî min bike/ da serê xwe/ bilind bikim û berê xwe bidim e/ lêvên te“ 89,90.

Ev cenga di navbera hêzê û nehêzê û nehêzê hêzê de, kela helbestê bilind diket û berev bi valîyeke wijdanî, xeyalî û liberçavçêkirî(Tesewir) dibet. Li vir peyamhinêr(nivîser) û peyam xwe nêzîkî peyamwergir(xwendevan) dikin, li

destpêkê bihêz û li dûv re bi hêvî û lavelav. Ev mîkanîzma avakirina deqî xwêner nawestîne, lê wî har dike û dixwaze kêlîk beriya kêlîkê bizanibe, ka dê çi bibe, wate wê bersiv çi be.


Li vê helbestê, em, xwe nêzîkî tiyoriya Phinominlogiya Hussrel dibin „ Asoyên bendemanê“ li van parçeyên ku me li jor dinivîsîn, EZ bendemana Ew/WÊ dike û berovajî.

Ne tenê wesa jî belê ev feza helbestî, bi hestên xwendevanî fereh û bilind dibin û li gor Ingarden, nivîs dibe projektekî ciwanî, sementîkî(delalî) û xwendevan dibe regezê bigehîn di avakirina prosesa deqî de, lê li vir deq pêdivî bi xwendevanekî heye, neku li nav xêzan bigere, belê digel kewdanên helbestê xwe biguncîne.

Taybetmendiyan vê pirtûkê:

Ez dixwazim, li ser du xalan tenê ji van taybetmendiyan rawestim. Bo çi min ev 2 xalên, ku dê li xwarê behsê bikim hilbijart? Min berê xwe da pirtûka xanim Perwîn, ji sernav û nîşan, ta bigihe metna helbestan zor dem bi kar înye...

Di vê dîwanê de 20 helbest hene, ji wan 20an



Ev navnîşan bitinê bûn, ku nivîskara me, dem wek regezêkî jiyana helbestê sereke bikar înyaye. Eve jî diyar diket, ka çendî tûşî astengiyên jiyaneke bêserûber bûye! Ji bilî ku nazdarî û nazikî di pirsiyar û gotinê de heye, te dem heye/ teniya dîdareke/ Wilamek bo mergit, hêviyek/daxwazek/ bixwenebaweriyek û ji beramber nebawer heye.. Ev e jî me berbi “desthilata deq û nêrîna deq ya kesayetî (zatî) epistomolojî dibe û her wesa jî nerîna civakî û derûnî” الشعر وتعدد القراءات, اعداد د. بهجت الحديثي. ص. 219

Taybetmendiya din jî ew, ku peyva NE/NA/ME pirr bikar înyaye.

Di vê dîwanê de, gelo bi vî şêweyî, helbestvana me dixwaze me berev kî deverê ve bibe û bo çî me bibe?!

Bersiva van pirsan tenê bi xwendina pirtûkê tête dan û eger her yek ji me bixwaze bersivê tomar biket û li dawî bersiv kom bibin, dê bibînin encam cuda ne, wekî ku

Perwîn bi xwe jî ji helbestekê bo ya din cuda tête ber çavan.

Bêguman, ev pirtûk dikare bi gelek şêweyan bête xwendinê, lêw me bi vî şêweyî bixwênin û bi kurtî hindek taybetmendî, di vê pirtûkê de hene, destnîşan bikin û bi hêviya rahêjtina vê pirtûk û wergirtina çêjekê ji xwendinê, an jî xwêner bi xwe bibe regezê sereke ji afirandina berhemê.....

Jêder:

- **Hebûneka Berze, helbest. Perwîn Muhsin, Çapxana Xanî, 2012**
- **ji Dîwana F. Foroxzad Asîr“**
- **الشعر وتعدد القراءات, اعداد د. بهجت الحديثي. ص. 219**

Şevêk ji şevên helbestê Nivîskara kurd Yildiz Çakar, Hannover bi helbest ên xwe gerim kir

Di 11.11.08, nivîskara kurd ya Amedî Yildiz çakar (Helbestvan“ Goristana Stêrkan“ û çîroknivîs „ ALA“), bû mêvanê bajarê Hannoverê.

Şevxwendina Yildiz, di seat 20.00an de, destpêkir.

„ Ez pîrr kêfxweş im, ku me kariye nivîskar û rojnamevana kurd Yildiz Çakar ji Diyarbekir, li bajarê xwe Hannoverê bikin mêvan û vê şeva xwe bi helbestên wê sermest bikin.

Yildiz xan, li ser rola jina kurd di edebiyatê de, axaftina xwe dest pêkir.

Bo me hemiyana diyar e, ku kurd beşekê giring e, di mozaîka Türkiyê de û kultûra kurdî ya dewlenda jî, ji wan kultûrên deverê ya herî kevin e.

Helbestên ku xatûn Yildiz bi kurdî xwendin, bo elmanî jî hatibûn wergerandin û bi herdû zimanan hatin xwendin. Nivîskar û helbestvana kurd, bi dengê xwe yê mişt xemgînî, lê mişt bixwebawerî, dest bi xwendina helbestên xwe kir. Di derketina tona pêşî ji peyvên helbestê, bêdengiyê konê xwe bi ser guhdêran de veda û di dawiya xwendina her parçeyekî ji helbestê, bi kurdî, çepkan dîlana dilxweşiyê li dar dixist serxweş dikir .deng û helbest bûn sîmfoniyek û ketin nav liv û tevgereke bêdawî de:

„ Navê Çûyînê

Şeveke xemrî dibişire wek bizmarekî li ser bajêr.

Bayê azwer nameyên bêbersiv li ber deriyên bêxwedî diweşîne.

Û ez piştî çûyina te lanetê tînim bi kafirkî....

Di bin darekî hişk de me, û li çûyina te difikirim.

Niha tenêtiya min û ya darê dişibe hev.

Ne pelên min ê sor mane ne jî yê darê.

Wek du zarokên ji dêyekê.

Li navê wêneyê helbestê, xweşî, xemgînî, girî, zulim, tenêti, derbederî, ba, bêrîkirin, libendemayîn, reng, bûnewer, sirûşt, têkel dibin, dibin sirûdên şin û girî, dibin sîmfoniya nizim û bilind, dibin agir, dibin ba, dibin axîn û xwe bi ser bejina kurdan û welatên wan de dibarin.

Em her du bi tenê ne

û kokên me hêdî hêdî ber bi rizandinê ve diçin.

Dirizim, dar jî dirize.

Ez bi temenê xwe ve diqermeçim,

dar bi xetên sor pel diweşîne.

Ditirsim li awênayan binêrim,

kokên darê jî ji xwe.

-Ev çi dubendî ye, dilê min ?

Ev xezeba çi ye?

Min nedikarî nav li te bikira; gelo baran bû an bahoz...

Dizanim tu yê vegeerî!

Bêriya te dikim.

Wek bêhna ku ji sînga dayika min tê, te ji xwe re dikim dê.

Yildiz, bi wê tenikiya ruha xwe, mîna kevnarên xwe, mîna seydayê Xanî, ji dubendî, lihevnikirina kurdan, dinale. Yildiz, li welatê xwe ye û bêriya welatê ew dixwaze dike. Mixabin, eve derdeserî ya me kurda ye, ku em li ser axa xwe biyan in û eger di dest me de jî bit, her çavê dayikên xwe mişt ji rondikan dikin.

Hîn di bin dara hişk de me.

Û xeyalên bizdonek rastî şevên min ên reş tên.

Mixabin hîn şerm dikim ji te hez bikim.

Tenê te wek wêneyek qedexe diveşêrim di awêneya dil de.

Tenê stêrkên derewçîn me temaşe dikin.

Niha em her du li ser ewrekî şîn in û destên me bi hev re hatine pêçandin.

Û vê carê em li stêrkan temaşê dikin.

Pişt re kom dibin, roj û şev.

Evîna qedexe, ji hemî tiştan, bedbextiya wê jî destnîşan kiriye. Mirov êdî ji sîbera xwe ditirse. Her dever, di nav tirs, guman û tehlûkê de ye. Soz û peyman jî bûne mîna stêrên liberçûnê. Hişkiya xurustê jî hişkatiya raman û têkilî û danûstendinê ye.

Helbesta 2an ya bi navê xeyidîme, li ba helbestvana me Yildiz xwedî cihekî taybet bû, ji ber ku dîtina dîmenê zarokekî kurd 6salî, wisa bi sarî û hovîtî ji hêla polîsekî tirkî ve bête kuştin, ew xist nav şîneke giran de, ku gelek caran, li nav bexçeyê xewnên wê mêvan e.

„ Ne li te tîm û ne jî li xwe.

.....

Ne dayika min û ne jî tu, destê min nagihîje asîman.

Her ku destê xwe davêjim stêrekê, guleyek dibare, di bin banê çavên min de. Li vir, li ba te, di nav gola xwînê de, qeşmerek diawite..“

Yên Yildiz ji wan hez dike jî, nikarin, merem û armanca wê nêzîk bikin, an jî pê re yarmetîdar bin. Eş, gola xwîn, gellebarîn û mirovên mirovêş.. hemî di gulwaza helbestê de, sirûdekê ji kovanên pêşkêşî xwendevanî dikin û mîna

mirovek bibêje : Eger hun behwer nekin, werin berê xwe bidin Amedê û çavê serê xwe bibînin.

Carnan di bêdengiyê de û carnan bi kovanên dayîka zaroka 6 salî, yê çavsorî, kîn û nemirovayetiya polîsê tirk, ew berbi zindîbûnê ve biribû, şeva helbestê dixemilî, lê her car jî, gîrnijîneke mîna bayê sibehên bihara Amedê, xwe li ser dêmên Yildiz radida.

Yildiz xanê di helbesta xwe de dixeyidî, lê xwenasîn rêya wê bû. Digirî, lê hêvî û geşbînî silava wê ya dawîn bûn. Ew helbest ên hewqas dilkovan, azarkêş û miştbirîn, dema ku derbasî qada cemawer dibûn, dibûn sîmfoniyeke ezelî, li ser kurpînên dil, dîlaneke perwaneyî li nav guh û awirên beşdarên dikire mêvan.

Piştî xwendina helbesta 2an, hizrên beşdarên ketin nava bêdengiyekê de. Wê bêdengiyê qûnaxekê xwe kêşa û çavên helbestvana me jî di nav rondikan de mabûn. Beşdarên dixwestin, hensa helbestê û bêhna wê bikin morfiyoma xewnên xwe.

Dema beşa helbestxwendinê qediya, nivîskara kurd Yildiz, gotara xwe, ya li ser rola jinê di edebiyata kurdî de, xwend. Bêy ku ku gotarê dirêj bike, Yildiz behsa qûnaxên berê kir, ku çawa jin bû, ya kultûr û zimanê kurdî parastin, her wisa jî helbestvanên dema xwe bûn, dema ku ew şer,

heyranok, dîlok, payizok û lawik digotin. Wate ew bû imbar û gencîna kultûr û edeba me.

Wisa jî, di dema îro de, eve bêhtir ji 80 salî ye, ku siyaseta fermî ya Tûrkiya ziman û kultûra kurdan genocide dike, jin dîsa di sengera pêşî de ye bo parastina wî zimanî. Her jin e, ya ku li male digel zarokên xwe kurdî dipeyive:

“Edebiyateke bê jin, dişibe mêzek lingşikestî.

Di dirokê de heta niha gelek çewisandinên giran û neheqiyên mezin li jinan hatiye kirin. Ger ku em qala jinên kurdan bikin, divê em ji dîroka wê destpê bikin.

Bi rastî dîrokeke nivîskî ya kurdan zêde nîne, hebe jî dibe ku hîn derneketibe holê.

Lê sûdeke kurdan heye ew jî çand û pûxtên hundirîn ku bi xêra jinan giheştiye serdema me.

Ger ku em li ser edebiyata kurdan bipeyivin, divê em berê destê xwe bavêjin dîrokê û rewşa jinê ya ku di dîrokê de bide ber çavan. Lê mixabin rewşa jinê bi taybet bi feraseta feodalizm û islamiyetê çiqas di rewşeke kambax û taritiyeke de derbas bûye, derdikeve holê. Ev ferasta ol û feodalite jinê di nava çar diwaran de hiştiye û aliyê wê yê afiranêrî qedexe kiriye. Ji ber van êrîş û qedexeyan jina kurd di dîroka edebiyata kurdî de cihek negirtiye. Di sedsalên dawîn de behsa çend jinan tê kirin ku navên wanên rastîn û belgeyek ku nivîskî ji wan hîn derneketiye holê. Lê, çanda devkî dide

nîşan ku hinek jin xwestine vê xeleka ku wan dorpeç kiriye
bişkînin û bigehîjin azadiyekê.

Pirsa yekem, ku europiyek ji helbestvanekê/î rojhilatî dike ev
e:

- Bo çi helbesta te mişte ji êş, keder, azar û xeman?

Bo kurdan jî bersiv her ev dimîne: Ma kurdan ji bilî zulim,
zor, bindestî, tepeserî, bombebaran, jeherdan, kuştin, talan,
lêdan, derbederî, bi serçiyanketin, qirkirin û enfalkirin û
genosîdan çi dîtin? Di dawiyê de, her yekê berê xwe da mala
xwe, lê ew şev li def wan bo şevê ji şevên Hezar û şevê...

Hannover, 13.11.08

Ji Weşanên Yekîtiya Nivîserên Kurd/ Duhok
www.duhokwriters.com

- 1) Nivêjek Mestane Li Dor Gunbada Cizîrî/ Vekolîn/ Dr. Fazil Omer 2004
- 2) Xewnên Tazî/ Helbest/ Ruxweşê Zîvar 2004
- 3) Wexerek Di Nihênîyên Deqî Da/ Rexne û Vekolîn/ Yasirê Hesenî 2004
- 4) Biyavê Xwandinê/ Vekolîn/ Celal Mistefa 2004
- 5) Li Ber Derazînka Têkistan/ Xwandinên Wêjeyî/ Selam Balayî 2004
- 6) Xwandingeha Birsîkrînê/ Çîrok/ Sedîq Hamid 2004
- 7) Hizir û Dîtin/ Hizir û Rewşenbîriya Giştî/ Dr. Arif Hîto 2004
- 8) Çend Rêyek Bo Deqî/ Vekolîn/ Sebih Mihemed Hesen 2004
- 9) Berperekê Winda Ji Jyannama Selîmê Esmerê/ Çîrok/ Enwer Mihemed Tahir 2004
- 10) Çend Xwandinek Şêwekarî/ Vekolîn/ Star Elî 2005
- 11) Janên Sînahiyê/ Roman/ Tehsîn Navşîkî 2005
- 12) Qîses Min Bîlad Alnercis/ Hesen Silîvanî (çapa diwem) 2005
- 13) Gotarên Rexneyî/ Komele Witar/ Hoşeng Şêx Mihemed 2005
- 14) Geriyanek Di Nav Baxê Edebê Kurdî Da/ Reşîd Findî 2005
- 15) Sotingeh/ Roman/ Bilind Mihemed 2005
- 16) Siyapoşê Zêmarî/ Çîrok/ Dr. Fazl Omer 2005
- 17) Şanoya Hevçerx û Çend Dîtin/ Siyar Tmir 2005
- 18) Vîyan Di Demekê Jandar Da/ Roman/ Mihsin Ebdulrehman 2005
- 19) Teknîka Vegêranê Di Kurteçîrokên (Fazl Omerî) Da/ Vekolîn/ Nefîsa Îsmaîl 2005
- 20) Mêrî û Kevok/ Çîrokên Zarokan/ Dr.Ebdî Hacî 2005
- 21) Hejde Çîvanokên Gurga/ Çîrok/ Ber: Mihemed Ebdule(Çapa Diwem) 2005
- 22) Rustemê Zalê/ Dr. Arif Hîto(Çapa Diwem) 2005
- 23) Şhîna Çyayê Spî/ Çîrok/ Nizar Mihemed Seîd 2005
- 24) Cemiserê Siyê/ Kurte Çîrok/ Xalid Salih 2005
- 25) Ey Roj/ Neçe Ava/ Pexşan/ Selam Balayî 2005
- 26) Ji Rewşenbîriya Kurdî/ Vekolîn Gotar/ Nacî Taha Berwarî 2005
- 27) Zarokên Cîhana Aştî û Aşopê/ Vekolîn/ Hizirvan Ebdule 2005
- 28) Duhok Di Serboran Da/ Bîrewerî/ Sedîq Hamid 2005
- 29) Cak Drêda û Helweşandin/ Vekolîn/ Dr. Fazl Omer 2005
- 30) Dawya Şervanekî/ Roman/ Îsmet Mihemed Bedel 2005
- 31) Pêlên Rexneyî/ Rexne/ Nîmetula Hamid Nihêlî 2005

- 32) Dema Hêşta Gyanewer Dişiyani Biaxvin/ Çîvanokên Milî/ werger: Hecî C'efir 2005
- 33) Ber Bi Deqê Xomalî/ Deq û Şrovekrin/ Îbrahîm Ehmed Simo/ 2005
- 34) Mêmêtîkis/ Ji Hizirkirîna Taku Aydiyolociyayê/ Dr. Fazl Omer/ 2005
- 35) Keltor.. Nasyonîzîm û 'Erebkrin/ Vekolîn/ 'Ebdal Nurî/ 2005
- 36) Peyvên Bê Perde/ Vekolînên Rexna Edebî/ Ebdulxalq Sultan/ 2005
- 37) Nivîstin Di Çavên Nêrgîzê Da/ Helbest/ Beşîr Mzuyrî/ 2005
- 38) Ji Felsefa Bexudanê/ Helbest/ Remezan Îsa/ 2005
- 39) Ewê Djî Hemîya/ Kurteçîrok/ Sebih Mihemed Hesên/ 2005
- 40) Nijyargerî/ Dr. Fazl Omer/ 2005
- 41) Bîst Sal û Êvarek/ Roman/ Sebrî Silêvaney/ 2005
- 42) Nivêşîn Di Navbera Nivîserên Xwedawend û Lêgerîyan Li Azadiyê/ Vekolîn/ Hoşeng Şêx Mihemed/ 2005
- 43) Ji Çîrokên Mîlî Yê Filklorî/ Cemîl Mihemed Şêlazi/ 2005
- 44) Cwahir Alimbîdî/ Munaqşat Adebîye/ Îsmâîl Badî/ 2005
- 45) Dîmenên Peçnî/ Çîrok/ Kîvî Arîf/ 2005
- 46) Tîr Ji Kvana Dweşyên û Ber Têne Min/ Helbest/ Selman Kovlî/ 2005
- 47) Kevalekê Ruys/ Helbest/ Şukrî Şehbaz/ 2005
- 48) Dewlet û Eşqeka Kevnar/ Helbest/ Deyka Dalyayê/ 2005
- 49) Şevên Bê Xew/ Helbest/ Beyar Bavî/ 2005
- 50) Azrandîna Bendemanê/ Hîzîrvan/ 2005
- 51) Çaxê Roj Dpeyvît/ Helbest/ Şemal Akreyî/ 2005
- 52) Dû Çemkên Havîbûn Yaxîbûn/ Emîn Ebdulqadir/ 2005
- 53) Rastî û Talan/ Sibhî Mirad/ 2005
- 54) Deftera Bê Gûnehîyê/ Helbest/ Ebdulrehman Bamernî/ 2005
- 55) Zîman û Zîmanîvanî/ Ebdulhab Xalîd/ 2005
- 56) Evîn/ Xem û Mirin/ Helbest/ Yeyîb Deştanî/ 2005
- 57) Zîndana Bçuyk/ Helbest/ Ezîz Xemcivîn/ 2005
- 58) Eşîq Di Behîşteka Yutubayî Da/ Helbest/ Mistefa Selîm/ 2005
- 59) Ezê Di Hembêza Henasên Te Da/ Çîrok/ Îsmâîl Mistefa/ 2006
- 60) Roman Li Devera Behdînan/ Vekolîn/ Remezan Hecî Qadir/ 2006
- 61) Raya Giştî/ Têgeh û Pênasîn û Guhorîn û Pîvana Zansîtî/ Vekolîn/ Mislim Batêlî/ 2006
- 62) Helbestên Rengîn/ Hozan/ werger: Tengezarê Marînî/ 2006
- 63) Tevinkera Kurd/ Hunermenda Berze/ Vekolîn/ werger: Mesûd Xalîd Gulî/ 2006
- 64) Çapemenoyêt Rewşenbîriyêt Devera Behdînan (1935/2000)/ Bîblugrafya/ Wsefî Hesên Ridênî/ 2006
- 65) Şeva Frîşte Revîn/ Çîrok/ Îsmâîl Silîman Hacı/ 2006
- 66) Gululka Alozyay/ Xalîd Salîh/ 2006

- 67) Nivêjeka Baranê/ Hozan/ Heval Findî/ 2006
- 68) Roj/ Hozan/ Hişyar Rêkanî/ 2006
- 69) Eşiq Li Jêr Pira Çînudê/ Bilind Mihemed/ 2006
- 70) Werzê Evînê/ Novlêt/ Yunis Ehmed/ 2006
- 71) Efsaneya Sitranên Bindestiyê/ Necîb Balayî/ 2006
- 72) Xewneka Emirîkî/ Çîrokên Ezîz Nisîn/ werger: Xîrî Buzanî/ 2006
- 73) Hizrînek Di Zimanê Kurdî Da/ Reşîd Findî/ 2006
- 74) Xanî Mamostayê Sêyemîn/ Mem Şeref/ 2006
- 75) Ji Awazên Ciwaniyê/ Hozanên/ Nacî Taha Berwarî/ 2006
- 76) Pêdaçûnek Lser Hindek Belgenameyên Taybet Bi Kurdanive/ Vekolîn/ Dr. Selah Hirurî/ 2006
- 77) Meşa Bokan/ Hozan/ Hîvî Berwarî/ 2006
- 78) Ew Zalamê Dgel Xo Lêk Cuda/ Şano/ Siyar Temer/ 2006
- 79) Pelên Eşqê/ Hozan/ Dirbas Mistefa/ 2006
- 80) Şevên Sar/ Roman/ Hesên Îbrahîm/ 2006
- 81) Hozan Bo Delalê/ Hozan/ Xalid Hisên/ 2006
- 82) Balolka Şekrê/ Çîrok/ Hesên Silêvanî/ 2006
- 83) Heyranok/ Nameyên Evîndaran/ Edîb Ebdule/ 2006
- 84) Mirin Di Qîşleya Padşahî Da/ Çîrok/ Mihsin Ebdulrehman/ 2006
- 85) Çîvanoka Gayê Sor/ Filklur/ Cemîl Mihemed Şêlazî/ 2006
- 86) Selwa Hêş Belalîske/ Helbest/ Luqman Asîhî/ 2006
- 87) Bilîcan/ Roman/ Peruyz Cîhanî/ 2006
- 88) Le'lîxana Goveyî/ Çîrok/ Mistefa Bamernî/ 2006
- 89) Veger/ Roman/ Şahîn Bekir Sureklî/ 2006
- 90) Qedera Min/ Hozan/ Selman Şêx Memî/ 2006
- 91) Bêhnişk/ Fulklor/ Mihemed Hesên Bnavî/ 2006
- 92) Armanc/ Hozan/ Sebiriye Hekarî/ 2006
- 93) Bakurê Dil/ Hozan/ Dilşa Yusif/ 2006
- 94) Xewnek Bnefşî/ Çîrok/ Îsmet Mihemed Bedel/ 2006
- 95) Nihênîyên Xameyî/ Hozan/ Sebrî Nihêlî/ 2006
- 96) Henasek Di Peristgeha Ş'rê Da/ Xwandinên Wêjeyî/ Selam Balayî/ 2006
- 97) Şorşên Barzan/ Hozan/ Heyder Metînî/ 2006
- 98) Eşqa Me Çrayekê Zeradeştî Ye/ Kurteçîrok/ Îsmâil Mistefa/ 2006
- 99) Tenihistan/ Helbest/ Kemal Silêvaney/ 2006
- 100) Rostemê Zal/ Fulklor/ Hacıyê Cindî/ 2006
- 101) Meqalat Neqdiye/ Micemu'et Niqad / 2006
- 102) Bergotiyên Koçerekî Deştînebûiyî/ Hozan/ Îsmâil Taha Şahîn/ 2006
- 103) Dev Çi Nabhîsn!/ Kurteçîrok/ Têlî Salh Mûsa/ 2006
- 104) Şeveka Bê Nivêj/ Hozan/ Layiq Cemal Kurêmey/ 2006

- 105) Paraduksîzim û Têgehê Wê Di Hozana Nûxwaza Kurdî Da Li Devera Behdînan/ Vekolîn/ Îsmet Xabûr/ 2006
- 106) Dosiya Barzanî Di Sindoqa Pîlayî Ya Stalînî Da/ Vekolîn/ Wezîrê Eşo/ 2006
- 107) Helebçe/ Helbest/ Seydayê Keleş/ 2007
- 108) Çavên Sîtavkê/ Roman/ Tehsîn Navşikî/ 2007
- 109) Bakurê Helbestê/ Helbest/ Arjen Arî/ 2007
- 110) Geriyaneka Bê Hûde/ Çîrok/ Nefîsa Îsmaîl/ 2007
- 111) Sure Brîna Şeva Min/ Helbest/ Selwa Gulî/ 2007
- 112) Eşq Di Xilwegeha Mirnê Da/ Helbest/ Aştî Germavî/ 2007
- 113) Srudên Rojhelatî/ Çîrok/ Celal Mistefa/ 2007
- 114) Ariyana Sînurên Dûr/ Helbest/ Mesûd Xelef/ 2007
- 115) Awazên Xameyî/ Lêkolîn/ Nîmetula Hamid Nihêlî/ 2007
- 116) Beyta Sîsebanê/ Hizirvan/ 2007
- 117) Ger Tu Mabayî/ Hozan/ Selman Şêx Memî/ 2007
- 118) Leşê Şevê/ Helbest/ Selam Balayî/ 2007
- 119) Dalehî Yên Kesekê Bi Tnê/ Çîrok/ Dr. Arif Hîto/ 2007
- 120) Çend Hizrên Rewşenbîrî/ Gotar/ Nacî Taha Berwarî/ 2008
- 121) Helkulîna Zimanî/ Vekolîn/ Dr. Fazl Omer/ 2008
- 122) Xewneka Kîvî/ Helbest/ Deyka Dalyayê/ 2008
- 123) Ji Bo Rênivîseka Çêtir/ Vekolîn/ Îsmâil Taha Şahîn/ 2008
- 124) Petromekirna Gunehan/ Çîrok/ Mihsin Ebdulrehman/ 2008
- 125) Rojanên Şetekî/ Têksitên Edebî/ Adîb Ebdule/ 2008
- 126) Roj Ava Dbît Da Bhelêt/ Helbest/ Sedîq Xalid Hirurî/ 2008
- 127) Bajêrê Dîna û Çend Çîrokên Din/ Karîkatore Çîrok/ Têlî Salih/ 2008
- 128) Evîn û Sitran/ Hozan/ Fêsel Mistefa/ 2008
- 129) Govenda Jînê/ Hozan/ Dr. Xeyrî Ni'mo Şêxanî/ 2008
- 130) Kepezê Xewnan/ Helbest/ Xemgînê Remo/ 2008
- 131) Bênder/ Helbest/ Diya Ciwan/ 2008
- 132) Spîhistan/ Kurte Çîrok/ Xalid Salih/ 2008
- 133) Hêcbûn// Têksitên Edebî/ Ehmed Yasîn/ 2008
- 134) Têksit Di Navbera Gotara Rexneyî û Rêbazên Edebî Da/ Emîn Ebdulqadir/ 2008
- 135) Payîzeka Şîn/ Helbest/ Tirîfe Doskî/ 2008
- 136) Em Boçî Ktêban Çêdkeyn?/ Gotar/ Hoşeng Şêx Mihemed/ 2008
- 137) Şevên Pirag/ Hesên Abrahîm/ Roman/ 2008
- 138) Çîrokên Wergêray Ji Kurdî Bo Înglîzî/ Çîrok: Loqman Asîhî/ 2008
- 139) Deh Xewn/ Komeka Helbestvanan/ Helbest/ 2008
- 140) Rapisîn û Rawergirtin/ Misilm Batêlî/ Vekolîn/ 2008
- 141) Têksitên Edebî/ Xalid Hsên/ 2008

- 142) Pira Arta Yan Bihayê Giran/ Enwer Mihemed Tahir/ Sê Şanogeriyên Wergêray/ 2008
- 143) Tirsâ Bê Didan// Roman/ Helîm Yusif / 2008
- 144) Bîrhatnên Serixweş/ Sîrwan Qiço/ Helbest/ 2008
- 145) Payîza Peyvan/ Seebrî Silêvanî/ Lêkolîn/ 2008
- 146) Meydana Kûçkan/ Îsma'îl Silêman Hacı/ Kurteçîrok/ 2008
- 147) Çend Stêrên Geş Di Esmanê Helbesta Nû Ya Kurdî De/ Xelîl Duhokî/ Vekolîn/ 2008
- 148) Dîwanên Botanî/ Sebrî Botanî/ Helbest/ 2008
- 149) Ziman û Edeb û Mêjuwa Kurd Di (Rojî Kurd) Da 1913/ Hecî Ce'fer/ Vekolîn/ 2008
- 150) Lavja Kevnewarekê Xembar/ Gulnar Elî/ Helbest/ 2008
- 151) Snurên Vekrî/ Îsma'îl Badî/ Çavpêkeftin/ 2008
- 152) Pesnên Amedxanê// Helbest/ Henîf Yusif / 2008
- 153) Twafa Yarê// Helbest/ Emerê Le'elê /2008
- 154) Tiyora Wêjeyî/ Û: Dr. Arif Hîto/ Vekolîn/ 2008
- 155) Saloxet Di Heyranokan Da/ Cemîl Mihemed Şêlazî/ Vekolîn/ 2008
- 156) Şano.../ Siyar Temer/ Vekolîn/ 2008
- 157) Min Nevêt Ji Leşê Te Bibarm/ Beyar Zawîtey/ Hozan/ 2008
- 158) Sêhrebendî Ya Berdewam(Zimanê Çameyî)/ Fazl 'Emer/ Vekolîn/ 2008
- 159) Saku/ Nuzad Mizurî/ Kurteçîrok/ 2008
- 160) Ferhenga Klasîkên Kurd/ Mesûd Xalid Gulî/ Vekolîn/ 2009
- 161) Ew Pyawey Be Lamewe Rit Bû/ Behir Muftî/ 2009
- 162) Çend Babet û Lêkolînên Zimanî/ Ebdulwehab Xalid/ Vekolîn/ 2009
- 163) Sîmiya Alixîtab Alşîrî/ Dr. Mihemed Sabir Ubeyd 2009
- 164) Rojanên Edebyata Kurdî / Çîkî/ 2009
- 165) Li Bersifka Me Befr Barî/ Mihsin Qoçan/ Hozan/ 2009
- 166) Deng û Helingiftin/ Azad Dartaş/ Xuyindinên Rexneyî/ 2009
- 167) Alişewaf... Aleyile Alaxîre/ werger: Samî Alhac/ Çîrok/ 2009
- 168) Kîmiyager/ werger: Dr. Lezgînê Avdrehmanî/ Roman/ 2009
- 169) Ew Pyawaney Le Naw Rengî Tablokanim Sema Deken/ Nale Ebdulrehman/ Çîrokan/ 2009
- 170) 100 Salya Zana û Nivîserê Kurd Qanatê Kurdo/ Tusinê Reşîd/ Komeleka Vekolînan/ 2009
- 171) Helweseyên Zînê/ Dr. Arif Hîto/ Ş'r/ 2009
- 172) Baxure/ Mihsin Ebdulrehman/ Roman/ 2009
- 173) Pêla Reş/ Hişyar Rêkanî/ Ji Bîreweriyên Pêşmergeyekî/ 2009
- 174) Kimêdê Gewr/ Sedîq Hamid/ Roman/ 2009
- 175) Demê Nîçe Bi Xo Dibêjît/ werger: Salih Yusif Sofî/ Vekolîn 2010
- 176) Babê Mino/ Mihemed Selîm Siyarî/ Kurte Çîrok/ 2010

- 177) Meqha Al'umiyan/ Enwer Mihemed Tahir/ Qîses Kurdiye Mutirceme/ 2010
- 178) Ew Xanma Henê/ Hesên Silêvaney/ Hozan/ 2010
- 179) Sewdaserî/ Xalid Sindurî/ Hozan/ 2010
- 180) Henaseyên Şîrê/ Ebdulrehman Bamernê/ Hozan 2010
- 181) Şev Jî Daxfin/ Demhat Dêrkî/ Helbest/ 2010
- 182) Frîn Di Bencerê da/ Hizirvan/ Helbest/ 2010
- 183) Stafkên Evro û Duhî/ Şemal Akreyî/ Helbest/ 2010
- 184) Ez û Tu Bi Dîtneka Dî/ Nacî Taha Berwarî/ Helbest/ 2010
- 185) Ne Heval Ne..! /Ehmedê Şoşê/ Helbest/ 2010
- 186) Çend Gulek Bo Yara Min/ Selman Şêx Memî/ Helbest/ 2010
- 187) Dara Çil Awaz/Edîb Çelkî/ Helbest/ 2010
- 188) Peyaleka Din Tarî / Bîlge Sûmer/ Helbest/ 2010
- 189) Wexerek Li Nav Pêrbestên Zimanê Kurdî(Kirmancî) / Fazil Omer/ Zimanivanî/ 2010
- 190) Seyê Hêja/ werger: Ehmedê Zero/ Çîrok/ 2010
- 192) Dîrasat Neqdiye e'n Aladeb Alkurdî/ Meqalat nuxbe min alinuqad/ Dîrase/ 2010
- 193) Lêkolînên Wêjeyî/ Komeka Nivîserên Kurd/ Vekolîn/ 2010
- 194) Xewnên Helawîstî/ Selwa Gulî/ Helbest / 2010
- 195) Layê Dî Yê Prê/ Tehsîn Navşîkî/ Roman/ 2010
- 196) Bêdera Ruys/ Behrî Reşîd/ Helbest/ 2010
- 197) Kurte Çîroka Kurdî Li Devera Behdînan/ Xalid Salih/ Biyografî/ 2010
- 198) Dem alsinewber// werger: Bedel Revo/ Helbest/ 2010
- 199) Şihîna Şevbihwêrkên Dil/ Konê Reş/ Helbest/ 2010
- 200) Rêbazên Edebyatê/ Hêvî Berwarî/ Vekolîn/ 2010
- 201) Asê/ Têksitên Edebî/ Xalid Hsên/ 2010
- 202) Malbata Bedirxaniyan/ Dr.Selah Mihemed Silîm Mihmûd Hirurî/ /Dîrok/ 2010
- 203) Ji Destipêkî Heta Destipêkê/Sebrî Silêvaney/ Gutarên Rexneyî/ 2010
- 204) Li Ber Têhna Bersivên We/ Komele Dîdar/Luqman Asîhî/ 2010
- 205) Pişikên Stenbulê Ji Lexern/ Îsmail Hacanî/ Çîrok/ 2010
- 206) Diyarda Mirina Zimanan/ Vekolîn/ Ferhad Hacî/ 2010
- 207) Xerîbî/ Helbest/ Elinid Mizurî/ 2010
- 208) Heparayên Baranê/ Helbest/ Dr. araf Hîto/ 2010
- 209) Xewnên Şum/ Helbest/ Deyka Dalyayê/ 2010
- 210) Deravek Ji Rexnê/ Vekolîn/ Nîmetula Hamid Nihêlî/ 2010
- 211) Çîrokên Cadugerî Bo Zarokan/ Çîrok/ werger: Hecî Ce'afet/ 2010
- 212) Sê Şanogerî/ Şano/ Jaro Duhokî/ 2010
- 213) Çesteyên Firok/ Çîrok/ Mihsin Ebdulrehman/ 2010

- 214) Dahênan Di Edeb û Gotara Rewşenbîrî Da/ Gotar/ Nacî Taha Berwarî/ 2010
- 215) Evîn û Enfal/ Roman/ Hesên Îbrahîm/ 2010
- 216) Demê Pivdank Dipeqin/ Kin Çîrok/ Salih Xazî/ 2010
- 217) Vînima/ Helbest/ Sû'ad Silêvanî/ 2010
- 218) Ma be' de el'erd/ Vekolîn/ Siyar Tmir/ 2010
- 219) Deşta Dubanê/Helbest/ Ebdulezîz Hacı/ 2010
- 220) Çend Berperê Ji Rojnamevaniya Kurdî/ Rojnamegerî/ Musedeq Tovî/ 2011
- 221) Tefkîk alnes/ Muqarbat Neqdiye/ Xalîde Xlîl/ 2011
- 222) Neyiya Bendemanê/Kurteroman/ Kemal Silêvaney/ 2011
- 223) Nêzîkî Dumahiya/ Kurteçîrok/ Sebîh Mihemed Hesên/ 2011
- 224) Çend Gotin û Pejinên Kurdan Ji Devera Badînan/ Îdiyemên Kurdî/ Nizar Mihemed Seîd. 2011
- 225) Xewnek Le Derewey Bazine/ Şanogerî/ Helket Îdirîs Ebdid/ 2011.
- 226) Mîr/ Vekolîn/ Nîkolo Makiyafîlî: werger: Salih Yusif Sofî. 2011
- 227) Sîtavka Mirovekî Havî/ Kurteçîrok/ Sîpan Ebdula/ 2011
- 228) Şopên Rundikan/ Roman/ Hîzirvan Ebdula/ 2011.
- 229) Almihreqe/ Rîwaye Kurdiyê/ Bilind Mihemed. werger: Samî Elhac/ 2011.
- 230) Lê Lê Weso/ Sipêdeka dî/ Derdê Evînê/ Yunis Ehmed. 2011.
- 231) Qîla'e Behdîna/ Ebdulkerîm Findî/ 2011
- 232) Stiranên Kometayî/ helbest/ Rizgar Kêsteyî. 2011.
- 233) Evîn û Welat/ helbest/ Emerê Le'elê / 2011.
- 234) Gîve Bayekê Kanûnî/ Helbest/ Arif Hîto / 2011.
- 235) Ferhenga Hîzar(Navên Kurdan) / Ferheng/ Mesûd Xalid Gulî/ 2011
- 236) Alşeyx Yunis Alkurdî/ Dîrase/ Dîrase We tehqîq: Îsma'îl Badî/ 2011
- 237) Dîwana Serdayî/ Helbest/ Berhevkrin: Tehsîn Duskî/ 2012
- 238) Şopa Xezalê/ Helbest/ Huşnig Usê/ 2012
- 239) Şervanekî Sûrî Dûr/Helbest/ Fethulle Huseyinî/ 2012
- 240) Mîn Deftir Alantîfade/ Qîses/ Hesên Silêvanî/ 2012
- 241) Qefdek Ji Helbestên Şîngalê/ Komeka Helbestvanan/ 2012
- 242) Di gel Çirkan/ Helbest/ Mistefa Hisên/ 2012
- 243) Sinorên Dînekê/ Helbest/ Hilbîn Baqir/ 2012
- 244) Perê Spî/ Helbest/ Tîroj/ 2012
- 245) Gotgotik/ Helbest/ Şe'ban Silêman/ 2012
- 246) Bijare / Helbest / Fêrîkê Ûsiv . 2012
- 247) Kurê Sava Re'nayê / Roman / Enwer Mihemed Tahir . 2012
- 248) Malanê / Kurte Çîrok / Macid Elheyder / 2012
- 249) Henasek Ji Tîpên Xewna Sinoran / Helbeset/ Gulnar Elî / 2012

- 250) Gulzar / Helbest / Şêx Tahirê Şuşî/2012
 251) Çîrok / Çîrokên Lyoardo Davinşî / Wergêran Îzet Yusif/2012
 252) Haris alnercis / qîses Qesîre / Dr. Sekvan Xelîl Hîdayet/2012
 253) Dastana Hestên Kuyvî/ Helbest / Şîlan Mihemed Hesên/2012
 254) Rogeha Eşîq Têda Mirî/ Helbest / Behrî Reşîd /2012
 255) Helbestên Bijare/ Helbest / Bariyê Bala /2012
 256) Çend Gotarên Wêjeyî/ Gotar / Arjen Arî/ 2012
 257) Wesa/ Helbest/ Wecîhe Bidalirihmn/ 2013
 258) Sehne/ Çîrok/ Cîhan Roj/ 2013
 259) Elî Baba Û Çil Diz/ Helbest/ Ferhad Hacî /2013
 260) Vejenên Rexna Edebî/ Werger/ Nizar Selman Tahir/ 2013
 261) Êvarek Bêyî Te/ Helbest/ Mihabad Hemîd/ 2013
 262) Veçîrîna Pirçê Sitêran/ Helbest/ Subihî Melkayîzî/2013
 263) Dîroka Kurdan Ya Nû/ Vekolîn/ Dr. Selah Mihemed Silîm/ 2013
 264) Qesaid Teşeq Alşems/Qesaid Kurdiê Mutercme/ Tercmet: Hesên Silêvanî/ 2013
 265) Filamoş/ Çîrok/ Jaro Duhokî/ 2013
 266) Çavê Sîê/ Çîrok/ Tehsîn Navîşkî/2013 /
 267) Qehweyeka Tehl/ Çîrok/ Kîvî Arf/ 2013
 268) Ji Eşqa Zimanê Şîrîn/ Vekolîn/ Anwer Mihemed Tahir/ 2013
 269) Kifnê Pîrê/ Çîrok/ Îsmayîl Silêman Hacaî/ 2013
 270) Piraktîzekirina Rexna Nû / Dr. Nîmetula Hamid Nihêlî/2013
 271) Sê Vehînok/ Mela Mehmûd Mistefa Yûsifî/ Dîwan/ 2013
 272) Dîv Av/ Têkistên Hunerî/Şano/ Enwer Tovî/2013
 273) Gul Dibe Kul/ Helbest/ Mistefa Hisên/ 2013
 274) Dîwarên Zindanê/ Helbest/ Îsmet Alosmanî/ 2013
 275) Lûleper / Helbest/ Xalis Xelîl/ 2014
 276) Bêhna Axê/ Helbest/ Dilbirîn Halo/ 2014
 277) Pêlîn/ Helbest/ Ebdulezîz Silêman/ 2014
 278) Sercem Çîrok/ Çîrok/ Dr. Fadil Omer/ 2014
 279) Naterîb/ Çîrok/ Mihsin Ebdulrehman / 2014